

AZMÛNÊN SAZIYÊN CIVAKA SÎVÎL DI ÇARESERIYA PEVÇÛNAN Û SAZKIRINA AŞTIYA CIVAKÎ DE

# MEKANÊN AŞTIYÊ


*Amadekar*
Cuma Çiçek

*Wergera ji Tirkî*
Şêxo Fîlîk



DİSA
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

# MEKANÊN AŞTIYÊ

Azmûnên Saziyên Civaka Sîvîl di Çareseriya Pevçûnan û Sazkirina Aştiya Civakî de

*Amadekar*
Cuma Çiçek

*Wergera ji Tirkî*
Şêxo Fîlîk

DİSA
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

**Mekanên Aştiyê:**
**Azmûnên Saziyên Civaka Sîvîl di Çareseriya Pevçûnan û Sazkirina Aştiya Civakî de**

**WEŞANÊN DÎSAYÊ**

**Amadekar:** Cuma Çiçek

**Rêveberê Bernameyê:** Atalay Göçer

**Bergsazî:** Feyza

**Rûpelsazî:** Feyza

**Wergera ji Tirkî:** Şêxo Fîlîk

**Sererastkirin:** Înan Eroglu

**Wêneyê Bergî:** Mariana Rio

**Sala Çapê:** Cotmeh 2020

**ISBN:** 978-605-5458-41-6

**Copyright ©Cotmeh 2020**
Hemû mafên vê berhemê parastî ne. Bêyî destûra Enstîtuya Diyarbekirê Bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA), nayê kopîkirin.

DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ

ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ

DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

Mimar Sinan Cad. Aslan Apt. B Blok No: 12
21100 YENİŞEHİR/ DİYARBAKIR
**Tel:** 0 412 228 14 42
**Faks:** 0 412 224 14 42
**www.disa.org.tr**
**disa@disa.org.tr**
facebook.com/disadiyarbakir
twitter.com/disadiyarbakir

Ev xebata bi navê **“Mekanên Aştiyê: Azmûnên Saziyên Civaka Sîvîl di Çareseriya Pevçûnan û Sazkirina Aştiya Civakî de”** ya derbarê projeya ‘çareseriya pevçûnê û sazkirina aştiya civakî’ de, ji hêla DÎSAyê ve û bi piştgiriya Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftung a Nûnertiya Tirkiyeyê hatiye amadekirin.

DİSA
DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ
DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

FRIEDRICH EBERT STIFTUNG

Fikir û ramanên di vê xebatê de, dibe ku li fikir û ramanên DÎSA û Komeleya Friedrich-Ebert-Stiftung a Nûnertiya Tirkiyeyê nekin.

# DERBARÊ BEŞDARAN DE

**Cuma Çiçek**, Li Diyarbekirê dijî. Di sala 2004an de li Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê beşa Endezyariya Endustriyê û di sala 2008an de li ser Plansaziya Bajar û Herêman lîsansa xwe ya bilind diqedîne. Di navbera salên 2009-2014an de li Enstîtuya Etûtên Polîtîk a Parîsê di beşa 'Sosyolojiya Siyasetê û Tevgerên Kamûyê' de doktoraya xwe dike. Di kovarên wek *Birikim*, *Praksis*, İktisat Dergisi, *Turkish Studies*, *Dialectical Anthropology*, *Middle East Report* de li ser mijarên wek Meseleya Kurdan, Îslamparêziya Kurdan, Rêvebiriyên Herêmî, Newekheviyên Herêmî, Têkiliyên Çînî û Nasnameyî, Çareseriya Pevçûnê û Sazkirina Aştiya Civakî gotarin nivîsîne. Yek ji avakarên Weqfa Aştiyê ye. Ji sala 2018an û vir ve rêvebirê DÎSAyê ye û bi navê *Süreç: Kürt Çatışması ve Çözüm Arayışları* [*Pêvajo: Pevçûna Kurdan û Lêgerînên Çareseriyê] (2018, Weşanên İletişim)* berhemeke wî çap bûye.

**Vivet Alevi**, Li Tirkiyeyê hatiye dinyayê. Li Zanîngeha Berlînê, beşa Ragihandina Dîtbariyê ya Fakulteya Hunerên Bedew dixwîne. Dema wek Pedagoga Civaknas dixebite di sala 1999an de têgeha Ragihandina Bêtundî dinase. Ji sala 2004an û vir ve li CNVC (Navenda Ragihandina Bêtundiyê) wek hînkera bisertfîka tecrûbeyên xwe parve dike. Ji sala 2005an û vir ve, da ku Ragihandina Bêtundî berbelav bike bi rêkûpêk tê Tirkiyeyê. Seroka Avakar a Komeleya Ragihandina Bêtundîyê ye (www.siddetsiziletisim.org) ku di sala 2013an de ava bûye.

**Reha Ruhavioğlu**, Li Diyarbakirê dijî. Di warê akademîk de li ser mijarên wek Civaka Sîvîl a Îslamî, Medyaya Îslamî û Gotar Di Medyayê de; di warê siyasî de li ser mijarên wek Siyaseta Îslamî, Meseleya Kurdan û Çareseriya Pevçûnan dixebite. Çi di navenda MAZLUMDERê de çi di şaxa wê ya Diyarbekirê de di astên curbecur ên rêvebiriyê de cih girtiye. Yek ji avakarên Înîsiyatîfa Heq e ku a niha di rêvebiriya Nûnertiya Diyarbekirê de ye. Endamê lijneya weşanê yê kovara edebî û hunerî a bi navê *yokuş yol'a* ye ku navenda kovarê li Diyarbekirê ye. Hevserê Nazê, bavê Avzem Şûle û Ali Mîrza ye.

**Tarık Çelenk**, Di sala 1961an de li Erziromê hatiye dinyayê. Di 1982an de li Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê beşa Elektrîkê xwendiye. Di 1983an de tayînî Fermandariya Hêzên Behrî bûye. Di 1998an wexta "bînbaşî[1]" bûye îstîfa kiriye. Di navbera salên 2002-2004an de rêvebiriya ISKIyê kiriye. Di navbera salên 2005-2011an de bûye koordînatorê xebatên Eko-Polîtîkê ku yek ji avakarên Eko-Polîtîkê ye. Di navbera salên 2013-2015an de, dema Proseya Çareseriyê, di nava Heyeta Însanên Aqilmend de cih girt. A niha di televîzyonan de şirovekariyê dike. Bi navê Nexşerêya Fikriyeta Rastgirên Tirkan pirtûkeke wî heye. Di 2018an de Weşanên Çandî yên Vakifbankê ava kir û bû derhênerê giştî yê weşanxaneyê.

1 Di artêşa Tirkiyeyê de payeyeke fermandariyê ye. (Nîşeya Wergêr)

**Özlem Öztürk**, Di sala 1973an de li Xelfetiya Rihayê hatiye dinyayê. Di navbera salên 1995-2005an de li ser mijarên wek 'tundiya li ser jinan' û 'zayenda civakî' xebitiye. Ji sala 1995an û vir ve li gelek deverên herêmê mamostetî kiriye. Ji ber hin xwendekarên xwe yên ku bûne mexdûrê mayin û bermayiyên pevçûnan, ji sala 2005an û vir ve li ser vê qadê dixebite. Di sala 2008an de bi hin hevalên xwe ve Komeleya Hestiyariya Civakî û Dijberên Şer (DUY-DER) ava kiriye. Ji sala 2008an û vir ve bi xebatên xwe hewl dide ku rê li ber bigire da mayin û bermayiyên pevçûnan zirarê nedin zarok û sîvîlan. Bi projeya 'DUY-DER Perwerdehiya Mayin û Bermayiyên Pevçûnan a ji bo Zarokan' xwe gihandiye zêdetirî sed hezar zarokan û derbarê mayin û bermayiyên pevçûnan de perwerdehiyên xetereyê dane. Hê jî di asta neteweyî de, bi perspektîfa 'meseleya mayinan meseleya mafên mirovan e' xebatên xwe didomîne.

**Öztürk Türkdoğan,** Di qada mafên mirovan de parêzeriyê dike. Ji sala 2002an û vir ve rêvebirê komeleya mafên mirovan e û ji 2008an û vir ve jî serokê wê yê giştî ye. Demeke dirêj e ku berdevkiya Koalîsyona Tirkiyeyê ya Dadgeha Cezayî ya Navnateweyî (UCMK) dike. Ji 2008an û vir ve rêvebiriya Platforma Hevpar a Mafên Mirovan (IHOP) dike. Di 2013an de, di nava Heyeta Însanên Aqilmend de cih girtiye. Zêdetirî bîst salan e ji Sendîkaya Kedkarên Tenduristî û Xizmetên Civakî (SES) re şêwirmendiya hiqûqî dike.

**Şah İsmail Bedirhanoğlu,** Di 1961an de li Diyarbekir hatiye dinyayê. Li Zanîngeha Dicleyê Mamostetiya Zimanê Tirkî qedandiye. Di sala 1985an de, di piyaseya derman û medîkalê de dest bi kar kiriye. Ji sala 1994an û vir ve di qadên curbecur ên Saziyên Civaka Sîvîl (SCS) ên civata karsazan de cih girtiye. Seroktî û rêvebiriya Komeleya Pîşesaz û Karsazan a Diyarbekir (DISIAD), Komeleya Pîşesaz û Karsazan a Başûrrojhilat (GUNSIAD), Federasyona Komeleyên Pîşesaz û Karsazan a Rojhilat-Başûrrojhilat (DOGUNSIFED) kiriye. Yek ji rêvebirên DÎSAyê ye û serokê lijneya bilind a (DOGUNSIFED) e.

**Metin Bakkalcı**, Di sala 1956an de li Eskişehirê hatiye dinyayê. Di 1987an de li Zanîngeha Hacettepeyê, Fakulteya Tibê qedandiye. Di serdemên navbera salên 1992-1994an û 1998-2000î de endamtiya konseya navendî ya Yekîtîya Bijîşkên Tirk (TTB) kiriye. Di salên 2000-2002an de wek serokê duyemîn yê TTB xebitiye. Di 2001an de dest bi xebatên Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyeyê (TIHV) kiriye. Ji 2006an û vir ve sekreteriya giştî ya TIHV dike.

**Vahap Coşkun**, Lîsans û lîsansa xwe ya bilind li Zanîngeha Dîcleyê, doktoraya xwe li Zanîngeha Enqereyê kiriye. Derbarê Mafên Mirovan, Pirsgirêkên Demokrasiyê, Siyaseta Tirkiyeyê û Meseleya Kurdan de pirtûkên wî û di hin rojname û kovaran de nivîs û gotarên wî derçûne. Xebatên xwe yên akademîk li Zanîngeha Dîcleyê didomîne. Yek ji avakarên DÎSAyê ye. Ji 2018an û vir ve serokê DÎSAyê ye.

# NAVEROK

**Derbarê Beşdaran de** ........................................................................ 4

**Destpêk** - *Cuma Çiçek* ........................................................................ 7

1. **Erka Saziyên Civaka Sîvîl di Sazkirina Aştiya Civakî de: Çarçoveyeke Teorîk** - *Cuma Çiçek* .................................................... 15

2. **Civakîbûna Navkomî û Çanda Aştiyê: Azmûna Komeleya Ragihandina Bêtundî** - *Vivet Alevi* ...................... 55

3. **Parêzvanî û Ragihandina Giştî: Azmûna Înîsiyatîfa Heq** - *Reha Ruhavioğlu* ...................................... 79

4. **Pevrebûna Civakî li Dijî Pevçûnan: Azmûna Eko-Polîtîk** - *Tarık Çelenk* .................................................. 103

5. **Parastina Welatiyan û Azmûna Duy-Derê: Pirsgirêka Mayin û Bermayiyên Pevçûnan li Tirkiyeyê** - *Özlem Öztürk* ............................. 127

6. **Şopandin û Hesabdayîn: Azmûna Komeleya Mafên Mirovan** - *Öztürk Türkdoğan* .................... 155

7. **Navçînî û Hêsankarî** - *Şah İsmail Bedirhanoğlu* ................................. 185

8. **Xizmetdayîna Yekser: Azmûna Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê** - *Metin Bakkalcı* ............ 207

**Gotina Dawî: Tiştên ji bo Xatirê Aştiyê Bên Kirin Tim Hene** - *Vahap Coşkun* .............. 231

# DESTPÊK

*Cuma Çiçek*

Kürt meselesi Meseleya Kurdan ji Tîrmeha 2015an û vir ve ji diyalog û mudaxeleyê, berê xwe daye tundiyê. Proseya Çareseriyê jî qediya ku piştî Proseya Îmraliyê (1999-2004) û Proseya Osloyê (2008-2011) dest pê kiribû.[2] Pevçûnên ku piştî Pêvajoya Çareseriyê dest pê kirin ji her aliyê xwe ve ji pevçûnên berê cudatir in.

Sê guherînên berbiçav ên pevçûnên piştî hilbijartinên 7ê Hezîrana 2015an destpêkirî hene. Yek jê; pevçûn berê bêhtir li çolê derdiketin lê vê carê daket nava bajaran jî. Tevî ku bandora wê pişt re bêhtir xwe nîşan da, di pevçûnên navbajarî de, ku di navbera Gelawêja 2015an û Avrêla 2016an de û li bajarên wek Diyarbekir, Mêrdîn, Şirnex û Colemêrgê qewimîbû, bi hezaran kes mirin[3] û nêzî 350-500 hezar kes jî ji cihê xwe bûn.[4]

Ya duduyan, pevçûn derbasî aliyê din ê sînor bûn. Pevçûnên ku li derveyî sînoran diqewimîn, bûn yek ji dînamîkên sereke di nêzîkatiya Tirkiyeyê ya derbarê Meseleya Kurdan de. Ji ber pevçûnan, operasyonên li dijî endamên PKK/KCKyê dewam kirin ku ji salên 1980î dest pê kiribû. Tevî vê yekê bi derketina şerê Suriyeyê yê navxweyî re ku sala 2011an dest pê kiribû, Suriye bû navenda şer û pevçûnên ji ber Meseleya Kurdan derdikeve. Ji rûdanan wek mudaxeleya Tirkiyeyê ya li Cerablus, el-Bab û Efrînê jî meriv dikare pê derxe ku şer derbasî aliyê din ê sînor bûye. Digel ku bi salan e wext di ser re derbas bûye hê jî ji wan bajaran venekişiye, herî dawî di Cotmeha 2019an de mudaxeleya Tirkiyeyê ya li Rojava jî dîsa nîşana wê yekê ye.

Axir Meseleya Kurdan û pevçûnên Kurdan bi qasî ku bi paşerojê re neyê

2 Derbarê pevçûnên Kurdan de, ji bo dahûrandineke berfirehtir bnr; Çiçek, Cuma, ***Süreç: Kürt Çatışması ve Çözüm Arayışları [Pêvajo: Pevçûna Kurdan û Lêgerînên Çareseriyê]*** (Weşanên İletişim, 2018).

3 Li gor daneyên Komeleya Mafên Mirovan, di pevçûnên çekdarî yên di navbera salên 2015-2018an de 3.310 kes mirine. (Bnr.: www.ihd.org.tr, dîroka gihaniyê: 15.10.2019). Li gor Bernameya Daneyên Pevçûnê ya Zanîngeha Uppsalayê jî (UCDP) 3.574 kes mirine. (Bnr.: https://ucdp.uu.se/conflict/354, dîroka gihaniyê: 15.10.2019). Li gor daneyên International Crisis Group, di navbera Tîrmeha 2015an û 4ê Cotmeha 2019an de hejmara kesên mirî 4.686 e. (https://www.crisisgroup.org/tr/content/grafik-ve-haritalarla-türkiyedeki-pkk-çatışması, dîroka gihaniyê: 15.10.2019).

4 Office of the United Nations High Commissioner for Human Rights, ***Report on the human rights situation in South-East Turkey – July 2015 to December 2016,*** February 2017, https://www.ohchr.org/Documents/Countries/TR/OHCHR_South-East_TurkeyReport_10March2017.pdf, dîroka gihaniyê: 15.10.2019.

muqayesekirin, bû meseleyeke navneteweyî. Meseleya Kurdan jixwe meseleyeke navdewletî û navneteweyî bû. Lewre mesele ne tenê meseleya Tirkiyeyê lê meseleya Îraq, Îran û Suriyeyê ye jî. Ya din, rewşa civaka Kurdan a îroyîn, nexasim bi peymanên navneteweyî û bi erêkirina aktorên navneteweyî saz bûye. Tevî vê yekê, bi qeyrana Suriyeyê re, mesele li qada navneteweyî bêhtir berbiçav bû, bêhtir bala hêzên navneteweyî kişand. Piştî êrîşa DAIŞê ya li dijî Kobaniyê, bertekên di qada navneteweyî de hatin nişandan û ew bertekên bûn sedema sempatiyeke gelemperî li gel Kurdan, dîsa piştî mudaxeleya leşkerî ya Tirkiyeyê û di serî de DYA, YE, û Yekîtiya Ereban berteknîşandana hema bêje hemû dewletan û di vê biwarê de tenêmayîna Tirkiyeyê, bi me didin xuyakirin ku Meseleya Kurdan ji lokalbûnê derketiye û bûye meseleyeke navneteweyî.

Heke ev guherîna di formasyona Meseleya Kurdan de li ber çavan bê girtin, meriv dikare bibêje êdî bi rêya diyalog û muzakereyan çareserkirina vê meseleyê dijwartir e. Lewre Meseleya Kurdan ku heta Proseya Çareseriyê (2013-2015) meseleyeke Tirkiyeyê ya navxweyî bû û bi rêya diyalog û muzakereyan çareseriya wê pêkan bû, êdî bûye meseleyeke girift a pir-aktorî, pir-astî û li ser çend erdnîgariyan berbelav bûye.

Bi qasî berbelavbûna Meseleya Kurdan a li ser çend erdnîgariyan û bi qasî zêdebûna aktor û astan, hokereke din a girîng heye; li Tirkiyeyê parçebûnek û jihevqetîneke berbiçav rû da, di nava “Taxa Kurdan” û “Taxa Tirkan” de. Û ev jihevqetîn her ku diçe kûrtir dibe. Mudaxeleya Tirkiyeyê ya li Rojavayê û bandora wê ya li ser Kurdan û Tirkan ku xwe di bertekên wan de dida der, vê angaştê piştrast dike. Li aliyekî di serweriya AK Partiyê de lihevkirina partiyên muxalîf ên wekî CHP, MHP û IP ku di hilbijartinên 23ê Hezîrana 2018an de rêjeya van her çar partiyan %86,3 bû. Li hember wan HDP li parlamentoyê bi tenê ma û bêdengiyeke ker û lal bi ser kuçeyên Kurdan de girt. Tevî bêdengiya taxa Kurdan, partiyên Kurdan ên li Tirkiye, Îraq û Îranê ku berê gelek caran bi hev ketine û xwîna hev rijandine, li dora Rojavayê xwe dan hev, hemû Kurdên li seransarê dinyayê daketin qadan. Ev bergeh bi me dide xuyakirin ku Tirkiye di Meseleya Kurdan de bi rengekî din re rûbirû maye.

Ev bergeha ku li jor bi kurtahî hatiye qalkirin, hewldanên aştiyê û avakirina lihevkirinekê pûç dernaxe, dijberî wê, aştî û lihevkirinê bêhtir li ser me ferz dike. Ferzkirineke wisa ku heke rê li ber neyê girtin temamê civakê wê di bin giraniya giringiya meseleyê de bimîne. Ne pir zêde, çar pênc sal berê şer û pevçûn ji binî ve sekinîbûn, hewldanên demokratîkbûnê, pêvajoya pirrengî û otonomiyê bêhtir derxist holê û ew derfeta ku pevçûn û tundî ji binî ve ji holê rabin afirand. Çer ku ew derfet ji dest hat berdan, şer û pevçûnan dîsa dest pê kir û bû sedema talanî û malwêraniyeke ji yên berê xirabtir. Îro jî em bi rewşeke siyasî û jihevqetîneke civakî re rûbirû mane ku dikare bibe

sedema şer û pevçûnên bi salan dewam bike.

Dema em bala xwe didin bûyerên di warê çareseriya pevçûnan û avakirina aştiya civakî de li mekan û zemanên cuda qewimîne; pevçûnên wek ên Kurdan bi salan dewam dikin ku di eslê xwe de pevçûnên navdewletî *(intra-state)* yê nasnameyî û herêmî ne, ji hêla nasname û erdnîgariyê ve rê li ber jihevqetînên kûrtir vedike. Dema şer bi salan dewam dike, dibe sedema newekheviyên etnîk û neteweyî ku xwe dispêre hêzdariyê, newekheviyên giran ên sosyo-ekonomîk, demokrasiya paşdemayî û tunebûna amûrên tevlêbûna siyasetê, pevçûnên ku sereqat li herêmeke diyarkirî diqewimin, mirin û kuştinên zêde û koçberiya zarûrî. Ev jî têkiliyên navcivakî ji binî ve xira dike. Lihevhatineke jidil a civakî dikare van têkiliyên navcivakî yên xirabûyî ji nû ve saz bike û wê jihevqetîna civakî ji holê rake.

Avakirina mala aştiyê bi mekanên aştiyê pêkan e. Sazkirina mekanên aştiyê jî ne tenê bi sekinîna pevçûnan pêkan e ne jî tenê karê aliyên pevçûnê ye. Û bi ser de aktorên siyasî jî nikarin bi tena serê xwe vê saz bikin. Lewre pevçûn tenê di navbera aliyên pevçûyî de naqewimin. Pevçûn ji hêla aborî, civakî, çandî, îdarî, mekanî, derûnî û ji gelek aliyan ve têkiliyên navcivakî têk dibe û wan têkiliyan bi hesta tolhildanê û dijminahiyê jehrî dike, bi wan têkiliyên jehrî jî ji xwe re pergaleke nû ava dike.

Ji bo têkbirina tundiyê, nihêrtineke di ser siyasetê re, jinûve-sazkirina têkiliyên jehrîbûyî û mobîlîzasyoneke civakî ya pirqatmanî, piraktorî, pirrehendî divê da ku em karibin ji pîvanga mîkroyî derbasî pîvanga makroyî bibin. Aktorên civaka sîvîl di mobîlîzasyoneke wiha de dikarin peywireke girîng bi cih bînin. Ne tenê di warê jinûve-sazkirina têkiliyên civakî de lê di warê veguherandina qada siyasetê de jî dikarin peywirê bi cih bînin.

Thania Paffenholz û Christoph Spurk ku li ser mijara "rola SCSyan di avakirina lihevkirina civakî de" dixebitin, qala heft karîgeriyên Saziyên Civaka Sîvîl dikin: (1) parastina welatiyan, (2) şopandin û hesabdayîn, (3) parêzvanî û ragihandina gelemperî, (4) civakîbûna navxweyî û çanda aştiyê, (5) pevrebûna civakî li dijî pevçûnan, (6) navçînî û hêsankarî (7) xizmetdayîna yekser.

Xebata li ber destên we li gor çarçoveya[5] akademîk a Paffenholz û Spurk hatiye nivîsîn û ji nîqaşên xebata bi navê "Çareseriyên Pevçûnê û Erka SCSyan Di Avakirina Aştiya Civakî de" hatiye pê ku (DÎSA: dibistana aştiyê) ev xebat

5 Aktorên civaka sîvîl derbarê çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî de dikarin çi bikin, ji bo agahiyên berfirehtir, dahûrandina bûyerên cihê û nîqaşên teorik ên derbarê vê de bnr.: Paffenholz, Thania (Ed.), ***Civil Society and Peacebuilding: A Critical Assessment*** (Boulder: Lynne Rienner Publishers, 2010). Derbarê Meseleya Kurdan de, cih û rola aktorên civaka sîvîl ên li Tirkiyeyê bnr.: Çiçek, Cuma, ***2013-2015 Çözüm Sürecinde Sivil Toplum Kuruluşları [Saziyên Civaka Sîvîl di Proseya Aştiyê ya 2013-2015an de]*** (Weşanên Barış Vakfı, 2017).

organîze kiriye û di xebatê de aktorên civaka sîvîl azmûnên xwe yên derbarê avakirina aştiya civakî de bi hev re parve kirine.

Di beşa yekem de Cuma Çiçek di warê çareseriya pevçûnan û avakirina aştiya civakî de çarçoveyeke teorîk datîne. Derbarê vê de bi daneyên hejmarî li ser pêvajoyên şer û peymanên aştiyê yên li dinyayê disekine û bi dûv re behsa parametre û dînamîkên pevçûnên wek ên Kurdan dike ku pevçûnên navdewletî, nasnameyî û erdnîgarî ne. Di vî warî de, wek referans qala azmûnên Endonezya/Açe û Fîlîpîn/Bangsamoroyê dike. Ji têgehên Johan Galtung û John Paul sûd werdigire ku du navên (Galtung û Paul) sereke ne di warê xebatên li ser aştiyê de. Axir nexşerêyeke çareseriya pevçûnan û aştiya civakî derdixe. Di nava muzakereyên pirqatmanî û piraktorî de cihê aktorên civaka sîvîl dide nîqaşkirin. Beş, tevî nîqaşên teorîk, di ser azmûnên Kolombiya, Fîlîpîn û Îrlandaya Bakur re qala xebatên şênber ên aktorên civaka sîvîl dike bê ka dikarin kîjan peywiran bi cih bînin û têkevin nava karîgeriyeke çawa.

Di beşa duyem de Vivet Alevi, derbarê "civakîbûna navkomî û çanda aştiyê" yên aktorên civaka sîvîl de behsa teoriya Marshall B. a bi navê "Ragihandina Bêtundî" dike. Alevi, tecrûbeyên xwe yên li Komeleya Ragihandina Bêtundî bi beşdaran re parve dike. Bi me dide zanîn ku ragihandineke din pêkan e ji derveyî ragihandina ku em hemû di jiyana xwe ya rojane de tê de difetisin. Ragihandina jiyana me ya rojane ya li ser esasê rast/çewt, baş/xirab avabûyî, him pêdiviyên me û him pêdiviyên kesên dîtir ji nedîtî ve tê ku li ser esasê darizandin û reqabetê ava bûye. Dilovanî di darê me de heye lê tundî tê hînkirin. Heke em xwe ji pêzanînên xwe bişon û bi wî hawî di çav xwe re bikin, bi hestên di dilê xwe de bihesin, pêdiviyên xwe yên ku nîşaneya nirx û bêriyên me ne bînin ziman, ricayên xwe bi zimanekî zelal û erênî bînin ziman, em dikarin ragihandina bêtundî pêk bînin. Wek Vivet Alevi û hevalên xwe dibêjin, "Ragihandina bêtundî, bi empatî û guhdarîkirina bidilûcan û famkirina hemû aktorên pevçûnê ye, lêgerîna rêyên têkilîdanîn û hevkariyê ye ku pêdiviyên hemû aliyan li ber çavan digire." Beşa navborî hewldana veguherandina pevçûnan û dirustkirina têkiliyên me dide. Di warê avakirina rêya aştiyê de ragihandinê datîne navendê, nîqaşên xwe li dora wê navendê dike û perspektîfeke dîtir dide pêşiya me.

Di beşa sêyem de Reha Ruhavioğlu azmûnên xwe yên derbarê mafên mirovan ên îslamparêz de, ku bi Komelaya Mafên Mirovan û Hevgirtina ji bo Mazlûman (MAZLUMDER) dest pê kiriye û bi Înîsiyatîfa Heq berdewam dike, di pevgirêdana "ragihandina giştî û parêzvanî" de parve dike. Di pevgirêdana îslam, nijadperestî û Meseleya Kurdan de qala têkoşîna mafên mirovan dike ku di qada civakî de bûye sedema pevçûn û lihevhatinan û herwiha qala xebatên Înîsiyatîfa Heq dike. Helbet parvekirinên navborî ne wek lîsteya kar û xebatan e. Bi qasî qala wan azmûnan dike ku baş ku çûne serî, qala azmûnên

nebaş jî dike ku bi kêrî tiştekî nehatine. Ji perwerdehiya zimanê zikmakî heta şervanên zarok di qadeke berfireh de qala azmûnên baş û nebaş ên têkoşîna mafên mirovan dike. Ji aliyekî ve jî qala hokerên bûne sedema azmûnên baş û astengiyên rê li ber nebaşiya azmûnan vekirine jî dike.

Di beşa çaremîn de Tarık Çelenk, di pevgirêdana Eko-Polîtîkê de radigîhîne bê ka aktorên civaka sîvîl di qada "yekîtiya civakî ya li dijî pevçûnan" dikarin çi bikin. Komikên pev diçin an jî aktorên civakî ku bûne aligirê wan komikan dema rastî hev tên û bi hev re dikevin têkiliyê hêza veguherîner a wê rasthatin û têkilîdanînê bi mînakan raber dike. Di azmûna Eko-Polîtîk de ku li Tirkiyeyê mînakeke wê ya din tune, ne tenê di ser Meseleya Kurdan re lê ji Qibris heta Kurdîstana Îraqê; li hemû deverên ku civak ji hev qetiyaye, yekîtiya civakî çawa ji nû ve hatiye sazkirin, li ser wan mînakan jî radiweste û lêkolînên xwe bi haziran re parve dike. Ev azmûn di bingeha xwe de wek mînakeke "ragihandina bêtundî" jî dikare bê pênasekirin. Lewre di vê azmûnê de leşkerekî kevn û endamekî PKKyê, nijadperestekî Tirk ê entelektuel û siyasetmedarekî Kurd ê navdar anîne cem hev. Azmûna Eko-Polîtîkê ev e ku divê meriv hevrikî û pêşdaraziyan deyne aliyekî, bêyî darizandinê yê hember guhdar bike. Bi awayekî dualî pêhesîna bi hest û pêdiviyên hev û hewldana lêgerîna çareseriyeke nû ye. Azmûna Eko-Polîtîk di çareseriya Meseleya Kurdan û sazkirina aştiya civakî de balê dibe ser xebatên nû yên nehatî ceribandin; nexasim ji hêla metodolojiyê ve bi keda Vamık Volkan gihiştiye asta xwe ya îroyîn ku Vamık Volkan bi xebatên xwe yên di warê psîkolojiya polîtîk û psîkanalizê de li dinyayê deng daye.

Di beşa pêncemîn de Özlem Öztürk di pevgirêdana "parastina welatiyan a ji xetereyên pevçûnan" de û di ser azmûna Komeleya Hestiyariya Civakî û Dijberên Şer (DUY-DER) re raber dike bê ka civaka sîvîl dikare çi bike. Öztürk bi têkilîdanîna xwe û hin şagirtên xwe yên bûne mexdûrê mayinê dest pê dike ku vê hewldanê çawa xwe gihandiye bi hezaran zarokan û paşê bûye xebateke berfireh û berbelav di bin banê DUY-DERê de. Û çîrok bi me dide xuyakirin ku digel hemû sînoran civaka sîvîl dikare çi bike. Ev xebata navborî bi awayekî hûrgilî bi me dide xuyakirin ku pirsgirêka mayin û bermayiyên pevçûnan -di medyayê de wek pirsgirêka ewlehiyê an jî wek pirsgirêka astengiyên li ber çandiniya zeviyan tê binavkirin- ji ewlehî û çandiniyê bêhtir, yekser mafê jiyanê binpê dike ku ew maf bingeha mafên mirovan bi xwe ye. Pirsgirêka mayin û bermayiyên pevçûnan ku di eslê xwe de ji mêj ve heye, bi me dide xuyakirin ku ji sala 1990î û şûn de, piştî pevçûnên ji ber Meseleya Kurdan zêde bûye, pirsgirêk veguheriye tiştekî dîtir. Öztürk, bi meseleyên li ser sînoran dest pê dike lê bi raporên fermî, bi daneyên lêkolînên neteweyî û navneteweyî berê me ji ser sînoran dide herêmên dûrî sînoran ên wek Dêrsimê ku li deverên dûrî sînoran jî ev pirsgirêk heye. Bi vî hawî, em bi çîroka DUY-DERê dihesin bê çawa gund bi gund, dibistan bi dibistan xwe gihandiye bi sed hezaran zarokan.

Di beşa şeşan de Öztürk Türkdoğan, di ser azmûnên Komeleya Mafên Mirovan (IHD) re raber dike bê ka derbarê “şopandin û hesabdayîn”ê de civaka sîvîl dikare çi bike. Türkdoğan ji me re qala serpêhatiya têkoşîna mafên mirovan dike, ya ku komekê li hemberî îşkence û binpêkirinên mafên mirovan piştî derbeya 1980yî dabû destpêkirin û pê de pê de veguherîbû meşeke mezin. IHD beriya her tiştî, balê dibe ser girîngiya şopandin û raporgirtinê. Bi vî hawî bi me dide nişandan ku bi saya şopandin û raporgirtinê ne tenê di warê neteweyî de di warê navneteweyî de jî derbarê mafên mirovan de bîrek tê avakirin. Çi bi têkoşîna xwe ya li dijî binpêkirinên mafên mirovan dayî û çi bi hewldanên derbarê Meseleya Kurdan de kirî, di avabûna vê bîrê de em îro gelek tiştî deyndarê IHDyê ne. Û bi ser de azmûnên IHDyê raberî me dike bê ka çareseriya pevçûnan û aştiya civakî çawa bi van hokeran ve ketiye nava hev; şopandin û hesabdayîn, di asta herêmî, neteweyî û navneteweyî de parêzvanî, nirxandina mekanîzmayên navneteweyî, têkoşîna bi bêcazetiyê re, parastina welatiyan û navçînî. Û dîsa raberî me dike ku divê saziyên sîvîl di navbera van hokeran de bibin pire.

Di beşa heftan de Şah İsmail Bedirhanoğlu, di çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî de balê dibe ser “hêsankarî û navçînî”yê. Bedirhanoğlu, wek endamekî Koma Têkilîdanîn û Diyalogê ku beriya Proseya Çareseriya di navbera 2013-2015an de ava bûbû, di ser tecrûbeyên Kolombiya û Îrlandaya Başûr re, xabetên hêsankarî û navçîniyê yên di Meselaya Kurdan de hatî kirin dinirxîne. Di van xebatan de zor û zehmetiyên ku li Tirkiyeyê derketine pêşiya wan, di ser tecrûbeyên xwe re radigihîne. Proseya Îmraliyê (1999-2004) heta dawiyê ji raya giştî re ne aşkere bû, Proseya Osloyê (2008-2011) bi hêsankarî û navçîniya saziyeke navneteweyî bi rê ve çû lê di Proseya Aştiyê de (2013-2015) hikûmet û rêxistin yekser bi hev re ketin têkiliyê. Digel vê, di vê proseyê de Koma Têkilîdanîn û Diyalogê ava kirin ku ji rewşenbîrên fraksiyonên cihê, serkêşên civatan û saziyên civaka sîvîl pêk dihat. Bedirhanoğlu, him di ser tecrûbeyên navneteweyî him jî di ser tecrûbeyên Tirkiyeyê re qala vê tecrûbeye dike ku li ser medyayê pir zêde nehat nîqaşkirin. Bi qasî xebatên erênî yên heyeta navborî bi dilekî safî qala şaşî û kêmasiyên vê heyetê jî dike.

Di beşa dawî de Metin Bakkalcı, derbarê “xizmetdayîna yekser” de ku saziyên sîvîl vê xizmetê didin kes û komikên di bin bandora şer de mane, qala xebatên Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TIHV) yên tedawî û rehabîlîtekirinê dike da ku him trawmaya şer a domdar têk bibin û him jî piştgiriyê bidin kesên duçarî binpêkirinên mafên mirovan bûne. Xebatên tedawî û rehabîlîtekirinê yên TIHVyê ku Bakkalcı wek “hevdîtina kûrahiya akademîk û ruhê aktîvîst” amaje pê dike, esas tenê ne xizmetdayînek e. TIHV ku di tedawî û rehabîlîtekirinê de yekûniya fîzîkî, ruhî, civakî ya însên li ber çavan digire, dema xizmet dide kesên ku duçarî îşkenceyê mane vê xebatê bi nêzîktêdayî-

neke yekûn bi rê ve dibe. Nêzîktêdayîneke yekûn a wek pêzanîna heqîqetê, xwegihandina edaletê, jinûve-bidestxistina heqan, tezmîn, têkoşîna bi bêcezatiyê re û serederiya bi trawmaya civakî ya domdar re. Di warê çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî de azmûna TIHVyê, mînakeke baş û bandorker e ji bo meriv têbigîhije bê aktorên saziyên sîvîl çawa dikarin xebatên karîgeriya wan ji hev cihê bi hev re û bihevûdu re pêwendîdar bi rê ve bibin.

BEŞA YEKEM

# ERKA SAZIYÊN CIVAKA SÎVÎL DI SAZKIRINA AŞTIYA CIVAKÎ DE: ÇARÇOVEYEKE TEORÎK

*Cuma Çiçek*

Ez ê axaftina xwe di bin sê serenavên bingehîn de bikim. Pêşî bi kurtasî ez ê behsa tabloya vî karî bikim bê ka li dinyayê çawa ye û derbarê vê de ez ê behsa çend daneyan bikim. Ya duduyan, da ku di çareseriya pevçûnan û di sazkirina aştiya civakî de cihê civaka sîvîl were famkirin ez ê qala nexşeyeke giştî bikim. Çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî çi ye? Ez ê qala çarçoveyeke giştî bikim. Di beşa dawî de, li ser vê nexşeyê pozîsyon û cihê SCSyan çi ne, li ser kîjan karên şênber dikarin çi bikin, di ser vê re ez ê qala çarçoveyeke teorîk bikim.

## PEVÇÛN Û SAZKIRINA AŞTIYA CIVAKÎ LI DINYAYÊ

Ez ji ya ewil dest pê bikim. Ev hinekî muhîm e, lewre li Tirkiyeyê bi giştî têgihiştineke "xwemalî" heye. Bi gelemperî meyleke wek "Em dişibin hev, loma jî hempayê me tune ye" heye. Di gelek bûyeran de em dibêjin Tirkiye xwedî şert û mercên taybet e û em xwe nadin ber ceribandina tecrûbe û agahiyên dinyayê. Lê esas di vê mijarê de jî heta hûn bibêjin pêzanînên -mixabin ev pêzanîn ne pir baş in- hene. Qet nebe ji sala 1816an û vir ve li dinyayê nêzî 422 pevçûn qewimîne. Hema hema li hemû parzemînan, li 122 dewletan.

Loma heke hûn bi meseleyê re eleqedar bin, dixwazim bi we bidim zanîn ku ev ne tenê aîdî me ye. Li gelek deverên dinyayê bûyerên ku pir dişibin hev diqewimin. Derbarê vê de lîteratûreke pir berfireh heye. Mixabin di vê mijarê de çavkaniyên Kurdî û Tirkî kêm in. Lê heke eleqeya we ya zimanên biyanî hebe, ez dikarim bibêjim pêzanînek heye bi qasî texmîn nekin û di çareseriya pevçûn û avakirina aştiyê de li dinyayê qederek ekol hene. Dibe hûn ji reqeman hez nekin û rexneyên we hebin ji kesên ku li ser reqeman disekinin. Yên min jî hene lê hin caran ji bo dîtina tabloyeke gelemperî, reqem çarçoveyeke baş pêşkêş dikin.

Ji van yek, bi navê *The Correlation of War Project* (Projeya Têkiliyên Şerî) e ku ji sala 1969an vir ve xebatan dike. Xebateke navneteweyî ye û ji aliyê tîmeke akademîk ve hatiye sazkirin. Di navbera salên 1806-2007an de, daneyên hemû pevçûnan, di bin neh-deh beşan de qeyd kirine û hesab kirine.

Nexşeyeke pir înteraktîf nîne lê ku navbera we û Excelê xweş be, hûn dikarin xwe bigihînin agahiyên gelek dewletan.

Ya dîtir, *Uppsala Conflict Data Program* (Bernameya Daneyên Pevçûnî) a ji Zanîngeha Uppsalayê ye. Ev heta hûn bibêjin bes bernameyeke hêsan e. Nexşeyeke înteraktîf e û hê jî aktîf e. Dema hûn li ser nexşeya welatekî ditikînin, hemû daneyên pevçûnên wî welatî derdikevin. Agahiyên kurt hene: çend bûyeran rû daye, kengî dest pê kirine, meseleya bingehîn çi ye, çend kes mirine filan, hûn dikarin gelek daneyan bibînin. Li vir jî di navbera 1956-2011an de, şecereya daneyên qewimî yeko yeko hatine girtin. Taybetiyeke vê ya duyem heye ku di navbera 1975-2011an de, 196 peymanên aştiyê yên îmzekirî analîz kirine.

Ez ê qaseke din wek mînak hin daneyan bi we re parve bikim lê ez ê pir li ser naverokê hûr nebim. Di vir de tiştê esil ev e ez dixwazim rave bikim: Ev bûyer, ne tenê bûyereke aîdî me ye û gelek tecrûbe hene. Derbarê vê de ji sala 1950an vir ve hin xebatên bi navê çareseriya pevçûnan, sazkirina aştiya civakî û xebatên aştiyê hene, ji loma lîteratûreke berfireh, daneheveke muezem a agahiyan çêbûye.

Mixabin me li Tirkiyeyê heta îro ji daneheva van agahiyan têra xwe sûd wernegirt. Tevî ku meseleyeke me ya bi vî hawî heye û welatê me di bin bandora xwe de hiştiye. Tevî ku meseleya me, hema hema her roj, her saet -wek ku hûn dizanin îro jî li Diyarbekir tecrûbeya qeyûm heye- bandorê li ser jiyana me hemûyan dike, çima heta îro me ji ewqas tecrûbeyan sûd wernegirt an jî em dikarin bibêjin ka zanîngehên me li kû ne?

Heke hûn van her du bankeya daneyan vekolin, hûn ê gelek daneyan bi dest bixin. Ser meseleyê li gor şêwaza pevçûnan senifandinek kirine. Tenê dixwazim hûn li serenavan binêrin. Nekevin nava hûrgiliyan. Rengê van pevçûnan çi ye? Navdewletî ye yan navxweyî ye? Bingeha wê nasnameyî ye an herêmî ye? Ev serhildan dixwazin hemû dewletê bidin ber xwe an tenê dixwazin pergala siyasî biguherin? Ango wê derfetê dide me ku em li gor rengên pevçûnan senifandinekê bikin. Hûn dikarin dabeşiya herêmî jî bibînin. Him ji sala 1816an him jî ji Şerê Cihanê yê Duyem vir ve heye. Ku hûn li dabeşiya piştî Şerê Cîhanê yê Duyem binêrin hûn ê bibînin ku tablo bêhtir li Asya û Afrîkayê gur bûye.

Pevçûnên bin-dewletî (*intra-state*) ji hêla armancê ve xwedî du cureyên bingehîn in. Serîhildanên ku dixwazin rejîma heyî hilweşînin û rejîmeke din saz bikin -wek mînak yên ku armanca wan avakirina dewleteke komunîst, avakirina dewleteke Îslamî ye- û yên ku dixwazin li herêmeke dewletê tenê rejîma siyasî biguherînin an jî tev li rejîmê bibin.

Hûn dikarin li gorî şêwaza qedandina pevçûnan jî daneyan bi dest bixin. Çawa qediyane ev pevçûn? Awayên cuda yên wekî serkeftina leşkerî ya dewletê, serkeftina leşkerî ya serhildêran, rewşa korerêyî an jî têknebirinê, dewamkirin û dewamdarbûna gurahiya lihevhatin an jî pevçûnan di asteke kêm de hene.

Hûn dikarin rêjeya miriyan bibînin. Di bûyerên wiha de teqrîben çend kes mirine? Di van bûyeran de ji dewletê derdora 8 hezaran, ji serhildêran jî derdora hejdeh hezar kesan mirine.

Ev tenê çend mînak in ku min dane. Hûn dikarin bigihîjin gelek daneyên wiha. Qet nebe derbarê vê de fikreke we dê çêbibe bê ka li dinyayê ev kar çawa bi rê ve diçe. Teoriyên li ser van hatî afirandin jî hene.

Ser meseleyê, min du gotar xwendibûn. Gelo pêwendiyek di navbera şêwaza xilasbûna pevçûnan û maweya wê de heye? Gotarekê nod rûdan dabûn ber hev, yeke din sed û bîst rûdan dabûn ber hev bê ka pêwendiyek di navbera şêwaza xilasbûna pevçûnan û maweya wê de heye an na. Bi temamî encamên jimareyî ne, bêyî ku guh bidin dewamiya pevçûnan. Yekê ser meseleyê wiha digot: Îhtîmala ku serhildêr bi ser bikevin pênc salên ewil in, ya dewletan heft salên ewil in. Piştî heft salan êdî ev pevçûn an dê bibin pevçûnên mayînde yên domdar an dê veguherin rewşa têknebirinê an jî dê çareseriyeke ku muzakereyên ferzker li ser aliyan pêk bîne. Bi kurtayî van xebatên akademîk ku ji van daneyên jimareyî derketî, daneheveke muezem derxistiye holê.

Nexasim di xebata duyem de, derbarê peymanên aştiyê de agahîdankek heye. Li çar parzemînan, 196 tekstên peymanê hatine vekolîn bê ka mijarên wan ên hevpar çi ne. Şeş mesele hene ku min amaje pê kiribû. Di piraniya peymanan de meseleya çek û tundiyê heye. Derbarê rêbaza çareserkirinê de hûn dikarin analîzên jimareyî bikin. Mesela; di çend bûyeran de agirbest hatiye ragihandin û dawî li dijminahiya li dijî hevûdu anîne, an jî avakirina artêşeke nû, reforma polîs û artêşan di çend bûyeran de heye, di çend bûyeran de serhildêran dev ji çekan berdaye, di gelek serenavên curbicur de hûn dikarin vê bibînin. Bi kurtayî di ser meseleya çek û tundiyê re tabloya dinyayê ya giştî hûn dikarin bibînin.

Meseleyeke din a ku derdikeve pêş, meseleya hikûmetê ye. Di meseleyên wiha de pirsgirêkên siyasî û îdarî çawa tên çareserkirin, di çend bûyeran de kîjan derdikevin pêş, daneyên derbarê van de cih digirin. Mesela rewş çi ye, nexasim di meseleyên terîtoryal ên şibî Meseleya Kurdan de, ku veguherandina avadaniya sîyasî û îdarî ya herêmeke dewletê ji xwe re dikin armanc, çawa bi encam bûne, em dikarin van bibînin.

Meseleya dîtir, edalet e. Di bûyerên wiha de edalet çawa û bi kîjan amûran pêk hatiye, dabeşiya van çawa ye? Di van mijaran de jî daneyên curbicur hene.

Dîsa derbarê pratîzekirinê de bankeya daneyan heye. Ev çawa hatine pratîzekirin? Bi rêya lijneyan? Muzakere hatine rojevê yan na, ji bo parastina aştiyê hêzek hatiye wezîfedarkirin yan na, berdewamî heye yan tune ye, daneyên bi vî rengî hene. Dîsa hûn dikarin daneyan derbarê wan hewldanan de bibînin ku neçûne serî. Di nav bûyerên wisa de, çend bûyer hene ku piştî peymana aştiyê, di nava pênc salan de pevçûnan ji nû ve rû daye? Heke mirov peymanê îmze bike mesele naqede. Di gelek bûyeran de, di nava pênc salan de dibe pevçûnên bi heman rengî an jî hinekî dirûvguhertî ji nû ve dest pê bikin.

Hûn dikarin him derbarê formasyona pevçûnan de him jî derbarê peymanên aştiyê yên muhtemel de ji van bankeyên daneyan hîn bibin. Li van bankeyan nêrîn, ji vî aliyî ve bi qîmet e. Heke hûn têkevin nava hûrgiliyan, derbarê Meseleya Kurdan de hûn dikarin gelek daneyan bibînin. Ser meseleyê min wexta wê bi zanebûn bi bîr xist. Nod û sed û bîst bûyerên her du lêkolînên me gava din qalkirî vê ji me re dibêjin; heke serhildêr di nava pênc salan de bi ser neketibin, êdî serkeftina wan zehmet e. Ji bo dewletan jî ev dem pênc an jî heft sal in. Piştî heft an jî deh salan êdî dewlet jî nikare wê meseleye bi çekan çareser bike.

Ji van daneyan hûn dikarin van bibînin. Li vê derê hûn dikarin lê binêrin ka pevçûnan çend salan dewam kiriye û çend kes mirine. Derbarê mirinan de jî hin teorî hene. Hin agahî hene dibêjin her ku mirin zêde bibin çareserî zehmettir dibe. Teorî dibêje; her diçe “civaka ku neçar e bi dijminê xwe re li hev were” zêde dibe, loma sazkirina aştiyê bêhtir zehmet dibe. Tezên dijberî vê jî hene. Ev tez jî dibêjin ji ber ku pevçûn pêdiviya aştiyeke nexuyayî bêhtir dide xuyakirin û pê de pê de vediguhere pêdiviyê, ev jî bingehekê ji aştiyê re çêdike. Lê ev hemû, ew ekolên navborî ne ku li ser daneyên jimareyî xebitîne.

## DÎNAMÎKÊN KU FORMASYONA PEVÇÛNÊN BIN-DEWLETÎ DIYAR DIKIN

Dîsa xebatên ku ji hêla çawaniyê ve nêzî meseleyê dibin hene. Min senifandinek çêkir. Bi kurtayî em bibêjin xebatên terîtoryal ên bindewletî -li herêmeke diyarkirî a li dewleteke diyar; ev dibe xwe bispêre bingeheke siyasî an jî nasnameyî- hene. Di lîteratura Îngilîzî de rasterast jê re dibêjin *intra-state, identity-based territorial conflit.* Pirseke mezin a wek; ‘di van xebatan de dînamîkên bingehîn ên derdikevin pêş çi ne, parametreyên bingehîn ên ku formasyon, şêwegirtin û şêwaza xilasbûna pevçûnên bi vî rengî diyar dikin çi ne?’ û xebatên ku derbarê vê pirsa mezin de hatine kirin.

Gelek hokerên guherbar hene lê yê min sê komên bingehîn bala min kêşa. Yek ji van, meriv dikare bibêje dînamîkên derveyî sînor an jî navneteweyî û herêmî ne. Em dikarin vê bikin du beş. Lîteratûr dibêje, dirûvgirtina pevçûnan ango formasyon û şêweya xelasbûna pevçûnan ne bi destê we tenê ye. Di serî de bi destê cîranên we ye. Cîranên we kî ne? Li cem cîranên we bûyerên pevçûnan hene an tune ne? Di navbera mirovên cîranên we û mirovên welatê we an jî mirovên ku li herêma pevçûnê de têkiliyên wek nasnameyî an jî dînî hene? Tiştên li cîranên we diqewimin, formasyona pevçûnên we diyar dike. Ango divê hûn li wê jî binêrin.

Meseleyeke din jî "hêzên navneteweyî" ne. Ango helwesta hêzên emperyal ku dirûv didin siyaseta dinyayê çi ye derbarê pevçûnan de? Nexasim, li ser hilweşîna Sovyetê ya di salên 1990î de xebateke qerase heye. Cudahiyên teşegirtina bûyeran a di navbera beriya hilweşîna Sovyetê û piştî hilweşînê de, li ser vê nîqaşek û hin agahî hene ku ji van nîqaşan çêbûne. Bi taybetî agahiyên ku ji vir çêdibin vê ji me re dibêjin: Hêzên emperyal an jî hêz û dewletên mezin ku dirûvê didin siyaseta herêmî, yekser formasyona pevçûnên we diyar dike.

Ya din, komeke parametreyê ye ku min xwest wek "dînamîkên binyadî yên navwelatî" formûle bikim. Kêm zêde ew meseleyên ku hindikek be jî bingeh girtine û êdî aktorên heyî zû bi zû nikarin wan biguherînin. Ser meseleyê asta sosyo-ekonomîk a welatekî. Tezek jî heye dibêje, "her ku xizanî zêde bibe potansiyela rûdan û gurbûna pevçûnan jî zêde bibe." Pêwendiyek heye di navbera mekanîzma, astên mekanîzmayên beşdar li siyasetê bi rêyên derçekdarî yên mirovên eleqedarî demokrasiyê û awayê pêkhatin, dirûvgirtin û bidawîhatina pevçûnên wereng de.

Şêwaza pevçûnan; ango armanca pevçûnê ew e ku di tevahiya dewletê de hikûmetê biêxe an dixwaze tenê rejîma siyasî biguherîne û ev pevçûn xwe dispêre hokerên nasnameyî û tenê li herêmekê gur bûye? Ev nasname dibe dînî be, dibe etnîkî be. Têgihiştineke giştî heye ku dibêje, heke bingeha pevçûnan nasnameyî be çareserî zehmettir dibe. Ji ber bûyeran em dikarin bibêjin pevçûnên bi vî rengî dirêjtir didomin, dane jî vê piştrast dikin. Feraseta vê angaştê jî ev e: Heke li herêmeke diyarkirî qabîliyeta mobîlîzasyona serhildêran zêde bibe, ev rê li ber pevçûnên dûvdirêjtir vedike. Ji loma hinek dibêjin, "Li deverên qerebalix ji hêla nifûsê ve, ji ber ku bicihbûn û alîkariya lojîstîkî lê hêsan e, pevçûnên ku xwe dispêrin bingeheke nasnameyî dûvdirêjtir dibin."

"Serdestiya etnîk, ya neteweyî" an jî "kompozîsyon"... Kompozîsyona etnîkî ya dewletê çi ye? Li vir hûn dikarin têgehên wek etnîsîte, milet, netewe bi kar bînin lê ya rastî konfîgurasyona civakî ya li ser bingeha nasnameyî avabûyî çi

ye û têkiliya di navbera van de çi ye? Dîsa ev jî dînamîkek e ku formasyona pevçûnan diyar dike.

“Qada pevçûnê” herêmek e an tevahiya dewletê ye? Ango qada pevçûnê ya fizîkî kû der e? Serhildêr di qada xwe de dimînin û pev diçin an jî stratejiyekê tetbîq dikin ku pevçûn li hemû dewletê belav bibin. Ev dîsa dînamîkek e ku bandorê li pevçûnan dike.

Meseleyeke din jî “Taybetiyên fizîkî yên qada pevçûnê ne” Heke li qada fîzîkî daristan hebe, devereke çiyayî be, an jî heke sînor zêde bin, ji ber ku qabîliyeta mobîlîzasyona serhildêran zêde dibe îhtîmal e ku pevçûn zêdetir bidomin.

“Zêdebûna nifûsê û diyaspora”... Dîsa li gor têgihiştineke giştî dema nifûs zêde be pevçûn dûvdirêjtir dibin û diyasporaya zêde jî bandoreke neyînî li pevçûnên bi vî rengî dike.

Axir, ev hemû ew dînamîk in ku dirûvê didin meseleyê. Min behsa tabloyeke mezin kir. Tu tiştekî tuneyî tê de tune ye. Qaseke din, dema hatim ser meseleya esas, em ê bi hev re bibînin ku mesele ewqas ne hêsan e.

A dawî “dînamîkên bi aktoran ve girêdayî”, di vir de em dikarin qala tercîh, stratejî, prensîb, bîrdozî û arezûyên siyasî yên aktoran bikin ku ev bêhtir dînamîkên girêdayî aktoran in. Di vir de du mesele hene ku bêhtir derdikevin pêş. Yek ji van maliyeta pevçûnê ye. Wek binbeş ‘mirin’ û ‘koçberiya mecbûrî’, du hokerên bingehîn ên maliyetê hene. Di navbera hejmara miriyan û formasyona pevçûnan de têkiliyeke yekser heye. Dîsa di navbera koçberiya mecbûrî, derxistina bi darê zorê ji waran û formasyona bûyerên wereng de têkiliyeke yekser heye.

“Potansiyela dewletê,” rasterast qesta potansiyela dewletê ya çekdarî û leşkerî dike. Ango hêz û mezinahiya artêşê çiqas e? Hêza polîsî çiqas e? Hêza ciwanên ku bikarin tev li şer bibin çiqas e? Em hinekî din berfirehtir bikin, potansiyela dewletê çiqas e ku ji hêla polîtîk ve girseyan mobîlîze û îqna bike? Xebatên mîna van ku “guh didin kapasîteya dewletê, di serî de jî kapasîteya leşkerî” hene. Teoriyeke mistîmezin heye, dibêje, “Hûn dikarin li vir binêrin û ji pevçûnan fam bikin.”

“Subjektîviya siyasî” di ser mekanîzmayên biryardayînê re nêzîktiyê bi aktoran re datîne. Mekanîzmayên biryardayînê yên wekî tercîh, stratejî, nasname û nirxên aktorên polîtîk.

Hokera din a bi aktoran re girêdayî dabeşkirina hêz/desthilatdariyê ye. Parvekirin/dabeşkirina hêz û desthilatdariya di nav dewletê de çawa ye?

Avadaniya îdarî û siyasî xwe dispêre dabeşkirina hêzê an xwe dispêre navendparêziyê? Ev hokereke girîng e.

Asta tevlêbûna aliyên sêyem"... Gelo aliyên sêyem tev li bûyerên bi vî rengî bûne? Tecrûbeyeke wiha heye an tune ye? Ev jî meseleyeke bingehîn e. Peymanên fermî yên berhevbûyî hene gelo? Ne şaş bim, li Fîlîpînan 112 peymanên nivîskî hatine îmzekirin. Pêşketineke mezin e ji hêla tecrûbeyên peymanan ve. Peymanên fermî yên bi vî rengî di navbera aliyan de çêbûne gelo?

Bi kurtayî, ev dînamîkên bingehîn in ku ji reqeman wê de li çawaniya rehendê dinêrin û balê dibin ser nêzîktêdayînên ku meseleyê bi kûrahî dinirxînin.

Ji bo famkirina bûyera me jî, em dikarin bibêjin li ber me tabloyeke qerase heye. Formasyona civakî ya li hember me, ne tiştekî hêsan e.

Dema em qala meseleyeke derbarê çareseriya bûyerên wereng de bikin, gelo em tabloyeke çawa derdixin holê? Em hinekî li vê binêrin. Çi ye gelo çareseriya pevçûnan û avakirina aştiya civakî? Di vê mijarê de jî dîsa tecrûbeyeke qerase heye lê ez ê îro di ser du navan re biaxivim. Yek ji van Johan Galtung e, heke eleqeya we bi mijarê re hebe we dê bihîstibe. Yê din jî John P. Lederach e. Her du jî endamên akademiyê ne. Lederach hem akademîsyen hem jî pratîsyen e. Rasterast tev li bûyerên wiha bûye û şêwirmendî kiriye.

## GALTUNG Û SÊ CUREYÊN TUNDIYÊ

Derbarê meseleyê de çend têgehên Galtung ên krîtîk hene. Em van têgehan di meseleya me ya Kurdan de pir bi kar tînin. Fokûsa Galtung tundî ye. Têgeha aştiyeke asgarî wek "bêtundî" pênase dike. Ew hinekî ji vir, li ser qada tundî lê tuneyî der çûye. Dibe hûn bibêjin "Baş e, tundî çi ye?" Di wateya îroroj de, xwedî çarçoveyekê ye ku ev nîqaşên han curbicur kirine, rave kirine û tiştên girîng li ser van nîqaşan zêde kirine.

Galtung qala sê cureyên sereke yên tundiyê dike. Ji van a ewil "tundiya yekser", a duyem "tundiya binyadî", a sêyem jî "tundiya çandî" ye. Qesta wî ya ji tundiya yekser ev e: Aktorekî berbiçav pêşî bi tundiyê radibe û paşê bandora wê ya li ser yê hember dişopîne. Ango heke aktorekî berbiçav hebe ku rasterast tundiyê li yê hember dike, ji vê re dibêje "tundiya yekser." Ev tundiya çi fizîkî çi jî devkî dibe sedema birînên ruhî, bedenî an jî aqlî. Heke ev tundî bi awayekî sereqat dewam bike, vediguhere trawmayê. Li gor Galtund trawmayên tundiya domdar jî dibe ku sereqat bidomin, trawmayên tundiya domdar ku di meseleya me de tim derdikevin pêşberî me.

Galtung bi heyf û mixabinî dibêje meseleyên bi vî rengî ji tundiya yekser û fizîkî wêdetir in. Angaşt dike ku di eslê xwe de di nava vê tundiyê de, tundi-

yeke veşartî ya binyadî heye, ango dixwaze bibêje em bi xwe jî bi tundiyeke wek tundiya binyadî re tim û dayîm rûbirû ne û pê de diçe; ev tundiya ku xwe dispêre newekheviyên komî û navkomî, di tekiliyên navcivakî de jî veşartî ye û şikil dide tevgerên aktorên têkildar. Vê jî wek "tundiya binyadî" bi nav dike. Li gor wî di civakên wiha perçebûyî de ev tundiya binyadî herî kêm bi çar mekanîzmayan dixebite. Yek ji wan mekanîzmayan *penetration* ango nifûzkirin e. Ango bi nifûzkirina avadaniyên civakî, tundiya binyadî çêdibe. Ya din *segmentation* ango em dibêjin tebeqekirin, wek tebeqeyan jihevcihêkirina civakê, weke koman jihevcihêkirina tebeqeyan e. Dîsa *fregmentation* e ku tê wateya jihevcihêkirinê û ya dawî jî *marginalization* e ku ew jî marjînalîzekirin e.

Bi kurtayî angaşta wî ew e ku aktorekî xuyayî tune ye. Lê di jiyana rojane de, tundiyeke binyadî heye ku sirayetî têkiliyên komên navcivakî dike, di nava xwe de newekheviyê dihewîne û li gor vê dixebite. Ev jî bi taybetî di qada siyasî de wek zexteke siyasî, di qada aboriyê de jî wek mekanîzmaya kedxwarinê ya aboriyê kar dike. Loma tundiya ku em qal dikin bi serê xwe wek aktoran e ku ne ji wan tundiyên xuyayî yên fizîkî ye lê wek têgeh qadeke berfireh dide ber xwe.

A sêyem, Galtung behsa tundiyeke din dike ku van her du cure tundiyan pêkantir dike. Dibêje tundiyeke din heye ku tundiya yekser û ya binyadî meşrû dike. Ji vê cure tundiyê re jî dibêje tundiya çandî. Tundiya çandî bi mekanîzmayên xwe –mekanîzmayên qerase yên wek dîn, çand, qanûn, huner, çapemenî, perwerdehiyê ku bi rêya hin sazûmanan bi rê ve diçin, tundiya yekser û ya binyadî tabiî û normal dike ku civak çavên xwe li tundiyê bigire– "tundiya binyadî" li ber çavên civakê normalîze dike. Bi ya wî ev jî tundiyeke çandî ye. Esas tundiya binyadî wek tundiya aborî û tundiya siyasî ji hev vediqetîne û dibêje çar cure tundiyên bingehîn hene. Meseleya aştiyê, divê tevî van çar cure tundiyan bê nirxandin. Ji bo famkirina van çar cure tundiyan jî têgeha *power* ango hêzê pêşniyaz dike. Dibêje heke çareseriyek hebe ew ê di ser têkiliyên hêzê re pêkan be; ango bi hêza tundiya yekser, hêza siyasî, hêza aborî û hêza çandî dê mesele çareser bibe.

## AŞTIYA NEYÎNÎ, AŞTIYA ERÊNÎ

Li gor Galtung di akademiyê de hin meyl hene ku dixwazin meseleyê fam bikin û hin xebat hene ku bi awayekî normatîf nêzî meseleyê dibin û dixwazin meseleyê çareser bikin. Galtung, bêhtir di nav kategoriya duyem de ye. Derdê wî ne ew e ku bi tena serê xwe meseleyê teşxîs bike. Derdê wî ew e ku meseleyê çareser bike û hemû xebatên xwe dişibîne metodên tibî. Dibêje wek çawa ku bijîşkek mudaxeleyî nexweşiyekê dike, divê aktorên civakî jî bi vî awayî mudaxeleyî rûdanên tundiyê û pevçûnan bikin. Di tibê de ewil teşxîs tê danîn pişt re qonaxên peydabûn û domdariya vê nexweşiyê tên analîzkirin

û tedawiyeke karîger tê destpêkirin. Diyar dike li gor vî awayî, di lêhûrbûna bûyerên pevçûnan de; pêşî divê analîzeke derbarê vê “Rewşa tundiyê çi ye, rûdaneke çawa li hemberî me ye, ev çawa derketiye holê, rewşa wê ya niha çi ye û dê di kîjan qonaxan re derbas bibe?” bê kirin û axir divê terapiyek û çareseriyek hebe.

Dîsa du têgehên wî yên bi navê “aştiya erênî” û “aştiya neyînî” hene ku bi rêya tibê bi dest xistiye. Ew her wekî mudaxeleyên ku semptomên nexweşiyekê kêm dikin, mudaxeleyên ku bandora rûdanan kêm dikin an jî wan rûdanan ji binî ve holê radikin, wek awayê aştiya neyînî yan jî wek meyleke bo aştiya neyînî pênase dike. Jiholêrabûna tundiyê wek aştiyeke neyînî pênase dike. Lêbelê pêvajoyên ku jiyanê rihet dikin, mudaxeleyên piştî nexweşiyê yên baş û mayînde jî wek aştiyê îfade dike. Ne tenê jiholêrabûna tundiyê, wek rewşeke ku başiya giştî ji nû ve tê sazkirin û pêwendiyên xweş û baş tên danîn; têgeha “aştiya erênî” derpêş dike û van her duyan ji hev vediqetîne. Aştiya neyînî wek tunebûna tundiya kolektîf û organîzebûyî pênase dike. Ango dibêje heke tundî tune be aştiya neyînî hatiye sazkirin lê ew aştiya civakî ku em behs dikin tenê ji vê pêk nayê, divê aştiya erênî jî hebe. Ji bo em bikarin behsa aştiya erênî bikin divê nirxên erênî li civakê berbelav bûbûn. Nirxên erênî yên wek; hevkariya civakî, entegrebûna li hevûdu, pêkhatina wekheviya civakî an jî jiholêrakirina mekanîzmayên kedxwarinê. Ez dixwazim vê jî aşkere bikim. Di eslê xwe de sê pênaseyan wî hene. Ji ber ku ev pênase yek bi yek ji Îngilîzî hatine wergirtin, dema em werdigerînin Tirkî, dibe hinekî ecêb xuya bikin.

Ser meseleyê ji bo aştiya erênî rasterast vê dibêje; “Kubariya devkî û fizîkî, divê ji bo beden, aqil û ruhê te û yê kesên din qenciyê bihewîne, bi armanca pêkanîna hemû pêdiviyên bingehîn, pêkanîna tevlêbûna jiyanê, xweşiyê, azadî û nasnameyê. Evîn wek yekîtiya beden, aqil û ruhan, rasterast mîna sembol û kurteya aştiya erênî ye.”

Aştiya erênî ya binyadî jî wiha pênase dike, “Azadî li şûna zextê, wekhevî li şûna kedxwarinê. Pişt re, diyalog li şûna nifûzê, entegrasyon li şûna tebeqekirinê, piştgirtin li şûna jihevcihêkirinê, û tevlêbûn li şûna marjînalkirinê dê hêzê bide vê têgehê.”

Axir ji bo aştiya erênî ya çandî jî vê dibêje: “Bi avakirina çanda aştiyeke erênî re, meşrûyeta aştiyê li şûna meşrûyeta tundiyê di dîn, hiqûq, bîrdozî, ziman, huner, zanist, dibistan, zanîngeh û çapemeniyê de. Dê bê wê wateyê ku di mekanê hundirîn ê şexs, ez ango *self*ê de ji zextê bêhtir rê li ber kapasîte û qabîliyeta însanî veke.”

Bi kurtayî wekî min gotî, ne tenê tundiyeke bi tena serê xwe, Galtung wek

pêşketina civakî qala gotara xwedî asoyeke normatîf jî dike. Wek pêkhateyên bingehîn ên aştiya erênî, bi kêmanî qala deh normên bingehîn dike. Yek ji van jî "hebûna hevkariyê" ye. Dibêje heke aştiyeke erênî hebe, divê di bingeha civakê de hevkarî hebe. Dîsa dibêje divê azadbûna ji tirsê û azadbûna ji daxwazên kesên dîtir hebe. Rewşa ekonomiya pêşketî û mezinbûyî, tunebûna kedxwarinê, wekhevî, edalet, azadiya tevgerî, pirrengî û dînamîzmê wek normên herî kêm ên aştiya erênî bi nav dike.

## DERBASKIRINA JI PEVÇÛNAN BI AWAYÊ VEGUHERANDINÊ

Galtung, bi analîz û têgehên xwe re yên derbarê sê cureyên tundiyê de, tiştên girîng li çareseriya pevçûnan û xebatên aştiyê zêde kirine. Dîsa cudahiya aştiya erênî/neyînî xebateke girîng e ku divê bê qeydkirin. Li gel van her du analîz û têgîniyan, xwediyê nêzîkatiyeke bi navê *transcend*ê ye ku wek "derbaskirina ji pevçûnan bi awayê veguherandinê" jî wergerandine Tirkî. Ez ê behsa vê bikim û derbasî navê duyem, Lederach bibim.

Galtung angaşt dike ku aştiya mayînde kêm zêde ji wekheviyekê bêhtir, dibe ku ji çarçoveya tetmînker ya aliyan pêk bê. Dibêje di bûyerên wiha de di ser helwesta "an gişt an qet" re mesele nayên çareserkirin û aştî nayê avakirin. Dibêje meseleya esil hedefkirina aştiya mayînde ye û ev jî bi çarçoveyeke tetmînker ya aliyan ve dikare pêk bê. Formulasyona bingehîn "hem ew hem ew" e. Em bibêjin ku di meseleya heyî de aliyek dibêje "ev", aliyê din dibêje "ew". Dibêje divê em meseleyê ji helwesta "an ev an ew" der bikin, divê formulasyonek bê peydakirin ku vê bi awayê "hem ew hem ew" veguherîne. Meseleya ku pêşniyaz dike jî ev e: Divê hûn ji xeynî klîşeyên giştî ji nû ve çarçoveyekê ji meseleyê re deynin û saz bikin.

Mînakek heye ku pir tê zanîn. Pir hêsan e lê ji bo ku di hişê mirovî de bimîne baş e. Mînaka porteqalê. Dibêje li malekê di destê dayîkekê de porteqalek heye û du zarokên wê hene. Her du jî porteqalê dixwazin. Di halekî normal de divê vê porteqalê bide yekî û dilê yê din bihêle. Paşê dayîk dipirse, "Hûn ê çi ji porteqalê bikin?". Yek dibêje, "Ez ê ava wê vexwim," ê din jî dibêje, "Ez ê pê kekê çêbikim." Dayîk, porteqalê diguvêşe û ava wê dide yekî, ên mayî jî ji bo kekê dide yê din. Belkî mînakeke hêsan e lê meseleya esil ew e pirsa "di çîrokekê de hem pevçûn hem jî lihevnehatin hebe, gelo çarçoveyeke baş saz dibe ku her du alî jî jê bersivên tetmînker wergirin, mesele ji nû ve saz dibe?" bê kirin û bersivên li gorî vê bên peydakirin.

Dîsa bûyerek heye ku di pevçûnên navbera Ekvador û Perûyê de derketiye pêş. Sê caran bûye sedema pevçûnê. Hema bibêje bûyereke pevçûnê ya şêst salî ye. Pevçûna sînorî ye. Li van welatan, vê herêma sînorî ji bo du neteweyan vediguherînin qada parkekê û di bin kontrola van neteweyan de vedikin

û meseleyê wiha çareser dikin. Hûn dikarin çareseriyên tetmînker ji bo her du aliyan, li meseleyên siyasî jî biguncînin.

Galtung dibêje di meseleya bihurtina çareseriya pevçûnan de, wek talî şeş karên esas divê bên kirin. Yek ji van “çanda aştiyê” ye. Dibêje ji bo bihurtina tundiya çandî, divê çanda aştiyê ango binhiş, têgihîn, binhişa kolektîf a li ser meşrûtiya aştiyê bên avakirin. A duyem, qewîkirina binyadên li ser aştiyê ne. Ango dibêje wek binyadî divê şixul bên kirin li ser meseleya kêmkirina newekheviyê, li ser avakirina qada berbelavkirin û destekkirina aştiyê. A sêyem “navçînî” ye. Çawa ku ez behsa vê dikim ew jî dibêje divê aliyên sêyem carinan têkevin navberê ji bo jinûve-avakirina meseleyê, pêşkêşkirina çarçoveyeke nû bi xwendineke derveyî xwendina klasîk. Loma dibêje xebatên navçînî û hêsankariyê, ji bo meseleya vehûnandina çareseriyeke tetmînker krîtîk e. “Avakirina aştiya berçav”; di navbera aliyên pevçûnê de temasên rasterast ava dike û erkeke eleqedarî xebata ji bo rewşa aramiyê wek karekî bingehîn pênase dike. Meseleyeke din jî “der-tundî” ye. Galtung dibêje di hemû meseleyê de rêbaza esas divê bêtundî be. Lewra teza wî ya esas ev e: Tundî rê li ber tundiya dijber vedike û ev wekî çerxekê hev didomîne. Di rewşa sepandina tundiyê ya aliyekî de jî, heke daxwaza tundiyê ya aliyê din hebe divê bersiv bi rêbazên der-tundiyê bên dayîn da ku ev çerx bê têkbirin. Dibêje bi awayê din, “Dibe mahkûmê nav çerxê.” A dawî, dibêje bi têgeha “rihetbûn”ê divê xebatên rihetbûnê bên kirin li ser qedandina trawmayên ku ji bûyeran der bûne an jî li ser qedandina şêweya tundiya domdar.

## LEDERACH Û TEBEQEYÊN AŞTIYA CIVAKÎ

Pir kes hene ku li ser vê mijarê xebitîne. Lê yê ku derdikeve pêş, yek ji wan kesan jî John P. Lederach e ku tiştên girîng li ser vê mijarê zêde kirine. Yek ji wan kesan e ku serê xwe li ser pirsa “aştî di civakên dabeşbûyî de çawa tê sazkirin?” êşandiye û xala esas a bingehîn jî ev pirs e. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem piraniya pevçûnan, pevçûnên di nav dewletan bi xwe de ne. Ji bilî şer û pevçûnên navdewletî, piraniya pevçûnan di nav dewletan bi xwe de qewimîne, em li pêşberî rewşeke wiha ne. Di bûyerên wiha de civakên dabeşbûyî piştî çareseriyê mecbûr in bi hev re bijîn. Loma Lederach dibêje ku divê em li vir bi hedefa aştiyê ya pêkvejiyanê bidin rê. Ev bûyer, bi taybetî piştî sala 1946an, bi piranî li wan deran diqewime ku em dibêjinê “welatên çeper” ango li civakên xizanî, newekheviya wê zêde, kêm pêşketî an jî bi paş de hatî hiştin, ew wiha angaşt dike. Derpêş dike ku ya rast di bûyerên wiha de, hem di zemîneke tîkî hem di zemîneke berwarî de dabeşbûna civakî derdikeve pêş, loma meseleya esas jî avakirina wan hewlan e ku beşên tîkî û berwarî ji holê rake û pêwendîdanîna civakî jinûve mimkun bike. Ji ber vê, angaşt dike ku ev mesele jinûve avakirina aştiyeke pir-merhaleyî û pir-aktorî ye. Çarçoveyek ji meseleyê re, bi tena serê xwe ne wek bêdengkirina çekan,

wek avakirina bingeha civakî ya ewqasî dabeşbûyî datîne, bingeha nû ya ku hemû pêwendiyên xwe yên civakî dikare ji nû ve saz bike û pêk ve lê bijî.

Sê têgehên esas ên krîtîk hene ku Lederach wan dupat dike: Têkilî, rasthatin û rêyên afirîner. Li gor Lederach di bûyerên wiha de bi taybetî têkiliyên civakî yên di navbera du koman de zirarê dibînin. Loma têkilnebûn ne çareserî ye. Bi mînîmalîzekirin û qelskirina têkiliyan şansê me tune ye ku em çareseriyê bibînin. Berevajî, hûn mecbûr in bi têkilîdanînê, vê meseleyê çareser bikin. Pevbestina bingehîn a li vir ev e: Jinûve-avakirina têkiliyên xerabbûyî, belavbûyî an jî têkiliyên ji holê hatî rakirin mîna xetek ji xetên bingehîn diyar dike. Dibêje, "wek çareserî, hûn nikarin bêtêkiliya du civat an jî du komên ku pevçûyî û veqetiyayî deynin holê." Berevajî, divê hûn vê têkiliyê ji nû ve ava bikin û wek têkiliyeke baş ava bikin.

Ji bo vê jî wek awayê duyem têgehên "rûbirûbûn" û "rasthatin"ê dupat dike. Ev komên civakî divê hem bi xwe re –bi dahatû, hafîze, birîn û derdên xwe re– hem jî bi birîn, derd û hêrsa koma dijberê xwe re rûbirû bibin. Loma dibêje a rast avakirina aştiyê jî piçekî pêkanîna vê rûbirûbûnê ye. Heke em bixwazin aştiyê ava bikin, em mecbûr in karên derbarê rewşên vê rûbirûbûnê de bikin.

Di vê mijarê de meseleyên naskirî bi kêr nayên; dibêje divê navgîn, rê û rêbazên kêmnas û afirînertir ên ji klîşeyên aktorên serekî çêkirî wêdetir bên avakirin. Lederach têkilîdanîn, rasthatina hem bi xwe re hem bi yê din re û vê yekê jî bi navgînên afirîner pêşniyaz dike.

## MEKANÊN LIHEVHATINÊ

Di vê mijarê de têgehek heye ku pêşniyaz dike: "Mekanên Lihevhatinê". Li Başûrê Amerîkayê di pevçûnên komên herêmî de navçînîya rahiban vedikole. Li ser vê mijarê wê teoriyê derpêş dike ku piçekî têgînî kiriye. Gotinek heye ku di İncîlê de derbas dibe: "Heqîqet û bexşandinê hev dîtine, aştî û edaletê hev maç kirine." Lederach ji vir dest pê dike û li ser çar têgehan gotina "mekanên lihevhatinê" saz dike. Ev, heqîqet, edalet, bexşandin û aştî ye. Bi kurtayî vê dibêje: Heke rûbirûbûnek bi heqîqeteke xwedî-bexşandin re çêbibe û heke aştiyeke xwedî-edalet çêbibe, aştiya civakî ji nû ve tê sazkirin. A rasttir dibêje, ji bo avakirina mekanên lihevhatinê, ji bo lihevhatina civakî û mala aştiyê, divê bexşandineke xwedî rûbirûbûna bi heqîqetê re hebe. Divê mirov bibexşînin lê di heman demê de divê bi heqîqet û tiştên qewimî re rûbirûbûnê pêk bînin. Di heman demê de divê aştiya xwedî-edalet hebe.

Li vir xala ku ez dixwazim bala we bikişînim ser, ev e: Lederach, cihekî ku xwedî asoya dahatûyê ye pêşniyaz dike. Heke hûn rûbirûbûna heqîqetê tenê

bi edaletê re bi cih bînin, hûn dikarin qadekê ji bo dahatûyê vekin. Dîsa heke hûn aştiya xwedî-edalet ava bikin, hûn dikarin dahatûyê ava bikin. Bexşandina bêyî edaletê dê pevçûnê ji nû ve bîne an jî piştî çar-pênc salan, deh salan, piştî nifşekî dê ji nû ve pevçûn biqewimin. Loma dibêje divê bexşandin bi rûbirûbûna heqîqetê re û meseleya aştiyê jî divê bi edaletê re bê axaftin. Dibêje meseleya esasî ya pêwendîdarî van çar têgehan jî mekanên lihevhatinê ava dikin.

Em meseleya lihevhatinê çawa ava dikin? Lederach dema ji vê pirsê re li bersivan digere, meseleya aştiyê dişibîne pîramîdê. Dibêje hewce ye muzakereyeke civakî ya sê tebeqeyî hebe. Li herî jora pîramîdê rêberiya pilebilind heye. Muzakereyeke vê astê, wek esas rasterast mekanîzmayên diyalog û muzakereyên di navbera aktorên pevçûyî de nîşan dide. Herî binê pîramîdê jî ji rêberiya asta civakî pêk tê. Aktorên vê astê beşên civakê yên berfireh dihewînin. Di vê wateyê de ji encamên pevçûnên rojane, mirovên jirêzê yên rasterast rûbirûyî vê pevçûnê mayî û pêvajoya muzakereyê ya di navbera wan de rave dike. Di navbera her du tebeqeyên piramîdê de, rêberiya pilenavîn heye. Ev ast, di jiyana rojane de bi mirovên jirêzê re têkildar e lêbelê di heman demê de bi rêberiya pilebilind re jî pêwendîdar e û di navbera van her du tebeqeyan de kesên xwedî potansiyela pêwendîdanînê dihewîne. Em ji van re dikarin bibêjin aktorên rêkxistî an jî aktorên kolektîf. Dibêje ev aktor dikarin di navbera her du tebeqeyan de pêwendî deynin û pêvajoya aştiyê ava bikin.

Argumana wî ya bingehîn ev e: Aştî tenê bi pêkve-karkirina van sê tebeqeyan; hem di asta civakî de hem di asta navîn de hem di asta bilind de, bi domandina muzakereyan dikare bê avakirin. Heke bala we lê be, ku em ji piramîdê ber bi jêr dakevin, derfetên ku em bigihêjin zêdetir mirovan derdikevin holê. Lederach derpêş dike ku rêberiya tebeqeya navîn û asta navîn di van meseleyan de xwedî stratejiyeke girîng in. Angaşt dike ku lewra di navbera jêr û jor de ango di navbera rêberiya pilebilind û rêberiya asta civakî an jî muzakereyê de aktorên navçîniya esil ev in. Loma di avakirina aştiyê de rola krîtîk piçekî dide ser milê aktorên kolektîf û komên rêkxistî ku em jê re dibêjin rêberiya pilenavîn. A li vir qest dike, SCS, rûspî, tevgerên civakî, akademîsyen an jî komên cuda yên wekî rêber, aktor û pêşengên xizmetên giştî ne.

## TÊKILÎ, BINEPERGAL, PERGAL

Modeleke Lederach heye ku bi spartina vê yekê kemilandiye. Weke modeleke piçekî tevlihev bixuye jî, wek esas vê dibêje. Du xetên esas ên meseleyê hene. Yek ji van binyad, a din jî pêvajo ye. Angaşt dike ku di gelek rewşan de, pirsgirêkek di nav tora têkiliyeke diyar de heye, ev tor binepergalan ava

dike û ya rast bi vê, bi tevahî pergaleke giştî ava dibe. Dibêje dema mudaxele li pirsgirêkan tên kirin, bi baldarbûna li vê tevahiyê re; mirov baldar be ku di nav toreke diyar de pirsgirêk veşartî ye û ev cure têkilî binepergalan ava dike, ev jî pergaleke polîtîk a giştî ava dike, divê mirov vê pêwendiyê deyne û meseleyê fam bike. Li gor vê divê em bi midaxaleya vê qeyranê re û xeyala dahatûyê têkildarî hev bikin. Bi gotineke zelaltir, dema em dixebitin ku pirsgirêkekê çareser bikin, bi awayekî esasî divê armanca wê yekê bidin ber xwe ku têkiliyên di nav vê de veşartî veguherînin û pergaleke nû saz bikin û helwesteke wisa bigirin.

Em dikarin vê ji bo meseleya zimanê zikmakî jî şirove bikin. Divê em çareseriya pêdiviya zimanê zikmakî yê Kurdan bi wî awayî pêk bînin, bala me lê be ku bi rastî ev pirsgirêk çawa têkiliyên civakî çêdike û çareseriya vê dê têkiliya civakî çawa biguherîne. Di çarçoveya binepergalan de, divê em bikarin meseleya Kurdî bi polîtîkayên perwerdehiyê an jî bi polîtîkayên nasnameyê ve girê bidin. Lederach pêşniyaz dike ku, a rast ji pirsgirêk û qeyranan bêhtir li ser têkiliyên pirsgirêk tê de veşartî û binepergalên ji van têkiliyan bên vekolîn û bi maweyên dehsalane li ser vê meseleyê bifikirin. Ew dibêje dema em mudaxaleyî meseleyeke civakî, kêliya qeyraneke berbiçav bikin, divê em bizanin ku ev mesele di nav têkiliyeke diyar an jî binepergalekê de ye û bi maweyeke dehsalane divê midaxale lê bê kirin. Ya sereke veguherîna têkilî û binepergalan e. Ew dibêje birêvebirina qeyranê ya bi serê xwe tenê an jî destwerdana meseleya heyî di wê gavê de nabe alîkariyeke mayînde.

Di dawiyê de, Lederach diyar dike ku ev veguherîn divê di formên şexsî, têkilî, çandî û binyadî de li ser çar tebeqeyan be. Gava ku hûn midaxaleyî qeyranekê an jî meydana pirsgirêkê bikin, di bingehê de divê veguherîneke têkiliyê hebe û armanc ew be; ew dibêje ev, di heman demê de beranberî veguherîneke çandî divê bê çêkirin. Belkî her du bi hev re dikarin di demeke dirêjtir de veguherînekê pêk bînin.

**ŞUMÛLA AŞTIYA CIVAKÎ**

Berî ku em derbasî beşa dawî bibin, em niha dikarin balê bikêşin ser pênc meseleyên serekî. Pêşî, çareseriya pevçûnê û avakirina aştiyê tenê nikarin bibin mijara rawestandina çekan an jî meseleya aştiya neyînî. Ya ku em jê re dibêjin aştî ne tenê bêdengiya çekan e.

A duyem, ev mesele bi rastî ne meseleyên hêsan in. Çareseriyeke demkî û hêsan tune ye. Berevajiya vê, hewce ye ku mirov ji bo demeke dirêj armanc û plansaziya veguherîna civakî ya têra xwe tevlihev bide ber xwe. Pirî caran, wekî civak, em pêşbînî dikin ku «pêvajoyek her şeş meh, salek, du sal, pênc salan carekê dest pê dike û ji vir jî çareseriyek çêdibe, mesele diqede," lê

mixabin, ev şixul wiha çênabin. Di gelek mijaran de em bi meseleyekê re rûbirû dimînin ku digihîje çend nifşan. Dibe ku di demeke kin de beşa tundiya çekdarî ya kolektîf bi dawî bibe, lê divê em bizanin ku ev ne meseleya bingehîn e. Divê em texmîn bikin ku ev dikare bi navgîn, rê û formên din berdewam bike.

A sêyem, mirov nikare çareseriya meseleya tundiyê bi xwe jî bîne asta çalakiyên aktorên ku tenê bi serê xwe pev diçin. Em behsa tora têkiliyên civakî ya pir mezin, binepergal û pergalan dikin. Em li ser van hemûyan, qala qadeke mezin dikin.

A çarem, pirsgirêkên bi vî rengî ne ew pirsgirêk in ku aktorên siyasî tenê bikarin çareser bikin. Heke bûyerên wiha têkiliyên civakî felişandibe an jî têkiliyên civakî yên xerabûyî, belavbûyî ava kiribe û heke ev bi binepergal û pergalên cuda re şixulandibe, em behsa van hemû veguherînan dikin. Ev, ne ew kar in ku aktorên siyasî tenê bikarin bikin. Ew bixwazin jî, tiştek nîne ku bikaribin bikin. Di qadeke gelek berfîreh de, di astên cuda de, miqatebûna hev, temaskirina bi zanebûnî ya aktorên cuda bi awayekî kolektîf, meseleyek e ku divê çareser bikin.

A dawî, saziyên civaka sîvîl dikarin di çareseriya pevçûnan û avakirina aştiya civakî de bi roleke girîng rabin. Ev meseleya pêncemî, mijara pêşkêşiya beşa sêyem e. Ka em niha derbasî vê beşê bibin.

## AVAKIRINA AŞTIYÊ Û CIVAKA SÎVÎL

Heta niha me tabloyeke giştî ya bûyerên wiha nîşan da. Dû re me qada pevçûn û avakirina aştiya civakî destnîşan kir. Di vê beşê de, herî dawî çawa ku Lederach rave kiriye, me bal kişand ser asta navîn û erkên aktorên kolektîf yên di vê astê de û xwedî civaka sîvîl.

Ji ber vê yekê, bi awayekî berbiçav, aktorên kolektîf û saziyên civaka sîvîl yên awayekî wan, dikarin di çareseriya pevçûn û avakirina aştiya civakî de çi bikin? Dikarin kîjan fonksiyonên şênber an jî fonksiyonan bi cih bînin? Li ser van pirsan, lêkolîn û komek zanyarî hene. “Bi awayekî şênber, fonksiyonên saziyên civaka sîvîl çi ne, ew di bûyerên şênber ên bi vî rengî de çawa dibin alîkar?” Hin bersivên ji bo pirsên wiha hene.

Du siyasetzanên Almanî, Wolfgang Markel û Hans-Joachim Lauth, bi gelemperî, ji bo civaka sîvîl çarçoveyekê datînin. Bi taybetî bersivên pirsa “civaka sîvîl, di jinûve-sazkirina civakê ya piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê de çi kiriye?» tên dayîn. Yek ji wan parastin e; ango çalakiyên hemwelatiyan di qada civakî de û çalakiyên wan ên civakî û parastina hemwelatiyan li hemberî midaxalayên dewletê ku dem bi dem çalakiyan berteng dikin. Di rastiyê de,

ew dibêjin erkeke civaka sîvîl ew e ku welatiyan û aktorên civaka sîvîl biparêze yan jî vê qadê berfireh bike li hemberî pozîsyona bertengkirina qadê ya dewletê.

A duyem "sosyalîzasyona tevlêbûnê" ye. Vê jî bi vî rengî, wiha rave dikin: Binyada ku em jê re dibêjin civaka sîvîl, di dawiyê de xwe spartiye civakeke piçekî rêkxistî û xeyala feydeya giştî. Saziyên civaka sîvîl wekî celebeke vê xeyalê ji bo pêşketina binyada civakî, erka cureyeke dibistanê, dibistaneke demokrasiyê, pêk tînin. Ew angaşt dikin ku ew wek celebeke mekanîzmaya civakîkirinê ya tevlêbûnê tev bigere, da ku nirxên parastî yên civaka sîvîl di nav binyadeke civakî de belav bibin.

A sêyem, "ragihandin" e. Bi taybetî di vir de referansa bingehîn teza demokrasiya bi muzakereyê ye. Dawiya dawîn, ew angaşt dikin ku cewhera demokrasiya bi muzakereyê ragihandin e û torên ragihandinê yên civakî hene û qadên civaka sîvîl ên vê ragihandinê mimkun dikin jî qad, aktor an jî navgîn in.

A çarem, "avakirina civakê û yekparebûn" e. Di vir de teza bingehîn ev e: Di civakê de gelek cudakirinên têvel hene, wek malbat, eşîr, bajarvanî, û hevwelatî. Bi rastî, ew angaşt dikin ku civaka sîvîl, li ser van hemû cudahiyan bi avakirina civateke hevbeş, koma kolektîf, kom an jî civateke yekparebûyî û hevbeş alîkariya avakirina kolektîvîteyê dike.

Di dawiyê de, ew dibêjin ku civaka sîvîl wek navçînî di navbera dewlet û hemwelatiyan de tevdigere. Ew angaşt dikin ku, civaka sîvîl di qada civakî de wekî aktoreke navçîniyê tevdigere, xwestek û daxwazên welatiyan ji dewletê re dişîne û wan radigihîne dewletê.

Fonksiyonên ku akademîsyenên Almanî rave dikin, ji bilî çareserkirina pevçûn û avakirina aştiya civakî, derbarê karûbarên gelemperî yên civaka sîvîl de bûn. "Civaka sîvîl, di çareseriya rasterast a pevçûnê de çi dike û dikare çi bike?" Derbarê vê pirsê de jî xebat hene. Akademîsyen û çalakvan Catherine Barnes, di van bûyeran balê dikêşe ser heşt fonksiyonên dike. Yek ji van ew e ku pevçûnê, bi awayekî çêkerbi pêş bixe. Ew dibêje civaka sîvîl dikare bi xebatên xwe di qada civakî de şekil bide pevçûnan an jî bihêle ku ew biçin qonaxeke çêtir.

A din jî "guherîna helwestan" e. Wekî ku me di nav aktorên pevçûnê de qal kiriye, pêvajoyên pevçûnê, bandor li têkiliyan dikin û ev nêzîkatî û helwestan di bin bandora xwe de dihêle. Civaka sîvîl dikare erka veguherandina van nêzîkatiyan wergire û dikare helwestên aktorên civakî biguhezîne.

"Sazkirina rojeva aştiyê." Ew diyar dike ku danîna rojeva aştiyê di qada giştî de, pêkanîna rojeva aştiyê an jî naveroka rojeva aştiyê, yek ji karên sereke ne.

“Mobîlîzekirina gel û girseyan ji bo aştiyê.”Mirov dikare bi gelek awayan vê yekê bike. Ev dibe ku kampanyayeke aştiyê be, meşa girseyî be an jî kampanyaya îmzeyê li ser mijarekê be. Ew diyar dike ku mobîlîzekirina girseyê û birêkxistina wê yek ji karên bingehîn ên civaka sîvîl e di çareserkirina pevçûn û avakirina aştiya civakî de.

“Kêmkirina tundiyê û piştgiriya aramiyê.” Saziyên civaka sîvîl dikarin di pevçûnên berbiçav de tundiya fizîkî kêm bikin. Ew angaşt dike, çêdibe ku înîsiyatîf hebin ji bo berlêgirtina birîndarbûna mirovan bi teşebusên curbicur ên wekî xebatên avakirina herêmên bêmayin û bêtundî.

“Avakirina aştiyê di asta civakî de.” Di nav civakê de nirxa li ser aştiyê, sazkirina norman, rojevîkirina aştiyê an jî meyldarkirina binhişa kolektîf li aştiyê, dibe ku bi van awayan xwedî erk be.

Dawiya dawîn, mijara “avakirina çanda aştiyê bi vekolîna sedemên bingehîn”. Ji aliyekî ve, qeyran û pirsgirêk hene, lê ji aliyê din ve pirsgirêkên sereke û bingehîn ên meseleyê hene. Ew dikarin rojevê derbarê vê de çêbikin û bibin alîkar di avakirina aştiya civakî de.

## GIRÎNGIYA CIVAKA SÎVÎL DI PEYMANÊN AŞTIYÊ DE

Du akademîsyen, Christine Bell û Catherine O’Rourke, li peymanên aştiyê yên îmzekirî nihêrîne û derbarê fonksiyona civaka sîvîl de bi tecrubeyên xwe têgeh saz kirine. Wan 441 belgeyên 73 pêvajoyên muzakereyên berdewam di 102 bûyerên pevçûnê de vekolane. Di belgeyên wiha de roleke çawa ji civaka sîvîl re heye? Di ser vê pirsê re belge analîz kirine û rola civaka sîvîl li ser çar komên sereke kategorîze kirine. Ya yekem, “alîkariya însanî” ye. Di rewşên wiha de, mexdûrên pevçûnê bi gelemperî hewceyî alîkariyên însanî ne. Civaka sîvîl jî dikare bibe aktorekî sereke yê vê mekanîzmaya alîkariyê.

Ya duyem, “şopandina peymanê” ye. Ew aliyên han, dikarin peymaneke aştiyê çêbikin. Saziyên civaka sîvîl dikarin mekanîzmayên cuda bi cuda saz bikin, wek mînak dikarin komîteyeke çavdêriyê saz bikin da ku riayetkirina li peymanê kontrol bikin. Ev mekanîzma dibe ku fermî an jî ne-fermî bin. Lê bi awayekî şênber, ew dikarin fonksiyoneke çavdêriyê saz bikin ku li dû peymanê be, peymanê bişopîne û li ser vê raya giştî agahdar bike.

Ya sêyem, “meşrûkirin, piştgirî û berbelavkirin” e. Di esasê xwe de, em dikarin bibêjin ku ew hewldan in ji bo rizaya civakî çêbikin li ser peymanên aştiyê. Bi kurtayî, her şixulên li ser çêkirina rizayê di nav civakê yên ku tên bîra we dibe ku bên kirin.

A dawî, “rêveberiya veguhêzbar a demkî û pêşveçûna sazûmanî”. Di bûyerên

wiha de, di gelek rewşan de dibe ku pêvajoyeke makeqanûnî ya nû têkeve dewrê. Hin bûyer hene ku divê hin qanûn biguherin yan jî hin sazûmanên nû hatine avakirin. Dibêjin ku civaka sîvîl dikare di serdema veguhestinê de beşdariyê bike di avakirina binyada îdarî û siyasî ya nû de û bibe alîkarê vê yekê.

Ya ku em li vir behs dikin teoriyek nîne, senifandina fonksiyonên derketî holê ne li ser analîza metnên îmzekirî di pêvajoya 73 muzakereyan de.

**TECRUBEYA ÎRLANDAYA BAKUR Û CIVAKA SÎVÎL**

Ez dixwazim li ser sê tecrubeyan biaxivim. A yekem, Îrlandaya Bakur e. Civaka sîvîl li wir çi kir? Bi taybetî jî li Îrlandaya Bakur aktorekî ji cepheya hikûmetê, hetta balyozekî jî balê kêşaye ser hin fonksiyonan. Yek ji van navçînî ye. Di tecrubeya Îrlandaya Bakur de, em dizanin ku bi taybetî di serdemên pêvajoyên aştiyê qutbûyî de, civaka sîvîl bi awayê "dîplomasiya deriyê paşîn" tevdigere da ku bi vê navçîniyê, navbera aliyan ji nû ve çêbike.

A duyem, "diyarkirina naveroka peymana aştiyê" ye. Ango divê di peymana aştiyê de çi hebe, kîjan mijar bikevin bin serenava muzakereyê û divê alî li ser çi li hev bikin, bi vî awayî em dizanin ku jî civaka sîvîl jî beşdar bûye di diyarkirina naveroka peymana aştiyê de li Îrlandaya Bakur.

A sêyem, "piştgiriya pisporî" ye. Ya rast civaka sîvîl qadeke berfireh e, lê aliyekî vê jî ew saziyên xwedî-kapasîte ne ku di hin qad û karên diyar de bûne pispor ûagahiyên eleqedarî vê yekê diafirînin. Em dikarin Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TIHV) mînak bidin. TIHV, li ser mexdûrên îşkenceyê bi salan e xwedî tecrubeya tedawiya trawmayê ye. Dewlet jî dikare vê tecrubeyê di pêvajoya aştiya muhtemel de bi kar bîne. Em dizanin ku li Îrladaya Bakur karên bi vî rengî hatine kirin.

A çarem, "qewîbûna fikra aştiyê di binyada aştiyê de" ye. Di eslê xwe de hin tecrube hene ku em ji wan re dibêjin çanda aştiyê an jî karên ku rizaya civakî çêdikin ji bo aştiyê.

A pêncem, "avakirina qadên ewle ji bo mexdûrên pevçûnê" ye. Qesta min ji vê, ne qadên ewle yên fizîkî ne. Her cure kar in ku jiyana rojane ya mexdûrên pevçûnê baştir dikin. Ev dibe ku alîkariya maddî an fizîkî an jî piştgiriya derûnî be. Em bibêjin ku mirovên bi awayekî ruhî û bedenî hîsa baweriyê wenda kirî, wan karan bikin karên ku vê hîsê ji nû ve bi dest bixin. Li vir em dikarin li çarçoveyeke berfireh, ji têkoşîna trawmayê, alîkariyên maddî heta alîkariya xwarinê bifikirin.

A dawî, "fonksiyona pêkvejiyanê di nav ahengekê de" ye. Ya rast ev fonksi-

yoneke berdewam e. Em bifikirin ku ev hemû qediyane. Li Îrlandaya Bakur ev xala dawî dibe ku nehatibe sepandin. Tevî peymana aştiyê em dizanin ku hîn jî jihev-cudabûn dewam dike. Civaka sîvîl jî ji bo çareseriya vê pirsgirêkê xebatên xwe didomîne.

**TECRUBEYA FÎLÎPÎNÊ Û CIVAKA SÎVÎL**

Li Fîlîpînê -bûyera ku ez berfîrehtir li ser xebitîm- em dibînin ku çar fonksiyonên bingehîn derdikevin pêş. Ji van a yekem navçînî û hêsankirin e. Li Fîlîpînê, tecrubeyek hat tetbîqkirin ku heta niha li cîhanê tune bû. Komîsyonek navneteweyî hat damezrandin ji bo ku aliyan bîne cem hev û pêvajoya aştiyê bi rê ve bibe. Çar dewlet endamên vê komîsyonê ne. Yek ji wan Tirkiye ye. Ji sala 2012an heta îro dewam dike. Bi navçîniya Tirkiye, Brîtanya, Japonya û Erebîstana Siûdî, di navbera hikûmeta Filîpînê û Cebheya Rizgariya Îslamî ya Moroyê (*Moro Islamic Liberation Front – MILF*) de pêvajoya pevçûnê a li başûrê welêt kombûyî û hema hema pêncî salî dewamkirî, di serê 2019an de bi peyman û referandûmê hat çareserkirin. Niha pêvajoya aştiyê dewam dike. Herêma Xweser a Bangsamoroyê bi referandûmê hat avakirin û pêvajo hîn jî didome.

Ji xeynî van her çar dewletan, çar SCSyên navneteweyî jî wek navçîniyê di nav vê pêvajoyê de cih girtin û hîn jî dewam dikin. Ango çar SCSyên ji van heşt endamên komîsyona bingehîn a birêvebirina pêvajoyê, bi dewletan re di heman pozîsyonê de bûn alîkar di pêvajoyê de. Bi tevahî ev saziyên civaka sîvîl ên navneteweyî bûn ku li ser vê karî hûr bûne.

A duyem jî pêvajoya şopandinê ye. Li Fîlîpînê komîsyona şopandinê ya pênc-kesî hat damezrandin. Du komîsyon ji van herêmî û du komîsyon jî SCSyên navneteweyî bûn. Yek ji van SCSyên navneteweyî jî Weqfa Piştgiriya Însanî ya ji Tirkiyeyê bû. SCSyeke herêmî û yeka navneteweyî Tevgera Rizgariya Îslamî ya Moroyê, ên din jî dewleta Fîlîpînê diyar kir. Vê komîsyona pênc-kesî bi awayekî birêkûpêk şopand ka ew aliyên han riayetî peymana aştiyê kirine an nekirine, ew rapor kirin û pêşkêşî raya giştî kirin.

A sêyem, çêkirina rojeva muzakereyên aştiyê ye. Ev meseleyek e ku di gelek rewşan de derdikeve pêş. Ango li ser wê meseleyê, ku divê naveroka aştiyê çi be, em dizanin ku SCSyan hin xebatên cuda pêk anîne.

A dawî, -ev meseleyek e ku di piraniya bûyeran de tê dîtin- em dizanin ku SCS hin xebatên ji bo wergirtina piştgiriya raya giştî li ser aştiyê jî pêk anîne.

**TECRUBEYA KOLOMBIYAYÊ Û CIVAKA SÎVÎL**

Herî dawî jî em qala Kolombiyayê bikin. Her çiqas hin fermandarên FARCyê

ji nû ve biryara vegera têkoşîna çekdariyê girtibin jî di demeke nêz de lihevkirinek çêbûbû.

Civaka sîvîl di peymana îmzekirî de xwediyê çar fonksiyonan e. Yek jê parêzvanî ye, fealiyeta parêzvaniya li ser aştiya qada civakî ye. Ya din jî çêkirina rojevê ye, ev jî mekanîzmayeke mezin rave dike. Nêzîkî 61 hezar pêşniyazan, bi rêya forûm û strukturên cihêreng rasterast ji maseya aştiyê re têne şandin. Civaka sîvîl dikare bi rêya forûmên cihêreng pêşniyazên xwe bikemilîne û wan bi nivîskî rasterast bişîne ser maseya aştiyê ya ku wekî kom dewam dike.

Em dibînin ku herêmên aştiyê ango herêmên bê-çek hatine avakirin. Em dizanin ku ev tecrubeyeke aştiyê ye ku ewlehiya fizîkî yên welatiyan dabîn dike.

Kolombiya, ji aliyê rûbirûbûna rabirdûyê û meseleya edaletê ve jî bûyereke baş e. Derbarê vê de rojeveke mezin hate danîn û herî dawî di nav peymana aştiyê de cihgirtina hin mekanîzmayan hatin kirin. Sê mekanîzma hene. Ya yekem, di çarçoveya rûbirûbûna rabirdûyê de dadgeha rayedar a taybet hat damezrandin. Ji bo eşkerekirina heqîqetê, pêkvejiyanê û pêşîlêgirtina dubarekirinê komîsyonek hat avakirin. Dîsa yekîneyeke bi navê "Lêgerîna Wendayiyan" di nav metna lihevhatinê de hat sazkirin û ev hemû tişt bi zordayîna civaka sîvîl hatin kirin. Her wiha, ji bo ku ev bûyerên tundiya zayendî jî wek parçeyekî rûbirûbûna rabirdûyê bê qebûlkirin, piçekî bi zora saziyên civaka sîvîl pêk hat.

## HEFT FONKSIYONÊN BINGEHÎN ÊN CIVAKÊ DI AVAKIRINA AŞTIYÊ DE

Di vê mijarê de weke dawî, ez dixwazim çarçoveya teorîk parve bikim ku bingeha xwe ji rapora Weqfa Aştiyê digire. Ew modela ku ji aliyê Thania Paffenholz û Christoph Spurk ve hatiye bipêşxistin, hem ji ber ku çarçoveya têgîna wê firehtir e û hem jî ji ber ku li ser tecrubeyeke qadê ya diyar hatiye avakirin, girîng e. Hêla serekî ya bernameya me ya niha dewam dike, vê modelê pêk anî. Dibe ku bala we bikişîne û hûn bi berfirehî bixwînin.

Paffenholz û Spurk modela xwe li ser çarçoveyeke teorîk ava kirin û li ser lîteratura aştiyê, lîteratura demokrasiyê û lîteratura pêşketinê bi hev re disekine. Ya rast, meseleya civaka sîvîl bi van her sê meseleyan têkil dikin. Çawa ku hûn bala xwe didine têgeha civaka sîvîl, hem di meseleya aştiyê de, hem di meseleyên demokratîzebûn, demokrasî û dewletê de, hem jî di mijara pêşketinê de dedikeve pêş. Nivîskarên têkildar, bi komeke akademîsyenan re ev her sê lîteraturan jî gêre kirin û çarçoveyek çêkirin, ev çarçoveya han adapteyî yanzdeh dewletan kirin. Li ser her bûyerê yek-du akademîsyen xebitîn û di nav de Tirkiye jî hebû. Ayşe Betül Çelik bûyera Tirkiyeyê nivîsî. Heke şaş

nebim, Esra Çuhadaroğlu jî li ser Qibris û Guatemalayê nivîsî. Vê çarçoveya teorîk li yanzdeh bûyeran sepandin û derfetên wan ên testkirinê çêbû. Aliyek hêja yê vê teoriyê jî ev e ku di yanzdeh bûyeran de hatiye ceribandin.

Di vê modelê de heft fonksiyonên bingehîn ên civaka sîvîl tên ravekirin. Mirov dikare bi kurtasî jê re bibêje modeleke fonksiyonel. Fonksiyona yekem, "parastina welatiyan" e. Weke esas vê dibêjin: Her karên ku welatiyan, li hember tundiya dewletê û serhildêran wek fizîkî biparêze. Em dikarin li ser vê, avakirina herêmên aştiyê, çalakiyên mertalên zindî, vekirina qadên bêmayin zêde bikin. Em dikarin bibêjin ku ev kar rasterast parastina fizîkî ya welatiyan dikin armanc. Ew dibêjin ku civaka sîvîl bi rastî dikare di dorhêla tundiyê de, li gor hêza mirovan, hin xebatan pêk bînin ji bo ber li zirardîtinên komên diyar bigirin.

Ya duyem, "parêzvanî û ragihandina giştî" ye. Parastina li ser aştiyê di qada giştî de, parastina aştiyê wek nirxekî normatîf, wek fonksiyonên bingehîn rave dikin. Em dikarin çapemeniya kevneşopî û çapemeniya civakî li ser vê zêde bikin. Em dikarin li ser vê çarçoveyeke pir berfireh deynin. Bi rastî, ew dibêjin ku parastina aştiyê bi serê xwe karek e. Bi kurtasî, em qala her cure hewldanên belavkirina vê fikra "divê em aştiyê bikin, aştî tiştekî baş û hewce ye" di civakê de dikin.

Fonksiyona sêyem, «civakîbûna navkomî û çanda aştiyê" ye. Xala ku ew li vir rave dikin ev e: Dibe ku alî û komeke pevçûnê hebe. Ew dibêjin ku hûn ji kîjan komê dibin bibin, di nav civat û koma we bi xwe de, girîng e hûn çarçoveyeke têkildarê ragihandina der-tundiyê xêz bikin û di vê çarçoveyê de kar bikin. Ew dibêjin, hewce ye ku zemîneke normatîf an jî derdorek bê afirandin ji bo ku di zemîna çandî de ber li tundiyê bê girtin û astengkirin. Ew angaşt dikin ku ev jî bi ragihandina bêtundiyê dikare kar bike. Dibe ku têkiliya we bi "koma dijber" re tune be. Hûn di nav kîjan civatê de bin, di nav wê civatê de hûn dikarin aştî û bêtundiyê biparêzin. Bi gotineke şênber, hûn dikarin di nav *network*a serhildêran de jî bin, hûn dikarin li wir jî parastina aştiyê bikin. Hûn dikarin di nav *network*a hikumetê an jî partiya A, B, Cyê de bin, hûn dikarin aştî û bêtundiyê di wê de belav bikin.

Fonksiyona çarem, «şopandin û hesapdayîn" e. Her karê ku encamên bûyerên pevçûnê dişopîne, rapor dike û bi raya giştî re parve dike. Em dikarin bibêjin ku li Tirkiyeyê vî karî herî baş IHD Û MAZLUMDER kir. Qeydkirina bîlançoyên mirinê, vê ragihandina vê ya ji raya giştî re. Bi kurtayî em dikarin bibêjin, şopandin, kontrolkirin, raporkirina mexdûriyet û binpêkirinên mafan yên ji ber pevçûnê û hem ragihandina ji rayagiştî re hem jî arşîvkirina wan.

Fonksiyona pêncem, "Pevrebûna civakî ya hesas ji pevçûnê re". Ev qala wan

komên pevçûyî an jî di nav tora komên li hev civiyayî de dike ku tên cem hev û li ser vê têkiliyê hin karan dikin. Wek mînak vê yekê, Eko-Polîtîk kir li Tirkiyeyê. Ser meseleyê, malbata kesên li gel aliyên dijber ên di nav pevçûnê de jiyana xwe ji dest dayî anîn cem hev -heke em Lederach bi bîr bînin: rêyên afirîner, rasthatin û têkilî-, xebatên bi vî rengî yên li ser bingehê vê hevdîtinê pêk anîn. Em dikarin bibêjin, her cure xebatên ku dihêlin hûn ji mala xwe û taxa xwe derkevin û têkilî bi taxa hember re deynin.

Fonksiyona şeşem, "navçînî û hêsankirin" e. Çawa di navbera aktorên pevçûyî de ev tişt dibe, di nav wan komên toran de jî ev tişt dibe ku li dor aktoran civiyane. Ya rast, em behsa başkirina têkiliyên van her du koman û têkilîdanîna jinûve ya fealiyetên navçînî û hêsankirinê dikin.

Ya dawî, "pêşkêşkirina xizmetê bi awayekî rasterast " ye. Her du nivîskar jî pirsnîşan datînin ser vê fonksiyonê. "Gelo hilberîna xizmetê karê civaka sîvîl e? Gelo dayîna perwerdeya kreşê karê civaka sîvîl e? Gelo karê civaka sîvîl e ku alîkariya xwarinê bide qurbaniyên pevçûnê?" Ew pirsên wek van pirsan dikin. Ev mijareke bi nîqaş e. Gotara bingehîn ev e: Heke ev fonksiyon cih ji şeş fonksiyonên din re veke, bibe deriyê wê yê têketinê yê pêşiyê, wek fonksiyoneke civaka sîvîl dibe ku bê qebûlkirin. Ser meseleyê, eger hûn ê tenê bi alîkariya mirovî bikarin têkevin qada pevçûnê; hûn dikarin bi alîkariya xwarinê têkevin qadê û karên din jî bikin. Ango wek avakirina aştiyê, navçînî, şopandin û nirxandinê. Ji ber vê yekê mîna avakirina aştiyê, navbeynkariyê, şopandin û nirxandinê, ji bo raporkirinê hûn dikarin alîkariya xwarinê bibin û rapor bigirin. Teza sereke ya nivîskaran ev e: Civaka sîvîl ne aktorek e ku rasterast xizmetê bibe. Civaka sîvîl, ne aktorê wan xizmetan e ku hewce ye dewlet bike û divê van xizmetan neke. Ev jî mijareke bi nîqaş e. Paffenholz û Spurk, fonksiyona xizmetkirinê ya rasterast, bi şertê rêliber-vekirina şeş fonksiyonên din, tev li modelên xwe dikin. Ev dibe ku her cure xizmet be. Dibe ku alîkariya xwarinê be, dibe ku piştgiriya derûnî ji bo mexdûrên îşkenceyê be, dibe ku piştgiriya hiqûqî ya di pêvajoyeke hiqûqî de be wek baroyan. Wek encam, fîzîkî an jî ne-fizîkî, her cure alîkariya ku rasterast dabînkirina pêdiviyan dike armanc.

Ji bo ku mirov fam bike ev heft fonksiyon çawa dişixulin û kîjan piçek girîngtir e, her du nivîskar balê dikêşin ser sê têgehên sereke û dibêjin ku divê sê karên bingehîn bên kirin. Yek ji wan "famkirina pêwendiyê" ye. Ew dibêjin hewce ye ku hûn ji pêwenda bûyera berbehs têbigihijin. Di vir de, girîngiya binyada çandî û sosyoekonomîk ê welêt, di nav binyada herêmî û cîhanî de çi ye, pozîsyona çapemeniyê, rejîma siyasî, aktorên bingehîn ên binyada civakî, rolên zayenda civakî, qesta me meseleyên wek van in ku bêhtir teşe didin û rê ber têkiliyên civakî nîşan didin. Ango hewce ye ku mirov binyada kûr a giştî ya welêt fam bike.

Ya duyem, “avakirina aştiyê” ji bo aliyên têkildar çi îfade dike? Aktorên di nav binyada civakî de aştiyê çawa îdraq dikin? Serhildêr û civak dema dibêjin aştî, hikumet çi fam dikin? Ew angaşt dikin ku divê civaka sîvîl fam bike ku ev aktor ji hev cuda ne û her yek ji aştiyê çi fam dike. Ew dibêjin, heke ku em fam nekin li ser aştiyê pozisyonên cuda bi cuda hene, ne pêkan e ku em van heft fonksiyonan bi cih bînin. Dîsa ew dibêjin ku wateya avakirina aştiyê, pozîsyonên rasterast û nerasterast ên aliyan û heke em piçekî li vê binêrin, ji bo demeke kin, dirêj û navîn çi hewce dike, divê nexşeya wê bê çêkirin.

Di dawiyê de, “statuya civaka sîvîl çi ye?” We konteksta wê analîz kir. Di vê çarçoveyê de, we analîz kir ku ji bo aştiyê çi hewce ye. Baş e, civaka sîvîl li vir dikare çi bike? Wê demê ew dibêjin ku divê profîla civaka sîvîl bê sazkirin. Ev civaka sîvîl kî ye, bingeha wê ya civakî çi ye, çavkaniyên wê yên fînansî çi ne, sazûmana wê ya hundirîn çi ye? Ser meseleyê, di gelek lêkolînên me de, rêxistin hene ku nirxên angaşta civaka sîvîl hilnaberin, berevajiyê vê tevdigerin, rexneyên wiha hene. Di rapora me de, ku me ji Weqfa Aştiyê re nivîsandiye, gotina mamosteyê me tê bîra min: “Ew dibêjin civaka sîvîl, lê heman mêr bîst sal in wir bi rê ve dibin.” Ji aliyekî din ve, li welêt tecrubeyeke wiha ya civaka sîvîl hebe, hûn ê çiqas vê meseleya aştiyê biaxivin? Ji ber vê yekê binyad, nirx û rêbazên şixulkirina civaka sîvîl çi ne? Di rastiyê de, ya ku em jê re dibêjin civaka sîvîl -ku em di çarçoveya parêzvaniyê de lê bifikirin- ew sazî ne ku ji bo “feydeya giştî” aktorên siyasî rexne dikin. Rewşa Tirkiyeyê çi ye? Têkiliya civaka sîvîl bi siyaset, çapemenî û binyada civakî re çi ye? Gelo ev rêxistinên bingehîn in, rêxistinên bi têkiliya girseyî re an jî avahiyên burokratîkbûnê yên di nav çar dîwaran de ne? Divê hûn profîleke civaka sîvîl jî xêz bikin.

Min di destpêkê de hejmarek dabû. Di sala 2014an de 110 hezar bû, niha dibe ku 130 hezar hebe. Em dizanin ku di nav 130 hezar komeleyan de du hezar komele bi meseleyên wiha re eleqedar dibin. Hûn mecbûr in bi vê tabloyê bizanin û bişixulin. Ma em ê niha bi du hezar komeleyan ve bimeşin an em ê li ser rêyên din jî bifikirin ên bikarin 128 hezar komeleyên mayîn jî lê zêde bikin ? Heke hûn vî tiştî nezanibin, hûn nikarin bi pêş ve biçin.

Ji ser tecrubeya yanzdeh bûyerên ku ez behsê dikim, Paffenholz balê dikêşe ser heft xalên hevpar.

Beriya her tiştî, dema em di çarçoveya teorîk de li bûyeran binêrin, bi ya min agahiya herî krîtîk ev e: Civaka sîvîl di van bûyeran de ne wek aktorekî diyarker, wek aktorekî piştgir dişixule. Ew dibêje aktorên diyarker, aktorên siyasî û aktorên pevçûyî ne. Ya rasttir, Paffenholz di encama analîzên bûyeran de vê yekê dibêje. Ev a yekem e.

Ya duyem, ev teorî ji bo têgihiştina bûyeran çarçoveyeke fonksiyonel rave

dike. Ji ber ku parastina welatiyan, parastina aştiyê, ragihandina gelemperiyê, şopandin û nirxandin li gorî fonksiyonê ne, li ser fonksiyonê ev model ne tenê li civaka sîvîl, di heman demê de li ser aktorên komeke berfirehtir, ku civaka sîvîl jî tê de ye, radiweste.

Ya sêyem, ew dibêje dibe ku ev heft fonksiyon li gorî giraniya pevçûnê ji hev cuda bibin an jî dibe ku bi zanîna qadê ji hev cuda bibin. Di dema pevçûnên giran de civaka sîvîl divê navçîniyê bike an jî welatiyan biparêze. Lêbelê di dema muzakereyan de divê giraniyê bide ser ragihandina giştî, parêzvanî an jî yekbûna civakî ya hesas ji pevçûnê re û divê giraniyê bide ser sosyalkirinê. Ew îddîa dike ku heft fonksiyon her tim di heman demê de ne girîng in û divê li gorî cih û rewşa bûyerên pevçûnê hin fonksiyon derkevin pêş.

Ya çarem, Paffenholz dibêje di pirî bûyeran de bi rastî nehevsengiyek heye di navbera karên civaka sîvîl û hewcedariyê de. Ser meseleyê, ew nîşan dide ku civaka sîvîl dema ku hewcedarî bi parastina civakî hebe li ser navçîniyê disekine. Li gorî tecrubeyên qadê, ew îddîa dike ku di navbera pêdivî û xebata şênber a civaka sîvîl de nehevsengiyek heye û li gorî pêdiviyên guncav, fonksiyonên guncav nayên vekolîn.

Ya pêncem, fealiyetên civaka sîvîl dibe ku li gor fonksiyonan biguhere. Ya ku li qadê tê dîtin ev e: Bi taybetî şopandin û hesabdayîn, hêsankirin û parastina welatiyan, tiştên ku civaka sîvîl wek peywirekê di van yanzdeh bûyeran de karên baş kirine. Lê ji çar fonksiyonên mayîn tecrubeyên baş derneketine.

Ya şeşem, bûyerên wiha bi rastî cudabûnên civakî yên piralî çêdikin. Lêbelê, civaka sîvîl li ser hin xalan an li ser mijarên aktuel disekine. Li gel vê, tevî van meseleyan bi qadên pevçûnê û tebeqeyên cuda yên berbelav re têkil nabin. Bi rastî, ew angaşt dike ku dabeşên civakî curbicur, cudatir û zêdetir in lê saziyên civaka sîvîl bi giştî li ser meseleyên sereke û cudahiyên berê dixebitin.

Di dawiyê de, balê dikêşe ser meseleya kontekstê xêz. Ew diyar dike ku divê têgeha hûn lê dixebitin, binyada giştî û zemîna ku em pê diavêjin ser wê nas bikin. Ew angaşt dike ku di bûyerên hatine vekolayî de, bê nirxandin ka li ser kîjan fonksiyonê di kîjan demê de çawa dişixule û ji ber ku analîzên kontekstê baş nehatine kirin, baş nayên nirxandin jî. Ji ber vê yekê, ew pêşniyaz dike ku civaka sîvîl divê ji xwe re rolekê destnîşan bike, fonksiyonên xwe diyar bike û pozîsyonekê bigire.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Beriya niha Hewldana Jiyandina Heskîfê hebû. Ez tê de rêvebir bûm. Hê jî endamekî wê yê fermî me. Seferberiyên me yên li hember bendava Ilısuyê*

*çêbûn. Me gotûbêj û konferans amade kirin. Serokên şaredariyan piştgirî dan me û em gund bi gund geriyan. A rastî pir jî piştgirî nedan me. Ji sala 2012an heta 2013an min hewl da ku vê rêxistinê bi tena serê xwe li ser pêyan bihêlim. Me kampa ciwanan çêkir. Di wateya civakî de, me xwest hin hevalan jî tev li van karan bikin lê tu sînerjî çênebû. Ser meseleyê em niha li Dibistana Aştiyê ne. Beriya niha ez tev li Dibistana Mafên Mirovan jî bûm. Ji wir jî ti tişt peyda nebû. Di wateya parvekirina tecrûbeyan de me hin tiştan dan ber hev, jixwe tu jî tev lê bûyî. Nizanim ji tirsê ye yan ji dilsariyê ye, bi awayekî hin pirsgirêk peyda dibin. Ev jî wisa dide hîskirin weke ku me av kutabe. Ez dixwazim sedema vê hîn bibim. Çima wiha bê palpişt dimîne?*

Ez nafikirim ku te av kutabe. Belkî lazim e, di serî de tu vî tiştî qebûl bikî: Ev bûyerên ku derdikevin ber me jixwe ne bûyerên wiha ne bi cehd û xebata sê meh, pênc meh, pênc salan bên çareserkirin. Ku em sala 84an esas bigirin, di bûyera me de, me sî û pênc salan li paş xwe hiştiye. Ez di sala 1980an de ji dayik bûme. Wexta ez ji dayik bûm, vê dest pê kiribû û hîn yek-du nifş jî dê dewam bike. Em qala meseleyekê dikin ku ji nifşan derbas dibe. Bi taybetî ez ji bo van meseleyan bibêjim. Divê em di serî de qebûl bikin ku ev cure mesele, ne karên wisa ne ku di demeke kin de çareser bibin. Em behsa veguherîneke gir a civakî dikin. Divê em bizanin ku ev dê demeke dirêj bidome, rehenda yekem ev e.

Rehenda duduyan, di DÎSAyê de herhal nêzî bîst endamên me hene. Piraniya wan di qadên diyar de pispor in. DÎSA, di 2011an de ava bû, umrê wê heşt sal in. Bawer dikim, nêzî panzdeh raporên me hene. Bê qîmet e, na bi min bi qîmet e. Me li ser cerdevaniyê agahiyên biqîmet derxistin meydanê. Îhtimal e ku pêncî sal di destên me de bimînin. Me agahiyên biqîmet derbarê zimanê dayikê de afirandin, bê ka ev kar çawa çareser dibe. Ev jî dê di bin destên me de bimîne. Bi wateya tevkariyê, belkî di deryayeke mezin de bi qasî dilopekê heye an jî tune ye. Axir ew dilop jî nebin dê tiştek necive. Bi ya min, li ser vê meseleyê, civaka sîvîl divê vê bizane û helwest bigire: Ev, qadeke mezin û gir e ku mobîlîzasyon hewce dike. Helwest-girtina piçekî jî bi zanîna sînoran. Ev jî rehenda duyem a vî karî ye.

Rehenda sisêyan, bi ya min li ser pêvajoya çareseriyê bi gelemperî du teorî hene. A yekem, meseleyê li ser "çarçoveyeke normatîf" dinirxîne. Xebat hene ku dibêjin "aştî baş e, hewce ye, xweş e" û wisa helwest digirin. Ez nabêjim ku normatîfî bê qîmet e. Weke norm jixwe di hemû teoriyan de, meseleyeke bingehîn bi navê parastina aştiyê heye. Weke norm parastina aştiyê girîng e. Lêbelê ev rûyekî vî karî ye. Rûyekî duyem ê vî karî jî heye. Ev jî rawestana li ser aştiyê bi awayê pêdiviyê ye. Teoriyeke bi navê teoriya hilbijartina rasyonel heye. Bi Îngilîzî dibêjin *rational choice theory*. Wek şexs, teoriyek nîne ku

ez yek bi yek dipejirînim, teoriyek e ku ez bi mesafeyî lê disekinim. Kêm zêde wiha ye, ku aştî ji pevçûnê bifêdetir bibe, weke maddî û sembolî dibe aştî. Ku hûn bixwazin aştiyê ava bikin divê hûn aştiyê hem maddî û hem sembolî bînin asteke "biqezenc". Teoriyek dibêje, "Heke hûn tenê xîtabî hest û hîsên mirovan bikin an jî hûn li bendê bin ku mirov vê wek norm qebûl bikin, ev kar hîn li benda gelek nifşan dimîne." Di xebatên aştiyê de divê em aştiyê weke normekê bingeh bigirin an jî aştiyê weke pêdiviyekê bi çarçove bikin?

Dixwazim mînaka porteqalê bînim bîra we. Wek pêdivî em çiqasî kod bikin, em ê ewqasî rê biçin. Ez nafikirim ku di vir de jî pirsgirêkek heye. Li cem me meyleke gelekî zêde heye ku em ravedana norman dikin. Wek norm, aştî tiştekî baş e lê bi rastî di jiyana rojane de bi serê xwe norm, tevgerên mirovan diyar nakin an jî kesên di van norman de noqbûyî, ji wan azad nînin, naveroka wê hin hilbijartinên rasyonel in. Ev dibe ku heta cihekî maddî an jî sembolî bibin. Aliyê rasyonel ê kar belkî, divê ji nû ve bê avakirin.

A niha bi deng difikirim. Bi qinyata min di rapora Weqfa Aştiyê de tiştê herî pir derketî pêş ew bû: Li Tirkiyeyê civata civaka sîvîl bi awayekî zêde di bin siya sazûmana siyasî de ye. Ev gotin ji bo hemû aktoran meqbûl e. Civateke civaka sîvîl heye ku wek diyarkera bingehîn, aktorê siyasî qebûl dike û piçekî di bin siya wî de maye, li gorî wê helwest digire, li gorî wê bi cih dibe. Ango di qada siyasetê de gettoyên civaka sîvîl a gettobûyî hene. Wiha dişixule û ev hêl kûr bûye.

Civata civaka sîvîl, bi ya min divê têkiliya civaka sîvîl û siyasetê ji nû ve problematîze bike. Ji ber vê, alîkariya wê ji dinyaya navîn re jî tune ye. Ser meseleyê civakeke sîvîl a li gor aktorê xwe yê siyasî helwest digire, bi îhtimaleke mezin ji bo civakê xwedî rola ragihandin û birina biryarên vî aktorî ye. Di nav xwe de bi mekanîzmaya xwerexnekirinê, feraseta şixulkirinê kuştine. Ev tişt, di civata xwe de fersenda pêşketina rexneyî pir teng dike. Jê wê de, derbasbûna taxa din hema hema diqedîne. Heta ku hûn di bin siya aktorê xwe de bişixulin, dema aktorê we yê siyasî derbasî taxa din bibe hûn dikarin derbas bibin, ew derbas nebe hûn jî nikarin derbas bibin. Bi ya min meseleyeke girîng jî ev e. Têkiliya civaka sîvîl û siyasetê, heta di "civat"a civaka sîvîl bi xwe de jî -dibe xwedî civakek bibe, ez civaka siyasî weke aktorekî li derveyî siyasetê nanirxînim, helwesteke min a wisa tune ye- herî kêm divê di rewşeke rexneyî de be. Dema dor hatê, heta di nav civata xwe de jî divê bi wê helwestê be ku bikare bibêje, "Me di vî karî de xeletî kir, divê em bikevin taxa hember."

Tiştekî pir giştî li ser zêde bikim. Jixwe em li Tirkiyeyê di mijara civaka sîvîl de xwedî kevneşopeke kevin nînin. Nêzî 130 hezar komeleyan hene. Komeleyên ku parêziyê dikin li derdora du hezarî ne. 128 komeleyên din dest nadin

meseleyên wiha xeternak. Dest bidinê jî pêşî li dewlet û desthilatdara siyasî dinêrin. Ew çi bibêjin li gorî wan helwest digirin. Jixwe civata me civateke wiha ye.

Loma di vê meseleyê de em ji mirovan re bibêjin, “Ku em vê nekin dê berdêl û hesabekî vî karî hebe” û weke pêdivî divê em xwedî li vî karî derkevin. Em dikarin bibêjin, “Heke em vî karî bikin, berdêlê bide aliyekî, em dikarin ji bo xwe û zarokên xwe jiyaneke baş ava bikin.” Divê rêya vê jî weke pêdivî bi ser hev de bê. Belkî bi zor û zehmetiyan em bi pêş ve biçin. Wek civak, ku em nekevin, hişê me pir nayê serê me. Belkî hewce ye çongên me piçekî biteliş e. Lê ez nafikirim ku av tê kutan. Tenê em dikin tev li beşeke vê meseleya mezin bibin. Ez wê nizanim. Divê em xeyalên pir mezin, ji kapasîteya sazûmaniyê wir de, ava nekin. Em di bendeke çawa de ne, sînorên vê bendê çi ne, hewce ye em vê bizanin. Ji bo guhertinê pêdiviya me bi çi, çiqas wextê heye? Li vir ez behsa pasîfbûnekê nakim. Tenê divê em cihê wê bizanin ku ev kar wext dixwaze û divê em bi aktorên din re bin.

**Beşdar:** *Niha ez dixwazim du xal bên nîqaşkirin û divê em li ser vê mijarê bigihîjin encamekê. A yekem, têkiliya saziyên civaka sîvîl divê bi aliyên pevçûnê re çi be? An jî aliyên pevçûyî divê bibin xwedî saziyên civakên sîvîl an nebin? Ango civaka sîvîl, wek bîrdozî û siyasî divê li aliyê pevçûnê be an jî ji aktorên derveyî van pêk bê? A duyem, ev bîrdozî, li derveyî têkiliyên saziyên civaka sîvîl ji hêla aliyên pevçûnê ve divê bên fînansekirin an na? Ev ji hêla civaka sîvîl ve pirsgirêkên girîng in. Ez vê bi du mînakan berbiçav bikim. Li Tirkiyeyê di sala 1999an de bi banga Abdullah Ocalan, di çarçoveya pêvajoya aştiyê ya wê demê de komek endamên PKKê bi navê Koma Aştiyê hatin Tirkiyeyê. Yek ji wan kesên hatî wekîlê min bû. Piştî demekê veguherî, bû miteşebisê rêvebirê aştiyê. Niha asta bandora tiştekî wiha dê çi be? A duyem, bi navê IHHyê saziyeke civaka sîvîl heye, pir bi bandor e. Di pêvajoya panzdeh salên vê dawiyê de hemû fonên xwe, organîzasyonên xwe li ser hikûmetê bi rê ve dibe. Niha ev civakeke sîvîl e, an tiştekî din e? Divê em van çawa nîqaş bikin? Têkiliya civakên sîvîl divê bi terefên pevçûnê re bi awayê bîrdozî, fon û siyasî çawa be? Li gorî min meselaya girîngtir a civaka sîvîl ev e.*

**Beşdar:** *Em jî li ser aştî û çareseriya pevçûnê xebatan pêk tînin lê ser meseleyê wek civaka sîvîl cudahiya vê pir tê ber me. Gelo em çalakiyên parêzvaniyê pêk tînin? Gelo em xebatên şopandinê dikin an jî em xebatên raporgirtinê dikin? Bi rastî ev, tevliheviyeke micid çêdike, di eslê xwe de ev rewşeke wisa ye ku meselayan dike mesele. We jî behs kiribû, du nêrîn hene dema em li ser meseleyan bisekinin. Yek wek normatîf dibîne yeka din jî wek pêdivî dibîne. Belkî ya sêyem jî tabloyeke wiha derdixe holê. Dema em nêzîkî aştiyê dibin heçku em wek destpêka hin tiştan nêzîk dibin. Lê aştî, encama*

*hin tiştan e. Aştiya ku em qalê dikin, têkoşînek e ku bêyî domandina têkoşîna mafên mirovan, bêyî têkoşîna fikir û ramanekê nadome.*

*Niha di vê wateyê de erka civaka sîvîl çi ye an jî xebatkarên civaka sîvîl çi erkê li ser milê xwe bar kirine? Xala ku em tê de ditengijin piçekî jî ev e. Tiştekî din jî, birêvebirina hin tiştan bi şêwazeke kevin bi rastî jî, me vedikişîne posîzyoneke pir paş. Ser meseleyê, kesên li ser van mijaran diaxivin her tim extiyar û mêr in. Me ev di Şandeya Mirovên Aqilmend de jî dît. Herçend ku dewletê ev diyar kiribe û tişteke pir mêrane be jî. Lêbelê ez dixwazim vê bibêjim, bi rastî meseleyên ji aliyê kal û pîran ve bi bandoreke gerontokratîk tên axaftin pir çareser nabin. Beşên din ên civakê, ser meseleyê tevlêkirina ciwanên wê, belkî ji bo me hemûyan lêgerîna rê û rêbazeke wiha ji bo demeke dirêj bibe çareserî.*

**Beşdar:** *Ez di nav dezgeha Keskesor LGBT+ de cih digirim. Me li Îzmîrê, li Stenbolê bi navê "Kargeha Aştiyê" çalakî organîze kiribû. Çalakiyê pir baş dest pê kir. Ewil, gava me pirsî "Vîzyona we ya aştiyê çi ye?", hevalan bersivên pir baş dan. Dema me pirsî ku "Armanc û xebatên we çi ne?", pirsgirêkek çênebû. Lê wexta em hatin beşa dawiyê ku me pirsa "Di van heft serenavan de çi dikarin bên kirin?" berpêyî wan kir, di nav her kesî de bêdengiyek, rewşeke bersivnedayînê çêbû. Ez jî lê xebitîm ku mijarê zelal bikim. Dema ku min pirsa "Di qada gelemperî de belkî em nikaribin hevwelatiyan biparêzin, gelo em dikarin aştiyê biparêzin?" kir, hin dengên qels derketin. Ez difikirim ku em şiroveyê li ser vê bikin: Divê em Tirkiyeyê bi şert û mercên wê yên taybet nenirxînin û neavêjin goşeyekê. Gaveke berê jî te behsê kir, hem ji aştiya erênî hem ji ya neyînî, gelo piştî avakirina aştiya neyînî avakirina aştiya erênî hêsantir nabe? Lewra ji ber ku pêvajoya pevçûnê dewam dike, dewlet bi çavekî baş li xebatên derbarê aştiyê de nanihêre loma mirov xwe jê didin paş. Heçku me tirsa "Têgeha aştiyê hatiye marjînalîzekirin û heke ez li ser vê gotinekê bibêjim ez ê bêm cezakirin" dît. Ji aliyekî din ve em dikarin vê biaxivin.*

*Saziyên civaka sîvîl, bi hemû tevgerên civakî çawa bi ser hev de tên? Pir zehmet dibe ku tenê bi serê xwe ji aliyê tevger û komekê ve bê domandin. Nêzî du hezar civakên sîvîl li vê dixebitin. Rêyên vê çi ne an jî li cîhanê mînakên vê hene? Bi dewamkirina pevçûnê re aştiya erênî çawa tê avakirin, ez vê meraq dikim.*

**Beşdar:** *Ez wek esnaf dixebitim. Yek ji wan bûyeran jî pênaseyeke hevpar a civaka sîvîl e ku di mêjiyê min de tevliheviyê çedike jî. Yek ji nediyariya di bin pirsên hevalan de jî, vê rastiyê dide nîşan ku hîn li ser pênaseyeke diyar a civaka sîvîl lihevkirinek tune ye. Wiha ye ku, ji mêj ve pratîka sazî û tevgerên civaka sîvîl, bêhtir di dema pevçûnê de fealiyetên navçîniyê*

*didomînin. Çavekî sêyem, ango mîna kirdeyeke sêyem disekine di tehdeyî, binpêkirinên mafan û kevîya hemû pevçûnan de. Lê tiştê îro min ber bi vir ve dikişîne, ev bi xwe ye ku çil sal in belkî sed û bîst sal in olana min a şexsî ya pevçûnên berdewam e. Divê motîvasyona DÎSAyê an jî ya dezgeh û SCSyeke din ev bûya: Motîvasyona feraseta me ev be ku em birînên xwe, êşên xwe, wendayiyên xwe bi xwe derman bikin. Bi ya min di vê mijarê de, di vê wateyê de tevlihevî hene. Divê SCS, xwe wek saziyek an jî wek tevgerekê organîze bikin? Ji ber vê aktorên ku di rêvebirina avakirina aştiyê de cih digirin, divê aktorekî pileya yekem a siyasî be an jî pevçûn zêdetir bên tolerekirin û di nav zexmkirina muzakereya dilnexweş de cih bigire ku em wek lihevkirin ango navçînî bi nav dikin? Di mînaken te de, di çarçoveyên teorîk de, ji xeynî modela beşa sêyem, di her du modelên din de aliyê serdest ev bû. Bêhtir dezgehek heye di lêgerîna muzakereyeke dilnexweş de. Li Tirkiyeyê, li herêma me bi ya min di vê mijarê de pêdivî bi zelaliyeke micid heye. Motîvasyona min a îro ya ji bo hatina vir ev e. SCS divê roleke çawa bigirin û gelo em dikarin pênaseya civaka sîvîl a hevpar bikin, ez vê meraq dikim.*

Min wek şexs heterojeniya saziyên civaka sîvîl qebûl kiriye. Pênaseyeke homojen a civaka sîvîl ku her kesî li ser li hev kiriye dê çênebe û ev cure rêxistin jî dê li hev nekin. Îhtimal e ku ji aliyekî ve GONGO ango rêxistinên ji aliyê hikumetê ve rasterast kontrolkirî dê hebin, ji aliyekî din ve jî SCSyên rasterast wek niçika tevgerên siyasî bicihbûyî dê hebin. Li gel van aktorên ku bi aliyên pevçûnê re bi mesafe ne, di navbera aliyan de aktor dê hebin ku ji bo navçîniyê hewes dikin dê. Bi ya min ev curbicurî dê bidome. Di vir de hewla homojenkirinê dê encam nede.

Wek normatîf divê civaka sîvîl der-hikûmet bibe, em dikarin bibêjin ku ji bo feydeya gelemperiyê bixebite. Çend şertên me yên herî kêm hene. Qezencê dê neke mebest, dê ji bo feydeya giştî bixebite, têkiliya wê bi dewlet û hikumetê re dê tune be. Ev şertên herî kêm hene lê, ji vir pê de pênaseyeke civaka sîvîl tune ye ku her kesî qebûl kiribe. Îhtimal e ku dê di fealiyetê de jî tune be. Bi ya min ev curbicurî dê bidome. Mesele ev e: Di nav vê curbicuriyê de ji bo cihvekirina feydeya giştî divê hin cure rêxistin berbelav bibin. Em belkî dikarin bi pey pirsa "Divê ew cure çi be?" bikevin. An na yên din dê li rêya xwe dewam bikin. Di vir de ez nafikirim ku pir hêzeke me ya astengker heye.

Di rapora me ya Weqfa Aştiyê de babeteke ku derketî pêş jî ev bû: Dema ku hûn li van heft fonksiyonan binêrin, di nav van fonksiyonan de ku hûn bibêjin kîjan fonksiyon rasterast xîtabî biryarderan dike, a rast fonksiyona navçînî û hêsankariyê. Ji van fonksiyonan re hewce dike ku rasterast bi rêxistin û dewletê re têkilî bê danîn û bi wan re bê axaftin. Lêbelê ku em li yên din binêrin, parastina hevwelatiyan, parêzvanî, ragihandina giştî, civakîbûna

nav-komî û çanda aştiyê, yekîtiya civakî ya hesas ji pevçûnê re, şopandin û hesabdayîn, di eslê xwe de berê van gelek fonksiyonan li “kolan”ê ye. Ango ji van fonksiyonan re daketina kolanê û xebata li kolanê lazim e. Di rapora me de babeta derketî pêş jî ev bû: Li Tirkiyeyê jixwe hejmareke diyar a rêxistinan bi vî karî re eleqedar dibin. Piraniya kesên ku eleqedar dibin jî, bêhtir ji biryarderan an jî ji karên eleqedarî wan hez dikin. Me di raporê de dîtibû ku karên bêqezenc, bêhtir daketina qadê û çûyîn û hatinê di demeke kurt de balê pir nakişîne lêbelê di wan qadan de, ku xîtabî dewlet û rêxistinê dikin û navçînî û hakembûn lê heye, meyl û heweseke zêde heye. Belkî em bikarin li ser wan karan rawestin ên ku rûyên xwe nedabin biryarderên siyasî, dabin civakê an jî li ser mezinkirina civata civaka sîvîl a ku berê xwe daye van karan rawestin. Rehendeke vî karî jî ev e.

Derbarê pirsa di navbera têkiliya civaka sîvîl û siyasetê de ez dikarim wek bersiv van bibêjim: A rast belkî her du bi hev re bibin. Bi ya min di her rewşê de, saziyên rasterast di tora organîk a aliyên eleqedar de dê hebin. Ser meseleyê, fonksiyona civakîbûna navkomî û çanda aştiyê vê dibêje. Di tax û koma we de hûn dikarin helwesta aştiyê xurt bikin. Ser meseleyê, SCSyek dikare rasterast di nav tevgera Kurd de cih bigire, dibe ku bi dewletê, Tirkan û hikûmetê re jî derdê wê tune be, lê ew dikare di nav civaka xwe de ji bo xeta aştiyê bi helwesteke mayînde xurt bike û li gorî wê helwest bigire. Hin SCS dikarin vî karî baştir bikin. Dibe ku ji aliyê kirina vî tiştî de SCSyeke hundirîn xwedî potansiyeleke bilind be. Jixwe pir ne mimkun e ku pêşî li vê fonksiyonê bê girtin. Dema ku ez li bûyerên wiha mêze dikim, jixwe dê rêxistinên wiha hebin. Tê nîqaşkirin gelo ew baş e an na, lê qet nebe ev sazî dikarin li gorî aştiyê pozîsyon bigirin. An jî dema ku pirsgirêka şer û pevçûnê di wê civatê de were rojevê, ew dikarin wan karan bikin ku pêşî li meseleyê bigire.

Ji bilî van SCSyan, ez difikirim ku pêdivî ye civateke civaka sîvîl hebe ku têkilî aliyan nebe lê li ser berjewendiya giştî bisekine, berjewendiya kolanê esas bigire û aqilê rexnegir li navendê bi cih bike. DÎSA, yek ji wan saziyan e ku hewl dide di vê qadê de helwestekê bigire. Lê bi fikra min, her du cure saziyên sîvîl jî dikarin derbarê aştiyê de bişixulin. Bi vê wateyê, bi ya min ne realîst e mirov hêvî bike ku hemî saziyên civaka sîvîl ji siyasetê dûr bisekinin.

Bi tevahî bûyer nayê bîra min lê hin caran heke rêbertiya bilind pir li navendê be, ji bo zemîn bi lez bê mobîlîzekirin, carinan hebûna “rêxistinên organîk” bi bandor in. Lê heke SCSyên ku bi awayê organîk bi siyasetê ve mijûl dibin û vê tercîh dikin ku helwesteke diyar negirin li gorî konjoktura neguherbar a aştiyê, piştî wextekê vediguherin aktorekî navbeynkar û guhêzkar. Gava wext hat, ew dibin navbeynkar û guhêzkarên pevçûnê.

Em li çapemeniya serdest bifikirin. Di pêvajoya aştiyê de qenc xirab çape-

meniyek çêbû ku xizmeta aştiyê kir. Dema pêvajo qediya, wekî ku tiştek neqewimîbe çapemenî dîsa vegeriya ser kewna xwe ya berê. Çima? Ji ber ku bi rastî, medya medyayeke girêdayî navendê ye. Dema ku navenda siyasî A dibêje, ew Ayê dike, gava ku dibêje B, ew Byê dike. Ew dema dibêje pevçûn, li gorî pevçûnê, dema ku dibêje aştî li gorî aştiyê helwest digire. Bi rastî, divê ev guhertin çênebin.

Hûn dikarin bibin komeleyeke AKPyê an jî hûn dikarin xeyala civakî ya AKPyê parve bikin. Ez li vir pirsgirêkeke mezin nabînim. Xwezî civaka SCSya ku têkilî partiyên siyasî nabe berfirehtir bûya. Lê belê dîsa di her şert û mercî de hûn dikarin di nava AKPyê de helwesteke aştiyê bigirin. Di hundirê xwe de, di nava civata AKP, CHP an jî HDPyê de, hûn dikarin bi sekna xwe, xeta aştiyê biparêzin. Belkî hûn bikarin ji bo aştiyê piştgirîya pozîsyon-girtina SCSyan bikin.

Lê bi ya min zêdebûna wan aktoran krîtîk e ku di her rewşê de, derveyî van, tev li partiyên siyasî nebûne; aktorên ku siyasî ne lê tev li partiyên siyasî nebûne ku ji bo feydeya giştî fealiyetan dikin.

Ji bo pirsa we ya derbarê têkiliya di navbera fonksiyonan de tiştek hate bîra min. Niha di modelên Paffenholz û Spurk de, bi rastî çêtir e ku meriv çend fonksiyonan bi hev re bike. Ser meseleyê, ew dibêjin heke fonksiyonên şopandin û hesabdayînê baş bixebitin, parastina ku vê bi kar tîne dikare bêhtir bi bandor be. Tora agahdariyeke baş û pêvajoya şopandinê ya ku vê xwedî dike, di eslê xwe de parastina giştî jî xurt dike. Ji ber vê yekê, ne cihê behsê ye ku em bibêjin ji heftan tenê yekê bikin. Dibe ku hûn ji van, çend fonksiyonan bikin. Heta agahiyên qadê di navbera van çend heban de, ji bo avakirina pirekê baştir e. Ji ber vê yekê, ez ewqasî ne bawer im ku tevlihevî, tiştekî neyînî ye. Heke ev baş bê hûnandin, belkî ne heft fonksiyon, li ser sê fonksiyonan rawestin û heke di navbera van fonksiyonan de pirek bê avakirin...

Ser meseleyê, rasterast gihandina xizmetê derî li fonksiyonên din vedike, an jî fealiyeta şopandinê piştgiriyê dide parêzvaniyê. An jî dema ku hejmara zarokên di pevçûnê de mirî bên zanîn, dema ku rapor, qad û agahiyeke ewlehî hebe, di ser vê re parêzvaniya giştî xurttir tê kirin, parêzvaniya ku bê kirin jî bandortir dibe. Vê pirê bi serê xwe saziya Ayê jî dikare ava bike, sê fonksiyonan pêk bîne û di navbera van de pirê ava bike an jî saziyên ku her fonksiyonê baş dikin, di nav xwe de torekê ava bikin.

Di pêşkêşiyê de hate gotin: Ji bo ku rêxistin di pêlên dijwar de li pêyan bimînin, divê ew xwe di nav toreke giştî de bi cih bikin. Bi rastî, saziyên civaka sîvîl, ne xwedî şansekî wisa ne ku bi serê xwe di pêleke dijwar de bijîn. Ji ber vê yekê, her ku em li ser hin karan çêtir toran deynin, li dijî pêlên dijwar

şansê me yê mayîna li pêyan zêdetir dibe. Bi kurtayî, hem ji bo çêkirina “sînerjiyê» hem jî di van demên dijwar de ji bo li hember pêla dijwar rawestin, divê ev tor bên avakirin. Divê di navbera wan saziyan de tevkarî hebe, yên ku li ser vê mijarê xebitîne.

Di vê mijarê de tabloyeke me ya pir baş heye gelo? Li Tirkiyeyê platform û torên civaka sîvîl ên baş dixebitin hene gelo? Ya rast, pir zêde tune ne. Ez ji Diyarbekirê dizanim. Dizanim ku herî kêm du civatên wê hene. Yek, SCSya civata îslamî. Di nav xwe de platformên wê hene. Ya din jî civata sekuler û platformên wê yên din. Ev der jî parçekirî ye.

Wek DÎSA, em hevdîtinên SCSyan organîze dikin. Sê mehan carekê, bi SCSyên diyar ên çalak ên Diyarbekirê re dikin bên cem hev. Esil derdê me ew e ku diyalogeke mayînde ava bikin di navbera wan saziyan de ku tevkariyê dikin di avakirina qada giştî ya Diyarbekirê de.

Lê ya rast em ne li cihekî baş in. Gava ku dezgehek di tengasiyê de be, ew tor nikare wê li pêyan bigire. Belkî li ser van fonksiyonan ev tor bê avakirin. Ser meseleyê, IHD şopandin û hesabdayînê bi rastî baş dike. Di heman demê de paşxaneyeke micid jî heye. Lê belê hewce ye ku ev bi parêzvaniyê ve bê yekkirin. Hewce ye ku aktorên xwedî xebata parêzvaniya baş bên piştgirîkirin. Tecrubeya yanzdeh welatan dibêje bi awayekî aqilane avakirina sînerjiyê, tiştekî wisa ye ku hêzê zêde dike. Ji ber vê, pêşniyaza ku em li ser karekî tenê bisekinin tune ye. Bi rastî ez dikarim bibêjim ku ev pêşniyazeke xirab e.

**Beşdar:** *Çêkirina zincîrê zehmet e.*

Wisa ye. Kerem bike, gotinê ji te re dihêlim.

**Beşdar:** *Ez pirsgirêka navçîniyê pir hêja dibînim, lê ez difikirim ku SCSyan, di vê pêvajoya aştiyê de ev fonksiyon bi cih neanîn an jî nekarîn bînin, bi ser neketin. Lewre ji bo ku mirov bikare navçîniyê bike, divê du aliyên hevcot hebin an jî divê her du alî hev du bibînin an jî qebûl bikin ku ew hene.*

*Li Tirkiyeyê di çareseriya pevçûnê de, qisma ewil, ku em dixwazin pê re navçîniyê bikin, dewlet e. Ji bo ku bi dewletê re em bikarin navçîniyê bikin divê dewlet me weke hevcotê xwe bibîne. Divê qebûl bike ku em hene an jî bizanin ku em bi awayekî hene. Lê dewlet -ji bo Tirkiyeyê dibêjim- di nav xwe de hemû heyiyên din jixwe qebûl nake an jî heyî nabîne. Loma di navbera me de têkiliyeke hevcot jî tune ye. Ji ber ku ev tune ye, navçînîkirin ji bo min hinekî wiha xuya dike: Erê, ku hebe ew ê pir hêja û xweş be. Di nav hemû teoriyên te behskirî de, yek ji serenavên sereke jî navçînî bû. Mekanîzmaya hebûna dewletê û di bingeha hebûna wê de jixwe desthilatdar, hêz heye. Ji ber ku me bi xwe re hevcot nabîne, meseleya navçîniyê bi*

*ya min -ez naxwazim tabloyeke xirab çêbikim- li Tirkiyeyê du nifş derbas bibin jî pêk nayê.*

*Ewil jî di perwerdeyên ragihandina bêtundî de xala ku ez tê de asê dimam ev bû. Ji ber ku hûn dikarin di navbera mirovan de navçîniyê bikin. Hûn dikarin di navbera kesan an jî civakan de navçîniyê saz bikin. Ji ber ku di bingehê de her du alî vedigerin û vê dibêjin: "Ez dixwazim em li hev bên an jî ez dixwazim rûnim û li ser vê mijarê biaxivim, ji ber ku ez dixwazim dengê min bê sehkirin." Lê pirsgirêka me li vir bi dewletê re ye, gelo dewlet dixwaze me bibihîze an li hev were? Dema ku ez dibêjim em, qala yên din an jî komên din, komên dijber dikim. Ma herî kêm ew qebûl dike ku em hene? Beriya her tiştî, hewce ye ku em carekê li ser vê biaxivin.*

Ez yek bi yek wek vê çarçoveyê nafikirim. Navçîniyeke tenê bi awayê te behskirî tune ye. Ser meseleyê, Nimet F. Beriker li ser çareseriya pevçûn û navçîniyê xebitiye, di xebateke xwe ya li ser navçîniyê de qala 24 cure modelên navçîniyê dike. Ya ku tu qal dikiyê, dibêjim qey wek navçîniya di rola hekeman de ye.

**Beşdar:** *Ya rast, qet wisa nîne.*

Em li mînaka Îrlandayê binêrin. Li Îrlandayê bi rastî helwesteke wiha ya wekheviyê tune ye, lê di serdema pevçûnên pir dijwar de, ser meseleyê em dibînin ku keşîş bi dayîna agahiyê ji bo aliyan tevkariyê li aştiyê dikin. Ji ber vê yekê tenê modeleke navçîniyê tune ye. Weke ez fam dikim, tu behsa wê modelê dikî ku ji bo her du aliyan girêker be lê dibe ku rola civaka sîvîl di vê mijarê de ne ev tenê be. Ya ku tu behs dikî, yek ji wan modelên navçîniyê ye. Ez vê red nakim. Ev cure navçînî zehmet e bibe. Lê li gel vê, modelên din ên navçîniyê jî hene. Carinan dibe ku tenê herikîna agahiyê hebe. Hin caran alî nikarin bi eşkereyî di qada giştî de biaxivin, derdor pir tund dibe. Mînak, li Îrlandaya Bakur, ev tişt pir çêbû. Dibe ku ev ew fonksiyon jî bin ku veguhestina agahiyan di navbera aliyan de çêdikin.

**Beşdar:** *Ez meseleya hakemtiyê jî pir bi kar nayînim. Çima, ji ber ku qadeke din a desthilatdariyê diafirîne. Ango ev tê wateya, ew kesên ku biryar didin, rêzikan datînin û piştrast dikin ku ew rêzik têne kontrolkirin. Ew jî bi rastî di hundirê xwe de hêzeke din diafirîne. Ji ber vê, ya ku ez qala wê dikim di rastiyê de ne hakemtî ye. Ger wisa hatibe famkirin, ez dixwazim wê rast bikim. Ji ber ku ew diguhere û dibe mekanîzmayeke din a hêzê. Ji bo performanseke wisa çêbibe ku meseleya navçîniyê rast bi rê ve bibe û bi tevahî ji aliyan re bêalî û wekhev bisekine, ya rast divê rizaya her du aliyan jî hebe an jî xwedî niyet bin, ez behsa vê dikim.*

Li Îrlandayê, mirovên ku bikarin bandorê li ser aliyê dijber bikin, rêzdar bin tên tercîhkirin. Ango kesên ku nêzîkî aliyekî pevçûnê ne, carinan dikarin wekî navçînî rol bigirin. Lê belê weke min gotî, mijara navçîniyê bi vê re sînordar nîne. Nimet Xoce, behsa 24 cure modelên navçîniyê di bingeha avakirin û pêvajoyê de dike. Ji nav van xala herî cuda ew model in ku Neteweyên Yekbûyî hêzeke leşkerî dişîne, hêzeke aştiyê dişîne û midaxale dike. Lê di heman demê de modelên navçîniyê jî hene ku tenê veguhestina agahiyên di navbera aliyan de hêsan dikin û weke din hêz û roleke wan tune ye.

**Beşdar:** *Ez difikirim ku di meseleya navçîniyê de reşbînî -ji ber ku tiştên li Tirkiyeyê û li Rojhilata Navîn qewimîne- êdî ne mimkun e. Ser meseleyê, di dema Pêvajoya Çareseriyê ya 2013-2015an de, rewşeke wisa hate afirandin ku di carekê de atmosfereke aştiyê çêbû. Hin heyet hatin damezrandin û hevdîtin pêk hatin. Di rastiyê de, gava ku ev zemîn bê avakirin û hin gav bên avêtin, ev tiştên diqewimin pir jixweber û xwezayî ne. Ev ne tiştên ewqasî nemimkun in. Li Sûriyeyê ji sala 2011an vir ve pevçûn heye. Li Tirkiyeyê, pirsgirêkên pir giran û tevliheviyên siyasî hene. Li cîhanê pêvajoyeke pir nakok û pevçûneke siyasî heye. Bi rastî, êdî hêza Rojhilata Navîn û dinyayê tune ye ku vî barî hilgire. Ez difikirim ku ev êdî ne pir zehmet in û bi avêtina hin gavan dibe ku hin tişt çêbibin. Divê mirov vê jî bifikire, a rast meseleya ku li vir bê çareserkirin, mekanîzmayên bi vî rengî ne an zihniyeta dewletekê ye? Îro pêvajoyeke aştiyê jî hebe, divê neyê jibîrkirin ku li hemberî we zihniyeta dewletê heye. Dibe ku ev di pêvajoya çareseriya berî niha de kêmasiya me ya herî mezin bû. Li vir me pêbaweriyeke bêdawî anî û me hin tiştan bi îtimadeke bêsînor pêk anîn. Divê ku em ji vê perspektîfê lê mêze bikin.*

Di zanista siyasî de pirseke bi rengê, “Hêza dewletê ji ku tê?» heye. “Hêza dewletê girêdayî çi ye, çavkaniyên hêza wê çi ne?” pirseke mezin a bi vî rengî heye. Teoriyên pevçûnê, ku ez jî piçekî nêzîkî fikra wan im, vê dibêjin: Kotek û riza. Gramsci, vê bi têgehên hegemonya û hêzê şirove dike. Althusser, bi kategoriya amûrên îdeolojîk û zordestiyê ya dewletê analîz dike. Michael Mann jî dibêje, hêza binesaziya dewletê û hêza despotîk a dewletê. Ya rast, ev hemû têgînkirin balê dikêşin ser du hêzan: kotek û riza.

Esas, qesta min a ji kotekê, tundî ye; ango zorî ye. Dewlet bi zext û tundiyê rizaya civakê digire. Polîs, leşker, dadgeh, girtîgeh di eslê xwe de amûrên zoriya dewletê ne.

Çavkaniya hêza duyem jî riza ye. Dewlet we qaneh dike, dil û mêjiyê we bi dest dixe. Michael Mann dibêje hemû formasyonên dewletê ji kombînasyonên cuda yên kotek û rizayê pêk tên. Jixwe, ew li şûna kotekê hêza despotîk, li şûna rizayê têgeha hêza binesaziyê bi kar tîne. Li gorî Mann, ev

hevkêşeyek e ku yekûna wê yek e. Dema kotek zêde dibe, riza kêm dibe, dema ku riza zêde dibe, kotek kêm dibe.

Îtîrazeke ramangêrê Fransî, Pierre Bourdieu heye. Ew dibêje di rastiyê de, di nav tundiyê de riza heye. Gava ku dewlet tundiyê bi kar tîne, heke komek ku destûrê bidê tune be, dewlet nikare wê tundiyê bi kar bîne. Ji ber vê, esasa dewletê riza ye. Dewlet bi rastî, qasî ku ji bingeha civakî rizayê hilbere, dikare bişixule.

Dema ku em xwe li vê bingehê bigirin -bi nîqaşa heyî re têkildar bikim- heke "rizaya civakî ya ji bo aştiyê" neyê hilberandin, aktorên alîgirê pevçûnê dê di rêya xwe de bimeşin. Reva ji vê tune ye. Bi ya min di vir de hemû mesele ew e ku civaka sîvîl zêdetirî ku bi navçînî, dewlet û rêxistinê re mijûl bibe, di qada civakî de li ser aştiyê -aştiya ku ez behs dikim ne tenê aştiya nayînî ye, weke kêmtirîn ew e lêbelê jê wê de belkî aştiya erênî ye- bikare rizaya civakî hilbere. Civaka sîvîl li ser aştiyê, rizayê çawa hildibere? Ev fonksiyona sereke ya civaka sîvîl e: li qadê. Bi rastî, heke em vê rizayê hilneberin, şanseke aştiyê ya mayînde tune ye. Ev ne pir hêsan e. Îhtimal e ku avakirina aştiyê çend nifş bidome. Aştiya neyînî dibe ku piçekî zû bibe. Di çarçoveyeke siyasî de lihevkirinek dibe ku pêk were. Ez difikirim ku meseleya bingehîn a civaka sîvîl jî ev e ku divê bala xwe bidin hilberîna vê rizayê. Berê me pir ne li vê ye. Ango heke ev riza li Enqereyê bê hilberandin, ev kar ewqas hêsan nayên kirin.

Ez mînaka qeyûm bidim, mînakeke cuda ye. Bi rastî, heke di civakê de rizayeke berbelav tune bûya; li Edîrne, Stenbol, Îzmîr û heta li Diyarbekirê -li vir jî heta radeyekê û di nav komên diyar de riza heye- qeyûm evqasî hêsan nedihat teyînkirin. Rizayek ji binî ve heye. Û gelek amûrên vê rizayê jî hene.

Di aştiya me de ev mekanîzmaya rizayê çawa dixebite? Li ser şer û pevçûnan, li ser înkara mafên Kurdan rizayeke berbelav heye. Li dijî vê rizayê rizayeke din çawa tê çêkirin? Bi fikra min, li ser wekhevî, heq, hiqûq û newekheviyê bi qasî ku em rizayekî biafirînin, ev mesele dê ewqasî vegere ser aştiyê.

Ya rast tiştê ku em nikarin piçekî di civaka sîvîl de bikin ev e. Em pir zêde li ser hilberîna vê rizayê nafikirin an jî çavkaniyên xwe û enerjiya xwe li vir xerc dikin. Karên wekî navçîniyê ji gelek saziyên berbiçav re balkêştir dixuyin. Karên ku bi desthilatdarî û hêzê ve eleqedar in balkêştir tên. Ser meseleyê, çîrokeke neyînî ya bîst salî ya keseke mexdûr ji bo ku veguherînin çîrokeke erênî, karên ku hûr bi hûr tên kirin bi rastî mirovan pir motîve nakin. Em pir zêde enerjiyê serf nakin. Ez dikarim vê ji bo gelek mînakan bibêjim. Ev ne tenê ji bo civaka sîvîl e jî. Hûn dikarin saziya siyasî, çapemenî û zanîngehê jî tev lê bikin. Lê bi rastî, ez difikirim ku mesele -her çend dubare bibe jî- a rast di civakê de ji bo aştiya erênî meseleyeke hilberîna rizayê ye û hewce

ye ku piçekî balê bikişînin ser vir. Bi rastî derbarê vê de, li gel hemû mekanîzmayên zordest ên dewletê, gelek kar hene bên kirin ango tiştên ku me nekirine, me kêm hiştine.

**Beşdar:** *Zehmet e ku mirov bi perspektîfeke wiha dest pê bike. Ji bo ku mirov berê xwe bide civakê -a rast ev e- ango herî kêm di wateyeke Ewropayî de, em behsa wê Ewropayê bikin ku civaka sîvîl di bingeha hiqûqî de hatiye avakirin. An jî ez qala kevneşopiya civakê dikim ku dema hîn dewlet geş nebûbû û civakîbûn meqbûl bû. Helwesta civaka sîvîl bi rastî tengkirina qada dewletê ye û civaka sîvîl dixwaze ku civak bikare hemû pêdiviyên xwe bi serê xwe pêk bîne. Ji ber vê, li dijî dewletê her tim di nav têkoşîneke parastinê de be. Di vê wateyê de, perspektîf hene ku partiyên siyasî, sendîka, mezheb, ango hema hema hemî rêxistinên ku xwediyê hêza dewletê nînin, wekî civaka sîvîl rave dikin. Ez jî piçekî nêzîkî perspektîfeke wiha me. Zivirandina berê xwe li civakê niha fealiyeteke siyasî ye. Avakirina aştiyeke civakî ya bi vî rengî, tê wateya damezrandina tevgereke civakî ku partiyên siyasî jî berê xwe bizîvirînin gel. Bi ya min, di vê wateyê sedema me ya zivirandina berê xwe li xebatên rizayê jî ji ber vê ye. Ango di van tevgeran de, ku çêbûne û çêdibin, wêrekî û biryardariya ku rîska vê hilbigire tune ye. Wekî ku min li vir gotî, ji bo ku em di serî de bi cih bibin, divê em tercîhekê bikin. Mesele ev e ku meriv rizaya berê wê li civakê bi awayekî misoger di mijara aştiyê de pêk bîne. Lê ev fealiyeteke siyasî ye. Heke em zehmetî û valahiyên hiqûqî yên ji heqê vê derkeve bidin aliyekî...*

Kes heye ku dixwaze bipeyive? Heke tune be belkî bikarim li ser bûyereke ji heyama dawî bersivekê bidim.

**Beşdar:** *Ji bilî bersivê, vê bibêjim. Ez dixwazim qala vê bikim. Beriya ku bêm vir siwarî taksiyê bûm. Şofêr beg pirsî, got, "Diçî ku?" Min jî got, "Diçim DÎSAyê." Got, "Xêr e?" Got, "Hay ji xwe hebe, ev pêvajoya niha ne xweş e," filan bêvan. Di her du civakan de jî -em bibêjin tirs gelo- li ser pêvajoyê nêrîneke îllegal heye. Ev polîtîkayeke hezimkirinê ye yan jî dibe ku mirov cudatir li ser hûr bibe, nizanim.*

Niha ez mînakeke cudatir bidim. Rojekê me bi hevalan re li ser cudahiya çînî ya di nav Kurdan de nîqaş dikir; ango li ser xizan û dewlemendan. Herî dawî hevalekî got: "Birêz Cuma, tiştê ku tu dibêjî siyaset, meseleya pevçûnê ye. Ger li Diyarbekirê îtirazeke xizanan ji tiştên qewimî re hebe ew ê pev biçin. Bê pevçûn şansê wan tune ye ku mafên xwe bi dest bixin." Terz, rê û navgînên pevçûnê hene, wê pir nizanim. Lê nêzîkatiya ku ez di siyasetê de li ser disekinim ev e. Rêxistinên civaka sîvîl aktorên siyasî ne. Lê ez vê siyasetê ne weke siyaseta partiyên bilind, weke siyaseta nizm fam dikim. Em jê re bibêjin siyaseta nizm an mîkro-siyaset an jî siyaseta mîkro ya bi perspektîfek

makro, ez nizanim. Di radeya dawî de, pênaseya ku ez di “siyasetê” de li ser disekinim ev e, di eslê xwe de reqabeta komên ku xwedî berjewendiyên civakî yên cuda ne. Divê hewil bên dayîn.

Heke teoriya hilbijartina rasyonel bê bîra we, xala ku ez lê disekinim ev e; ev kar bi rastî, di jiyana rojane de bi neyînî û erênî çiqas ji we bigire ewqas we digire nava xwe. Jixwe siyaset qadeke wiha ye. Bi rastî di konteksteke weke Tirkiyeyê de, qadek e ku hin caran hewce dike berdêlên giran bên dayîn. Li Tirkiyeyê bi ya min li ser aştiyê, pirsgirêkeke vekişîna aktoran ji bo berdêldayînê tune ye. Ser meseleyê, heke hûn ji konteksta Kurdan bifikirin, gelek berdêl hatine dayîn. Ez nafikirim ku ji ber dayîna berdêlê, rewşa xwevekişandina ji wê hebe. Heta çavkaniyeke mirovî ya xurt, ked û mobîlîzasyoneke mezin a Kurdan heye. Heke hûn bi gelek bûyeran re bidin ber hev, kedeke mezintirîn heye. Ez bawer nakim ku mirov ji ber vê xwe jê dûr bigirin.

Min di panelekê de bihîstibû, heke em di bûyerên wiha de, vê bînin bîra mirovan, dibe ku ev şixul çêbibe: Ji bilî çîroka dirêj a rabirdûyê an jî ji hêviya pir dûr a dahatûyê, di demeke nêz de, a ku bê çi ye? Ango em ku nekin, em ê çi wenda bikin? Divê mirov vê hîs bikin, heke em bixwazin li ser vî karî hin tiştan bikin. Belkî ne ku ya bê, ya ku “tê” divê bê dîtin. Bûyerên bi vî rengî piçek wiha ne. Heke ku em nekin, tiştên ku em ê wenda bikin çi ne? Yek, em çiqasî meseleyê wiha bihûnin an jî çiqasî ji mirovan re ji nû ve çarçove bikin, şansê me heye ku em li ser aştiyê ewqasî rê biçin. Dudu, ku em pêşî lê bigirin, dê çi bi destê me bikeve? Ez vê tenê ji aliyê maddî ve nabêjim, ji aliyê maddî û sembolîk ve dibêjim. Bi ya min di nav Kurdan de pirsgirêka mobîlîzasyonê tune ye. Mesele, meseleyeke din e.

Dema ku min teoriya hilbijartina rasyonel bi bîra we xist, min xwest bala we bikişînim ser vê xisûsê. Wek normekê, aştî tiştekî xweş e, divê em vê ji mirovan re vebêjin. Lê ji aliyekî din ve jî, weke hilbijartineke rasyonel, pêdiviya me bi aştiyê heye ku em wenda nekin û em van bi dest bixin.

Em çawa dikarin pirsgirêkê bi vî rengî saz bikin û amûra vê çi ye? Dîsa, ez dikarim çend daneyên min ji qadê wergirtî bibêjim. Niha di meseleya Kurdan de, gelek meseleyên makro hene. Em nikarin van mijarên makro vegerînin ser pîvana mîkro. Gelo gava ku em nekevin meseleyên di nav makroyê de, em di mikroyê de çi wenda dikin, çi nikarin bi dest bixin? Ez mînak bidim. Ser meseleyê, em pir qala xweseriyê dikin û nikarin gavekê biavêjin. Lewre, heke hûn bizanin meseleya xweseriyê di pîvana mîkro de çawa bandorê li jiyanê dike... Ser meseleyê, heke Îzmîr û Stenbol bibin xweser çi dibe, ez diçim ser nimûneyeke girantir – heke Diyarbekir bibe xweser çi dibe? Heke gelê Diyarbekirê % 80 çavkaniyên Diyarbekirê bi rê ve bibin, jiyana rojane ya Diyarbekirê, Îzmîrê dê çawa biguhere? An jî em berevajiya vê bifikirin, heke nebe çi dibe?

Mesela, ez dikarim mînaka çopa Bêlecûkê bidim. Li gorî zagonan, şaredariya navçeyê çopan berhev dike û şaredariya mezin jî wan digire û berteref dike. Bêlecûk, bi ser Rihayê ve ye, 110 km dûrî navendê ye. Hûn wê çopê ji wir hildidin, 110 km tînin navendê û berteref dikin. Lê 30 kîlomêtre dûrî Bêlecûkê, Nizîpa girêdayî Dîlokê heye. Li Nizîpê qada depoyeke çopê ya birêkûpêk heye. Ser meseleyê heke Bêlecûk çopê li şûna Rihayê bibe Nizîpê, dê mesref çaryekek kêm bibe. Zêdetir, ji bo ku ji çopên li Nizîpê ceyran were çêkirin, divê çopa rojane herî kêm 400 ton be. Çopa Nizîpê bi serê xwe têra vê nake, lê heke çopa Bêlecûkê jî biçe wir, ew ji 400 tonî derbas dibe û derfeta ceyran-çêkirinê bi dest dikeve. Bêlecûk dewam dike û çopên xwe tîne Rihayê, rojê 110 km rê diçe. Ji ber ku, ji hêla îdarî ve, Dîlok li cihekî din e û Riha li cihekî din e. Avahiya îdarî ya Tirkiyeyê ya yek-tîp û bendeyê navendê, nahêle ku hevkariyên bi vî rengî çêbibin.

Ez mînakeke duyem bidim. Hevalekî me ji Herêma Egeyê behsa çemekî kir. Çem, ji bajarekî derbasî bajarekî din dibe û li bajarê sêyem qirêjiyê çêdike, lê çavkaniya qirêjiyê fealiyetên avdaniyê yên li bajarê din in. Heta ku hûn pirsgirêka derdor-avê nekaribin li ser sê bajaran tev de bi rê ve bibin, şansê we tune ye ku hûn serederî li meseleyê bikin.

Niha em di çarçoveya meseleya Kurd, pevçûn û çekan de xweseriyê diaxivin. Ango ji wir wê de dê çi bibe, ger xweserî hebe jiyan dê çawa biguhere? Belkî rehendeke vî karî ev e.

Li ser vê wêrekî û biryardariyê ez vê jî bibêjim. Derbarê vê meseleyê de, bi fikra min du tişt girîng in: Hêvî û baweriya bi aktorên kolektîf. Ger hêviyeke we hebe, hûn ê bişixulin. Ez îro li vir im ji ber ku hêviya min heye. Ez dikarim dawiya hefteyê, şemiyê li malê rûnim û bi keça xwe û jina xwe re taştêyê bixwim. Lê pirsgirêkeke min heye û ji bo çareseriyê hêviya min heye. Min hîn ev hêvî wenda nekiriye. Divê hêviya we hebe. Aktorên civaka sîvîl an jî di derdoreke berfirehtir de, aktorên siyasî jî di nav de, divê hemû aktor hêviya xwe zindî bihêlin an jî tiştên ku vê hêviyê têk dibin divê neyên kirin. Civaka sîvîl çiqas bikare hêviya li ser guhertinê zindî bihêle, dê mirov ewqasî bên mobîlîzekirin.

Ya duyem, her kes bi sînorên xwe dizane. Ya ku ez dikarim bikim weke şexsekî, pir kêm e. Lê wekî DÎSAyê, piçekî firehtir e. Wekî civaka sîvîl a Diyarbekirê piçekî mezintir e, an jî wekî beşek ji îtîraza Kurdan, pir mezintir e. Bi heman rengî, weke parçeyekî tevgera demokrasiyê ya li Tirkiyeyê jî. Hewce ye hûn bi pêvajoyên çalakiya kolektîf a van aktorên kolektîf ewle bibin.

Ji ber vê yekê, bi ya min heke hemî aktorên sîvîl bi qasî ku bikarin van her duyan, hêvî û pêbaweriyê, ava bikin an jî ya avakirinê biparêzin, dikarin

bi pêş ve biçin. Carinan ew tiştê ku ava kiriye jî hildiweşîne. Car caran hûn hêviyê têk dibin, herçend ku hûn vê naxwazin jî an jî hûn dikarin baweriyê bişikînin. Em neçar in ku baweriyê bi wan aktorên kolektîf bînin ku em pêkhateyên wan in, û em neçar in karên hêvîbexş bikin.

Beriya her tiştî siyaset, avakirina jiyana me ya rojane ye. Qet nebe ez wiha lê dinêrim. Em jiyana xwe ava dikin. Li gorî min siyaset, ji bo kesên din û nifşên bê naşixule. Siyaset, derbarê îro de, avakirina îro, jiyana îro, başbûna îro, başkirina derdorê an jî ji bo mirov bibe pêkhateya derdoreke baş, meseleya bicihbûnê ye. Divê ev ji bo nifşekî din, weke şixulekî ji bo pêncî sal paşê, weke xeyalekê neyê kodkirin.

Hûn ji vir lê binêrin, ez ne pir reşbîn im. Tiştekî din jî, jixwe em li bajarekî baş, li Diyarbekirê dijîn. Tevî vê hemû çîrokê, ez xwe ewle hîs dikim. Ez endamê vê civatê, Diyarbekirê, me. Ez bi rastî vê ji bo ajîtekirinê nabêjim. Tevî hemû çîrokên xirab ên ku me di van çend salên dawî de jiyane, Diyarbekir bajarek e ku ez xwe lê ewle hîs dikim. Ango sê sal berê, li vir qiyamet çêbû. Me hemûyan dît ku li Sûrê çi qewimî. Lê ez li vir, tevî van hemû tiştan xwe ewletir hîs dikim. Em di vî warî de piçekî bi şans in. Li bajarê ku em tê de ne, bawerî, hevkarî û tevlêbûna mirovan a kolektîf û civakîbûnê her çiqas hin derb xwaribin û bi paş de kişiyabe jî, tevî her tiştî ev bajar li cihekî baş e. Heke hûn dixwazin em li vir biqedînin.

BEŞA DUYEM

# CIVAKÎBÛNA NAVKOMÎ Û ÇANDA AŞTIYÊ: AZMÛNA KOMELEYA RAGIHANDINA BÊTUNDÎ

*Vivet Alevi*

"Çima ragihandina bêtundî?" Ez di dixwazim vê pirsê ji biyografiya xwe bi çend mînakan bibersivînim. Di zimanê latînî de wateya navê min "jiyan, jindar " e. Ez ji nifşê dawîn ê cihûyan im ku navê xwe bi xwe li xwe datanîn. Nifşê piştî me, navên Tirkî lê kirin. Kesekî bi awayekî aşkere zordarî li me nekir lê ji bo cihû zarokên xwe biparêzin ev bi dildarî dikirin. Perla bûn INCI, Yasef bûn Yusuf. Ser meseleyê merivekî me –ku hûn ji min bipirsin navekî xwe yê pir xweş hebû- dema li fabrîqeyekê dest bi endezyariyê kir, serî li mehkemeyê da û navekî Tirkî li xwe danî. Demeke dirêj hînî navê wî nebûm. Li vî welatî antîsemîtîzm wek rastiyeke nebinavkirî hat serê min.

Tevî vê yekê, di çîneke navîn a kêmaran de heta hûn bêjin apolîtîk mezin bûm. Niha jî nifşekî super-apolîtîk ê mîna min a wextekê radibe ku pevgirêdanên li Tirkiyeyê, heq û azadiyan nas nake, fam nake, meraq nake, hewl nade ku ji van tiştan haydar bibe, bertekekê nîşan nade li hember tundiyê.

Bi navê Berava Suadiyeyê deverek hebû li Stenbolê, di ber re rê nediçû. Beraveke ku niha tune ye. Di sala 1974an de li wê beravê, me li aliyekî xwe dabû ber tavê û li aliyekî me rojnameyên xwe dixwendin. Ecevît bi ser ketibû di hilbijartinan de. Efûyeke giştî hatiye ragihandin, yên ku 12 Adarê hatibûn girtin hatine berdan û hema dest bi nivîsandin û nîqaşê kirine. Ez jî wan deman ciwan im jixwe. Derdor tevgeriya ez jî bi wan re tevgeriyam.

Wan salan li Almanyayê xwendekar im, diçim û têm. Li Tirkiyeyê tevgerîna civakî bi lez e. Ez hê tê negêhiştim ka çi çi ye, rewşa awarte hat ragihandin. Min jî li Almanyayê bi metirsiyên derbarê welatê xwe de, bi helwesta ka ez dikarim çi bikim diçûm komeleyên karker û koçberan. Bi vî awayî min gelê Tirkiyeyê li van komeleyan nas kir. Ji ber ku ez li Nişantaşi û Şişliya Stenbolê mezin bûbûm. Min di sala 1978an de dibistan qedand û vegeriyam. Û dem zû derbas bû. Tirkiye bû şahidê tunebûna nifşekî ku destê wan bi qelemê digirt, nifşekî difikirî û metirisyên wan ên civakî heyî. Wek fizîkî, wek ehlaqî, wek hestiyarî ew tune kirin. Ên dîn nebûn yên ku karîn ji xwe re karekî bibînin li ser pêyan man. Lê axir rewşenbîr, em dikarin jê re bibêjin nifşekî akademik, tune kirin. Min jî para ji salên 80î wergirt, wek hatî ji nû ve vegeriyam

Almanyayê û di sala ‘87an de dema rêvebiriya leşkerî derbasî rêvebiriya sivil bû, dîsa vegeriyam welêt.

Dixwazim mînakekê bidim. Min akademîsyenek nas kir ku li ser ragihandina bêtundî dixebitî. Li Zanîngeha Hacettepeyê, di Fakulteya Zanistên Aborî û Îdarî de li ser mijarên aştiyê û çareseriya pevçûnan xebatên akademîk dikirin. Dema em axivîn, got, “Te beşa zanistên siyasî xwendiye, doktoraya xwe kiriye. Tevî ku li Tirkiyeyê, Zanistên Siyasî keleha hînbûna fikirîna civakî ye, çawa çê dibe? Dema min got we dersên mafên mirovan wernegirtin,” ez şaş mam wexta got, “Li zanîngehê tenê Server Tanilli dida, ew jî derseke hilbijêr bû.” Ango li Tirkiyeyê nifşê piştî 1980yî, li zanîngehê bêyî ku dersên derbarê mafên mirovan de wergirin, beşa zanistên siyasî diqedandin. Pişt re di nava beşdaran de jî rastî hin kesan hatim ku beşa zanistên siyasî xwendine lê dersên mafên mirovan wernegirtine.

Ez çima van vedibêjim? Piştî 1980yî nifşê rewşenbîr hemû tên tunekirin. Nifşê piştî wê, ango ew nifşê ku heta niha tev li perwerdehiyên ragihandina bêtundî bûne, eleqeya xwe bi tiştekî bi kesekî nayînin, ji ber tirs û metirsiyê. Ez lê dinêrim aqil feraset li şûnê ye, li ser xwe ye, wek mirov heqeten hêja ye lê hişmendiya civakî tenê bi alîkariyên civakî sînordar e.

Qala tiştên wiha dikin ser meseleyê; zarokên ku piştî salên 1980yî çûne zanîngehê, malbatên wan ew temî kirine “eman ji siyasetê dûr be, tê xwe bişewitînî.” Jixwe re lê binêrin, ew nifşê ku vî welatî bi rê ve bibin, bixwînin, binivîsin, yên ku dinyayê fam bikin û li ser qewîminan bifikirin, bi vî awayî diçin zanîngehan. Divê em vê fam bikin êdî; çima li Tirkiyeyê, em bibêjin ji Enqereyê ber bi rojavayê Tirkiyeyê, apolîtîkiyeke ecêb heye?

Dîsa vedigerim ser meseleya xwe. Ez bi awayekî din hejiyam. Me qala wî nifşê “şoreşger” ê têkoşer dikir ku dê dinyayê biguherînin. Dema bêyî darazî li wan dinêrim ku di girtîgehan de ewqas zext û zordarî dîtine, piştî ewqas tehdeyê ji girtîgehan derketine; yê aqilê xwe ji dest xwe bernedayî, dîn nebûyî, an jî nexweş neketî –ji ber ku ez yên ku dîn bûne nas dikim, yên ku bi nexweşiyên mîna şîzofreniyê ketî, ser meseleyê bav îşkenceyeke giran derbas kiriye, lê xistine, paşê şîzofrenî lê peyda bûye û paşê mal terorîze kiriye- ew “rêhevalên” berê dema tev li jiyana rojane bûne –mesela îro gelek ji wan xwediyê şîrketên mezin in- niha bi pergal û polîtîkayên îroyîn re li hev in û jiyana xwe wisa didomînin. Yên ji herêmên we, ango hevalên ji vir, ji vê derdorê, bi têkiliyên xwe yên feodal rêhevalên xwe yên berê niha ji xwe re kirine emele.

Heke armanc ne hema darizandin û derketina ji navê be, ev pirs li meriv peyda dibe: Ew mêrxas û jinxasên ji ber armanca xwe ya gewre canê xwe

didin, ewqas tehdeyan didin ber çavên xwe, çawa qayîl dibin bibin parçeyekî pergala ku berê li dijî wê bûn? Vê pirsê pir zêde serê min êşand.

Ewqas hêvîşikestî bûm ku min di dilê xwe digot, “dema du kes tên ba hev xetereyê diafirînin; hêz, serdestî û tundî, wekî din tiştekî naafirînin” û ji qada civakî vekişiyam nava malbata xwe, min zarok anîn dinyayê, bûm bermalî. Heqeten ew jî tecrûbeyeke girîng e. Dema meriv bi meseleyên mezin re mijûl dibe meriv jiyanê bixwe ji bîr dike. Çalakiya çalakgiran ji serê sibehê heya nîvê şevê tevgerîn e. Ango têkiliya meriv bi kesên “normal” re qut dibe. Paşê meriv xwe wek insanekî raser, di ser însanên din re dihesibîne ango pê dixape. Xetereyeke wê ya wiha heye.

Li Berlînê him xwendekar bûm, him jî penaber, paşê jî bûm koçber. Ango li derveyî welêt min statûyên cihêwaz azimandin. Di dema penaberiya xwe de min zanistên siyasî xwend. Zanîngeha Azad a Berlînê saziyeke wiha bû ku gelek profesorên navdar di warê zanistên siyasî de ders didan. Bi xêra vê, min fersend bi dest xist ku li ser tecrûbeyên xwe yên berê bifikirim û fam bikim.

Di sala 1987an de dema li Tirkiyeyê sêla siyasetê dîsa sor bû, min dît wekî karîkatura ya berê, rabirdû dîsa xwe dubare dike. Çawa karîkatûra ya berê, ma qey fêrî tiştekî nebûbûn? Ew koma bîreweran, ku wek rewşenbîrên welêt dihatin hesibandin, hat tunekirin û tu dersek ji vê dernexistin. Dema du kes hatin cem hev, min got jixwe bi xetere ye û vekişiyam mala xwe.

Mebesta min a qalkirina ewqasî bi hûrgilî ya van tiştan ew e ku bingehekê ji “ragihandina bêtundî” re amade bikim. Ji ber ku dixwazim em bi hev re li ser bifikirin bê ka çi xêra ragihandina bêtundî gihiştiye pirsgirêkên herêmê.

Wexta min destê xwe ji heyatê şûştî û zarok mezin dikirin, wexta min û bavê zarokê xwe li hev nedikir, rastî ragihandina bêtundî hatim. Bi xwe Alman e. Min hevoka “nijada lihevnekirinan tune ye” wê çaxê keşif kir. Tu nabêjî entelektuelekî Alman jî dikare tundiyê li jinê bike. Hat asteke wiha ku wek malbat –malbat dibêjim dê û bavê wî zarokî- em ê çawa jiyana xwe bidomînin, min şopa bersiva vê pirsê ajot. Min ragihandina bêtundî berê jî bihîstibû lê pêdiviya min hê nû pê çêdibû.

Min pirtûka *Ragihandina Bêtundî, Zimanekî Jiyanê* kirî. Ez ê hînî rêbazê bibûma û min ê têkiliya ku bi bavê zarokê xwe re qut kirî ji nû ve saz bikira. Min pirtûk di bîskekê de qedand û got “di vir de gencîneyek heye” di dilê xwe de. Di heman demê de min got “heke ez bi ser bikevim ez ê biwêrim bi însanan re careke din têkevim têkiliyê.” Çer ku pirtûk qediya, min hêz da xwe û çûm cem navçînekî. Serpêhatiya min û ragihandina bêtundî bi vî awayî dest pê kir.

Min dest bi pêkanîna metodên xwe kir. Her çiqas min bi awayekî mekanîk pêk dianî jî bi kêr dihat, di danîna têkiliyan de bi ser diketim. Di vê de tiştek heye, min got. Bi min wisa hat ku ev metod ne tenê jiyana min a rojane lê wê bi kêrî hevdîtina civakî jî were ku ji mêj ve kula dilê min bû. Heke bikarin bi vî awayî têkiliyan bi hev re deynin, di nava însanan de aştî dê pêkantir be.

Binêrin wexta diêjim aştî, qala çareseriyên mezin, projeyên mezin nakim, qala gav-avêtinê dikim. Bila mirov bi hev re dest bi axaftinê bikin. Ev têgeh wê derfetê dide me, wê rêyê dide pêşiya me ku kesên bîr û baweriyên cihê, nijad û neteweyên cihê bi cihêwaziyên xwe werin ba hev û li hevûdu guhdar bikin. Marshall B. Rosenberg ku xwediyê teoriya ragihandina bêtundî ye, bi navê *Dilê Veguherîna Civakê* pirtûkeke xwe heye. Em ê hewl bidin ku wê wergerînin.

Tim ez axivîm we guhdar kir. Ji kerema xwe dema we nekarî êdî li min guhdar bikin bipirsin, biaxivin. Em bi vî awayî pê de biçin.

**Beşdar:** *Di serî de dixwazim spasiya we bikim ji bo van agahiyan. Kêrhatî bûn lê tiştekî bala min kişand. We pirsên rast pirsîne. Ez di wê baweriyê de me ku pirsên rast tim girîng in. We got min pirs kirin, ev çawa çêbû?*

Ku min qîma xwe tenê bi pirsan bianiya, min ê bigota, “Xwedê wan çi neke, tiştek ji van afirîdeyên ku em jê re dibêjin însan dernakeve.” Lê wê bîskê ez vekişiyam quncikê xwe. Çûm zanîngehê. Min rexneya îdeolojiyan, dîroka ol û mirovahiyê, rexneya femînîzmê û filan xwend.

Marshall jî pirs kirine. Sala 2015an, di 80 saliya xwe de mir. Ez axaftina xwe ya aşkere û zelal deyndarî mirovahiya wî ya saf im. Dema we pirtûk xwend hûn ê bibînin. Bi xwe cihû ye, di salên 1940î de ji Amerîkayê bar dike Detroitê. Detroit bajarekî Amerîkayê ye ku li wir karker pir zêde ne, hema bibêje bajarekî karkeran e. Ford li wir e... Dema di temenekî zarok de koçî Detroitê dike piştî koçkirinê hema roja duduyan pevçûnên nijadî dest pê dikin. Sê rojan nikarin ji malê derkevin û di wî temenê xwe yê zarok de dibe şahidê mirina çil kesî. Pişt re dema dest bi dibistanê dike, têdigihije ku kesek tenê ji ber navê xwe jî dikare tehdeyê bibîne. Di pirtûkê de qala vê meseleyê dike.

Marshall, dibêje “ez hînî jargona Detroitê ya tundiyê bûm” û pê de diçe, “dapîreke min hebû. Hema kê jî xwe li wê bigirta derî lê vedikir, di mala xwe de dihewand, av dida wan, mînder dida binê wan, doşeg li binê wan radixist, bi wan re direqisî.” Loma Marshall B. Rosenberg ji min xweştir dipirse bi ya min: “Çawa çêdibe ku hin însan nikarin ji tebîetê xwe yê birehm bi dûr bikevin, di şertên herî xirab de jî xwe biparêzin û dev ji vê tebîetê xwe bernadin?” Dibêje, “Û li aliyê din çawa çê dibe hin însan fêrî tundiyê dibin?” “Tundî tê

hînkirin”. Rehm di darê me de, di xwezaya me de heye. Ev, angaştên bêtundiyê ne. Dibêjim angaşt, ji ber ku hûn dikarin îtîraz bikin. Psîkolojiya Frudyen dibêje xwezaya însanan êrîşkar e. Loma jî divê bê terbiyekirin. Em bi perwerdehî û pergaleke ku li ser vê hişmendiyê ava bûyî rabûne. Ango însan mexlûqekî tundhez û bixetere ye ku divê were terbiyekirin, divê bê kedîkirin ku li çandê bike.

Angaşta yekemîn a ragihandina bêtundî: “Xwezaya însên empatîk e.” Zanistên mêjiyî, îro bi keşifkirina noronên neynikê peyitandiye ku empatî di xwezaya me de heye. Ango tiştê di xwezaya me de heyî di civak, çand û malbata me de yan geş dibe, bi pêş dikeve an jî qels dibe, ko dibe û dimire. Bifikirin ku hûn tovek in. Ketin ser axê. Heke ev axeke beyar be, av tune, zibil tune, girekî bayî... li wir çi dê ji wî tovî derkeve? Li axeke din te çand, ava wê, zibilê wê, te ba jê qut kir. Dê hemû potansiyela wê tovê derkeve. Ev e, em potansiyela rehmê tînin, tundiyê didin hînkirin.

Ev ji min re pir balkêş hat. Wê wextê min xwast serê xwe bi vê pirsê bêşînim: “Ji tovê însên re derdoreke çawa hewce ye da ku geş bibe û hemû potansiyela xwe derxe holê?” Vê pirsê pir bala min kişand, min dest bi lêkolîna ragihandina bêtundî kir ku jê fam bikim.

Min dît pirtûk di 2004an de li Tirkî hatiye wergerandin. Mala min, zarokên min tev li Almanyayê ne. Salê carekê mîna koçberan em tên serdana merivên xwe yên li Tirkiyeyê. Dema pirtûk derket min dil dikir bibim yekane hînkera ragihandina bêtundî ya Tirkîaxêv. Ji bo danasîna ragihandina bêtundî min dest bi serdanên Tirkiyeyê kir.

Dema ji pirtûkê hîn bûm ku Marshall di salên 1990î de li Sirbistan, Îsraîl, Filistîn, û Ruandayê navçînî kiriye, pir di bin bandorê de mam. Ya herî zêde bandor li min kirî jî ew xebatên wî bûn ku piştî komkujiyên mezin di navbera Hutu û Tutsiyan de kiribûn. Jixwe ha wê demê hêvî bi min re çêbû ku di navbera civakên însan ji hevûdu kuştî de jî diyalog pêkan e. Helbet min ji Marshall jî pirsî: “Du eşîrên hevûdu kuştî, xwînî bûyî, hevûdu qetilkirî, hûn çawa wan tînin cem hev, çawa çêdibe hûn di nava wan de pêwendiyê datînin û li hev tînin?” Beriya wan bîne cem hev, nêzî salekê bi her du aliyan re cihê cihê li ser ragihandina bêtundî xebitiye û bi empatî guh daye kul û keserên wan. Ango berî ku di odeyekê de werin cem hev, pêşxebatine dûvdirêj hatine kirin. Wexta hatine cem hev jî piştî pêvajoya navçîniya lihevanînê ji Marshall re gotine, “nexwe were vê rêbazê hînî xelkê me jî bike.” Di rûniştina serê sibehê de pirsên mîna “heke navçînî hebe, mesele dê çareser bibe” hatin kirin. Dibe ku ev bibe destpêka pêvajoya dûvdirêj.

Dema min ev bihîstin, pirsa ewil a hat bîra min ev bû: “Ez dikarim bi vê

rêbazê bi însanan re ji nû ve têkiliyê deynim.” Wek min qal kirî, ew serdema dijwar a min digot ragihandina herî baş ew e ku xwe ji însanan dûr bixim û pê re nekevim têkiliyê, ez ji jiyana aktîf bi dûr ketibûm, bi tena serê xwe mabûm. Wek min gotî, însan dikare dîn bibe, dikare xwe bikuje. Ew dema ku min bi însanan re têkiliya xwe danîbû asta sifirê, min digot; heke ez vê rêbazê hîn bikim dibe feydeyeke min bigihîjê û li Tirkiyeyê bi cihêwaziya xwe, bi çeşîtdariya xwe em bikarin di nava hev de bijîn. Ser meseleyê çima ku kesek Fileh e, heqeret lê tên kirin û kesek vê ji xwe re nake derd. Ji ber ku haya me ewqasî ji heq û azadiya însên tune ye, dema ew tên binpêkirin kesek venaciniqe. Ev meseleyeke perwerdehiyê ye, meseleya azmûnên nû û aştiyane ye. Gihiştim wê qeneatê ku ew ê bi îdeolojiyên mezin neçe serî. Loma bi ragihandina bêtundî piştgiriya SCSyan, ji min re pir balkêş tê.

Takekesî çawa ye? Berpirsiyariya takekesî çi ye? Û ez ê çawa bi wê motîvasyona xwe ya hundirîn tevbigerim ku feydeyeke min bigihîje guherîn û veguherînê. Motîvasyona min a hundirîn ku ji berpirsiyariya min a takekesî tê. Ku em nikaribin vê bikin, em organîze jî bibin heke lixwewarqilîna me lawaz be, heke em nizanibin hilbijêrin, em ê bi hêsanî werin xapandin û manîpulekirin. Min jî esas aştî dixwast lê li aliyekî jî sempatiya min a hin komên çekdarî yên şoreşger hebû. A niha wexta li dû xwe dinêrim, vê dibînim; dema wek takekes em ne xurt bin, tenê dibin pêkhênerên rastiyên hinekên din.

Ev dişibe çandina çayirê. Tu yê biçinî dê li wir belav bibe. Xweza şîn dibe. Em nikarin çayirê bi kişkişandinê şîn bikin. Rêya şînbûnê ew e ku zêde bibe û belav bibe. Hemûyan bi carekê re nikarim şîn bikim lê li cihê xwe, bi destxistina însiyatîfê re dikarim dest bi xebatê bikim da xêreke min bigihîje jiyanê. Bi ya min rêgeza bêtundiyê ya herî girîng ew e çiqas tiştên ji bo me hêja, biqîmet hebin ku em bêriya wan dikin, em di oxira pêkanîna wan de tê bikoşin. Dema em li dijî tiştekî bin, em ê dîsa bibin alîgir û ji xwe re dijminan peyda bikin: Ji dêvla şerê li dijî tiştên ku ez naxwazim, hewldan û tevgerîna ji bo pêkanîna pêwîstiyan.

Li vir, pêdivî bi guherîna paradîgmayê heye. Marshall qala çanda baviksalar a deh hezar salî ya mirovahî afirandî dike. Pirsgirêkên mirovahiyê tenê bi kapîtalîzma modern a van 200 salên dawî nayên çareserkirin. Em li çandeke îqtidar çavên xwe vedikin ku bi pergala ceza û xelatê hatiye sazkirin. Hemû rahênanên me yên çandî li ser lêxwedîderketina wan mekanîzmayan ava bûne ku hebûna dewletê meşrû dikin. Mirovê ku di nava dubendiya ‘an zalim î an qurbanî yî’ de asê bûye, ji xwe re li aliyekî digere. Paşê baweriyê bi kîjan aliyî bîne ku dikarin wê biparêze, xwe nêzî wî aliyî dike, dikeve bin destê wan û li wê hêzê digere ku wî xelat bike.

Da ku ev biqewime, hewce ye însan ji xwezaya xwe dûr be. Ji dêvla ku bifikire

ka pêdiviya wî bi çi heye, di bin nîrên tirs û perwerdehiyê de ji rastiya xwe bi dûr dikeve û serî li ber rastiyên ku li ser hatiye ferzkirin ditewîne. Carinan serî hilde jî di her du rewşan de, her du aliyên madalyonê pev diçin. Ku bi ser bikeve tê xelatkirin, heke têk biçe tê cezakirin. Wê deme, bi şertê ku hin otorîte hebin û jê re bibêjin kîjan rast e kîjan şaş e ev diqewime. Yekane şertê vê ew e ku em têkiliya xwe ya bi xwe re qut bikin. Bi vî awayî çer ku em hestên xwe wenda dikin û dev ji fikirînê berdidin, em xwe radestî îqtidarê dikin. Ev bi dê û bavê me dest pê dike. Li pergala malbatên me binêrin, hemû dewletên biçûk in. Paşê dibistanên me. Paşê kargehên me, sazî. Rewşa rêxistinên siyasî jî ev e. Ji bo ku îqtidar li ser xwe bimîne pêdiviya xwe bi însanên bi xwe ne bawer, çav li rastiyên hinekan û ji hêza xwe dûrketî heye.

Ser meseleyê her kes bêyî îstîsna ji yekî pêzan dipirse. Ji yekî ku rastiyê dizane –ew jî bê kî ye, kes nizane- dipirse. Ev tevgerên rûniştî ne di çanda me de. Di heyama kamilbûnê de em demekê dev ji vê berdidin û serî hildidin. Pergala me di navbera serîhildan û sertewandinê de dihere û tê. Heke em nikaribin serî li ber îqtidarê rakin, em serî li ber ditewînin: Dema şert diguherin em hêza xwe li ser hinekên din diceribînin. Ango em nizanin werin cem hev û piştevaniya hev bikin. Yekane tiştê ku em pê dizanin, pevçûnên bidestxistina îqtidarê ye. Di vî warî de biqasî deh hezaran salan tecrûbeyeke me ya kûr heye. Ez vê tenê bi herêmekê dorsînor nakim. Te dît me gotibû herêm, derdor: Ev çanda mirovahiyê ye. Di heman demê de em hemû -şikir ku- di warê pêdiviyan de xwediyê wê potansiyela pêwîst in ku bibin însan.

Û ji ber terbiyeya me wergirtî, bi qutbûna têkiliya me ya bi me re, me rehma xwe wenda kir, me piştevanî ji bîr kir. Ragihandina bêtundî ji nû ve mirovbûna me tîne bîra me; ev tiştekî hûn pê nizanin bi ber we naxe. Binêrin di çanda me de li ser navê mirovahiyê tiştên çiqas xweşik hebûn. Di îslamê de me ew didît. Lê îslama îro di oxira îqtidarê de bûye pergaleke dinyewî. Îsa kî bû? Îsa şoreşgerekî serdema xwe bû. Paşê çi bû? Dêra Katolîk li Romayê dewleta papa Vatîkan damezirand. Çawa dişuxile? Bû pergaleke ceza û xelatkirinê, bi guneh, cinet û cehenimê dixebite. Hebûnweriyeke manewî heye lê olên birêkxistî dikin ku em ji vê veqetin. Em dîsa vegerin ser îqtidarê, hemû pergalên îqtidarê, hûn hema li kîjanê binêrin; ser meseleyê li qraliyê, qral deshilatiya xwe ji Xwedê û dîn digirin. Loma rastiyê ew temsîl dikin. Hemû pergalên ku wan saz kirine, hiqûq û edalet li ser ceza û xelatê ava kirine. Îro vî tiştî em dikarin di pergala dewlet û partiyên siyasî de bibînin.

Mesela pir bala min dikişîne ku gazinan ji bîatkirinê dikin. “Bîat dikin!” Dibêjim em xwe nas bikin, em li ku bîat dikin? Li ku derê em ji eslê xwe derdikevin? Em çawa dikarin dîsa bi hêza xwe vegerin ser eslê xwe. Em însan wek aferîdeyên xurt in. Ango di kakilê me de potansiyel pir zêde ye, em pir xurt in. Lê belê em pir hatine terbiyekirin. A rast em hatine kedîkirin. Li

vir ez terbiyeyê di wateyeke maqûl de bi kar nayînim. Xwezî terbiyeya me jê biçûya û em dîsa vegeriyana wê hişmendiya ku rastiyên xwe bi xwezaya xwe, bi dil û mêjiyê xwe dibîne.

Da ku em hînî van tiştan bibin ragihandina bêtundî rêbaza herî kêrhatî ye. Rêbazeke hêsan, tê hînkirin û tê pratîzekirin.

Hûn li SCSyan dixebitin, yê me jî komeleyeke me heye ku ji hevdeh kesan pêk tê. Hûn dizanin ji damezirandina komeleyekê re hevdeh kes lazim in. Me ji bo xatirê pêkanîna vê projeyê ev komele damezirand da ku pêdiviya me bi kesê hiqûqî çêbû, em jê sûd wergirin. Ango komeleyek e ku li ser pêdiviyê hatiye damezirandin. Komikên me yên cihêwaz hene. Ser meseleyê hin hevalên me tên cem hev ku meraqa wan li ser malbatvaniyê heye, piştgiriyê didin dê-bavan di warê rêvebirina malbatê de. Dema karê xwe qedandin, wekî ku peywira xwe anîne cih, komik belav dibe. Piştî ew kar çû serî em dibînin heman heval li devereke din, li ser mijareke din li ser komikeke din dixebitin.

Ev tiştê ku ez behs dikim şêwazeke nû ya rêxistinê ye. Bi awayê toran, bi destan nayê girtin, bi çavan nayê dîtin, heye û tune ye... Ev amûreke pir hêja ya xebitînê ye. Ji ber ku sedsala 21ê serdema toran e. Him aliyekî wê yê fîzîkî him aliyekî manewî. Em bi xêra toran di nava hev de dijîn. Ji hêla ekolojîk ve lê binêrin. Em li vê derê bi rihetî qedehên qartonî bi kar tînin. Hinek dikarin bibêjin, “Ma em ê li şûna pirsgirêkên Diyarbekirê qala pirsgirêkên ekolojîk bikin?” Lê em ê qalê bikin hevalino. Ji ber ku di paşxaneya pisgirêkên Diyabekirê de şerên çavkaniyan hene. Şerên li dinyayê li ser xwegihandina daringê derdikevin. Wek parçeyekî, ev herêm jî bi dinyayê ve girêdayî ye. Ango em ewqasî bi hev ve girêdayî ne ku; ev sedsala 21. ew heyam e ku em encamên vê dibînin.

Da ku em vê fam bikin jî –pir naxwazim bikar bînim- divê em geşedana xwe ya takekesî bi pêş bixin. Wek kes em mecbûr in bi pêş bikevin. Em mecbûr in ku bibin takekes. Ji ber ku heqet jî ji me bêhtir kesek tune me xilas bike. Kengî me ev mijar fam kir, em ê berpirsiyariya xwe ya şexsî hilgirin ser xwe. Ser meseleyê li Tirkiyeyê tiştê ku herî zêde em bêriyê dikin, berpirsiyariya şexsî ye. Piştî 1980yî çi bû? Li kadroyên rewşenbîr ên xwegihandî binêrin. Paradîgmaya kevn bi lez û bez xwe restore kir.

Mêtingeha yekemîn ku navê wê qet nayê hilanîn Amerîka ye, wek hûn jî dizanin. Niştecihên wê derê hebûn. Ji sala 1492yan û şûn de koçberên Ewropayê hatin. Ki xerîb e kî niştecih e berevajî bû. Di demên dawî de hereketên gelên niştecih hatin pê û hewl didan bi çanda xwe, xwe bigihînin serdema îroyîn. Ez dixwazim beşeke ji manîfestoya extiyarên gelê Hopiyan bixwînim ku di

sala 2002an de xwendine:

*Niha robarekî boş heye, bi coş diherike*
*Ewqasî mezin û bi coş e hinek ji me wê jê bitirsin*
*Û ew ê hewl bidin xwe li qeraxê bigirin*
*Ew ê ji me veqetin û dê êşê bikişînin*

*Niha zanibin ku qedereke vî robarî heye*
*Bi ya extiyaran be divê em qeraxê berdin*
*Xwe biavêjin nava avê*
*Bi ya wan be çavên me vekirî, serê me dê bilind be*
*Ka kî li wir e em ê binêrin û wan pîroz bikin*

*Dewran ne ew dewran e ku em şexsî tevbigerin*
*Tew ne ew dewran e ku em pûte bi xwe deynin*
*Heke na dê mezinbûna me û rêwîtiya me bisekine*
*Dewrana gurê bi tenê derbas bû*
*Xwe bidin hev, pevçûnê ji gotin û helwesta xwe derxin*
*Niha hemû tiştên ku em dikin bi awayekî pîroz*
*Û bi pîrozbahî divê em bikin*

*Em in ew ên ku ewqas zeman e dipên*

*Extiyarên Gelê Hopiyan, 24ê Adara 2002yan*

**Beşdar:** *Te dî we got serkêşên mezin ew kes in ku serkeftinên xwe wek serkeftina girseya jê re xizmet dike dide nişandan û we qala pêwendiya vê îqtidarê kir... Heqeten jî di serdema me de, di berjewendiyên xwe yên rojane û beredayî de asê mane. Xizmetkirina di oxira hinekan an jî tiştinan de cihê şermê ye li ba wan ku esas serkeftina mezin ev e. Yên ku dev ji qeraxê bernedin nikarin xwe bigihînin deryayên mezin. Tişta ku ev ji min re dibêje; wek me gotî, wek takekes bi piranî em bi tenê ne. Di serî de divê mirov xwe rexne bike, xwe bi xwe kontrol bike, rabirdûya xwe rake û deyne, ji xwe dest pê bike û paşê gazinan ji derdora xwe bike. Li vir wek heval jî got, divê însan ji hin tiştan, belkî ji gelek tiştan, ji canê xwe jî fedakarî bike. Ango îllam ne ji bo berjewendiya xwe.*

Dixwazî bibêjî ne ji bo berjewendiyekê lê ji bo armancekê?

**Beşdar:** *Çanda wê derê nizanim lê armancek jê jî ew e ku dersekê bide nifşên nû, nifşên ciwan. Li wir xwe berdana nava şîpa avê, serê xwe rakirin û meşîn. Şîpa avê çiqasî boş biherike jî şîreta pevneçûnê dike. Ango ez berxwedanekê dibînim lê fedakarî tune ye. Digel wê şîpa bi çoş bi serbilindî meşîna*

*di nava avê de. Ji loma, ji aliyekî ve berxwedêrî heye lê pevçûn tune. Helbet xwebûnek heye, hişmendiya xwebûnê jî heye. Bêyî av wan bide ber xwe û bibe, digel şîpa avê diçin, bi şîpa avê re li hev diçin. Ji lewre di serê axaftina we û vir ve em di binê îqtidarê re ketinê di serê wê re derketin, di serê wê re ketinê di binî re derketin. Lê li wir belkî aştiyeke bêyî şert û merc tune. Her pevçûnek li dar e. Lê wek ku ez fam dikim, digel çareseriya hemdemî, divê haya me ji me jî hebe ku em çi ne û li dijî çi ne, domandina jiyaneke bi hev re.*

"Em in ew ên ku ewqas dem e li bendê ne." Dem ne ew dem e ku em li benda xelaskerekî bin. Tev li jiyana rojanê bibin, serê xwe rakin û pîroz bikin. Pev neçin, pîroz bikin. Ez wiha fam dikim. Sipas ji bo guhdariya we.

Heta niha min di nava çarçoveyekê de ji we re behs kir ku min ragihandina bêtundî li kû nas kiriye lê di derbarê ragihandina bêtundî bi xwe de min kêm tişt gotin. Di perwerdehiyekê de ku li ser vê mijarê bû dîsa, hevalekê kurtefîlmek çêkiriye, heşt xulek in. Pirsa ragihandina bêtundî kiriye û min jî bersivandiye, em bi hev re lê temaşe bikin.

***Çalakiya Hezê - Kurtêfîlmê Bi Navê Ragihandina Bêtundî*** [6]

**Vivet Alevi:** Ragihandina bêtundî hunerek e ku di dil de pêk tê. Ango derbirîna jiyana jîndar a di hundirê me de ye, jidil û bidilûcan. Di heman demê de fêmdariya ew jiyana jîndar a di hundirê wan kesên li hemberî me ne, meraqkirin, hewldana têkilîdanînê.

Ax! Em di serdemeke bilezûbez de ne ku çareseriyên bilezûbez li ser me ferz dike. Însan li ser çareseriyê meyldar e. Ax, heke ew qewimîbe hema bi lez û bez, zûzûka... Heta ku wiha be jî tim û dayîm şer û pevçûn e. Ragihandina bêtundî me ji çareseriyan vedixwîne têkilîdanînê. Hinekî rawestin dibêje, ka deqeyekê. Beriya ku hûn çareser bikin carekê lê binêre bê ka pêdiviya me bi çi heye! Di pevgirêdana wan pêdiviyan de em hevûdu bibihîzin. Em pêdiviyên ên hember jî li ber çavan bigirin û li gor van pêdiviyan li çareseriyan bigerin. Ango vedixwîne afirîneriyê.

**Özgen Saatçılar** (Hînkera Berendam a Navenda Ragihandina Bêtundî): Di ragihandina bêtundî de tiştê ku hûn dikin, di eslê xwe de ragihandin bi xwe ye; vegotina tiştên ji dilî re derbas dibin, bilêvkirina xwestekên xwe, hewldana pêkanîna pêdiviyan, ji bo vê jî pêdiviya me bi derbirînê heye. Belkî carinan em nikarin biaxivin, nikarin tiştên ji dilê me tên vebêjin. Wê çaxê komikên me yên piştgiriyê hene. Ragihandina bêtundî digel komikan, bi ko-

6 https://vimeo.com/299853321.

mikan tê hînkirin. Di perwerdehiyên salane de, di semîneran de komikên malbatî hene, pergalên hemsaliyê hene, em tim li gel hev in.

**Vivet Alevi:** Car heye ku em pir diqehirin, pir hêrs dibin. Em an hêrsa xwe didewisînin an jî ew hêrs dibe sedema êrîşkariya me. Di her du rewşan de jî em ne bextewar in, tehdeyê li tenduristiya me dike, tansiyona me radibe û em bêçare dimînin. Heke em tiştekî hîs bikin –ku hîskirin pir muhîm e- ev hest me hişyar dikin. Hêrs yek ji hişyarkerên herî mezin e, dema adrenalîna me ji nişka ve radibe, dibêje rabe, ji ber ku pêdiviyeke girîng a laşê me tiştekî dixwaze û nikare wê bibîne, ji bo em wê pêdiviya xwe pêk bînin, laşê me adrenalînê pompe dike. Heke ez xwe li nedîtinê deynim, bidewisînim, ez nikarim wê pêdiviya xwe pêk bînim. Rabim bikim qêrîn, bikim hawar, ez ê yê hember sûcdar bikim û erîşî yê hember bikim. Dîsa nikarim pêdiviya xwe pêk bînim. Loma wek hemû hestên din em dibêjin hêrsa xwe ferq bike. Ragihandina bêtundî xebateke li ser ferqkirinê ye. Dema tiştek tê serê min ez çi hîs dikim? Çi li min diqewime? Kîjan hest li min radibin? Ferqkirin û naskirina van hestan, ne dewisandin û xerckirina wan. Têkilîdanîna bi tiştên ku ew hest dixwaze min bigihînê.

**Özgen Saatçılar:** Di hînbûna ragihandina bêtundî de, tiştê herî muhîm ê pir zêde bandor li min kirî; em hêza xwe bi dest dixin. Ne bikaranîna hêzê ya li ser hevûdu, bikaranîna hêzê ya bi hev re, bi hevûdu re. Heke pêdivî pê çêbû bikaranîna hêza parêzker. Û hewce ye em vê bi rehma dil bikin.

**Vivet Alevi:** Hînkirina ragihandina bêtundî, bi ceribandin û pratîkê pêkan e. Mîna meriv hînî zimanekî biyanî dibe. Wek çawa ji bo hînkirina Îngilîzî em demekê jê re vediqetînin, bi xêra hînkirina gramer û peyvên Îngilîzî em hînî axaftina wî zimanî dibin. Em jî di ragihandina bêtundî de gramera hestan hîn dikin. Lîsteyên me yên dûvdirêj hene, ji bo hînkirina peyvên hestan jî bi heman rêbazî ye. Ragihandina bêtundî jî zimanek e. Ferhengeke vî zimanî û qalibên vî zimanî hene. Yên ku dihatin xebatên me, digotin “kesek wiha naaxive.” Belê, ji ber ku kesek li gor gramer û hevoksaziya Îngilîzî jî naaxive, lê ji bo hînkirina zimên divê meriv gramera wî zimanî bizane. Tiştekî wiha ye ragihandina bêtundî.

**Gonca Fide** (Beşdara Perwerdehiya Bingehîn a Ragihandina Bêtundî): Bi xêra ragihandina bêtundî lê hay bûm ku dema meriv têkiliya xwe bi jîndariya di nava xwe de qut neke jiyan çendî xweşik dibe. Loma spasdar im.

**Alper Süzer** (Beşdarê Perwerdehiya Bingehîn a Ragihandina Bêtundî): Kir ku ez di demên biyargirtinan de li ser encamên wê biryarê bifikirim bê ka ew biryar çi ji min bibe û çi feydeyê bigihîne min. Tenê ne ev, di heman demê de kir ku ez lê hay bibim ka dema ez wê biryarê digirim pêdiviya min bi çi heye.

**Vivet Alevi:** Hînbûna vê rêbazê tenê bi xwendinê ne pêkan e. Ji ber ku gelek kes dixwînin. Piştî ku beşdarî semînerekê an jî atolyeyekê dibin dibêjin “wîî, ne wek pirtûkê bûye, ev tiştekî cihê bûye.” Lewre tiştekî wiha ye ku bi pratîkê tê hînkirin. Hînkirina bi ceribandinê pir muhîm e. Lewre hemû heval ragihandina bêtundî belav dikin, parve dikin, atolyeyan ava dikin. Belkî ev bê kirin, hûn dikarin şevekê werin li perwerdehiyekê bibin mêvan û bibînin bê ka ev çi ye û bi kêrî çi tê.

Yên rastî ragihandina bêtundî tên, dibêjin ev zûrafa çi ye, ev torî çi ye? Hemû însan torî, hemû kes zûrafa. Em hemû bi fikrên darizandinê dagirtî ne. Ji ber em bi perwerdehiyeke wiha rabûne. Qalibên me hene, rahênanên me yên çandî hene. Lewre em hemû torî ne. Û dilê me hemûyan heye, qabîliyeta empatiyê heye di darê me de û loma em hemû zûrafa ne. Xebata ku xwezaya me ya bi rehm ji nû ve tîne bîra me.

**Alper Süzer:** Vê yekê pir bandor li min kir; her ku min pêwendî bi xwe re danî, pêwendiya min a bi însanan re jî zêde bû, kûr bû. Lê hay bûm ku rêya ku dihere însên di nava min re derbas dibe.

**Burcu Uçaray Mangıtlı** (Hînkera Navenda Ragihandina Bêtundî): Li dinyayê şer li dar in. Mirov nizanin li hev bikin. Di destê min de –jiyana min pir guherand- amûrek heye, rêbazek, helwestek, nêzîkatiyek. Dema em berê xwe bidin pêdiviyên xwe, lihevkirina me pêkan e. Li her derê dibêjim, dibim şahid. Însan dilê xwe ji hev re vedikin, dema vê dikin, dema pêwendiyê bi hev re datînin pê dihesin ku tiştin ji binî ve diguherin. Êdî hewce nake ku pev biçin.

Heke em bala xwe bidin ser pêdiviyan, em dikarin li devereke nipînû hevûdu bibînin ku heq û neheq li wir tune ye. Mars ku ev rêbaz bi me re parve kiriye, tim Mewlana bi rêzdarî bi bîr dianî. Ji rastî û şaşiyê wê de deverek heye, em li wir hevûdu bibînin. Ragihandina bêtundî daweteke wiha ye.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Mamoste, ew pêdiviyên ku we qal kirin, te dît tiştê ku em hilbijêrin, dê bi kêrî pêdiviyên me were? Di jiyana me ya rojane de, divê em xwediyê fikriyateke çawa bin, di warê pêdiviyan de?*

Di jiyana rojane de em wiha dikin, çi were serê min bila bê, mêjiyê me wiha dixebite. Em tavilê dinirxînin û didarizînin. Ev awayê xebitîna mêjiyê me ye. Em her wek şaş û rast, heq û neheq, baş û xirab, asayî û awarte. Bi taybetî jî em di warê heq û neheqiyê de tavilê biryarê didin, tavilê xwe didin aliyekî û pev diçin. Dema em pev çûn, şûna ku em lê pev diçin cihekî çawa be, heke

hêza me hebe, em tavilê xwe didin aliyê jor. Em li rê û rêbazan digerin ku hêza xwe di ser wan re bi kar bînin. Heke ew ji destê me neyê, em tavilê bi şûn ve vedikişin. Ango bi hêla jêrî re diçin. Paşê jî heyfa xwe hiltînin.

Di navçîniyê de wexta qala Galtung bû, behsa "bi ser bikeve bi ser bikeve" hat kirin. A ku em pê dizanin yan tu yê bi ser bikevî yan têk biçî. Bala me tim li ser e bê ka kî heq e kî neheq e, kî şaş e, kî rast e an jî kî dê çi bibêje. Vir qada şer e û korerê ye. Ji pevçûnên biçûk ên navmalbatî heta şerên mezin ên navneteweyî, hemû li ser heman bingehê ne. Dema dibêjin çandeke deh hezar salî, li wir qalibên pir kûr ên jiberkirî hene.

Ragihandina bêtundî bala me ji ser rastî û şaşiyê, heqî û neheqiyê dibe ser pêdiviya kê bi çi heye. Pêdivî qada hevpar a mirovahiyê ye. Ji ber ku pêdivî ew tişt e ku li seranserê dinyayê meriv dikare bi her kesî re têkiliyê deyne.

Di her zimanî de lîsteya pêdiviyan heye. Bi Çînî, Japonî, Rûsî û hwd. Dema hevalên ku li ser ragihandina bêtundî dixebitin van lîsteyan datînin ber însanan, ji hevûdu fam dikin. Ango ew ên berê pev diçûn, niha dibêjin, "Pêdiviya te ev e? Te ji bo peydakirina filan tiştî an jî ji ber bêvan sedemê wiha kir?" û pê re têkiliyê datînin, paşê "Dema te ji ber filan pêdiviyê wiha kir, tu dikarî bêyî ku xisarê bidî min tevbigerî?"

Pêdivî motîvasyona me ya hundirîn a jiyanê ye. Yek ji rawêjan e. Hemû tiştên ku em di jiyana xwe de dikin tev ji ber pêdiviyekê ne. Motîvasyona tevgerînê ya hemû mirovan e; ji raketinê heta şerkirinê hemû tevgerên me ji ber pêdiviyekê ne. Lê hişmendiya me ya pêdiviyan sifir e. Bi qewlê Marshall B. Rosenberg be, heta çûye zanîngehê di dema perwerdehiya psîkolojiyê de jî kesî jê re qala pêdiviyan nekiriye.

Em hestên xwe nas nakin. Di sedsala 20î de hest bûn wek tabûyan. Em bi liserferzkirinên wek "hestiyar tevnegere, objektîf be, maqûl be!" rabûne. Lê nîşaneya me ya herî hêja hestên me ne, me derbarê pêdiviyên me de haydar dike. Ev çawa ye hûn dizanin? Pêdivî jiyaneke jîndar e di hundirê me de. Danûstandina bêhna me, her roj jixewrabûn û gerîna me, ev tev bi saya serê pêdiviyan pêkan e. Û em rojê qedereke pêdivî pêk tînin. Dibe em van bi hînbûneke çandî pêk bînin. Heke em ji pevçûnên hêzdarî berê xwe bidin piştgiriyê ango piştevaniya hêzdariyê, em wê ne li ser hevûdu lê bi hev re bi kar bînin wê çaxê aştî pêkantir e. Hişmendiya min a pêdiviyan çavkaniya hêza min e. Jiyana di hundirê min de ser meseleyê aniha pir tî bûye. Bi hesta tîbûnê laşê min bi min salix dide ku pêdiviya min bi şilaviyê heye. Hemû hest wek vê hesta tîbûnê me hişyar dikin. Mesela em vediciniqin, kêfxweşiyek li me radibe, em şaş dimînin. Ev hemû hest, pir bi qîmet in çima ku haya me bi pêdiviyên dilê me dixe.

“Hestiyar nebe!” Dema wisa tê gotin, ji me wer tê ku hestên me naxwazin û em ji wan ango ji xwe bi dûr dikevin. Perwerdehiya ku em pê rabûne tim ji me re gotiye, “Biaqil be, huş be!” hwd. Û ya herî muhîm pergala em tê de hebûna xwe bi cezakirin û xelatkirinê didomîne. Heke tu bi ya min bikî... Xelatan bijimêrin... Xelatên li gor temenê me hene. Heke hûn bi ya dêya xwe bikin ramûsan heye, heke na ceza heye. Di warê cezakirinê de me çandeke ewqas ecêb a dewlemend afirandiye, bêsînor. Û tew em ne di ferqê de ne jî, carinan em wer dibînin em pê xapiyane ku tew haya me ji me tune. Êvarî hûn tên malê û dibêjin, “Çi li min qewimî îro? Ez ronika nîvro hatim xapandin. Çawa ketim dafikê?” Heke em ne li ser hemdê xwe bin, tavilê tê xapandin, li şûna xwe rûdinin, li ser radikevin, tew haya me ji me tune ye. Haya me jê tune ye lê tansiyona me radibe, nexweşiyên me yên dilînî dest pê dikin.

Axir, nexwe divê bala me ne wexta pêdiviya me li tiştekî çêbû. Lê hişmendiya pêdiviyan empatiya me xwedî dike, empatiya me pê geş dibe. Mesela wê rojê li bajarekî, li Gerînendetiya Karên Jinan û Malbatan, me li ser ragihandina bêtundî perwerdehiyek da. Dema min ji beşdarên piraniya wan jin pirsî bê ka bi kêrî çi hat, bersiva herî zêde hatî dayîn ev bû: “Ez pê hesiyam ku pêdiviyên min hene.” Wan jinan zanîngeh xwendiye, hemû jî di karê xwe de biserketî, “Min heta niha tim tiştên ji min dihatin payîn dikirin. Haya min jê tune bû ku pêdiviyên min hene.” Ev tiştekî pir normal e di wê çandê de, li ser hatiye ferzkirin ku çi jê bê payîn, wê pêk bînin. Ez çi û çima dikim gelo, pêdiviyeke min pêk tîne an na, heke hişmendiyeke me ya bi vî awayî tune be her kes dê me bi rê ve bibe. Ez xwe di ser kesekî re nabînim di vî warî de, herçiqas min ewqasî li ser xwendibe, haya min ji tiştinan hebe jî zehmet e ku hay ji lêferzkirinên çandî hebim û ya ji bo xwe baş pêk bînim. Ev rêwîtiyeke dirêj û dijwar e ku dê heta dawiya umrê me bidome.

Ev civak çawa wiha ji hev veqetiya, ji hev cihê bû? Em bes li ser stratejiyan parçe dibin. Di vê pevgirêdanê de heke ez dîsa vegerim serî, ya ku ragihandina bêtundî pê re eleqedar dibe, ferqkirin e. “Pêdiviyên min çi ne? Û ji bo pêkanîna van pêdiviyan li stratejiyên te diyar kirine binêre.” Ji bo pêdiviya xwe ya şilaviyê pêk bînim min av vexwar mesela. Bifikirin ku ez pêdiviya xwe ya tîbûnê tim bi bîrayê pêk tînim. Bifikirin ku her ku tî dibim bîrayê vedixwim. Di dawiyê de ez ê nebim alkolîk? Hin stratejiyên me yên ku me ji xwe re kirine edet hene; stratejiya vê pêdiviyê ev e! Em dikarin vê mînakê li ser temamê jiyana xwe bifikirin. Jiberkirinên me yên ku li me bûne edet, stratejiyên me yên bi lêferzkirinên çandî teşegirtî hene.

Di ragihandina bêtundî de çar gav; ferq bike, çi bûye, çi hîs dikî, pêdiviya te bi çi heye û ji bo pêkanîna vê pêdiviyê tu dikarî çi bikî? Ewqas; em qala rêbazekê dikin ku ji çavdêrî, hest, pêdivî û xwestekan pêk tê. Bi pêdiviya xwe bihese û gaveke şênber biavêje. Gava şênber ku berpirsiyariya pêdiviya xwe

hildigire û tev bigere. Kî ji me dizane berpirsiyariya pêdiviyên xwe hilgire? Di jiyana rojane de em dibêjin heke ez wiha bikim dê dilê xwe bihêle, wisa bibêjim dê bixeyide û li şûna ku em berpirsiyariya pêdiviyên xwe hilgirin, berpirsiyariya pêdiviyên yê hember hildigirin. Em ji xwe diqerin. Mizgînî, ew tişt e ku tê guherandin e; lewre mêjî hîn dike. Te dît dibêjin tu gotinekê çil caran bibêjî dê pêk bê. Heqeten jî mêjiyê me wisa ye. Dema em tiştekî nû pratîze bikin, lêhaybûna meriv zêde dibe. Mesela destpêkê tim dibêjin, “mamoste em ê çawa van hîn bikin?” Di destê wan de lîsteyên hestan û pêdiviyan ji ber dikin. Em dûvdirêj li ser dixebitin. Axir di dawiyê de em vedikişin înzîwayê û bêhtir lê hûr dibin. Carekê em çûbûn otelekê. Haya wan jê tune bû lê gure-gura wan bû texmînên empatîk dikirin. Bêyî ku li lîsteyan binêrin. Her ku li pêdiviyên xwe hay dibin, pêdiviyên yên derveyî xwe jî texmîn dikin. Di darê me de heye. Perwerdehiyeke ku me dîsa li xwezaya me vegerîne û wateyeke wê ya wisa heye li ba min. Pir hêsan xuya dike lê balê dibe ser dereke girîng û dikin ku meriv baş biguhere û veguhere.

Hûn li SCSyan dixebitin, mirovên çalak in. Bifikirin ku we ev rêbaz hîn kir û jidil jê hez kir. Dema we di jiyana xwe ya rojane de ew tetbîq kir, bandorê li însanên derdorê dike. Mesela em sê çar mamosteyên ragihandina bêtundî haya me jê tune em di nava xwe de diaxivin, dibêjin “hûn çawa diaxivin?” û şaş dimînin. Dibêjin, “hûn çiqas aram in.” Dibêjim, “Ez aram im?”

Carekê gotin, “Me ewqasî şer kir, te tew mû li xwe xira nekir.” Ma ez ê çima mû li xwe xira bikim? Li gor min tiştê ku em jê re dibêjin pevçûn di nava xwe de îhtimala lihevkirinê û ragihandinê dihewîne. Lê gotineke çandî jî heye, “serê xwe pê re êşandin.” Em dibêjin serê xwe pê re neêşîne û em pev naçin. Çima ku em pev naçin, em paşê dibin qatil. Mesela di Tirkî de peyvên xetere yên wek “dev jê berde”, “guh nedê”, “îdare bike” yên pûtepênedanê hene. Tiştek pê nabe hevalino. Dikeve ser hev paşê, bi dilopa dawî mêrik kêrê radikişîne û hûr dike. Heqeten jî çima ku em di ser guhê xwe re diavêjin û pûte pê nadin, ev kela hêrsê û ev sergermî li me radibin.

**Beşdar:** *Mamoste ev jî heye. Bi taybetî di nûçeyan de wek*î *sedemeke* mêrik a maqûl hebe, *dibêjin dînobûn... wek ji nişka ve, ji ber xwe ve qewimiye...*

Ew ê ji nişka ve diqewime, tiştên berê ne ku ketine ser hev, tiştên ku me di hundirê xwe de girtine. Ji ber ku li şûna em bibêjin, “Vê mijarê li min nekir,” an jî li şûna ku em bibêjin, “Ji ber ku ev pêdiviya min pêk nehat,” em bêdeng dimînin, paşê dikeve ser hev û em ji nişka ve diteqin.

Dema em bi pêdiviyên xwe re rûbirû bimînin, bi wan re têkiliyê deynin, em zelaltir dibin. Biyokîmyaya me, hormonên me diguherin. Em aram dibin. Êdî ev -şikir- bi saya alav û amûrên teknolojîk ji pêlên mêjî tê famkirin. Berê

mîna ku em qala tiştên mîstîk bikin. Di qonaxa pêdiviyan de em tu caran pev naçin. Di qonaxa stratejiyan de em pev diçin. Mesela pêdiviya her kesî bi tevgerînê heye. Lê ji bo vê wesayît ne şert e, em dikarin bimeşin, li bisikletê siwar bibin, wesayîtên girseyî, taksî... Mesela kesê dibêje "pêdiviya min bi erebeyê heye" û yê ku dibêje "na, otobês ji te re baştir e" dibe ku pev biçin, dibe em hewl bidin ku xwe mafdar bikin. Lê kesek li ser mijara 'pêdiviya însên bi tevgerînê heye' pev naçe. Meseleya bingehîn; pêdivî çi ye? Ji bo pêkanîna wê pêdiviyê stratejiyên me çi ne? Stratejî ew rê ne ku bi lêferzkirinên çandî tên hînkirin. Bi afirandinê em dikarin stratejiyên nû û kartêker bibînin.

**Beşdar:** *Heke ji bo we jî guncav be, pêşniyareke min heye? Gelo em nikarin li ser mînakekê pratîze bikin? Li ser bûyereke nimûne, qet nebe em ê hestan û pêdiviyên ku ji wan hestan peyda dibin bibînin, dibe gelo?*

Ez bawer nakim ku bi demoyeke kurt tiştek were famkirin... Lê dibe. Em pêşî navberekê bidin, li ser bifikirin. Mijareke we heye ku em li ser bixebitin? Mesela hûn mijareke ku we aciz dike bi me re parve bikin. Ez dikarim bi vê rêbazê, bi empatî li we guhdarî bikim.

**Beşdar:** *Di warê ragihandina bêtundî de erê, ez ê hay ji vê hebim. Ez ê hay ji pêdiviyên xwe hebim û paşê ez ê hewl bidim bi empatî guhdar bikim filan. Baş e lê ne heqê me ye ku em ji yên hember jî daxwaz bikin? Çi ku tiştek bi yekalî nabe.*

Vedigerim serê mijarê. Ji bo ku bi bavê zarokê xwe re li hev bikim, min xwe hînî mijara ragihandina bêtundî kir. Wek min gotî, ew, ew kes e ku parsûyên min şikandine û piştî vê bûyerê ya ku çûye terapiyê ez im. Tê bîra min di wê pêvajoya ne xweş de min baweriya xwe bi vê dianî; "çiqas pêwendiyê bi însanan re daneynî ewqas baş e." Bi kurtahî qala çîroka xwe bikim. Me eleqedariya bi zarokan re û hwd, her tişt bi planeke baş saz kiribû. Ez ne mecbûr bûm ku bavê zarokê xwe bibînim. Dihat lawê min ji devê derî digirt, min rûyê wî jî nedîdît. Ji hêla hiqûqî ve ragihandina di navbera me de daketibû asta sifirê. Lê lawê min mezin bû. Fikra 'ez ê herka jiyanê kontrol bikim', fikreke şaş e. Xwedê dizane çar pênc sal derbas bûbûn di ser veqetîna me de, lawê min rojekê hat, got; "Ez dixwazim bavê xwe zêdetir bibînim, wek te." Dawiya hefteyan diçû. De were ji nav derkeve! Yan min ê bigota, "Çi ji te re baş e çi ne baş e ez pê dizanim, kurê min. Bavê te hestiyên meriv dişikêne," an jî min ê qîmet bida pêdiviyên kurê xwe. Wê çaxê jî ez ê li çareseriyê bigerim. Beriya hînbûna min a ragihandina bêtundî, ji ber pêzanên xwe yên pedagojîk pêdiviyên kurê min li ba min bi qîmet bûn. Di wê de yekî pirtûka Ragihandina Bêtundî da min. Li Berlînê komên elimandinê hene, çûm wan. Bi şev bi qasî du seatan em tên cem hev. Ez vedibêjim. Ser meseleyê min

digot, “sibê ez û bavê zarokî em ê herin cem mamosteyê wî, dê li wir dîsa biaxive û min bihetikîne” filan, min gazin dikirin. Yên komê bi empatî li min guhdar dikin û hewl didin ez li pêdiviyên xwe hay bibim. Paşê min digot, “ew mêrik dijminê min e, ez qetiyen pê re nakevim empatiyê.” Ji komê hinek bi rola bavê zarokî radibûn, ez jî li wan temaşe dikim û hewl didim pê re têkevim empatiyê. Haziriya xwe dikim. De qet nebe wexta em çûn cem mamoste, şaşiyekê nekim.

Carekê, tê bîra min, di wê komê de min ji her aliyî ve haziriya hevdîtinekê dikir. Ev bûbû şeş meh ku li ser ragihandina bêtundî dixebitîm. Ez û bav hatin cem hev, em axivîn. Min hevokên mekanîk ên bi vî awayî saz dikirin; “wexta tu dibêjî ……. ez xwe ……. hîs dikim, ji ber pêdiviya min bi …… heye.” Beriya ku hevoka min biqede, got, “Da ku tu min manîpule bikî, te lîstokên din ên psîkolojîk hîn kirin?” û tehn li min xistin. Ca bifikirin tenê ji bo xatirê ku ez û mêriko em bi hev re biaxivin ev şeş meh in diçim kûrsê û mêriko çi dibêje. Ez rûniştim û bêyî ku wî rexne bikim, min bi dilekî safî birîna xwe der kir; “Belê ez bi vê metodê diaxivim ji ber ku êdî naxwazim em pev biçin.” Hûn ê bibêjin qey ew çû yekî din hat. Di cih de guherî. Jê û şûn de qîmet da ragihandina min.

Piştî vê, min hemû pevçûnên di navbera me de bi ragihandina bêtundî çareser kirin. Pê de pê de me bi hev re dîsa dest bi dê-bavîtiya xwe kir. Ew êrîşên wî yên berê, ew tevgerên wî yên ku min berê wek bêehlaqî dinirxandin, pê hesiyam ku ne li dijî min bûne, lê hay bûm ku ev tev ji ber pêdiviyên wî yên pêknehatî ne. Lê tu tevgereke wî ji nedîtinî ve nedihatim. Heta ku min pêdiviyên xwe pê dane sehandin û heta pê dane qebûlkirin, pê re di têkiliyê de mam. Û ev hemû bi gotinî, dilînî lê bi bêtundî çêbû.

**Beşdar:** *We dest bi dîtina kêmasiyan kir?*

Min dev ji nîqaşkirina kemasiyan berda. Min dev ji wê sewdayê berda ku wî bikim meriv, bikim însan. Li gor wî jî rastiyên wî ne. Dema van rastiyan li min nedikir, min ev jê re got. Ev pêdiviyên min pêk nayên, bila neyên paşguhkirin. Min rêyek da pêşiya xwe ku em bi hev re li ser wan çareseriyan bifikirin ku hemû pêdiviyên me pêk tîne. Min tim ew vexwend hevkariyê û ew jî neçar ma ku bi min re tev bigere. Bêyî hayûbayê wî ji ragihandina bêtundî hebe, ev hemû qewimîn. Kurê min mezin bû. Lîsansa xwe qedand. Dema kurê meriv dibistanê biqedîne, meriv vê kêfxweşiya xwe herî zêde dixwaze bi kê re bijî? Helbet yê ku herî zêde meriv bixwaze pê re bijî, bavê wî ye. Min telefonî wî kir û jê re got, “Were em li ser şerefa kurik şampanyayekê vexwin.” Ev roj ew roj e jî em rojbûna kurik, eyd û erefetan bi hev re pîroz dikin. Dema min dev ji sewdaya sererastkirina wî berda, heta hûn bibêjin azad bûm. Dev ji sererastkirina hinekan berdan û hewldana pêkanîna

xwestekên xwe! Hewldana bi berpirsiyariya pêdiviyên xwe. Dibe empatiyeke we ya bêdawî hebe. Ev nayê wê wateyê ku hûn erê dikin hemû tiştên tên kirin an jî qebûl dikin. Slogana me ji sedî sed empatî, sifir tolerans. Li şûna pevçûna li ser tevgeran bi awayekî empatîk guhdarkirina wan kesên ku wê tevgerê pêşniyaz dikin. Derbirîna pêdiviyên xwe û çareseriyên ku pêdiviyên her du aliyan pêk tînin. Divê em mêjiyê xwe bişixulînin, divê em afirîner bin. Helbet jê re dem divê.

Pêdivî di hundirê me de ne. Ne berbendê bûyer, tevger û enerjiyên razber ên derveyîn e. Di heman demê de xala hevpar a hemû mirovahiyê ye. Dema em pêdiviyan û tevgerên ji bo pêkanîna wan pêdiviyan tevlihev bikin, wê demê pevçûn jêneger e.

**Beşdar:** *Pêdiviyên xwezayî lê ne mecbûrî hene û pêdiviyên ne xwezayî ne jî mecbûrî. Însan hest bi tiştekî dike, tim daxwazker e. Ya balkêş pêdiviya xwezayî û mecbûrî him erzan e him jî bêdawî ye. Pêdiviyên xwezayî û mecbûrî çi ne, vehewîn, lêstarebûn. Meriv dikare li maleke xweşik jî rakeve û helbet bi awayên din jî. Bi awayekî bêdawî meriv dikare vê çalakiyê pêk bîne. Pêdiviyên xwezayî lê ne mecbûrî konfor, xwarineke baştir, maleke baştir... Pêdiviyên ne xwezayî û ne jî mecbûrî pir kêm in belkî lê dibe em wan pêdiviyên bêsînor bibînin. Tiştekî wiha balkêş e. Pêvajoya tetmînkariya pêdiviyên xwezayî û mecbûrî naguhere. Ji lew re jiyaneke bextewar dijîn lê lêgerîneke hetahetayî, tim di nava hewldanê de... Pêdiviyên duyemîn û sêyemîn ez bawer im stratejiya ku hûn qal dikin bi xwe ye. Di wê pevgirêdanê de meriv dikare pêwendiyekê pê re deyne.*

Li DYAyê, tevgera Martin Luther King Jr. a reşikan heye. Li Amerîkayê ew tevgerên han bi rê xistin ku rê li ber qanûnên nijadperestiyê bigirin û hemû jî bi çalakiyên bêtundî bi rê xistin. Polîs, çek, kuştin hemû zordariyên ku em pê dizanin li ser van însanan kirin. Em dîrokê jî nizanin. Em bi stratejiyên jiberkirî dorsînorkirî ne, em di korerêyan de asê mane. Cuma Çiçek gava din qal kir: “Tundî, tundiyê tîne, gerîneka tundiyê.” Ango ji derekê û pê ve dema dernekevin derveyî wê, em jî dibin parçeyekî ji wê, em jî serî li tundiyê didin. Tercîhên me hene helbet. Em dikarin tundiyê bi tundiyê vemirînin. Mirovahiyê ji mêj ve tim serî li vê rêbazê daye û hê jî serî lê dide. Jixwe em di nava vê gerînekê de ne an jî divê em tiştekî din bikin.

**Beşdar:** *Marshall, li Sudanê navçîtiya Hutu û Tutsiyan kiriye, ev jî mînakek e... çi di koma we de çi li dinyayê, mînakên ragihandina bêtundî hene ku di nava civakan de tên bikaranîn gelo?*

Helbet hene. Lê ez xwe hê nû hazir hîs dikim ji bo xebatên bi vî rengî. Li

Nepalê gerîlayên Maoger bi dewletê re li hev hatin.[7] Te dît me qala aştiya negatîf kir, erê aştî pêk hat lê welat parçe bûbû, birîna civakî û trawma pir mezin bû. Paşê wek Cuma Çiçek jî gotî, dest bi afirandina çanda aştiyê kirin. Hînkerên ragihandina bêtundî ku bala xwe bêhtir didan ser *reconciliation*ê ji bo aştiyê ango ji bo edilandina xisara ku rû daye xebitîn. Xebatên derbarê ragihandina bêtundî û xelaka veherîner de pir hessas in. Ew xebat in ku çêkirina fîlmê wan gelekî zehmet e. Ser meseleyê li Nepalê fîlm çêkirine. Paşê îtîraz kirine. Paşê li hemû fîlman nêrîne, venêrîne. Ji ber ku hewldana pêbaweriyê tê afirandin, însan dilê xwe ji hevûdu re vedikin, êşa di dilê xwe de, jehra xwe dirijînin. Heqet jî li ser birînên herî kûr tê axaftin. Di xebatên bi vî rengî de bawerî pir muhîm e. Dema ez a dilê xwe dibêjim, dê mehremiyeta vê were parastin? Wê pûte pê bînin? Ji bo vê jî materyalên me pir kêm in. Em bi malbatan re dixebitin, mêr û jin jî naxwazin. Li ber destê me qeydên dengî û dîtbarî pir hindik in mesela.

**Beşdar:** *Mîna têgeha edaleta veherîner...*

Ne edalet, li vir *reconciliation* heye, em qala kewandina birînê dikin, rehetkirina birînê, aştiya ji dil. Ji ber lihevkirin têgeheke din e.

**Beşdar:** *Tedawîker...*

Erê, tedawîker çêdibe. Şeş rojan xebateke wiha kirin. Kampek çêkirin bi wan însanan re ku bûne aligirên vê pevçûnê û li wir belgefîlmek derket holê.

Min ji we re qal kir nizanim? Ji 2yê Îlonê û pê ve ez vekişiyam quncikê xwe. Min mîsyona ku dabû pêşiya xwe bi cih anî. Li Tirkiyeyê nasandina ragihandina bêtundî, gihandina hînkeran bi perwerdehiyên ragihandina bêtundî. A niha em şeş hînkerên bisertîfîka ne. Hewce nake xebatên ku heta niha min kirine careke din bikim. Loma divê hinekî bi paş ve vekişim û lê hûr bibim ka dikarim ji vir û şûn de çi bikim; dixwazim bala xwe, enerjiya xwe, dema xwe bidimê ka ez bi ragihandina bêtundî dixwazim xwe bigihînim kû derê. Aştiya civakî her car bûye mijara min a sereke. Min her xwastiye di vî warî de bibim xwedî tecrûbe. Lewre dema dijberên hev li pevçûnê sor bûn, parastina cihê xwe û sekna saxlem muhîm e. Di vê înzîwaya xwe de ez ê hewl bidim ku materyalan bidim hev ango ji bo sazkirina aştiya civakî metaryalên heyî çi ne ez ê li ser wê bixebitim. Di vî warî de kê çi kiriye? Wek hûn dibînin ez pratîkker im, ne teorîsyen. Piştî pêncî saliya xwe ez bi teoriyên di rabirdûyê de tesîr li min kirî hesiyam. Dixwazim tiştên yekser tên pratîzekirin bikim. Ragihandina bêtundî di vî warî de alîkariya min dike.

7 https://www.youtube.com/watch?v=RqA2OydkXgg.

**Beşdar:** *Herêma me li navenda malwêraniyên mezin e. Te dît çareseriyeke bêtundî...*

Bawerkirin pir zehmet e ne wisa?

**Beşdar:** *Him zehmet e him jî ji pasîfîzmê nizanim heta çi meriv bi tiştên ecêb tê sûcdarkirin. Metirsiya têkbirina têkoşînê û pasîfîzasyonê heye. Ji loma dibe ragihandina bêtundî ji bo têkiliyên navkesî bê nîqaşkirin lê ez ji bo têkoşînên civakî derfeta bêtundiyê nabînim.*

Em bibêjin bêtundîtî û mijarê berfirehtir bikin.

**Beşdar:** *Meseleya pêdiviyan. Wek mînaka Galtung a porteqalê. Her du jî porteqalê dixwazin. Esas mesele ne porteqal e jî. Ev model bi me dide xuyakirin ku dema meriv xwe bigihîne bingeha pêdiviyan daxwaza her duyan jî pêk tê û mesele çareser dibe. Niha dema em vê meseleyê li ser civakê bifikirin... Civakîbûna însanan dibe guherbar be. Carinan li malê, li dibistanê, li taxê dibe lê civakîbûna însên a polîtîk bi takekesî nabe. Bi piranî di nava koman de dibe. Em çawa dikarin ragihandina bêtundî di nava komikan de bi kar bînin. Divê em hinekî serê xwe ji vê re biêşînin. Li ser komikan çêdibe? Li vir pêdivî... em hinekî din şênber bikin û li ser Meseleya Kurdan bi kar bînin, wek pêdiviyên Kurdan çi ne?*

**Beşdar:** *Ez parêzerê heft heşt salan im, dikevim gelek dozên polîtîk. Lê dema em têkoşîneke bêtundî nîqaş dikin valahiyeke mezin heye. Bi ya min divê ev mijar bi xisûsî were nîqaşkirin.*

Ez bi we re me, kêm tişt hene ku ji sazbûna aştiyê re amade ne. Peywira me ew e ku em afirîner bin. Pir bala min kişand, we got li gor lêkolînekê, pevçûnên çekdarî dema di nava pênc salan de, ji aliyê dewletê ve di nava heft salan de çareser nebin êdî hew çareser dibin. Hûn dibêjin wer xuya ye dê bi şer çareser nebe. Aniha di nava vê gerînekê û korerêyê de em çima afirîner nebin? Çima serwendayî bibin? Ciwan dema bêçare dimînin radihêlin çekê. Divê meriv rêyên din bide ber wan. Min jî çareseriyeke hazir bi xwe re neaniye lê bi awayekî zelal û aşkere dibêjim heke em serê xwe pê re biêşînin em dikarin alternatîfan biafirînin. Heqeten jî ji bo em paradîgmayê biguherînin, em ji çanda dehsalane ya şer, tundî û îqtidarê derbasî çanda aştî û piştevaniyê bibin, em mecbûr in ku rêyên nû bibînin û biafirînin. Rêyeke dîtir tune ye. An nexwe bi qewlê Gandî, “Çav bi çavî, xwîn bi xwînê, dê hemû dinyayê kor bike.”

Çima ku karê min pê neketiye zêde bi hûrgilî nizanim lê li Îrlandayê, IRAyê sih sal têkoşîna çekdarî daye û bi Qraliyeta Yekgirtî re li hev hatiye. Afrîkaya

Başûr bêyî xwînrijandin ji rejîma apartheid derbasî pergala demokratîk bûye, divê meriv lê bikole. Birayê min ê mezin li Afrîkaya Başûr maye. Cara ewil sala 1994an, dema Mandela ji hepsê derket, çûm. *Apart*, wateya wê cihê ye. Di navbera reşik û spiyan de jihevqetîneke muezzem hebû. Li kolanê hûn nikarin yekî spî bibînin ku dimeşe, hemû bi wesayitên xwe digerin. Li kolanên bêpeyarêk tenê reşik hene. Li hember pevkelijîna di bîst salên dawî de pêkhatî min got ez ê bejna xwe li ber bitewînim. Vî welatî çawa ev tişt pêk anî? Însanên vî welatî ku şer û tundî lê pir e, çawa karîn ji heqê vî karê têra xwe zehmet derkevin û bibin yek. Panzdeh ji sedê nifûsê ji spiyan, heşt ji sedî ji reşik, Hindî û melezan pêk tê. Nêzî çil milyon reşik bi salan li kamp û girtîgehên ji spiyan dûr hatine girtin. Dema apartheid qediya min digot qey dê reşik spiyan ser jê bikin. Şerekî li dar tune bû lê zordestî, îşkence û cihêwazî hebû. Jiyana Mandela bixwînin. Roja ji hepse derketî gotina ku dibêje muhîm e; “Ez 27 salan di hepsê de mam, heke ez xwe neguherim ez ê hepsê jî bi xwe re bibim.” Bi vî awayî xwîn nerijî. Rola Desmond Tutu, komîsyonên heqîqet û lihevkirinê yên hatî sazkirin kir ku însan bi axaftinê çareseriyan bibînin. Hepisxaneyên di mêjiyê me de nahêle em rêyên nû û aştiyane biafirînin.

**Beşdar:** *Bi ya min pirsgirêkeke lezgîn, rewşeke ku em pir îhmal dikin heye. Derbarê kesên di nava şer an jî li qerexa şer de. Dema em bi awayekî dualî tundiyê li hev dikin –ev dibe zimanê tundewer ê têkoşîna hiqûqî bi xwe re anîbe, dibe ji ber tevgerîna atomên me yên enerjîbilind ê bihêrs be an jî dibe ji ber hestên tenê temaşekirinê be- em ê tundiya ku ev di nava me de çêdike çi bikin?*

Spasiya we dikim. Min dixwast qala wê bikim jixwe. Wek min di destpêka axaftina xwe de gotî, çareseriyên mezin bi gavên biçûk çêdibin. Tovreşandin. Di serî de divê meriv tundiya di avadaniyên heyî de tespît bike. Ser meseleyê wexta ez komeleyekê, civatekê, rêxistinekê dibînim, ev dibe SCSyek be, dibe rêvebiriya wê SCSyê be, ez dipirsim bê ka dema tên cem hev xebatên xwe çawa bi rê ve dibin, çawa biryaran digirin. Tehekkumî, bikaranîna hêzê ya li ser kesên hember carinan herî zêde di wan saziyan de derdikeve pêşiya me. Ez li Almanyayê bi qasî sih salan di SCSyan de, di xizmetên civakî de xebitîm. Her kes heta hûn bibêjin dildar bû, daxwazkar bû. Bi pereyekî hindik bi dil û can dixebitîn. Ruhê karkirinê, xizmetdayînê hebû. Hema her saziya ku ez ketimê, pevçûnên îqtidar û egoyê heta qirikê hebûn. Belkî yekser ji kar dernedixistin lê bi rêbaza ku îro jê re dibêjin mobbing, însan ewqas diwestand ku axir lê dixistin derdiketin û diçûn.

Kongreya giştî ya komeleya ku herî dawî ez tê de dixebitîm, ji hêrs û qehran ez rakirim nexweşxaneyê û min du hefte berî wexta xwe welidand. Navenda perwerdehiya jinan bû û min gotibû partriyarka çû matriyarka hat. Em

hemû jin bûn, rêbaz hemû rêbazên kulîsê yên berê bûn, kêlîka dawîn jin dianîn dikirin endamê komeleyê filan. Min got, “Heman tişt xwe dubare dike.” Şerên îqtidarê yên bi salan e em hînî xwe kirine, di nava me de ne. Ji bo pirsa we spasiya we dikim. Ji bo ku em di oxira aştiyê de xwe hînî piştevaniyê bikin, cihên ku em dest bi xebatên balkişandinê bikin ev der in, hêz, îqtidar, îmtiyaz û hwd.

Ez bi dilê xwe, bi zanebûn ketim nav civateke ku li ser perwerdekirinê dixebite. Têgihiştim ku bi demê re divê mêjiyê me, perspektîfên me biguherin. Dema fokusa me guherî, em ê bibînin ku dinyaya me jî guherî. Lewre ha meriv fokusa bala xwe daye ser rast/şaş, heq/neheq ha meriv berçavkeke camsor xistiye çavên xwe. Heke em bi vê berçavkê li dinyayê binêrin bê ka kî rast e, kî şaş e, kî heq e û kî neheq e dê dinya ji me re wek qadeke şer a sor xuya bike. Heke berê fokusa bala xwe ji fikrên darizker bidin ser pêdiviyan, wekî ku me berçavka xwe guheriye, dê bandorê li me bike. Wê demê em ê bi pêdiviyan û bi çareseriyên pêkanîna wan pêdiviyan re eleqedar bibin. Bi vî awayî têgihiştina me jî dê biguhere. Ez ji jiyana xwe bi vê dizanim. Loma min qala jiyana xwe, qala rêwitiya veguherîna xwe kir. Pirsek hebû, çi bû?

**Beşdar:** *“Tundiya şoreşgerî” a di lîteratûra Marksîstan de...*

Spas. Berê serê min jî tevlihev bû di warê hewcedariya tundiya şoreşgerî de. Bi tundiyê, çareserkirina tundiyê me dike parçeyekî pirsgirêkê.

**Beşdar:** *Wek komik me dest bi xebatekê kir. Ji bo di rojeva me de be dipirsim. Qala mînakên ji dinyayê hat kirin. Qala proseyên cihê yên aştiyê, hinek jî qala tevlêbûna jinan û qala LGBTÎ+yan hat kirin. Ez dixwazim gotinê bînim ser zarokan. Ji ber ku zarok hê wek takekes nehatiye qebûlkirin dibe ev gotinên min wek tiştekî eletewş xuya bikin lê zarok jî bi qasî me, tew ji me jî bêhtir di bin bandora şer de dimînin. Di vê proseya aştiyê de cihê zarokan li kê ye? Wexta em derbarê proseya aştiyê de qala girîngiya tevlêbûna SCSyan û komikên din dikin, gelo em dikarin ji bo tevlêbûna zarokan jî tiştinan bikin? Ew aştiyê û pevçûnan çawa pênase dikin, mînakên vê li dinyayê hene? Derbarê tevlêbûna zarokan de mînaka Montessori heye. Dibe di rûniştinên din de em ji wê mînakê sûd wergirin. Ji bo ku di rojeva me de be dibêjim. Dema em li ser aştiyê xebitîn û hewldana tiştinan da, em li zarokan jî bifikirin û wiha pê de biçin... Ew çi difikirin gelo, wek hokerên herî zêde di bin bandora pevçûnan de dimînin?*

Ez a dilê xwe bibêjim; li ser ragihandina bêtundî xebateke demdirêj û bibingeh, bi SCSyên çalak ên karîger re, yekser bi welatiyan re û helbet bi zarokan re. Ji bo vê çavkanî divê. Ma hene derfetên wisa? Divê meriv jê re wextê veqetîne. Heke hûn tev lê bibin, piştî perwerdehiyeke demdirêj a bibingeh,

mesela piştî salekê, em dikarin li ser biaxivin bê ka em berê li kû bûn û niha li kû ne, di lênihêrtin û hêviyên me yên derbarê aştiyê de çi guhertin pêk hatine. Lewre beriya ku kar dest pê bike, axaftina li ser wî karî nakeve serê meriv. Ya dilê min ev e, derbarê aştiyeke mayînde de xeyaleke min a wisa heye.

BEŞA SÊYEM

# PARÊZVANÎ Û RAGIHANDINA GIŞTÎ: AZMÛNA ÎNÎSÎYATÎFA HEQ_

*Reha Ruhavioğlu*

MAZLUMDER, di sala 1991an de ji hêla 54 entelektuelên misilman ve hatiye damezirandin. Beriya ku MAZLUMDER were damezirandin, Komeleya Mafên Mirovan (IHD) hebû. Komeleya Mafên Mirovan li ser pêdiviya îşkence û bêhiqûqiyên di girtîgehan de û li ser pêdiviya mexdûriyetên piştî derbeya Îlonê, ku bi taybetî çepgir kiribûn hedefa xwe, hat damezirandin. MAZLUMDER jî bi mebesta parastina mafên oldaran ku nedikarîn li gor bîr û baweriya xwe bijîn û dîsa bi wê mebestê hat damezirandin ku astengiyên li pêşiya kesên bilaçik di jiyana rojane de bixe rojevê. Lê wek Cuma Çiçek jî got, di demeke nêz de –ez bawer dikim sala 1992an bû- qada Kurdî û MAZLUMDERê hêdî hêdî bi du milan ve meşiyan. Yek, azadiya bîr û baweriya misilmanan, dudu Meseleya Kurdan, bûn du mijarên ku MAZLUMDER li ser dixebite.

MAZLUMDER, yek ji wan rêxistinên misilmanan ên ewil e ku bi mijarên civaka sîvîl re eleqedar bûye. Hin saziyên ku bêhtir wek cemaet birêxistin-bûyî û doza mafên siyasî dikirin jî hebûn. Lê wek rêxistineke mafên mirovan, ez bawer dikim MAZLUMDER yekemîn e.

Piştî ku Proseya Aştiyê ya 2015an qediya û dîsa pevçûnan dest pê kir, sêla nîqaşên me yên navsazî jî sortir bûn. Hin prensîbên me berê li ser li hev kirî ji nû ve hatin nîqaşkirin. Cudahiya her du saziyan a di majara nêzîktêdayîna mafên mirovan de derket holê. Axir bi heyeta wek qeyûm tayînbûyî re kongreya awarte hat lidarxistin. Çima ku 16 heb şaxan got ‘bingeha hiqûqî ya kongreya awarte tune ye’ û tev li kongreyê nebûn, hemû hatin girtin. Ango ji 24 şaxan, 16 şax ji hêla MAZLUMDERê ve hatin girtin.

Bi kurtahî dikarim wiha bibêjim, du heb perspektîfên me hebûn derbarê mafên mirovan û nexasim derbarê Meseleya Kurdan de. Li gor min yek jê tesfiye bû, helbet wek alîgirekî vê dibêjim ne wek çavdêrekî xweser. Wek alîgirekî fikrên xwe yên sûbjektif dibêjim. Îhtimal e ku hevalên din wekî min nefikirin. Niha em werin ser Înîsiyatîfa Heq. Înîsiyatîfa Heq di 2017an de piştî vê biryara MAZLUMDERê û bi vê armancê hat damezirandin; “Ji dêvla em enerjiya xwe bidin nîqaşên navsazîyî, em saziyê diterikînin û tevgereke nû ya mafên mirovan ava dikin.”

Di nava saziyên mafên mirovan de, cudahiya MAZLUMDERê jî û ya Înîsiyatîfa Heq jî ew e ku xwediyê referansên xurt ên îslamî ne. Ango bi referansên îslamî nêzî mafên mirovan dibin. Di demên dawî de ku me dikira ji hev veqetin, MAZLUMDERê dixwast vê wek nasnameyê nîşan bide. Me jî digot, "Dibe motîvasyona me û hevîrê me Îslamî be lê divê sazî nebe Îslamperest" û nîqaşên bi vî rengî çêdibûn. Înîsiyatîfa Heq hinekî jî berhema van nîqaşan e ez bawer im. Bi ya min nêzî gotina Gannuşi ye ku digot, "Em misilman in lê êdî em siyaseta Îslamê nakin. Em siyaseta demokratîk a misilmanan dikin." Lê ez ne bawer im ka Înîsiyatîfa Heq di nava xwe de ev çiqas nîqaş kir heta ku bigihîje vê derê. Wek kesekî di nava nîqaşan de cihgirtî dibêjim. Axir em bûn rêxistineke mafên mirovan ku piraniya wê ji misilmanan û oldaran pêk tê. Û Înîsiyatîfa Heq ji ber tecrûbeyên xwe yên di dema MAZLUMDERê de, bi mebesta rê li ber astengiyên muhtemel ên pêşerojê bigire –ser meseleyê heke di Meseleya Kurdan an jî di meseleyeke din de dubendiyek an jî du fikrên cuda derkevin û ev her du fikrên cuda hevûdu sûcdar bikin û bibêjin "we xwe guherandiye"- derbarê meseleyên hesas de me li hev kir ku peymanekê deynin û ji wan xalan hinek jî hatin pejirandin. Bi rêjeya sê ji çaran divê biryar bên pejirandin. Ser meseleyê em bibêjin di Înîsiyatîfa Heq de li ser Meseleya Kurdan pirsgirêkek derket, ev peyman di wê astê de ye ku dikare di nava me de hekemiyê bike. Îro li çar pênc deran nûnertiyên me yên çalak hene; Enqere navenda me ya giştî ye, li Stenbol, Îzmîr û Diyarbekirê jî nûnertiyên me hene. Ji bo derên din jî xebatên me berdewam in.

Heta îro me çi kiriye, em çi dikin, çawa dikin? Em dikarin di bin banê çend serenavan de qala kar û barên xwe bikin. Yek ji wan serenavan xebat û çalakî ne ku civîn û daxuyaniyên çapemeniyê, meş, çalakî, vekirin û şopandina dozan, panel, konferans, danheva îmzeyan û tew twitterê jî em dikarin têxin bin banê vî serenavî.

Me xebatên raporkirinê kirin û em hê jî dikin. Ser meseleyê komkujiya gundê Zangirtê (Bilge) dê bê bîra we, sala 2009-2010an bû, dîsa ji xwe komkujiya Roboskiyê tê bîra her kesî. Demên dawî ji ber ku di rewşa awarte de (OHAL) mafê grevê pir zêde hat binpêkirin, me bi navê 'Binpêkirina Mafê Grevê di Rewşa Awarte de' raporek amade kir. Derbarê girtina Alpaslan Kuytul û serdegirtina Weqfa Furkanê de jî me raporek amade kiriye. Piştî ku Proseya Çareseriyê qediya û pevçûnan ji nû ve dest pê kir, heta ji me hatiye û heta me xwe gihandiye, me derbarê mafên binpêkirî de rapor amade kirin. Di vî warî de rapora me ya herî zêde tê zanîn ez bawer im Rapora Cizîrê ye; ji ber ku ya herî zêde deng da ev bû. Ya din jî, van rojan heke ji me bê em dixwazin raporekê derbarê Amed Sporê de amade bikin.

Em lobîtî û navçîniyê dikin. Em bi çend awayan lobîtiyê dikin. Li vir wek lokal, li Diyarbekirê em him pi partiyan re him bi saziyan re dikin. Ser me-

seleyê di navbera Huda-Par û HDPyê de, her cara ku xwe li hev rakişandine, me navçîtiya wan kiriye. Carinan me bi tena serê xwe, carinan bi hin saziyên din re. Dîsa çûnûhatinên me yên di navbera Ak Partiyê û HDPyê de jî çêbûne. Xebatên me yên lobiyê yên navbera hikûmetê û HDPyê jî çê bûne/dibin.

Yeka din jî, ji ber ku piştî pevçûnan û rûdana derbeyê, çima ku civaka sîvîl ji kolanan vekişiya malên xwe, me giranî da ser perwerdehiyên derbarê mafên mirovan de. Me Dibistana Mafên Mirovan a Diyabekirê, ku hê wexta em bi MAZLUMDERê re bûn me li dar xistibû, hinekî din bi rêk û pek kir û du serdem qedandin. Bi qasî dibînim ji van heşt dibistanan her duyên dawî profesyoneltir bûn, wekî ku hinekî din li cihê xwe rûniştibe û hinekî din nêzî armanca xwe bûbe. Di çarçoveyeke wiha de em dixebitin.

A niha, mijara ku Cuma Çiçek ji min xwestî “parêzvanî û ragihandina giştî” bû. Raporeke Cuma Çiçek a ji bo Weqfa Aştiyê amadekirî hebû, rapora bi navê rewşa saziyên civaka sîvîl, di proseyên aştiyê de. Min pênaseya wî ya di wê raporê de jê girt û li ser wê pênaseyê ez pê de çûm. Di wê raporê de Cuma Çiçek wiha dibêje: “Parêzvanî û karûbarên ragihandina giştî, ji van xebatan pêk tên; agahiyên SCSyan ên derbarê pevçûnan de, aşkerekirin û berbelavkirina van agahiyan ji bo xêra welatiyan û ji bo feydeya giştî. Çend mînak jî dane di wir de. Yek ji wan mînakan pêhesandina raya giştî derbarê wan zarokan de ye ku di şer de mirine. Yek jê xebatên tevgerên girseyî ne, ku li gel îhtimala hevdîtinên proseya aştiyê ji nû ve dest pê bikin, hatiye pêşniyarkirin. Ya din jî xebatên lobîtiyê yên bi aktorên siyasî re ne.

Helbet di pêkanîna van xebatan de him saziyên civaka sîvîl him jî wek Înîsiyatîfa Heq em di mijarekê de tim û dayîm hişyar bûn. Em van xebatan bi çi armancê dikin? Divê em ji bo kargûzariya civakê bikin. Em îro dikarin mînakeke şênber bidin. Meseleya malbatên ku li pêşiya avahiya HDPyê çalakiyê li dar dixin. Heke derbarê pevçûnan de hûn karguzariya civakê nekin, hûn wê nekin navenda armanca xwe; bi çavê HDPyê hûn ê bibêjin dewlet van malbatan îstîsmar dike û bi çavê dewletê jî hûn ê bibêjin HDPyê zarokên van malbatan şandine çiyê. Wê çaxê bi îhtîmaleke mezin hûn ê ji devereke şaş dest bi nirxandina meseleyê bikin û hê di serî de hûn ê xelet tevbigerin. Loma ji bo me bivênevê ye ku em bi karguzeriya civakê nêzî meseleyê bibin.

Ez ê mînakên ku heta îro me pêk anîne bi we re parve bikim û ji wan hinekan ez ê bêhtir bi hûrgilî li ser biaxivim. Me çi çawa pêk anî an jî çawa pêk neanî, çima me nikarî pêk bînin. Yek ji wan beriya sala 2010an, tew beriya sala 2007an meseleya çalakiyên ji bo azadiya sernixumandinê ye. Piştî salên 1990î ji 28ê Sibatê û vir ve, her şemiyê çalakiyên ji bo azadiya baweriyê hatin lidarxistin. Li Enqereyê, Stenbolê, Sakaryayê û li hin bajarên din ên curbicur... Li Enqereyê bi pêşengiya MAZLUMDERê, derbarê Azadiya Baweriyê de

mîtingeke mezin hat lidarxistin, her kes bi laçikên spî tev li vê mîtingê bû. Asoxî weke hûn jî dibînin, meseleya sernixumandinê hema bibêjin çareser bûye.

MAZLUMDERê di sala 2008an û 2009an de “Kampanyaya Bila ‘Sonda Me’ (Andımız) Bê Rakirin” saz kiribû. Ji Diyarbekirê dest pê kir. Taybetiyeke Diyarbekirê ya wisa heye. Wek hûn jî pê dizanin, hemû saziyên mafên mirovan, navendeke wan jî li Diyarbekirê ye. Vê kampanyayê bi daliqandina afîşan dest pê kirîbû. Li ser afîşê sondeke alternatîf jî hebû ku hinekî henekê xwe bi “Sonda Me” dikir, “Kurd im, Çerkez im, Laz im, ez jî jêhatî û rêrast im.” Qesta min ji alternatîfê ne ku di şûna “Sonda Me” de me ew sond pêşniyaz dikir, tenê ji bo ku balê bikişîne me li ser afîşê nivîsandibû. Ew afîşên ku divê hefteyekê daliqandî bimana, polîsan qetandin û avêtibûn erdê. Paşê em hatin wan rojên ku hikûmetê “Sonda Me” rakir. Di vê çalakiyê de wer dixuye hin sedemên din jî kir ku ev çalaki bi ser bikeve; hinekî zû tevgerîna me, bidestxistina piştgiriya civakî, hinekî jî çûk çû li kêvir ket. Ez bawer dikim yekane kampanyaya me pîroz kirî ev bû.

Raporên MAZLUMDERê yên derbarê cudakariya etnîk û olî de hene, ev raporên pir baş in. Careke din dubare dikim, wek saziyeke civakî ku bi referansên Îslamî di warê mafên mirovan de têdikoşe, tiştekî muhîm bû ku li ser binpêkirina mafê kesên xwediyê bîr û baweriyên cihê û kesên rûbirûmayî bi cudakariya etnîk re bixebite û raporan amade bike.

Kampanyayên me yên di warê zimanê zikmakî de çêbûn. Dema em li MAZLUMDERê bûn me ev bi perwerdehiya zimanê zikmakî dorsînor kiribû. Yeka din jî rakirina qanûna Tevhîd-î Tedrîsatê ku rê li ber perwerdehiya zimanê zikmakî digire. Ango ev her du çalakî derbarê zimanê zikmakî de bûn. Dema saziya me hat girtin, MAZLUMDERê jî kampanya di heman demê de dan rawestandin. Paşê ‘Kampanyaya Edalet ji bo Mexdûrên 28ê Sibatê’ ji nû ve da destpêkirin. Ji xeynî vê, bi qasî ku ez dizanim hemû kampanya dan sekinandin.

Îro, wek Înîsiyatîfa Heq, em dîsa xebateke li ser zimanê zikmakî bi rê ve dibin. Vê carê me çarçove hinekî din berfirehtir kir. Em bi perwerdehiya zimanê zikmakî bi sînor nakin. Em bangî dewletê dikin ku hemû xizmetên giştî bi zimanê zikmakî bide. Vê carê –belkî ji ber ku me ji Diyarbekirê daye destpêkirin- em ji Kurdan re dibêjin. Lê em bangî komikên din ên zimên jî dikin ku xwedî li zimanê xwe derkevin. Ew komikên zimanan ku ji xeynî Tirkî bi zimaninên din diaxivin. Belkî ev, li gor saziyeke mafên mirovan angaşteke pir mezin e lê em pê hesiyan ku çarçoveyeke wiha dê balkêştir be.

Kampanyayeke me ya bi navê ‘Bila Cerdevanî Bê Rakirin’ jî hebû. Ev kam-

panya mînakeke baş e ji bo piştevaniya di nava saziyan de. Mesela DÎSAyê li ser cerdevaniyê xebatên akademîk kiribûn. Me jî ji wan xebatan sûd wergirt û kampanyayek da destpêkirin. Ez dibêjim qey me panelek li dar xistibû. Ew mamosteyê rapora DÎSAyê amadekirî hat. Lê kampanya pir bi ser neket.

Meseleya Roboskiyê, piştî MAZLUMDERê Înîsiyatifa Heq jî pir anî rojevê. Li çend bajaran me stand vekirin. Li Stenbolê, li hewşa Mizgefta Fatîhê me di remezanê de fitarek ji bo Roboskiyê da û hinekên ji Cemaeta Çarşambayê bi sotaran êrîş anîn ser fitara me. Lê dîsa qala civata Misilmanan dikin.

Belkî heta niha karê ku me herî zêde birêkûpêk pêk anî, daxwaz û şopandina me ya derbarê jinûveşandina şervanên zarok de bû. Ez ê bi hûrgilî qala wê jî bikim.

Dîsa xebateke me ya têkildarî mijara me çêbû: Hewldana Koma Têkilîdanîn û Diyalogê. Xebatan li Diyarbekirê dest pê kiribû û hewl dida bingeha proseya çareseriyê ava bike. Piştî ku pevçûnan dest pê kir, me di bin banê MAZLUMDERê de bi navê “Koma Çavdêr a Pevçûn û Çareseriyê” komek ava kir. Raporên wê ne xirab bûn, ji ber ku em ne saziyeke profesyonel in raporên baş bûn.

Îro hin hewldanên me jî derbarê malbatên li pêşiya avahiya HDPyê rûniştî hene. Belkî ez qala wan jî bikim.

Dixwazim qala hin mînakan bikim ku çawa bi ser ketine. Carinan meriv kampanyayên çiqas baş jî bi rê ve bibe, bi raya giştî re çiqas têkiliyên baş jî deyne, dîsa jî ew kampanya her car bi ser nakeve. Wek mexdûriyeta serînixûmandinê û binpêkirina mafên baweriyê ku piraniya civakê eleqedar dike... Binpêkirin pir berbelav e û piştevaniya civakî jî xurt e. Konjonktur li gor wê ye. Em bibêjin qanûn û saziyên navneteweyî yên mafên mirovan êdî qebûl dikin ku ev pirsgirêkek e, mafek e ku tê binpêkirin, raya giştî jî pê dihese ku ev şaşiyek e sereqat tê dubarekirin. Di vê rewşê de raya giştî dê bi awayekî xurt piştgiriya wê bike. Bi vî awayî belkî daxwaza we bê cih.

Ya duyem, wek meseleya “Sonda Me” ku çûk diçe li kêvir dikeve. Me derbarê “Sonda Me” de kampanyayek bi rê ve dibir. Di her serdema destpêk û xelasbûna dibistanê de me li ber Saziya Perwerdehiyê ye Tirkiyeyê çalakî li dar dixist û daxuyanî dida çapemeniyê. Lê ku em bibêjin MAZLUMDERê bi tena serê xwe “Sonda Me” rakir, dê bibe neheqî. Qetiyen ne tiştekî wisa ye ku tenê bi xebata me ev pêk bê. Aciziya rêvebiran a li hember vê metnê jî girîng bû, aciziya wan a ku ji ber kodên wan ên kevneşopîparêz dihat. Ya duduyan ji ber proseya çareseriyê ku ev metin hinekî bi Meseleya Kurdan re têkildar bû. Dewlet derbarê çareseriya Meseleya Kurdan de xwe jê dide paş ku hin gavên

mezin biavêje û ji bo tiştên hewce pêk neyîne, li hincetan digere. Dibêje di şûna masiyê mezin de wek masiyê biçûk ez dikarim çi bidim? Û meseleya “Sonda Me” tê bîrê. Dema ev hemû parçe hatin cem hev, serê sibehekê em şiyar bûn ku derbarê pakêta demokratbûnê de me wer dît “Sonda Me ” ji jiyana me derketiye.

A balkêş hê jî bi temamî derneketiye. Ji ber ku tenê rêziknameya xwendina “Sonda Me” a li dibistanan guherandine. Par ne pêrar bû ez na şaş bim, em pê hesiyan ku metna “Sonda Me” hê jî di pirtûkên zarokên pola duyem û sêyem de heye. Me ev derbarê Qanûna Pirsîn û Agahdarkirinê de ji saziya eleqedar pirsî ku derbarê vê mijarê de me agahdar bikin. Saziya eleqedar bi me da zanîn ku qanûnê tenê xwendina sondê rakiriye û qanûna derbarê cihgirtina di pirtûkan de hê jî di meriyetê de ye, loma dê ji vir û şûn ve jî di pirtûkan de cih bigire. Ev deskeftiyeke me ye lê ji aliyekî ve jî em dibînin bê ka burokrasî di pêkanîna heqekî deskeftî de jî çiqas xwe li kerriyê datîne. Min li pirtûkên şagirtên pola çaran nêrî, tune bû îsal, yên din nayên bîra min.

Em werin ser meseleya şervanên zarok. Bînin bîra xwe di salên 2014-2015an de pir bû. Heta 2017an me ev şopand. Çalakiya malbatên ku zarokên wan tev li PKK bûne hebû. Pêşî li Fîskayayê çalakiyan dest pê kir. Wek çalakiya li ber avahiya HDPyê bû. Tenê malbetekê kon vekir û dixwast zarokê wan ê bi navê Sînan bi şûn ve bişînin. Derbarê meşrûtiyeta çalakiyê de kesek nikare tiştekî bibêje. Wek îro hikûmet mikûmet jî nediçû cem wan. SCSyên nêzî hikûmetê jî ev ewqas îstîsmar nedikirin. Paşê belkî kirin lê... Asoxî em çûn serdana malbatê. Belkî malbateke HDPyî bû. Ne bajarî lê malbateke welatparêz a li gundan bû. Tiştekî pir hêsan digot: “Madem Selahattin Demirtaş siyasetê dike, bila zarokê min jî siyasetê bike, bila ne li çiyê be. Ez dixwazim ew jî bibe mîna Selahattin Demirtaş.” Û ez wek mînak bibêjim: “Ez naxwazim bibe wek Duran Kalkan.” Mexseda xwe jî xweş dianî ziman.

Du mehan beriya wê çalakiyê, dezgeheke navneteweyî hatibû serdana me. Rêxistineke bi navê Bangewaziya Cenewreyê. Li ser vê meseleyê dixebitîn û me jî qala wan tiştan kir, a ku em derbarê wê de dikin. Me li hev kiribû ku derbarê vê meseleyê de heke tiştek qewimî em hevûdu agahdar bikin. Dema li vir tiştekî wisa rû da hewce bû me fikra wan jî bipirisiya. Çi ku zarok hê panzdeh salî bû Xwedê dizane. Baş e, em ê çawa zarok ji nû ve bidin vegerandin. Bangawaziya Cenewreyê hat bîra me. Em li wan geriyan û me got, “Meseleyeke wiha heye, teahudnameyeke we çêkirî hebû, wê ji me re bişînin.” Wiha ye; PKKyê û wê dezgehê teahudnameyek îmze kirine. PKK teahud kiriye ku dê şervanên zarok qebûl neke. Lewre dezgeh bi tu awayî qebûl nake ku kesên ji 18 saliyê biçûktir bikin şervan. Lê edetekî Tirkiyeyê û PKKyê ew e ku şerhê datînin ber peymanan. PKK li wir şerh daniye û gotiye: “Em kesên ji 16 saliyê biçûktir bi tu awayî qebûl nakin lê yên di navbera salên 16-

18an de em ê qebûl bikin, em ê qebûl bikin lê em çekê nadin destê wan. Em wan naşînin kampên çekdarî lê em ê bişînin kampên perwerdehiyê." Ango em çekê nadin dest wan lê em ê qebûl jî bikin.

Derbarê vê teahudnameyê de me bangî PKKyê kir, me got, "We teahudnameyeke wiha îmze kiriye, em jî dizanin ku filankes gihiştiye we, ji nû ve ji me re bişînin." Car hebû ku xeletiyên me jî çêbûn. Li ser meseleya Sînan wek mînak. Ev xeletî ye mesela, divê ev neyê kirin. Di medyayê de navê lawik pir derbas bû, malbatê fotokopiya nasnameya lêwik da her kesî. Ango guh neda nav, nasnav û mehremiyeta lêwik. Civak, medya, malbat, em, carinan me navên wan aşkere kirin. Asoxî lawik bi şûn ve vegeriya û ku lawik hat, malbatên din jî ketin bendewariyê; "Waa, nexwe dikarin bên."

Wê demê me yek du bangewazî kirin. Me Bangewaziya Cenewreyê jî agahdar kiribû, madem teahudnameyek heye, hûn jî mudaxele bikin. Paşê gelek malbatên haya wan jê çêbûyî hatin li deriyê me xistin. "Zarokê me çû çiyê, wiha çû, wisa çû." Li ber şaredariyê çalakiyek jî li dar xistin, çalakiya rûniştinê, bînin bîra xwe. Me ev mesele wiha şopand hevalino, bi her malbatê re serê mehê carekê bi rêk û pêk me hevdîtin pêk dianî. Derbarê zarokên xwe de çi agahî bi dest xistibin me nîşe girtin. Lewre hemû malbat ketibûn dû zarokên xwe yên ku çûne çiyê. Zarok ji bo seyranê çûye Birqeleynê û venegeriye. Paşê malbat diçe Liceyê. Li Liceyê hinekan dibîne. Yê Liceyê dibêje "zarokê te" ser meseleyê "li Dêrsimê ye." Diçe Dêrsimê, yekî dibîne. Yê Dêrsimê jê re wiha dibêje, wisa dibêje… Hin malbatên çûyî Başûr an jî çûyî kampên li jêra Qendîlê û zarokên xwe dîtî jî hebûn. Hin zarok li malbatên xwe digerin, dibêjin ez li Rojavayê me, li filan derê me, bêvan derê me. Malbat derbarê zarokê xwe de çê-xirab xwedî agahî ne. Me jî ev hemû agahî ji malbatan distendin. Me prose bi awayekî şopand. Em tu caran yekser bi PKKyê re neketin têkiliyê ji ber ku me dizanî dê serê me pir pê biêşe. Me hemû prose di ser Bangewaziya Cenewreyê û saziyên din ên mîna wê re bi rê ve bir.

Yek jî me tim ji bo raya giştî daxuyanî didan, bangewazî dikirin. "Li ber destê me bi qasî 20-30-50 zarokan serîlêdan hene. Zarokên ku nav û paşnavê wan bi filan tîpan dest pê dikin, hefteyek berê li filan derê tev lê bûne." Daxuyaniyên bêyî zarokan aşkere bikin lê bi daneyên rast ên ber destê xwe ku bizanin em bi meseleyê dizanin, haya me jê heye. Bangewaziya Cenewreyê muhtemel e ku bi telefonê, bi nameyan an jî diçûn wê derê û bi PKKyê re hevûdu didîtin. Taliyê digotin zarok li cem me di kampê de ne. Em li wir têgihiştin ku ji bo şopandina meseleyê, dayîna daneyan a bi hûrgilî çiqas muhîm e. Ji ber ku dema daneyên me bi hûrgilî bûna, PKKyê bi rihetî nedikarî red bikira. Piraniya van zarokan ji nû ve vegerandin.

Wê demê YPGyê jî ev teahudname îmze kir û bi qasî tê bîra min, li ber destê

me bi qasî 55-56 serîlêdanan hebûn ku me dişopandin. Ser meseleyê wiha diqewimî; “Zarokê min ê 15 salî van demên dawî bi hevalên xwe yên nêzî PKKyê re digeriya û çû. Li kû ye, em nizanin. Çawa çûye, em nizanin.” Me ev li cem xwe dinivîsandin, bê guman lê hewldanên me tenê ne li ser van agahiyan bûn. Heke tenê li ser van agahiyan bûna îhtimal e ku tiştê îro dibêjin dê ji me re jî bigotina. “Keko ji mal derketiye çûye, de em ji kû dizanin çûye kû derê, ez ê niha rabim yeko yeko li nasnameyên deh hezar mîlîtanan venêrim ku zarokê we bibînim?” Paşê YPGyê jî ev teahudname îmze kir û gelek zarok vegeriyan. Ji wan 55-56 zarokên ku me dişopandin, 15 jê vegeriyan.

Lê em vê dizanin, zarokên ku çûne ji hezarî zêdetir in. Bi hezaran bûn. Heke em 18 saliyê wek pîvan bigirin qala sê hezar û tiştekî dikirin wek hejmar. Heke ev hejmareke mubalexekirî be jî me dît ku bi kêmanî nîvê wê rast bû û çûbûn. Ser meseleyê malbateke Farqînî dihat cem me digot; “Vê hefteyê li taxa me 25 zarok vegeriyan.” Çûbûn Rojavayê, ji wir vegeriyabûn. Li gor vê teahudnameyê YPGyê ew bi şûn ve vegerandibûn. Vegerên ji Qendîlê zehmettir bûn. PKKyê ew radestî Herêma Kurdistanê dikirin û wan jî radestî Tirkiyeyê.

Bi ya min em saziyeke di cih de bûn ji bo mudaxeleya vî karî. Berfirehiyeke me ya wisa hebû. PKKyê jî û dewletê jî hewldanên me pir nedilomandin. Jixwe kesekî jî hewldanên me wek hewldaneke xirab bi nav nekir.

Di vê mijarê de bikaranîna mekanîzmayên navneteweyî fikreke pir û pir baş bû. Herwiha şopandina me ya ku xwe dispart daneyên birêkûpêk karê me hêsantir kir. Me tim ev hevsengî li ber çavan girt. Rîsk û meşrûtiyeta vî karî heye. Me hewl da ku hevsengiya rîska vî karî û meşrûtiyeta wê xira nebe.

Ser meseleyê derdora Adara 2015an bû. Çend malbat hatin û gotin zarokên me çûne çiyê. Ji me re qal kirin bê ka bi kîjan rêyê çûne. Gotin hêviya me ji we hûn tiştekî bikin ji bo zarokan. Me bi malbatê re da û stand: “Hûn dixwazin em bi hev re daxuyaniyekê bidin? An na em bêyî we daxuyaniyê bidin?” Helbet em ê navê zarokan aşkere nekin. Lê malbatê got: “Bêyî me daxuyaniyê bidin lê teqez bidin. Dibe ku zarok hê di rê de bin, belkî bi şûn ve vegerin. Em dixwazin hûn vê bikin.” Li vir hesabekî balkêş ê parêzvaniya mafên mirovên derdikeve pêşiya meriv. Di rojnamegeriyê de jî ev wisa ye. Bînin bîra xwe, hilbijartinên 7ê Hezîranê nêzîk dibûn. Hikûmetê wiha digot: “Em ê zarokên ku çûne çiyê bi şûn ve vegerînin, dayîk dê negirîn. Zarokên li çiyayan dê bigêhijin malbatên xwe.” Di danezana hilbijartinê de heye ev. Niha ev tê wê wateyê ku hewldanên me yên ji bo vegerandina zarokên li çiyayan, tê wê wateyê ku em li gor danezana hilbijartinê ya hikûmetê tevdigerin. Rîskeke wê ya wisa heye. Rîska ku HDP bendê derbas bike an neke. Her kes pir bi kelecan e, bi metirsî ye. Wê heyamê hemûyê bînin bîra xwe.

Em li hev rûniştin û me got, “Heke em vê bikin dê çi bibe?” Dibe ev bandoreke neyînî li rayên HDPyê bike. Wek saziyeke mafên mirovan em ê bûbûna sedema vê. Paşê me got hevalino, karê me karguzariya civakî ye. Em mecbûr in vê daxuyaniyê bidin. Lewre karê me ew e ku li derekê binpêkirina mafekî hebe, em li wir mudaxele bikin. Ew luksa me tune ye em binpêkirinê taloq bikin. Heke ev bandoreke neyînî li HDPyê bike, yê ku li vê bifikire ne saziya MAZLUMDERê an jî Înîsiyatîfa Heq e, divê PKK li vê bifikire. Divê tu zarokekî qebûl neke. Heke li ser wê fikrê ye ku ev veguheriye kampanyayekê û bandoreke neyînî li rayên HDPyê dike, nexwe divê vê rewşê ji holê rake. Em nikarin tim bibêjin, “Ev demên dijwar in ku ji her carê bêhtir pêdiviya me bi hev heye” û tiştan taloq bikin.

Loma min mînaka rojnamegeriyê da. Ser meseleyê em bibêjin dosyeya nelirêtiyeke mezin derketiye û ew kes di heman demê de namzetê serokatiya şaredariyê ye. Heke ez vê aşkere bikim, bidestxistina şaredariyê dê bikeve xetereyê lê nelirêtiyek jî heye li holê. Esas jixwe kesekî wiha nebe şaredar jî, divê nesekine rojnameger. Em wisa tevgeriyan û me gelek caran gelek rîsk dan ber çavan. Berê me tim daxuyaniyên nivîskî didan, wê çaxê çima ku em derketine ber çapemeniyê û axivîne, bertekên ecêb hatin ji girseya HDPyê. Me nedixwast em li hesabên xwe yên tora civakî binêrin. Heqaret, çêr, gotin li bin guhê hev diketin lê me got baş e ku me tiştekî wisa kiriye. Paşê em ji kirina xwe poşman nebûn.

Baş e, me çima dev ji şopandinê berda? Pevçûn pir dijwar bûn. Êdî ne malbatan agahî ji zarokên xwe distend ne jî me dikarî bişopanda. Me ji Bangewaziya Cenewreyêre tim heman tişt digotin; “Dibêjin ‘tu pêşketinek tune ye’, tiştekî nû ku malbat pê dizane tune ye, hewldaneke malbatê tune ye.” Ji loma dema Bangewaziya Cenewreyê dît ku daneyên ji Tirkiyeyê tên nû nabin, wan jî eleqeya xwe birî. Jixwe pevçûnên navbajaran dest pê kirin. Zarok bêhtir li navendê pev diçûn. Yan hatin kuştin yan hatin girtin.

Koma Têkilîdanîn û Diyalogê di 2012an de ava bûbû. Em jî û Komeleya Mafên Mirovan (IHD) jî tê de bû, rehmetiyê Tahir Elçi jî hebû. Me pênc-şeş saziyan bi navê Têkilî û Diyalogê komek ava kiribû. Bînin bîra xwe, di 2012an de grevên birçîbûnê hebûn li girtîgehan. Atmosfera siyasî ne xweş bû. Ji aliyekî ve PKK ji rêbazekê derbasî rêbazeke din a têkoşînê bûbû. Li şûna taktîka gerîlayan a lêxe-bazde, veguherîbû tiştekî din. Şikil û şertên têkoşînê, li hin deran tiştin ferz dikirin. Me jî bi vê koma têkiliyê di asta herî jêr de dest pê kir û em ketin hewldana hin têkiliyan. Ser meseleyê, em bi hevserokên HDPyê re diaxivîn, bi wezîran re diaxivîn, paşê wekîlekî AK Partiyê ku li herêmê xwedî gotin e. Û dûv re me danîna têkiliyan radikir asteke jortir, bi serokê giştî ê HDPyê re em diaxivîn, bi hin wezîran re, pê de pê de me hinek vedixwendin saziyê. Mesela Mithat Sancar ez bawer im yek ji wan kesan e ku me paşê tev li komê kiribû.

Ango hin hewldanên ku vê meseleyê bibin nava HDP û dewletê, li wir bi wan bidin nîqaşkirin ku danîna pêwendiyeke dîtir û hêsantir pêk bê.

Siûda wê hewldanê ew bû ku tavilê Proseya Çareseriyê dest pê kir. Vê hewldanê got pêdivî bi me nema. Paşê em li dû xwe vegeriyan ku esas hê jî pêdivî pê hebûye. Dikaribû bibûya mekanîzmayeke xweser a proseyê dişopîne. Ev tev nîşaneya ecemîtiyên me yên şexsî û civakî ne. Asoxî wan çi kir, ji ber ku şert û mercan hevdîtinên çareseriyê li ser wan ferz dikirin, wisa bi hêsanî derî li me nedigirtin. Ji ber ku bendewariya civakî her diçû zêde dibû. Polîtîkaya hikûmetê ya wê çaxê mîna niha wiha ne dijwar bû. Digotin meseleya Kurdan meseleya me ye jî û sozên demokratîkbûnê hê jî didan. Wisa mîna niha derî bi şid nedihatin girtin.

Îtîbara kesên ku wê lobiyan pêk bînin... Mesela Şah İsmail Bedirhanoğlu, Tahir Elçi, Mithat Sancar; ev kes xwediyê wê tecrûbeyê bûn ku him ji aliyê hikûmetê ve him ji aliyê HDP ve dikarîn bi karûbarên navçînî û lobîtiyê rabin. Wek sazî jî dikarim navê MAZLUMDERê hildim, yek jî navê Selahattin Çoban û Ahmet Faruk Ünsal... Ji loma avakirina komeke rast ji hêla aktorên baş û aktorên rast ku haya wan jê heye bê ka çi dikin... Heqeten jî di warê mafên mirovan de ev karê lobîtiyê karekî zor zehmet e. Em vê di meseleya malbatên li ber avahiya HDPyê de careke din dibînin. Hûn bi qesta gavavêtineke pir biçûk diçin cem însanekî, diçin saziyekê lê ew şîretan li we dike, propagandayê dike, heqaretan li aliyê din dike. Hûn mecbûr in xwe li ber van tiştan ragirin.

Ev çend mînakên baş in lê divê em qala mînakên xirab jî bikin. Ser meseleyê ji ber ku bi plansaziyeke baş nehatine kirin, hin kampanyayên me negihiştine armanca xwe. Yek ji wan meseleya perwerdehiya zimanê zikmakî ye. Kampanyayeke wisa ye divê hûn tim tiştinan bikin, lê bêyî em li vê bifikirin me xwe lê qewimandiye. Wek pêkneanîna berdewamiyê... Di kampanyaya 'bila cerdevanî bê rakirin' de ser meseleyê, me wer nikarî em vê bikin. Tunebûna organîzasyoneke baş a têkilîdanîna bi gel re. Em ê kampanyayekê bi rê ve bibin lê em ê çawa kesên li çarşiyê û bazarê tev li vî karî bikin? Em rûneniştin û me hesab û kîtabê vê baş nekir. Tunebûna karbeşiyeke baş û her wekî din.

Hey gotin hatiye ser, divê bînim bîra we ku saziyên wek MAZLUMDER û Înîsiyatîfa Heq tenê bi kesên dildar xebatên xwe dimeşînin. Dibe kampanyayeke pir baş were bîra we. Û bi ser de, dibe hûn bi ser rê û rêbazên domdariya wê kampanyayê ve jî bûbûn lê ji bo pêkanîna wê kampanyayê ewqas pere û ewqas însan lazim e û ew bi we re tune. Ji loma hûn mecbûr in ku wê xebatê yek du radeyan di asteke jêrtir de bidin destpêkirin. Mesela yek ji wan dildaran dibe bi carekê re bi du xebatan re mijûl bibe. Ev jî ji deverekê

û bi şûn ve dê bibe sedem ku motor germ bibe, hararetê rake û rê li ber neşixulîna erebeyê veke. Tunebûna pere, însan û derfetên teknîkî sedemek e ser meseleyê.

Guherîna şert û şûrtan jî dibe bandorê li kampanyaya we bike. Ser meseleyê dema me dest bi kampanyaya cerdevaniyê kir, bertek ne xirab bûn, bala her kesî kêşa. Federasyona Cerdevaniyê derbarê Proseya Çareseriyê de tiştin kirin, paşê çend cerdevan hatin kuştin. Me wer dît cerdevanî xurttir bû. Dema li çolteran cerdevanî veguherî cihê berjewendiyê û bi awayên dîtir dewletê hê zêde cerdevan girtin, me hew karî bi komeleyên cerdevanan re têkiliyê deynin. Me hevdîtînek plan kiribû, me qewlek dabû hev, paşê çênebû. Her ku proseya çareseriyê ber bi xirabûnê ve çû ev xebat jî têk çû.

Ev ne mînakeke têkçûnê ye lê ji ber tecrûbeyeke baş e, dixwazim vê jî bi we re parve bikim. Carinan hûn ê ji bo xebatekê haziriya xwe bikin lê hinek dê berî we tev bigerin û bi wê xebatê rabin. Em bibêjin sibê em ê derbarê perwerdehiya zimanê zikmakî de daxuyaniyekê bidin. Serê sibehê em radibin ku hikûmetê biryar girtiye û dibêje; “Mafê perwerdehiya bi zimanê zikmakî tê nasîn. Di sala 2023yan de dê têkeve meriyetê.” Êdî ev daxuyaniya we, dê di destê we de bimîne. Ji ber ku di warê mafên mirovan de ji bo min jî mînakeke pir baş e dixwazim bibêjim. Ew nivîsa li pêşiya parêzgariyê Diyarbekir dê were bîra we, nivîsa ku bi tîpên mezin digot, “Jê re cihê bextewariyê ye yên ku bibêjin em Tirk in.” Me wek MAZLUMDER haziriyeke wisa kir. Me brandayeke bi qasî mezinahiya wê tabeleyê anî û ayeta 22yan a Sûreya Rûmê bi Kurdî li ser da nivîsîn. Tê de dibêje, “Cudahiya rengê me û zimanên me ji ayetên Xwedê ne.” Di nimêja sibehê de em ê biçûna û du hevalên me dê branda li ser wê tabeleyê daleqandina. Haya çapemeniyê jî jê heye. Me tenê ji du rojnamegerên nas re gotiye ku sibê li filan derê çalakiyeke me heye, werin wê derê.” Ji ber ku wexta çapemenî bi rêya emailê tê agahdarkirin beriya çapemeniyê haya emniyetê jê çêdibe. Me branda hazir kir, her kes hemfikir e, em bi dil û can bi rê ve dibin. Roja dawî bi şev me got ka em wek cara dawî bicivin. Me karbeşiyên xwe yên dawîn kirin. Du parêzeran wê ev çalakî li dar bixista. Serokê şaxê û alîkarê serok dê li dar bixistina, da ku yên din nekevin rîskê.

Alîkarê serokê MAZLUMDERê yê berê, Şimşiröddin Ekinci hebû. Wê rojê ew jî hatibû civînê. Rêvebiriya me na lê kesên ku me jê re digot xeleka duyem ev kar spartin ciwanan û xwe dan paş. Got, “Hevalino pêşniyazeke min heye ji we re, vê çalakiyê wiha nekin.” Çawa nekin, me biryar standiye filan. Got, “Ev daxwaz a kê ye? Ya MAZLUMDERa şaxa Diyarbekirê ye. Hûn baş xirab dewletê jî nas dikin. Heke em vê pankartê daleqînin, îhtîmal e ku bandoreke neyînî jî lê bibe. Çi ku nijadperest jî li dijî Proseya Çareseriyê ne, Mirovên Aqilmend tim tên şermezarkirin. Heke ev têkeve rojeva welêt –ku dê têkeve- refleksek nijadperestî dê pêl bide, parêzgarî dev ji rakirina tabeleyê berdin, dê

tabeleyê nû bike, bibiriqîne û dîsa daleqîne. Axir ku dilê wan ê danîna wê nivîsê hebe jî êdî danaynin. Ji loma pêşniyaza min ew e ku hûn wisa nekin." Baş e em çi bikin nexwe? Tiştekî muezzem got. Hê jî wek guharekî bi guhê min ve ye. "Hûn dikarin daxwaza xwe ya saziyî veguherînin daxwaza civakî. Pêşî –Xwedê dizane wê çaxê hê nû hatibû- randewûyekê ji walî bixwazin, herin bixêrhatinê, dema we qala çend meseleyên bajêr kir, di nav re qala vê jî bikin. Bibêjin em dixwazin hûn vê tabeleyê deynin. Ji bo vê daxwaznameyeke fermî bidin û 15 rojan bisekinin, heke bersivek nedan em ê li çend cihên bajêr standan vekin. Em dixwazin nivîsa "Jê re cihê bextewariyê ye yê ku bibêje ez Tirk im" a li pêşiya parêzgahê bê rakirin! Û îmzeyan bidin hev. Paşê em van îmzeyan bigihînin hev, sed, hezar axir her çi be em wan bidin parêzgahê û bibêjin ev daxwaza gel e û em jî li ser navê wan dixwazin bê rakirin. Heke digel vê jî ranekirin, wê çaxê em vê çalakiyê li dar bixin. Bi vî awayî du sê hezar însan dê hay ji daxwazê hebin, dê hay jê hebin ku hûn di amadekariya tiştekî wiha de ne û dê piştgiriya we bikin qe nebe. Ew tiştê ku hûn dibêjin em ê di serî de bikin, herî dawî bikin."

Di vê navbeynê de çi bû? Mahsuni Karaman daxwaznameyek da parêzgahê. Ji me xweser, bêyî haya me ji hev hebe. Û piştî mehekê û du mehan ew nivîs rakirin. Xwedê ji wî razî be. Berî ku em çalakiya xwe bi formateke din biguherin, pirsgirêk çareser bûbû. Carinan wiha di nava lepên meriv de dimîne lê reqabeteke bi awayekî din e ev. Ango dema hinekên bi tiştinan re mijûl dibin li ser hin tiştan difikirin û dixebitin, barê meriv sivik dibe, ji loma meriv pê kêfxweş dibe. Ji ber wê ne wekî tiştekî ye ku meriv bibêje, "Me yê dest bi sektorekê bikira, dê qezenca me ewqas bûya lê ji dest me çû," tiştek wisa tune di vir de.

Bi saya van tecrûbeyan me xebata xwe ya nû, kampanyaya zimanê zikmakî baştir organîze kir. Em bi reklamkaran re rûniştin. Saziyekê (Rawest) bi ciwanan re lêkolînek li ser zimên kiribû. Da em daneyên wan di kampanyayê de bikar bînin me derfetek bi dest xist. Li Stenbolê saziyekê (Navenda Bîrê) em vexwendin û bi saya wan me xwe gihand reklamkaran. Wê demê min digot em vê kampanyayê wiha bi rê ve bibin. Sêwirandinên me xweşik bûn. Li ser panoya li korîdorê înfografîkek heye, derbarê nêzîktêdayîna ciwanan a digel zimên de ye. Postên me yên ji bo medyaya civakî bi profesyonelî hatin amadekirin. Metnên me yên bo serwîsê ji berê de amade bûn. Kîjan parîkirin dê kêngî bê parvekirin, çente dê ku li bên belavkirin, afîş dê çawa bêhtir li ber çavan bikevin...

Du kêmasiyên me man, yek jê me yê li bilbordan daleqanda. Kampanyayê dê xwe bigihanda girseyan, piştî me daxwaznameya xwe da şaredariyê, berî ku bersiva me bidin qeyûm anîn ser şaredarîyê. Hin bilbordên ku xisûsî aîdê şaredariyê ne, civaka sîvîl dikare wan belaş bi kar bîne. Ango şaredariyê derfe-

ke wiha dida, her sax bin. Ya duduyan, me yê li kolanan roportaj çêkira û ew ê montaj bikirina. Kêşana me ya ji bo ceribandinê muezzem bû. Lê kêşana ceribandinê bû. Ji bo kêşanên rastîn muwefeqata kesên li kolanan hewce bû. Însanan xwe nedidan ber muwefeqatê. Ji yên ku muwefeqatname dan tiştekî hêja derneket. Ev vîdyo çênebû. Ev her du tişt jî pêk nehatin.

Lê mesela me ev kir. Avantaja saziyeke wek Înîsiyatîfa Heq a wisa jî heye. Bi filan pirtûkfiroşî re jî nava meriv xweş dibe bi bêvan pirtûkfiroşî re jî; yek jê îslamî ye yê din nêzî HDPyê ye. Tew pirtûkfiroşekî dîtir ê di navînê de jî ji we re dibe alîkar. Me çû çenteyên xwe dan hemûyan û me dirûşmeyên kampanyaya xwe destnîşan kirin. Ne hişk in. Li ser çenteyan du tişt hatine nivîsin. Li aliyekî bi Tirkî li aliyekî bi Kurdî. “Dilim Varlığımdır” ango “Ziman Hebûn e” hatiye nivîsîn. Ya din jî “Ziman heq e, heq heyat e” hatiye nivîsîn. Ango li gor her kesî, tew ê ku bixwaze dikare aliyê wê yê Tirkî derxe, tiştekî wiha ye. Min bi xwe re biribû Kayseriyê û min li wir ji bîr kiribûn, heşt-deh heb. Min ji baltûzên xwe re got, “Ku hûn naxwazin aliyê wê yê Kurdî derxin, hêla Tirkî derxin zimanê we jî heqê we ye.” Vê carê jî me hê dest pê nekiriye materyal tavilê qediyan. Yayın Ağacı, Lilav, Yeni Umut Kırtasiye, Ensar Kitabevi. Me çente danîn van deran, tevî broşûrên xwe. Didan ên ku li wir alûvêrê dikin.

Esas çîrokeke din a çenteyê paçîn heye. Derbarê rojeva poşetan de bû ev. Bi meseleyên civakê re têkildarkirin di vir de muhîm e. Li pêşiya marketekê me yê belaş bida însanan… Li şûna poşetên naylon ên 25 qiruşan hûn van belaş didin. Li marketan li dora neh-deh lîreyan tên firotin. Ji loma pir balê dikişîne, dirûşmeya we bi vî awayî digihîje însanan.

Fikra çenteyê paçîn, piştî danûstandina bi xebatkarên ajansa reklamkariyê re derket holê. Çend xebatên me yên din hene, heke em pereyan peyda bikin em ê wan jî pêk bînin. Sûngerê firexan ser meseleyê, em her malekê sûngereke firaxan didinê. Qampanyaya xwe li ambalajê dikin. Me fîzîbîlîteya wê jî kir, tiştekî pir erzan e. Qonaxeke piştî wê rasterast ji dayikan re, jinên malê belkî. Çente dê bigihîje nava malê an na nizanim, lê ku hûn herin avahiyekê û her yekê deynin ber deriyekî însan dê wan sûngeran rakin. Heta derfet hebin dê kampanya jî xurttir bibin.

Dixwazim qala malbatên li ber avahiya HDPyê bikim û biqedînim. Ev krîzek e an firsendek e? Ji bo kê, ji bo me! Ji bo HDPyê, ji bo AKPyê krîzek e an firsendek e? Mijara me ya esasî ne ev e. Hewce ye ew jî vê pirsê ji xwe bipirsin. Helbet em dizanin meseleyeke çiqas zehmet, çiqas hesas e. Em dibînin ku tê îstîsmarkirin jî. Lê ji hêla me ve, ji hêla kargûzariya gel ve, aliyekî meseleyê heye ku divê em pirsgirêkê veguherînîn firsendê û ji loma me biryar da em daxilî meseleyê bibin.

Di qada civaka sîvîl de, hejmara saziyên ku bikarin him bi AKPyê him bi HDPyê re bidin û bistînin, li Diyarbekirê hê jî zêde ye lê li Tirkiyeyê pir kêm bûye. Her du partiyan jî dema me got em ê derbarê vê mijarê de werin ba we, xwedê ji wan razî, herduyan jî qebûl kirin. Me hinekî mesele rakir û danî. Du kom malbat hene li wir; yek jê malbata leşker û polîsên ku PKK dest daniye ser wan, ya din malbata zarokên wan çûne çiyê. Yên zarokên wan çûne çiyê jî du şax in; yên zarok û yên nezarok. Dema meriv bi giştî li meseleyê dinêre çareserkirina wê zor zehmet xuya dike lê dema em parçe parçe lê binêrin, wê demê dibe tiştin bên kirin.

Me ji HDPyê re jî û ji AK Partiyê re jî got ku "Heqê we tune hûn bibêjin 'em ne muxatabê vê meseleyê ne' ji ber ku li vî bajarî hûn yek ji %70 ray digirin yê din ji %30. Ango du partiyên siyasî yên vî bajarî hene. Heke hûn bi pisgirêka herî muhîm a van însanan re eleqedar nebin nexwe hûn ê bi çi re eleqedar bibin? Ji loma bi çavekî biçûk li xwe mêze nekin. Hûn aktorên xurt ên sîyasî ne. Hûn mecbûr in ku bi pirsgirêkên van malbatan re eleqedar bibin. Hûn bikarin wan bi şûn ve vegerînin an nikarin em wê nizanin lê em dixwazin daxwazên wan werin cih."

Ya duduyan, me hin pêşniyaz kirin. Me duh dît, ser meseleyê HDPyê hin ji wan pêşniyazan anîne cih. "Komîsyonekê di nava partiyê de ava bikin, wek maseyeke krîzê, sazî û kesan vexwînin, ji wan re bibêjin em dixwazin bi hûrgilî çîroka we guhdar bikin. Zarokê we li kû çû, çawa çû, çend salî bû?" Ji bîst û pênc malbatan heft-heşt jê malbatên leşker û polîsan in. nozdeh-bîst jê jî yên ku zarokê wan çûne çiyê. Zarokê malbatekê 22 sal berê çûye, heke hûn ji min bipirsin PKK dê nizanibe bê ew zarok li wir e an na. Lê dema em hemû enwanterê derxin, îhtimaleke mezin zarokên sê meh berê, pênc meh berê çûne dê bên dîtin an jî yên di 13 saliya xwe de çûyî, di 15 saliya xwe de çûyî... Ji vir meriv dikare daxilî meseleyê bibe.

Em niha haziriya vê dikin. Ji me re gotin PKKyê daxuyaniyek daye. Gotiye bila heyetek were em ê van leşker û polîsan radest bikin. Hevalên me dê vê daxuyaniyê bibînin. Di ser vê daxuyaniyê re em ê bangî hikûmetê bikin. Em wek Înîsiyatîfa Heq dildarê vî karî ne. Heke PKKyê daxuyaniyeke wiha dabe, heke dê radest bike, bila dewlet destûrê bide me, em ê herin bînin leşker û polîsên girtî. Çareseriya vê pirsgirêkê, qet nebe belkî mijara Meseleya Kurdan, pevçûnê, pêdiviya çareseriyê û daketina însanan ji çiyê dîsa bixe rojevê. Ev e mirazê me.

Li aliyê din, bi vê munasebetê em diçin AKPyê û dibêjin, "Çûne ber avahiya HDPyê lê ev ne meseleyek e ku tenê bi HDPyê çareser bibe. Heke hûn tune bin, hûn hin rêyan venekin, hikûmet hin pêbaweriyan nede, ev mesele çareser dibe? Qethen nabe. Ango divê hûn jî tiştinan bikin."

Em ê heta Enqereyê bibin van hewldanan. Partiyên ku li meclîsê komên wan hene. Ev mesele wiha çawalêhato nayê çareserkirin, bila zarokek were, dudu werin, deh hezar însan e ev, dê çawa werin? Divê çi bê kirin? Em tiştekî bikin, çi bikin, di vê lêgerînê de dibe derkeve holê.

Em nikarin meseleyê ji binî ve çareser bikin lê parçeyekî biçûk bê çareserkirin jî derfeteke mezin e. Em di ser vê derfetê re daxilî vê meseleyê dibin û di vir de di nava saziyan de ango nava partiyên siyasî de gelo nebe meseleya aştiyê dîsa bê axaftin, em di wê hewldanê de ne û dibêjin gelo dîsa ji nû ve neyê nîqaşkirin. Ango di asta mîkro de em karguzariya malbatê dikin. Li aliyê din, di asta makro de jî karguzariya hemû civakê dikin, derbarê çareserkirina Meseleya Kurdan, derbarê pevçûnan û derbarê çareseriyê de xwe daxilî vî karî dikin.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *We qala azmûnên xwe kir. Qala binpêkirinên mafan û we qalê kir ka we ew pirsgirêk çiqas çareser kirine. Di nava qalkirinên we de, erê gelek xebat hebûn ku heqeten jî hûn bi ser ketine lê yê min ez dixwazim vê bipirsim. Mesela dema we qala pisgirêkan kir, bi piranî we qala zarokan kir. Ji bo jinan, neqehiya li jinan hatiye kirin, hûn qet li ser xebitîn? Muheqeq we yê dîtibe, meseleya xwenixumandinê yek ji mînaka vê ye lê bi taybetî li vê herêmê hinekî din bandora kevneşopiyê, bandora feodaliyê heye. Em neheqiya ku li jinê tê kirin li vir, li van deran hinekî din zêde dibînin. Li hemû civaka me mixabin ev wiha ye, we ji bo wan tiştek kir gelo? Ser meseleyê we qala kampanyaya sûngerê firaxan kir. We got em sêngerên firaxşûştinê bidin dayîkan, deynin ber deriyan. Belê, me jî zeft kir. Esas ev in pirsgirêkên me yên civakî. Mesela em wî karî dispêrin dayîkan, dispêrin jinan. Hêviya me ji we hinekî din hestiyar bin. Hewce ye ew sûngerên firaxşûştinê li her kesî bên belavkirin, an jî li saziyan, dema jikar-derketinê tenê li mêran bê belavkirin. Ji ber ku her saziyê heştê ji sedê xwe mêr in, dê ji çûna malan bi bandortir be.*

**Beşdar:** *Di destpêka axaftinê de, we got 54 misilmanên entelekteel... Ez pênaseya "misilmanên entelektuel" bi rastî jî meraq dikim.*

Ez nikarim ji we re pênaseya misilmanên entelektuel bikim. Muhtemel e wê demê însanên misilmantî û entelektueliya wan bi hev re xuyabûyî hebûne. Niha ji we re navê wan hinekan bibêjim dibe hûn bikenin û bibêjin ma ew in entelektuel. Demekê ev di civakê de entelektuel û Îslamî bûne. Misilmanên entelektuel, wisa tên nasîn. Nexwe ne hedê min e ez rabim bi tena serê xwe pênaseya entelektueliyê bikim lê misilmanên entelektuel qet na. Hinekî bi dîtina civakê re eleqedar e ku van wisa dibîne.

Di mijara jinan de gotina we rast e. Dema ez bi şehitîna zimanê xwe hesiyam ku haya min jê hebû ev jî kodên kevneşopiya me ya di binhişê me de ne, min pê derxist dê hinek min bidin ber şeqaman jixwe. Baş bû, em jî wisa hîn dibin jixwe. Di mijara jinê de em qala kirên kesekî di nava civata îslamê de dikin. Li wir meseleya jin û mêran mixabin hê di asteke zehmet de ye. Heçî wekheviya jin û mêran e, qalkirin û pêkanîn du tiştên ji hev cuda ne.

Mesela di bin banê MAZLUMDERê de Koma Karûxebatên Jinan hebû. Yek ji arîşeyên me yên mezin li MAZLUMDERê ew bû ku vê komê dixwast xweser be. Jinan û piştgirên wan dixwastin ev kom xweser be. Îro wan kesên ku em tasfîye kirin, hemûyan digot, “Na bila herin xebatên xwe bikin û bînin pêşkêşî Lijneya Rêvebir a Navendî bikin (MYK). MYK di warê teserûfê de xwedî mafekî berfireh e.” Me jî digot, “Heta rêbazên me binpê nekirine, heke wek xebateke derveyî MAZLUMDERê ne beloq be, ne mecbûr in hemû biryarên xwe bi me bişêwirin.” Wek endamekî MYKyê van dibêjim di vê navberê de. Ji loma ez bawer im ji vê mînakê xuya dibe bê ka di hundir de tiştên çiqas zehmet diqewimîn.

Mesela niha, piştî ku em tesfiye kirin, ez li rêvebiriyê dinêrim. Yan jinek heye yan qet tune ye. Di demên dawî de metirsiyeke wiha li min peyda bûbû: Hevalino mesele tenê ne ew e ku em di wîtrînê de bin. Di warê çareseriyê de hin pêşniyazên dîtir ên jinan hene, atmosfereke rengîntir a nîqaşê çêdibe. Kî heye em li vê derdorê zêde bikin? Dema hûn ji bo rêvebiriya navendî ya saziyeke mafên mirovan li jinan bigerin, hûn ê çawa lê bigerin? Hûn çawa li mêran bigerin divê wisa jî li jinan bigerin. Wisa dema jinek dihat me lê dinêrî ku hinekî li ser meseleya mafan xebitiye û hatiye. Ji loma di pozîsyoneke ku yê hember nerihet bike dest pê dikir esas. Him ji ber binhişiya kevneşopî him ji ber ya îslamî ku heta niha tim di eleyha jinê de hatiye şirovekirin, fikreke wisa gelemperî heye. Ev jin jî li dijî vê derdikevin. Ev dibû pirsgirêk. Pirsgirêkên me yek jê jî ev bû. Ji loma bi me re hevalên me yên jin jî tesfiye bûn.

Hê jî bi ya min di Înîsiyatîfa Heq de hejmara jinan kêm e. Hejmara jinên di nava rêxistinê de jî kêm in. Ev jî bikî nekî bandorê li xebatan dike. Helbet çima ku jin tune ne, em nikarin xebatên xwe bidin sekinandin. Vê wek mezeretekê nabêjim lê hê jî dibînim ku kêm in. Lê di meseleya jinan de helwestnameyeke baş heye. Qet nebe helwestnameyeke ku ji hêla jinan ve hatiye nivîsîn û ji hêla wan ve hatiye erêkirin. Heke siberoj di bin banê Înîsiyatîfa Heq de sîrkulasyonek, guhertinek çêbibe û heke siberoj yek rabe di meseleya jinan de xwe bide paş, û xwe nede ber hin tiştan, wê demê ew helwestname dê rênîşandêr be. Wek tu şaş î, ne ku sazî şaş e.

Divê em di komeleyê de, di biryargirtin û aktîvîzmê de tevlêbûna jinê zêdetir

bikin. Bi gelemperî di mijara jinan de pirsgirêkek heye, hûn jî pê dizanin. Niha ji berê kêmtir xebatên bi vî rengî bala însanan dikişînin. Însan ji berê kêmtir dixebitin. Di vî warî de xebatên me ne ku nabin, dibin. Ji ber vê em bi kesên hatî Dibistana Mafên Mirovan re, piştî vê xebatê dîsa li hev dicivin. Çi jin, çi mêr. Çalakbûna di nava saziyê de: çi ku em bêhtir bi keda însên xebatan dimeşînin. Ango em ne profesyonel in. Ew luksa me tune ye em bibêjin, em ê sê kesan bidin xebitandin û bila hemû karûbarên me ew pêk bînin. Ji loma çiqas pir însan hebin em xwe ewqas li xebatên zêde diqewimînin. Ser meseleyê di Dibistana Mafên Mirovan de em hewl didin hejmara jin û mêran wek hev be. Min li Dibistana Mafên Mirovan mêze kir, di nava 46 kesî de rêje ji 22an re 24 e. Berê xirabtir bû. Ez ên sê çar sal berê dizanim. Serîlêdan êdî zêdetir dibin. Di nava wan serîlêdanan de em hewl didin hejmara jin û mêran wek hev bigirin. Hin kotayên dîtir jî dibin. Di vî warî de "kampanyayên sernixumandinê" û "koma xebatên jinan" wek mînakeke şênber em dikarin bijimêrin lê, erê, ez dikarim bibêjim em kêm in.

**Beşdar:** *Zêdekirina hejmara jinan a di nava organîzasyona we de, d*ê bibe pêş*ketineke erênî. Lê esas tiştê min pirsî ew bû ku hûn newekheviya jin û mêran a di nava civakê de dibînin gelo, wekî hûn newekheviyên din dibînin? Û hûn ji van re li çareseriyekê digerin? Yek jî, we got em lobîtiyê dikin, divê haya we jê hebe, em dizanin ku navçînên jin bibandortir in. Xebatek an jî projeyeke we derbarê* vê de *heye gelo an jî di pêşerojê de dê çêbibe? Çi tundiya li ser jinê, çi newekheviyên wek civak*î *û aborî ku li ser jinê tê ferzkirin... Di van waran de projeyên çawa hene li pêşiya we?*

Ji neh endamên MYKyê çar jê jin in. Alîkara me ya serokatiya giştî Fatma Bostan Ünsal di çareseriya pevçûnê de li ser mijara jinan dixebite. Ser meseleyê me di dibistana Mafên Mirovan de Fatma Bostan Ünsal vexwend ku ji me re qala tevgera jinan a li Tirkiyeyê, tevgera Jinên Misilman bike. Ji bo me pir girîng bû ku di Dibistana Mafên Mirovan de mijareke wisa hebe. Ku em nikaribin rasterast hejmara endamên xwe yên jin zêde bikin an jî beşdariya jinan zêde bikin jî, em girîngiyê didin wê ku mijareke li ser jinan bê dayîn ji hêla jinekê ve.

Ya duduyan, me taybetî mijara Kolombiyayê kir yek ji mijarên Dibistana Çareseriya Pevçûnê. Mijara Kolombiyayê jî Nîsanê vegotibû. Ji ber ku nikaribû were, vîdyoyek şandibû. Rapora DEMOSê, "Çareseriya Pevçûna Kolombiyayê û Perspektîfa Zayenda Civakî" bû. Bi şêwra saziyên jinan û bi şêwra saziyên LGBTÎyan ev rapor hatibû amadekirin. Di vî warî de ser meseleyê, me xwast ku jin tevkariya çareseriya pevçûnê bikin.

**Beşdar:** *Ev gotinên we yên dawî bi qîmet bûn. Mînaka dayîkên li ber avahiya HDPyê jî her wisa. Saziyeke bikare navçîniya HDP û AKPyê bike, ev tiştekî*

*pir bi qîmet e di avakirina aştiyê de. Helbet em alîgir in, aligirê aştiyê ne. Hinek ji me dibe alîgirê HDPyê hinek ji me alîgirê AKPyê bin, bê guman ez jî alîgir im. Ez di wê fikrê de me ku navçînî çiqas tiştekî bi qîmet e ewqas jî li ser xeteke zirav e. Di pêvajoyên asayî de hûn çawa dikarin vê biparêzin? Ji ber hevsengiyeke dijwar e, li ser benekî zirav. Her du alî jî dibe bi hêla xwe ve bikişînin, her du alî dibe li ber we rabin, nexasim di pêvajoyên krîtik de. Ez meraq dikim ka hûn vê hevsengiyê çawa diparêzin. Çi ku dema ez nivîsekê bo rojnameyê dişînim jî ez bi metirsî me. Carinan dibêjim gelo ez qet nekevim wan deran, tevî ku dilê min dixwaze. Wek saziyeke heqparêz hûn çawa ji heqê vê dertên?*

**Beşdar:** *Proseyên avakirina aştiya civakî, proseyên dûvdirêj in. Em ji hemû mînakan têdigihîjin ku aştî bi îmzekirina metnekê jî ava nabe pir caran. Hevkariya saziyên civaka sîvîl ên di warê parêzvanî û ragihandina giştî de dixebitin... Em hemû dizanin ku backgrounda me, fikrên me yên îdeolojîk, awayê rêxistinbûna me, çiqas ji hev cuda jî be, tiştekî pir girîng e ku em di warê mafên mirovan de werin cem hev. Di proseya avakirina aştiya civakî de, sazkirina zimanê parêzvaniyê, xalên muşterek ên piştevaniya hevûdu-kirinê çawa ava dibe? Mînak hene di vî warî de? Dixwazim vê jî bizanim. Ji ber ku li Diyarbekirê gelek sazî li ser vê mijarê dixebitin lê ev sê salên dawî ne ez dibînim ku xalên hevpar ên xebatê bêhtir ji hev vediqetin. Esas em hemû dixwazin tiştinan bikin, qada têkoşînê bilind bikin, belkî qatman hinekî din berfireh bibin lê ez di wê baweriyê de me ku ev jihevqetîn dibin asteng li pêşiya pêşketinan, loma meraq dikim. Ev qadên muşterek, ên hevpar dê çawa ava bibin?*

**Beşdar:** *We got em têkiliyan datînin di navbera siyasiyan û wan dayîkan de ku digirîn. Ez tenê tiştekî meraq dikim. Li vir qeneata wê çi bû? Heqeten jî dayik digirîn an hinek li dû berjewendînin siyasî ne? Dixwazim çavdêriya we, qeneata we hîn bibim.*

**Beşdar:** *Di warê ragihandina giştî de çapemenî li cihekî pir krîtîk e. Bi taybetî di mijara belavkirina meseleyê û ragihandina girseyên berfireh de. Pêwendiya Înîsiyatîfa Heq û ya çapemeniyê –belkî em dikarin medyaya civakî jî têxin navê- çawa ye? Di mijara parêzvanî û çapemeniyê de azmûnên we çi ne? Arîşeyên di vê mijarê de û çareseriyên wê çi ne?*

**Beşdar:** *Di çareseriya pevçûnan de we qala du aliyan kir. Esas bingeha pevçûnan, ku di navbera her du aliyan de rû didin, xwe dispêrin helwestên wan ên polîtîk û îdeolojîk. We gotibû em ne alîgirên helwestên wan in ku bi qasî nas dikim jî hûn ne alîgir in. Helwestên polîtîk û îdeolojîk hene di navbera aliyan de. Û dîsa cîhanbîniyeke we heye. Niha li gor cîhanbîniya xwe hûn ê meseleyê çawa çareser bikin? Tenê bi gotina 'bila aştî çêbibe...' Ango erê*

*bila aştî bê lê bêyî ku em têkevin esasê... Dixwazim vê bibêjim, bêyî em dakevin jêderkê, em wê pirikê –biborin ez wek pirrik pênase dikim-, bêyî em bi ser navenda pirsgirêkê ve bibin, em ê çawa çareseriyên kurtedemî bibînin? Ser meseleyê hûn dikarin pevçûna di navbera Huda-Par û PKKyê de, an jî di navbera Huda-Par û ciwanên HDPyî de ji bo demekê, ji bo çend rojan bidin sekinandin lê hûn ê çareseriyeke mayînde çawa ava bikin? Hûn ê çawa çareyê ji cudahiyên wan ên polîtîk û îdeoliojîk re bibînin, çareseriyeke çawa?*

Gotina min a "em xwe li hêsaniyê digirin" şaş hatiye famkirin ez bawer im. Me tu carî xwe wek rêxistineke muhîm nedîtiye û em xwe wek kirde pênase nakin. Baş an jî xirab di nava bîst û heşt bajaran de, li Diyarbekirê di sala 2004an de dest pê kir ez ne şaş bim, ji vê demê û vir ve pozîsyonek bi me ve hatiye zeliqandin. Em naxwazin wê pozîsyonê wenda bikin. Pozîsyon dibêjim, binêrin dema em ji MAZLUMDERê hatin tesfiyekirin, kirin ku me ji civata îslamê jî tesfiye bikin. Ji ber ku ev wisa ye. Dema hûn hinekî rexnegir bin di nava civata xwe de –ev tenê ne di nava misilmanan de, di civata çepgiran de jî wisa ye, tew carinan ya wan dijwartir e- û bi ser de heke tevî rexnegiriya we hûn guhê xwe bidin aliyên dîtir û pê re biaxivin, tavilê we bi aliyê din ve dehf didin. Çi ku meheleyek, civatek, civakek dixwaze tim homojen bimîne. Heterojenî wî tiştî dikuje.

Aliyek bi înyad me didehfîne aliyê dîtir lê aliyê dîtir jî bi şewq me ber bi xwe ve dikişîne. Wek bibêje "li wî aliyî karê we tune ye, werin vî aliyî." Em di navbera wan her du aliyan de li cihekî ne û divê em li wir bin jî. Tew îro newala di navbera civaka me ya jihevqetiyayî de kûrtir bûye. Li gor 2013an, 2011an kêm sazî, kes, partî mane li wê derê. Ji loma em hewl didin li wir bimînin. Teyaqûzeke me ya wisa jî heye. Dixwazim vê jî bi we re parve bikim lê me tu carî xwe wek parçeyekî filan derê û bêvan derê nedîtiye. Heke bi çawalêhato hûn li pozîsyonekê qelibîbin ew kar tê bîra we. Ew dibe we bike parçeyekî muhîm dibe neke. Lê nake. Ji me du kes hebûn di nava wê koma ku di 2013an de ew karmendên di destê PKKyê de anîn, serokê me yê giştî û alîkarê serokê giştî. Du sê hefte piştî wê me xwast em digel alîkarê serokê xwe yê giştî çelengeke reş deynin ber avahiya Ak Partiyê. Ev alîkarê serokê me yê gişti di heman demê de wexta Proseya Çareseriyê di nava Koma Têkilîdanîn û Diyalogê de bû. Rapora komîsyona meclîsê ya derbarê Roboskiyê de bi rayên Ak Partiyê ji meclîsê derket û me xwast em li Diyabekirê çelengeke reş deynin ber avahiya AK Partiyê. Polîs ji alîkarê serokê me yê giştî re got, "Ji ber hûn proseya çareseriyê ya destpêkirî dixin xetereyê, em destûrê nadin we." Hûn absûrdiyê dibînin? Nabêje, "Ma ne jixwe vî mêrikî ew anîne, jixwe ji bo xatirê Proseya Çareseriyê ewqas ked daye." Asoxî me ew çeleng danenî.

Ez rêzeke wisa çê bikim. Hawara dayîkên li ber avahiya HDPyê dişibe destpê-

ka salên 2014an. Hacire Akar çawa hat nizanim lê helbet dawiya dawîn dibêje zarokê min çûye. Zarokekî wenda heye li holê. Ji loma hawareke mafdar heye. Piştre hin malbatên din ên çav pê ketin hatin. Angaşta HDPyê, ne tenê HDP, ji hin deverên din jî angaştên din hatin guhê me lê me hê ew teqez nekirine. Li gor van angaştan, van malbatan bi taybetî dibînin û dişînin pêşiya HDPyê. Angaşta HDPyê ew e ku soza hin tiştan dane van û yên qebûl nekirine jî bi awayekî din wan aciz dikin. Bi destê xwe jî hatibin bi destê hinekan jî hatibin şandin, hawar hawareke mafdar e. Malbatên em pê re ketin têkiliyê, yên ku zarokên wan li çiyê ne. Ez malbatekê nas dikim. Ne şaş bim bavekî ji Zêdkana Agiriyê ye. Ez dizanim ku zarokê wan çûye çiyê. Tew HDPyê ji me re got, “Em ji wan malbatan hinekan nas dikin, berê jî hatibûn û çûbûn derbarê vê meseleyê de. Zarokê wan li çiyê ye, belê.” Roja em çûn serdana HDPyê, ji malbatan yekî qedeha çayê avêtibû yekî HDPyî. Qedeh şikestibû û birîndar bûbû. Got, “em dizanin zarokê wan li çiyê ne,” mesela, “lê hatiye tehrîkkirin, îstîsmarkirin.”

Hinek vê pirsgirêkê bi awayekî din bi kar tînin. Mînakeke pir balkêş bidim ji sala 2014an. Ez di civîneke de me digel malbatên ku zarokên wan di temenekî biçûk te li çiyê ne. Komek malbat jî li Enqereyê bû. Yek ji rêvebirekî me yê berê ku paşê em jî tesfiye kirin, tim tweetên wiha li ser hesabê me dinivîse; “MAZLUMDER çima ji bo van malbatan tiştekî nake?” Ez di civînê de me. Heke hûn bixwazin karekî bi lobîtiyê bi awayekî dîplomatîk bi rê ve bibin, divê hûn hesastir tevbigerin. Îro filan sazî dikare here pêşiya HDPyê û çi were ber dêv bibêje, luksekî wan ê wisa heye. Yê min, ew luksa min tune ye ez hemû tiştên ji dilê min tên bibêjim, ez mecbûr im pir baldar bim, mecbûr im hay ji devê xwe hebim. Çi ku dema PKK ji helwesta min aciz bibe, îhtimaleke mezin dê zarokê wê malbatê neşîne. Di 2014an de hatina zarokan a ji Qendîlê hema bibêjin hat birîn. Çi ku yek, ev mesele di mîtîngan de kirin melzeme. Dudu, PKKyê di ser zarokekî re ku bi şûn ve şandibû, ji Bangewaziya Cenewreyê re ev peyam şandibû; “Em ê zarokan bişînin lê divê wan zarokan qetiyen nedin çapemeniyê!” Bi vê şerhê şandibûn lê ew zarok li pêşiya şaredarîyê... (zarokekî 12-13 salî bû) Her tişt li aliyekî, hûn nikarin zarokekî 12-13 salî bi vî şiklî bidin axaftin. Ji çiyê hatiye, televîzyon in, mîkrofonan dirêjî zarok dikin, te çi kir, çawa kir. Zarok ket rewşeke pir xirab. Muhtemel e ku wê trawmayê nikare ji ser xwe biavêje. Paşê PKKyê got hûn dikin melzemeya şovên siyasî û neşand. Niha derdê van heqeten jî hatina zarokan be, em baş dizanin ku divê ewqas bi rehetî vê şovê nekin. Lê em nikarin ji kesî re bibêjin, “Keko wele hûn şovê dikin lê em jidil in” jî.

Pêwendiyên me yên çapemeniyê ne xirab in. Li Diyarbekirê baş-xirab têkiliya me û rojnamegeran, bi hemûyan re nebe jî, bi Sputnik, BBC, Dengê Emerîkayê re têkiliyên me baş in. Derbarê vê de, carekê li komeleyê di pirtûkekê de ku li ser ‘pêwendiya civaka sîvîl û çapemeniyê’ bû, em li ser xebitîn

û me nîqaş kir. Karên ne xirab derketin ji wir. Me postên xwe yên tora civakî bi pêş xistin. Hin postên twitterê hene, beyî hûn li ser wêne bitikînin, wêne hemû xuya dibe. Bêyî hûn tweetê bitikînin, ez dixwazim dema tweeta min derket pêşiya we, hûn hemû peyamê bibînin. Hin sepan hene ku li gor pîvana van postan disêwîrîne. Em bi wan sepanan disêwirînin. Tweet bi vî awayê zêdetir tê dîtin. Em tora civakî aktîftir bi kar tînin û em ê hewl bidin di demên pêş de aktîftir bi kar bînin. Me dest bi Instagramê kir.

Qet nebe di hemû platformên çapemeniyê de navê me eynî ye. Ev hûn jî dizanin pirsgirêkeke mezin e. Ji bo Diyarbekirê qet nebe ev wisa ye. Em pê dizanin ku têkiliya bi çapemeniyê re nexasim bi awayekî giştî polîtîkaya ragihandinê pêdiviyeke mezin e û di pêşerojê de dê bêhtir pêdiviya me pê çêbibe. Rojnameger bila sax bin bi çalakiyên me re eleqedar dibin. Em jî hewld didin tiştên ew ê pê re eleqedar bibin çêbikin. Divê hûn herin li şûna ku ew lê dinêre bisekinin. Hê jî daxuyaniyên pir klasîk ên pênc rûpelî tên dayîn di platformên hevpar de lê nabe nûçe. Nîvrûpeleke bi hevokên xurt hatî sazkirin divê. Bi qasî însan di tweetekê de bikarin bibêjin, “Înîsiyatîfa Heq wiha got!”

Dibe ev ji we re pragmatîk bên. Jixwe hemû mesele ew e hûn ên ku pragmatîk lê dinêrin bikişînin ser nêzîktêdayîna xwe ya rêgezî. Jixwe di çareserkirina pevçûnan de jî ev wiha ye. Hûn ê aştiyê bixwazin lê dema li ser mijarê hûn bi aktorên têkildar re rûniştin, hûn dikarin pragmatîk tevbigerin û bînin bîra wan ku ew ê bi avêtina van gavan çi bi dest bixin. Nexwe dibe tew ev ne xema we be jî. Bi ya min heqek, ji encama xweser heqek e û divê bê dayîn. Derbarê mijara Perwerdehiya zimanê zikmakî de heke fikrekî Ak Partiyê wek “Dema ez vî heqî bidim li rojhilata navîn ez ê bibim dewleteke xurt û mezin an na?” hebe, -ez ê wek hatiye ser zimanê min biaxivim- ez ê jê re bibêjim, “Dema tu vî heqî bidî, dema li dibistanan digel Tirkî, Kurdî jî bê hînkirin, Tirkî û Kurdî dê bibin zimanên destbira, wê ji hev neqetin. Tu yê jî bibî dewleteke demokratîk a mezin.” Ev ê were wê wateyê ku em nêzîktêdayîna xwe ya rêgezî bi daxwaza wî ya pragmatîk re li hev tînin.

Navçîniya di navbera du aliyên ji hêla îdeolojîk ve ji hev cuda jî tiştekî mîna vê ye ez bawer im. Helbet pir zor e. Ya ji hemûyan dijwartir, xuyanekirina nûnertiyên me yên dezgehî ye. Nûnertiyên me yên şexsî jî xuya nakin. Wekî ku hûn di heman demê de dezgehên din jî temsîl bikin. Ser meseleyê bifikirin hûn him alîkarê seroktiya baroyê ne û him jî alîkarê seroktiya IHDyê ne. Dê çi bibe, carinan dê nasnameyên we yên dezgehî tevlihev bibin. Di civaka sîvîl de –ez jî tê de- dibe kesek bi fedakerî, bi xemxwirî tev negere. Dibe her kesî plan û programeke wan, armanc û berjewendiyeke wan hebe. Ev hinekî tê famkirin lê heta saziyekê ev ji bo armancên xwe yên şexsî re nekiriye amûr û alav.

Tiştekî zehmet e navçîniya du aliyên ji hev cihê. Yek, em bi îdeolojiyên wan re eleqedar nabin. Dudu, yek jê li ser paradîgmaya jinparêzî û xwezaparêziyê ye, yê din muhafezekar û nijadperest e. Wisa jî nabe. An jî dê di asteke pir mîkro de çêbibe. Me carinan digel Weqfa Aştiyê û Navenda Bîrê bi SCSyên Îslamî yên nêzî hikûmetê re, carinan jî bi SCSyên nêzî HDPyê re civînên têkel li dar xistine. Li vir me di asteke herî jêr de qala meseleyan kir. Ez tim vê dibêjim. Li Diyarbakirê, ser meseleyê qirêjkirina Hewselê wek pirsgirêkekê li pêşiya me be û heke ez nikaribim derbarê çareseriya Meseleya Kurdan de IHD û Memur-Senê bînim cem hev, ma ez ê bikarim di mijara qirêjkirina Hewselê de bînim cem hev? Qet nebe dê li wir silavê bidin hev. Dê pêwendiyek çêbibe di nava wan de. Dê blokaj hinekî din nerm bibin. Ev her du aliyên îdeolojîk ên ji hev cuda tu carî nikaribin li hev bên, nikarin aştiyeke mayînde û birêkûpêk ava bikin di nava xwe de. Meseleya me ew e ku di pêwendiya çareserkirina tiştekî de, ka em dikarin van herdu aliyan bînin cem hev an na?

Em diçin cem HDPyê, li ba me ji AKPyê re dibêjin ha dibêjin. Dibêjin, "Hûn jî hevalên me ne, hûn jî wek me difikirin ne wisa?". Li AK Partiyê jî dibêjin, "Em van zarokan dizanin, haya me jê heye, HDP van dişîne, ma ne wisa ye?" Mîmîk li wir tiştekî wisa ye ku divê hûn mîna kevirekî bisekinin. Tu nikarî erê bikî, nikarî îtîraz bikî. Ku tu erê bikî ji bo aliyên din tu yê tiştekî xirab bikî, îtîraz bikî dê bibêje "rabe here" ji te re. Tiştekî pir zehmet e bê guman lê bi pêkanînê tê hînkirin. Ne ji ber ku em profesyonel in, ji heq derdikevin. Me pir şaşî kirin, pir xeletiyên me çêbûn, wisa jî dibe carinan.

Li ser Diyarbekirê dibêjim, SCSyên me dema dikevin tengahiyê hay ji piştevaniyê dibin. Hemû SCS tê de, em jî tê de. Ez bawer im hemû heval ji Diyarbekirê ne û vê pê dizanin. Di rojên xweş de em dibînin çawa xwe qure dikin lê di rojên ne xweş de... Siyaseta Kurdan jî mixabin wisa ye. Di demên teng de her kes qala yekîtiya neteweyî dike. Di rojên xweş de li ser arîşeya dê kî li ser kursîyê rûne civîn tên betalkirin, li ser sedemeke pir biçûk.

Hevdîtina bi aliyan re pir muhîm e. Me ev mesele bi îstişareya Racî Beg re, paşê bi serokê IHDyê Abdullah Beg re, bi serokê baroyê re, bi danûstandinê anî cihekî qet nebe, wek çend sazî di nava xwe de. Mînakek wiha tê bîra min. Em wek MAZLUMDER bi tena serê xwe çûn raporgirtina Cizîrê, 22 kes. IHD, TIHV, Egitim-Sen, Gundem Çocuk êdî li wir çend sazî hatin cem hev nizanim. Ew jî bi kêmanî 25 kes bûn. Mala we xira bûye, ez wek MAZLUMDER têm bi we re diaxivim diçim. Piştî min heyeta IHDyê tê, we dibîne diçe. Faysal Sarıyıldız, serokê şaredarîyê her wisa. Serokê Ak Partiyê yê navçeyê çû an neçû nizanim lê hemû wisa ne. Çiqas kedeke berhewa ye ne wisa? Em çima wiha dikin? Çima ku berê me li ser hin raporan li hev nekir. Ser meseleyê li ser rapora 6-8ê Cotmehê me li hev nekiribû. (Hevalên ku em tesfiye kirin, derbarê vê mijarê de hazirnekirina raporekê kirin hincet ji bo ku te tesfiye

bike lê ew rapora ku min qal kirî me di rûyê wî kesî de neweşand, ew kesê ku me bi vê tawanbar dike.)

Paşê me got bila ev piştevanî wiha be; bila ne wek platformekê, wek têkiliyeke zarûrî lê wek toreke ragihandinê be. Mesela em herin raporgirtina Cizîrê. Em çar kes, IHD, Baro, TIHV çar kes, êdî çend sazî hebin. Em bibêjin em şazdeh kes çûn, ji her saziyê çar kes. Em ê bibin çar kom. Bila yek jê hevdîtinekê ya din hevdîtineke din bike. Di her komê de bila ji her saziyê yek hebe. Paşê vegerin van hemû daneyan li derekê binîn ba hev. Bila çar kes pêşnûmaya raporê amade bikin. Ez wek mînak dibêjim çar lê dibe deh kes bin jî. Heke me dît em ê li ser pêşnûmaya ewil li hev nekin, em daneyên li ber destê xwe ji her çar koman re bişînin bila her kes rapora xwe bi xwe amade bike. Qet nebe li qadê 40-50 kes na lê şazdeh kes dê bixebite.

Dema ez wisa diaxivim, wisa qal dikim çiqas xweş û hêsan xuya dibe ne? Carinan ji me carinan ji hin deverên din astengî derdikevin û çênabe. Pir girîng e em di ser xalên asgarî re bikarin werin digel hev. Heke ez ê bi DÎSAyê re xebatekê bimeşînim, heke min dil hebe tiştekî bikim, heke em li ser heman maseyê rûniştin, nexwe ez dizanim DÎSA saziyeke çawa ye, an jî IHD. Hûn dizanin Înîsiyatîfa Heq saziyeke çawa ye. Heke tiştekî ku Înîsiyatîfa Heq wê qebûl neke hebe, rast an jî şaş, heq an jî neheq, hê di serê civînê de hûn tiştekî ku Înîsiyatîfa Heq wê qebûl neke deynin pêşiya Înîsiyatîfa Heq, ev mase dê belav bibe. Ev nayê wê wateyê ku em di xalên asgarî de hatine digel hev. Ev, îdeolojiya xwe li ser hev ferzkirin e. Em ne di vê bîreweriyê de ne. Bibêjim 'di serî de jî em' da ku heqê tu kesî nexwim.

## BEŞA ÇAREM

# PEVREBÛNA CIVAKÎ LI DIJÎ PEVÇÛNAN: AZMÛNA EKO-POLÎTÎK

*Tarık Çelenk*

Ji bo min cihê kêfxweşiyê ye ku azmûnên xwe bi komikeke daxwazkar re parve bikim. Lewre kes zêde van tiştan meraq nake. Lê tiştekî meraq dikim. Di nav we de çend akademîsyen an jî xwendekarên zanîngehê hene? Yên din bi piranî bi SCSyan re têkildar in?

**Beşdar:** *Hinek jê di SCSyan de dixebitin hinek jê na.*

Di sala 1961an de li Erziromê hatime dinyayê. Li Stenbolê mezin bûme. Bi hişmendiya 'memûriyeta herî baş Sûbayî ye', ji Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê, derbasî Hêzên Behrî bûm. Piştî wezîfeya mecbûrî min îstîfa kir. Hinek tecrûbeya min derbarê sektora taybet de çêbû lê karê min ê esil Eko-Polîtîk e. Jixwe dema li Enqereyê sûbay bûm, em diçûn *Türkiye Günlüğü [Rojaneya Tirkiyeyê]* ya Mustafa Çalık. Me û Mümtaz'er Türköne filan me bi hev re ji İlber Ortaylı ders werdigirtin. ATO hwd, em bi entelektuelên Enqereyê yên wê demê re têra xwe hatin strandin. Dema lîse û zanîngehê sempatîzanê komika têkoşîna miletî bûm. Bi Ahmet Davutoğlu re, jixwe min pirtûka xwe ya bi navê *Türk Sağı [Rastgiriya Tirkan]* jî bi feyzgirtina tecrûbeyên xwe yên wê demê nivîsî. Min meqaleyeke dûvdirêj a bi navê "Pirsgirêkên Tesewûfa Tirk a li Tirkiyeyê" nivîsî. Tecrûbeya min a Kurdan çêbû van demên dawî, çi li Tirkiyeyê çi li derveyî Tirkiyeyê. Ew jî azmûnek e, tecrûbeyeke baş bû lê heta tecrûbe neyên tetbîqkirin, heta kes hindik bin ku meriv wan pê re parve bike, qîmeta tecrûbeyan jî zêde tune.

Pêşî ez derbarê Eko-Polîtîkê de pênaseyekê bikim. Paşê ez ê qala avabûna wê bikim. Hûn li vir raporeke karûxebatan dibînin. Dema sazî hat girtin, me hewl da bi hevalan ve amade bikin. Di naverokê de xebatên me kirî hene. Me derbarê Mûsilê de hin xebatên çalak pêk anîn, ji 2005an û vir ve. Di ser komikên wek Kurd, Tirk Ereb, Êzîdî û hwd re ku li Mûsilê dijîn, em li bersiva pirsa 'entegrasyona Tirkiyeyê dê çawa pêk bê' geriyan, him ji hêla hiqûqa navneteweyî, him ji hêla sosyolojîk û him ji hêla siyasî ve. Helbet divê ev ne di wateya *irrendantist*[87] de lê wek projeyeke aştiyê bê famkirin. Me xebata wî belgefîlmî jî kir. Belgefîlm ji şeş beşan pêk tê û sî û sê xulek in. Yek jî dê

8 (Îngilîzî) Jinûve-daxwazkirina xakên jidestçûyî.

meqaleyek biweşe derbarê vê de. Û helbet pirtûkek jî li ser tê amadekirin.

Xebata "Avadaniya Mezin a Tirkiyeyê." Ev pir muhîm bû. Kesên ku him entelektuelên tevgera siyasî yên Kurdan, him jî entelektuelên netewperwer ên Tirkan wan baş nas dikin hebûn di nava vî karî de.

Li Qibrisa Bakur, bi navê "Dorpêçiya Sergirtî" me xebatek kir. Di vê xebatê de em li ser pirsgirêkên nasnameyî xebitîn. Ango ne li Qibrisa aliyê Tirkan, pirsgirêkên nava Rûman û Tirkan, penaberên Tirk di nava xwe de jî li hev nakin, penabêrên nifş bi nifş, wek penaberên 1980yî, yên 1974an, pirsgirêkeke wan a nebaniyê heye. Hikûmeta Tirkiyeyê, Tirkên Qibrisê veder dike. Tew ez dikarim mînakekê jî bidim derbarê wê de. Ez û Vamık Volkan em bi hev re çûn cem wezîrê ku bi Qibrisê re eleqedar dibe. Me dest bi qalkirina pirsgirêkên Qibrisê kir jê re. Wezîr got, "Me ewqas mizgeft dan çêkirin, *îmam-xetîb* ava kirin, dîsa jî me nekarî destnimêjê bi wan bidin girtin." Rûyê mamoste Vamık soromoro bû, bû soriya wîşneyê. Li ser van nêzîkatiyan me li wir xebat kirin.

Ev xebata "Avadaniya Mezin a Tirkiyeyê" jî me wek mijareke "mezkûr, meçhûl, mesele" dest pê kir. Ango meseleyeke ku pir tê bilêvkirin, her kes pê dizane lê meçhûl e ango kesek pê nizane, an jî divê kesek pê nezane, ewqas jî meseleyeke meşhûr e. 3M: mezkûr, meçhul, mesele. Navê Meseleya Kurdan me wisa îdare kir, a niha wer xuya dike em dîsa li wê vegeriyan. Di nava vê rêxistinê de (Avadaniya Mezin a Tirkiyeyê) me bi gelek komikan re tîmên biçûk ava kirin. Di nava van tîmên biçûk de, ji Seydi Fırat heta Altan Tan, ji Mete Yarar heta Durmuş Hocaoğlu, ji Murat Belge heta Musa Serdar Çelebi gelek kes hebûn û em bi van re bi rêk û pêk li hev dicivîn.

Derbarê Komxebata Îraqê û xebata Mûsilê de, bi navê Konseya Wîlayeta Mûsilê komek hatibû avakirin. Ev kom di salên 1990î de, piştî mudaxaleya Amerîkayê ya li Îraqê hatibû avakirin. Biraziyê Şêx Mehmûd Berzencî li ser wê komê bû, bêhtir di bin bandora eşîra Berzencî û Eşîra Caf de bû û Parlamentoya Wîlayeta Mûsilê diparastin ku tê de Tirkmen jî hebûn. Dixwastin ji Îraqê xweser bin, dixwastin di qada navneteweyî de dewleteke xweser a xwedîstatu bin, tew digotin, 'em dikarin bi Tirkiyeyê ve jî bên girêdan, em dikarin vê nîqaş bikin.' Wek Eko-Polîtîk, em demekê bi van re xebitîn. Min herî dawî nûnerê van û Binali Yildirim anîn cem hev, wê demê Binali Beg serokwezîr bû. Ev wîlayeta Mûsilê xebateke ewqas balkêş bû ku di nava wê de netewperwerên Kurd, welatparêz, netewperwerên Tirk hebûn. Her kesî di pencereya xwe de lê dinêrî. A dilê her kesî cihê bû. Wek di nava mizgeftekê de qibleyên cihê, lê li mizgeftê li hev diciviyan.

Destpêka 2009an me digel Vamık Volkan xebata xwe ya yekem pêk anî. Di civîna yekem de ku me aîdiyet û Meseleya Kurdan nîqaş kir, ev kes hebûn;

netewperwerê Tirk Durmuş Hocaoğlu, Altan Tan, Feruz Ahmet, Fuat Keyman, Mesut Yeğen, Vedat Bilgin, İbrahim Kalın, Mesut Yüksel, Cevat Öneş. Ango li Tirkiyeyê berî ku ev kar dest pê bike em li hev civiyabûn. Taybetiya vê civînê ew bû ku dijber werin ba hev. Durmuş Hocaoğlu digot em hokerên avaker in, spî, Anglosakson, Suniyên wek protestan, Tirk, Hanefî. “Em deyndarê rêvebirina nijadên din in û heqê şûr di destê me de ye. Heke hewce bike em dikarin wî heqî ji bo sererastkirinê bi kar bînin.” Li hember wî Gültan Kışanakê qala tiştekî din dikir. Dikaribûn li ser heman meseleyê biaxivin.

Em werin ser meseleya Qibrisa me qalkirî. Li Qibrisê pirsgirêkên di nava nasnameyan de çi ne? Trawmayên ku rû dane, bandorên van ên civakî, hewldanên ji bo çareserkirina van û em li ser têkiliyên di navbera Tirkên li Qibrisê û Tirkên li Tirkiyeyê de axivîn. Tîma di nava van de tîmeke saxlem bû. Ji MITê jî hebûn. Yên dixwastin bila Qibris tev li Ruman bibe jî hebûn. Wezîrê Karûbarên Derve yê berê jî hebû.

Ev, yekemîn civîn e ku li Tirkiyeyê hatiye lidarxistin. Nêzê pêncî şêst kes hatibûn cem hev. Sala 2009an li Otela Dedemanê. Di vê civînê de kesekî tuneyî tunebû, dema em li lîsteyê dinêrin. Avni Özgüven, Ayhan Bilgen, Seroka Çareseriya Pevçûnan a Zanîngeha Sabanciyê Ayşe Betül Çelik, Cevat Öneş, yek ji rêvebirên astbilind ên Tevgera Tekoşîna Neteweyî Cevat Özkaya, Deniz Ülke Arıboğan, Esra Çuhadar –Seroka Çareseriya Pevçûnan a Zanîngeha Bilkentê–, Devrim Gürkan Zengin, Halit Yalçın, ji rojnameya *Zaman*ê Hamdullah Öztürk, Hatip Dicle, İsmail Küçükkaya, Mazhar Bağlı, Medaim Yanık, Mesut Yeğen, Osman Bostan, Özlem Tanberk, Özden Zeynep Oktav, Raif Türk, Ruşen Çakır, Sema Sezer –di MITê de bû wê demê–, Selahattin Kaya, Sırrı Süreyya Önder, Şaban Gülbahar...

Binêrin, di vî wêneyî de hemû digel hev in. Di koma yekemîn de ev muzakeregerên bingehîn in, Serokê Ocaxên Tirkan Durmuş Hocaoğlu, yên din çavdêr in. Di nava çavdêran de Sırrı Süreyya Önder filan. Kêlîka dawîn Tayyip Beg, wezîrê Karûbarên Hundir jî şandiye. Hefteyek beriya hewldanên demokratîkbûnê bû. Em di pêşiya wan de bûn wê demê.

Me li vir wiha kir. Wê demê bernameyên serê sibê yên Flash TVyê çalaktir bûn, dihatin temaşekirin. Yekî netewperwer li ser bû, yekî bi navê Yılmaz Tunca yê dilpak, ji giregirên berê bû, ez ne şaş bim ew jî ji têkoşîna neteweyî (*milli mücadele*) bû. Me jê rica kir, bernameya wî bi qasî ya İsmail Küçükkaya nebe jî populer bû. Di her bernameyê de me dijber anîn hember hev. Ser meseleyê di yekê de Halit Yalçın û Serokê Ocaxên Tirkan Cezmi Bayram hebûn. Mesela ev neteweperwer Sema Xanim e, hê nû ji MITê teqawud bûye û yê din Seydi Fıratê me ye. Ev Mete Yarar û Gültan Kışanak in.

Ev jî civînên me yên tîmên biçûk in ku me hefteyê carekê pêk dianîn. Kî hene? Musa Serdar Çelebi, Altan Tan, Seydi Fırat, Mete Yarar, Murat Belge, Özlem Kamber, Raif Türk hene. Ev pêvojo wisa hefteyê carekê. Lewre da ku veguhere pêvajoyekê divê însan tim û tim, bi awayekî periyodîk werin cem hev. Helbet ev jî xwendevanên me ne, tim digel wan in. Xwendevan him ji me bûrsê digirin him jî di nava pêvajoyê de adapteyî çalakiyên civaka sîvîl dibin û ji hêlekê ve jî bi pratîkê hîn dibin. Xwendevanan jî em bi xisûsî hildibijêrin. Xwendevanên ji netewperweriya Tirkan, yên Kurd, çepgir, hemû hene. Paşê yên biyanî jî lê zêde bûn. Yên ji Fînlandiyê lê zêde bûn. Yewnanek heye, xwendevanê doktorayê ye. Vê derê bala biyaniyan jî dikişand. Wê demê meseleya zarokên keviravêj hebû, tîma me çû Colemêrgê û hat. Hevalên psîkanalîst jî hebûn ku bi dildarî dixebitîn. Derbarê mijara zarokên keviravêj de me xebatên dûvdirêj kirin.

Li Samsûnê kulm li Ahmet Türk xistibûn, dê bê bîra we. Wê demê em fikirîn bê ka em dikarin çi bikin û me ji Musa Serdar Çelebi rica kir. Em wek Eko-Polîtîkê herin serdanê û bila çapemenî vê bikişîne. Bila sax bin, çapemeniyê wê demê bi awayekî aşkeretir piştgirî dida. Pir bi ser me de hatin. Ez û Serdar Beg çûn mala Ahmet Türk a li Enqereyê. Musa Serdar Çelebi yek ji wan hevalên me ye ku keda wî pir zêde ye. Tevî zexta derdora xwe, yek ji neteweperwerên Tirkan bû ku piştgiriya çareseriyê dikir.

Paşê em li bajaran belav bûn. Wek Eko-Polîtîkê me li Mersinê şaxek vekir. Li wir jî me cudahî li ber çavan girtin û kesên ji hev cihê hatin cem hev. Li wir jî serê mehê carekê însanên ji herêman; Ji Yurikên[9] Mêrsînê bigirin heta HDPyê, hunermendên xwediyê bîr û baweriyên cuda, tew carinanan walî jî piştgirî da me. Me pir însan nas kirin. Serê pêşî dema em hê nû çûn, helbet em hinekî tirsiyan. Hûn kî ne, hûn zilamê dewletê ne? Hûn Fethullahger in, çi kes in? Bîreweriya li welatê me wisa ye, tavilê tiştekî bi te ve dizeliqîne lê ev bi demê re dişikê. Ev jî yek ji xweşikiyên wî karî bû.

Paşê me digel Vamik Volkan li ser rêvebirina girse, trawma, muzakere û hwd bi xwendevanan re xebatên perwerdehiyê kirin. Bi piştgiriya Turk Telekomê me ji herêmên cuda ciwan vexwendin. Weke kampekê me ciwan anîn cem hev û Vamık Volkan yeko yeko perwerde da wan. Halit Yalçın jî ne xirab bû. Hevalên ku mîna we bi SCSyan filan re eleqedar jî hatin wan civînan.

Em li Colemêrgê pir xebitîn. Li wir Komeleya Însanên ATI pir piştgiriya me kir. Wekî din, li Colemêrgê Muhsin Kızılkaya, Seydi Fırat pir piştgiriya me kir. Li wir problema me ya ewlehiyê hebû. Waliyê navendê Muammer Beg ku wê deme waliyê Colemêrgê bû, kesekî pir hêja bû.

9 Yurik: Koçerên Tirk ku debara xwe bi sewalkariyê dikin. (Nîşeya Wergêr)

Niha em wiha ewqas çûn û hatin, me xeber şand ji Abdullah Gül re. Bila sax be, qebûl kir û hat. Tew Seydi Fırat yekî bi problem e, got ez wî qebûl dikim, bila ew jî were Koşka Huberê. Wî wer nekarî destûr bixwaze ku ne şaş bim, ewraq çûn û hatin. Nikaribû bihata, ku bihata bi ya min pir baş dibû. Li wir kî hene? Mamoste Ayşe, Altan Tan, Deniz Büke, Murat Belge, Ümit Fırat, Musa Serdar Çelebi, Halit Yalçın, Mete Yarar hene. Bi qasî ji me hatiye, me însan li hev ciwandin.

Dîsa li Meletiyê me tiştekî mîna vê kir. Me pêşengên civakê li hev civandin, helbet pêşengên dijberên hev... Lewre qanihkirina wan jî pir dijwar e. Nemaze pêşengên netewperestiya Tirkan ku hêviya namzetiyê ji MHPyê dikirin bêhtir ditirsiyan. Mîna yên İyi Partiyê niha ditirsin û direvin. Qanihkirina wan pir zehmet bû li wan herêman. Pêşengên li ser fikra netewperestiya Tirkan ku hêviya xwe ji siyasetê birîne pir baş bûn, pir piştgiriya me kirin. Di nava me de heta hûn bibêjin netewperwer hebûn.

Di civîneke me ya demên dawî de, me çend komên wek koma Colemêrgê, Mêrsînê, Sêrtê, li Stenbolê li hev civandin, wê çaxê Musteşariya Ewlehiya Giştî jî piştgirî dabû wê civînê. Nexwe dê aboriya me têrê nekira. Pêncî şêst kes hebûn, civîneke têra xwe balkêş bû.

Serdemeke wiha bû ku êdî atmosfera siyasî dîsa hêdî hêdî ber bi xirabûnê ve diçû. Rewş ne baş bû. Dema em çûn Colemêrgê dirûşme filan avêtin. Walî Muammer Beg bi qederek toma û hêzên ewlehiyê em birin cihê civînê. Me jê rica kir ku toma û hêzên ewlehiyê ji wir rakin. Wî jî, her sax be, ew rîsk wergirt û rakirin. Em ketin hundir. Cengiz Kapmaz hinekî bi awayekî provakatîf xitabî girseyê dike, manîpule dike. Ku dirûşmeyek diavêtin, wê dirûşmeyê dikişîne dîsa filan. Cengiz û Murat Belge axivîn. Dor hat ser Musa Serdar Çelebi. Di wê de bêdengiyeke ker û lal çêbû, her kes li bendê ye ka dê çi bibêje. Çelebi, bi Kurdî dest bi axaftina xwe kir bi qasî sê çar hevokan. Girse şaş ma. Paşê çepikeke bi çoş dest pê kir. Paşê Çelebi dest pê kir û pêzanînên xwe bi me re parve kirin. Me hin komikên *ulkuger* jî biribûn civînê. Bi wan zarokan re, heta bibêjin hûn kî ne ji ku ne, Stenbol çawa ye filan me dît normalbûnekê dest pê kir. Beriya vê, carekê dema em çûbûn Colemêrgê, me serokê Ocaxên Ulkugerên Tirkan Cezmi Bayram jî bi me re bû. Wê demê em çûbûn daweteke Kurdan, govend digerandin. Bi Kurdî anons kirin û gotin hin mêvanên me ji Stenbolê hatine, piştî wê ji hurmetdarî hemû stranên Kurdî veguherîn Tirkî. Cezmi Bayram van hemûyan dibîne. A niha serokê Ocaxên Tirkan a Şaxa Stenbolê ye.

Civîna me ya li Sêrtê jî balkêş bû. Em derbarê xebatên xwe yên pirsgirêkên Wîlayeta Mûsilê de, wek koma Eko-Polîtîk, bi qasî mehekê çûbûn Îraqa Bakur. Li Hewlêr û Silêmaniyê, em yeko yeko bi pêşeng û giregirên serokeşîran re,

bi saziyên civaka sîvîl re û him jî bi partiyên siyasî re axivîn ka em ê çawa werin cem hev. Pişt re me li hev kir ku em piştî du mehan civînekê li dar bixin di formata vê civînê de. Ser meseleyê hevdîtineke me bi Senatoya Zanîngeha Silêmaniyê re çêbû. Li wir heta Utopyaya Kurdistana Mezin me hemû tişt nîqaş kirin, digel koma Eko-Polîtîkê. Serkêşê vê jî xwarziyê/biraziyê Mehmûd Berzencî bû ku piştigriya me dikir. Şêx Salar hebû. Me dîsa ciwanên ulkuger û netewperwer biribûn bi xwe re. Xanimeke neteweperwer hebû, Gamze Kona. Akademîsyen e, neteweperwereke hişk e. Dema bi hevoka “Esas em qet ji Kurdan hez nakin” dest bi axaftinê kir, çavên hemû serokeşîrên Kurdan ku di xew re diçûn ji nişka ve vebûn. Diyalogan gêrgîn dest pê kir lê asoxî ev hatin cem hev. Paşê em derbasî Qibrisê bûn. Heman pirsgirêk, kompozîsyona nasnameyî ya li Qibrisê.

Li vir jî me çekên xwe yên dawî diteqandin, ji ber ku êdî pevçûnan dest pê kiribû. Tew me digel koma Eko-Polîtîkê daxuyaniyek da çapemeniyê; “Di demên dijwar de bila çek rawestin, însan biaxivin.” Li vir Yavuz Aslan Argun heye. Yek ji avakerên Têkoşîna Tevgera Neteweperwer e, van rojan, nû wefat kir. Vedat Bilgin, a niha şêwirmendê serokwezîr e, Selim Okçuoğlu ji tevgera Kurdan e, Ömer Laçiner...

Herî dawî em çûn Colemêrgê. Dîsa Muammer Beg, bila her sax be, Musa Serdar Çelebi, serokê şaredariyê yê wê demê, Bedirhanoğlu. Meha remezanê bû, me fitara xwe vekir. Colemêrgî pir ji Musa Çelebi hez dikin. Me daxuyaniyek amade kir wê demê, wek hûn dizanin pevçûnan dest pê kiribû. Paşê Eko-Polîtîk ji hev belav bû. Xebata me ya herî dawîn jî derbarê Şiî û Suniyên li Lubnan û Bahreynê bûn ku ew çawa dikarin werin ba hev.

Bi kurtahî wiha ye, ji 2005an dest pê kir, ber bi dawiya 2011an qediya. Li vir yek ji pirsgirêkên herî mezin jî ev bû: Mesela ji hevalan yekî –ne şaş bim, gerînendeyê çandê yê Şaredarîya Eyubê, entelektuelekî îslamhez ê baş e- şiroveyeke wisa li min dikir: We bi azmûna Eko-Polîtîkê modela têkilîdanînê ya herî baş nîşan da ku rastgirên Tirkan û civata muhafezekar dikare têkiliyê bi yên dîtir re deyne.” Got; ji me kesekî dê nikaribûya modeleke wiha ya têkilîdanînê pêk bîne.” Yek ji şiroveyên ku bala min kişandî ev bû.

Eko-Polîtîk hat girtin. Wê demê musteşarê ewlehiya giştî yê dawîn li ser kar bû, navê wî jî, Xwedê dizane Murat Çelikkol bû. Paşê ji CHPyê bû parlamenter. Carinan bi ya min ji dêvla kesan û komployan mirov dikarin derkevin pêş. Dema me ev xebat dikirin, ew jî li ber xetereya jikar-dûrxistinê bû. Gotibû, “Min fam kir hûn ne Îslamperest in ne jî Fethullahhez in, ez ê piştgiriya we bikim.” Bi wê piştgiriyê me civîna Ewropayê li dar xist. Kurdên li diyasporayê, komikên federasyona Tirk-îslamê filan hatibûn digel hev.

Modeleke wiha hat danîn. Ev model tim bi navê Vamık Volkan tê hilanîn lê Vamık Volkan ji bo me du tişt bûn. Yek jê marka bû. Dema me digot Volkan jî digel me ye gelek kes dihatin. Niha kes nizane kî ye ne kî ye, dê kî bê, problemek wiha heye. Ya duduyan, Vamık Volkan ji hela metodolojiyê ve pir alî me kir. Ji ber ku modeleke wî ya biçûk a hazir hebû. Me ew modela biçûk bi awayekî berfireh şirove kir û lê anî. Helbet kêmî û qisûriyên modelê hene lê divê metedolojiyek hebûya. Wekî din, heqeten jî tecrûbeyên muhîm ên Vamık Volkan hene. Ew kes e ku çar caran bûye namzetê nobelê. Hê jî piştî mirina Freud, ji du kesan yek e ku mafê wî heye li mala Freud bimîne. Di wexta xwe de li Camp Davidê, Menahem Begin û Enver Sedat anîne cem hev.

Anekdotên balkêş çêbûn. A rast dema ez dixebitîm ji Meseleya Kurdan dûr bûm. Di civinekê de ez û siyasetmedarekî Kurd ê navdar em digel hev rûniştine. Min bi dilekî safî jê re got, “Yê we jî nexweşiyeke we ya siyasî ye, hûn pirsgirêkên xwe dispêrin serkêşekî kult. Ev ne nakokiyek e?” Li min vegerî û got, “ew serok û serkêşê me ye, rêberê me ye, ji kerema xwe nîqaş nekin Tarık beg.” Li wir ez têgihiştim, min got temam e. Piştî vê me lîstok li gor vê saz kir. Ji hela me ve fokusa lîstokê; famkirina baştir û têgihiştina hin tiştan e. Em hewl didin fam bikin. Ne di ser meseleya dijrabûnê re.

Dîsa li ser meseleya Mûsilê, em li ser heqên Tirkmenan pir xebitîn. Li wir Avni Lütfioğlu jî hebû. Li Bexdayê jî parlamenterê Tirkmenan bû. Dema diaxivî digot, “Tarık Beg mafê perwerdehiya zikmakî filan, hûn xwedî li van derkevin. Binêrin li vir ew maf dane me jî. Li Îraqê ji hêla hikûmeta Bexdayê ve ew mafê me tê nasîn.” Yê ku vê dibêje hevalekî pro-neteweperwer e.

Du tiştan kir ku ez meseleyê bêhtir fam bikim. Jargoneke Vamık Volkan a kemalîst hebû. Pirtûkeke wî derbarê Ataturk de hebû. Paşê hat qedexekirin, pirsgirêk derketin. Yek jî li ser Ocalan meraqeke wî çêbû. Helbet kêfa wê avadaniya malûm ji vê re nehat lê Vamık Volkan jî bi vê pêvajoyê re xwe nû kir. Dema Abdullah Gül serokkomar bû, em digel Volkan çûn cem serokkomar û me jê re qala meseleyan kir.

Di meseleya Mirovên Aqilmend de jî min ji Rıfat Hisarcıklıoğlu re wiha got; “Gelek derfetên Yekîtiya Ode û Borseyan hene. Meriv bibêje eyb e, teyareyekê radikin, diçin Belgradê xwarinê dixwin. Hûn heqê teyareyekê ji bo salekê bidin me, em ê bi van tecrûbeyan li vir navenda diyalogê û çareseriya pevçûnan a navneteweyî ava bikin.” Wê demê Ahmet Beg serokwezîr bû. Pêşî Tayyip Beg bû, paşê Ahmet Beg. Got, “Ji Tayyip Beg re bibêje, ku erê bike, em ê tavilê ava bikin.” Paşê gotin ji Ahmet Beg re bibêjin. Wê demê mixabin ne Tayyip Beg ne jî Ahmet Beg, –wer lê nenêrin, Ahmet Beg hevalê me ye lê– piştgirî nedan. Dema piştgirî nedan, yê me jî pirsgirêkên me yên navxweyî rû dan. Dema ewqas erk dan destê ewqas ciwanan, hemûyan jî xwe wek He-

Manê Tirkiyeyê hesiband. Ji hin pirsgirêkên navxweyî wêdetir, çima ku yekî jî ji wezîrê karûbarên derve û serokwezîrê wê demê Abdullah Tivnikli re negot "Te ev baş kiriye, em sipas dikin" û ew pîroz nekirin, bi ya min yek jî çima ku ji binî ve pê didan hîskirin ku heke wî karî biqedîne, ev mesele li wir tê girtin û diqede. Bi ya min saziyeke jidil a civaka sîvîl bû, ji wan rêxistinên ku tim di nava lêgerînê de bû û bi derfetên xwe mezin dibû.

## BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Hûn çawa însanên ewqas ji hev cuda tînin cem hev? Astengî an jî pirsgirêk dernetin pêşiya we? Hûn serokê Ocaxên Tirkan û endamekî PKKyê ê kevn tînin cem hev û didin nîqaşkirin. Yek jê qala heqê devê şûr dike. Yê din xwediyê perspektîfa Kurdistaneke azad e. Hûn çawa kesên ewqas ji hev cihê tînin cem hev? Ez li lîsteyê dinêrim, îro hûn nikarin komeke wiha bînin cem hev.*

Erê, wiha ye, ya yekem ez tu carî nebûm zilamê tu aliyan. Dema wiha dibe jî an dibêjin têkiliyên wî bi hêzên kûr re hene an jî dibêjin sîxurê niza'm kû derê ye. Zehmetiyên wisa çêdibin. Li civakên me yên rojhilat mixabin ev wisa ye, lê bi ya min jidilî muhîm e. Dema însan jidiliya we dibînin, û heke hûn netirsînin, dê wî deriyî ji we re vekin. Ango em pir pê daketin. Yek jî li civaka rastgir û neteweperweran min baş nas dikin û baweriyê bi min tînin. Ji wî aliyî ve pirsgirêka min tune ye. Di komikên din de astengî derket, ji hêla qanihkirinê ve. Tu astengî ji civata neteweperweran derneket. Digotin, heke ez bikarim bi rihetî ya dilê xwe bibêjim ez ê werim. Me jî got tu çawa dixwazî biaxive, jixwe armanc axivîn e derbarê vê meseleyê de.

Helbet bi qasî ku ez îro dibînim, ser meseleyê di İyi Partiyê de, baş an jî xirab derbarê Meseleya Kurdan de qet agahiyeke wan tune ye. Ji pêzanînê bêhtir bi metirsiyên refleksîf tev digerin. Bi taybetî derbarê Meseleya Kurdan de lê di mijarên din de jî. Di komikên din de jî pêşdaraziyên cidî hebûn. Meriv dikare ji wan re qal bike. Li ser medyaya civakî naxwazim têkevim van mijaran. Çi ku dema meriv dikeve van mijaran, xuya ye dê yên din aciz bibin, lê vê carê sibê dusibê, çar penc salên din heke em bi heman xebatan rabin bila heqê min ê silavdayînekê hebe ku bikarim bibêjim were rûne. Meriv li navînê disekine ji mecbûrî lê dema meriv tê cem hev diaxive. Jixwe di vî warî de ez ji wan çend kesan yek im ku dikarim bi her du aliyan re biaxivim. Em dibêjin "em nexin xetereyê, bila niha bimîne", ji bo xatirê welêt filan lê problemên pir cidî hene li her aliyî.

Em hewl didin însanan bînin cem hev lê rewşa welêt li ser jihevqetandin û rêvebirina hêsan hatiye sazkirin. Jixwe di rewşeke wiha de ew derfet tune meriv tiştinan bike. Li Rojhilata Navîn jî heman tiştî dikin. Ji hev vediqetînin

û bi rê ve dibin, dema em lê dinêrin. Lê dîsa jî bi ya min çîrokeke serkeftinê ye. Mesela Cezmi Bayram, neteweperwer e, Cezmi Bayram û Murat Belge wextekê bi kulman ketine ser hev, pev çûne. Yek serkêşê çepgiran, yê din ê rastgiran e ango. Ew piştî du sê astan normal bûn. Mesela Musa Serdar Çelebi û Murat Belge bûn hevalê hev ê nêzîk.

Lê nenêrin niha pir medyatîk e, êdî xwe bi destê aboriyê û magazînê ve berdaye lê wê demê yek ji hevalên me bû ku barê me hildigirt. Xebateke Musa Serdar û Mete Yarar tê de bin, kesî bi çavekî xirab lê nedinêrî. Hevalên Mete Yarar ên berê carinan bi şev dihatin Eko-Polîtîkaya me. Tew çend caran bêyî nasname hatin di civîna me de cih girtin. Ev tiştên girîng bûn. Lewre heke em bixwazin tiştinan bikin divê em him dewletê re him bi saziyên sîvîl re di pêwendiyê de bin. Pêwendî, ango ne ku tu bibî yê dewletê an jî yê Qendîlê. Hewce ye meriv pêwendiyê pêk bîne û di astekê de biparêze. Wê demê meriv dikare tiştinan bike.

Helbet Vamık Volkan muhîm e, dîsîplîna psîkolojiyê muhîm e di van xebatan de. Balkêş e, nêzî sed xwendavanan hatine cem me û çûne. Tevî ku pir rexne dikirin, min jimart niha ji wan tenê 66 kes di cihên herî ewle, herî krîtîk de ne. Yek jê nûnerê Ajansa Anadoluyê yê Washingtonê ye, yê din nûnerê Moskowayê ye. Li Kulliye du heb şêwirmend hene. Koordînatorê Nûçeyan ê TRTyê hevalê me ye. Ango ew hevalên ku fikra wan wekî min û te ye lê çima ku dizanin li kû çawa xeber bidin, bêyî qeza û bela hatin cihekî. Însanên resen, hê bêhtir dikarin xwe bînin ziman, fêdeya wan dê bigihêje her kesî. Yek ji tecrûbeyên Eko-Polîtîkê jî ev bû.

**Beşdar:** *Tecrûbeyên pir resen bûn û min bi kêfxweşî guhdar kir. Lê îroroj, dema hûn li dû dinêrin, tiştên ku hûn dibêjin "xwezika" hene, tiştên ku hûn şaş dibînin, kêmasî, şaşî an jî korerêyên ku we di nava xwe de kirin mijara nîqaşê hene gelo? Ji ber ku dawiya dawî ewqas ked, hewldan mixabin berhewa kirin. Erê, dibe hin kesên ku bi van xebatan rabûne, bi saya van xebatan xwe gihandibin hin derfetan. Dibe wan xwe gihandibe lê mixabin asoxî encameke giştî bo civakê jê derneket. Bi taybetî digel tîmên we yên biçûk, we çawa nirxand?*

Dema em bi Mirovên Aqilmend re çûn Mêrsînê, yên wê derê digotin, "Ne ji Eko-Polîtîkê bûya, ewqas însan dê nehata ba hev." Heke baweriya însanekî bi dîrokê, bi Xwedê, bi dinyaya din hebe û xwedî ûcdan be, ango ji xwe re bibêje "min tiştekî baş kir" û bi ûcdanî rehet be, wî însanî mohra xwe li dirokê xistiye. Jixwe însan pir ne mecbûr e ku bibe muqtedîr. Ango em ji serfiraziyê na lê ji seferê berpirsiyar in.

Me çi şaşî kirin? Belkî em bi demokratîk tevgeriyan ji xwendevanan re, dibe

ji we re şaş bê lê min zeafeke wisa dît bixwendevanan re. Dema rastî yekî neteweperwer dihatin dibûn neteweperwer, dewlethez. Dema bi yekî KCKyî re rûdiniştin vê carê digotin em rêvebiriya xweser ava bikin filan, di nava komeleyê de. Bêtecrûbetiyên wan... Nexwe avakirina dezgehekê û hiyerarşiyekê divê hebe di nava rêxistinê de. Ev jî ew mijar in ku zeafê bi meriv re çêdikin.

Bi ya min ev tecrûbe, siberoj dema meriv bibêje, “Ka em li defterên xwe yên berê binêrin, bê tiştinên xweşik tê de hene an na?” dê wê çaxê bi qîmet bibin. Mesela dema min “Rastgiriya Tirkan” nivîsî, min hewl da ku ji sed, sed û pêncî sal berê tiştinan bibînim. Di ya nêz de min nedît, min got belkî ez di ya kevn de bibînim. Min Çelebiyê Katib dît ser meseleyê, fikrên xwe yên pir baş hene. Hêvî dikim bibînim.

Yeka din jî, meseleya Mirovên Aqilmend heye. Bi ya min, helbet meseleya Mirovên Aqilmend yek ji pisgirêkên bingehîn ên rastgiriya Tirkan e û nikaribûn projeyan biafirînin. Lewre bi qasî dizanim meseleya Mirovên Aqilmend projeya Ocalan bû. Bila yê nêzî min jî hebin yê nêzî te jî. Û yên ku ji kontenjana Ocalan, ji kontenjana dewletê, ji ya Ak Partiyê ketine hebûn, ya din jî, yên ku kêm zêde ji vî karî fam dikin.

Ji van jî wêdetir, pirsgirêka Mirovên Aqilmend, di warê têkilîdanîna bi gel re rû da. Li otelên pêncstêrkî... Yên me wisa bûn. Beşdaran jî nedikarî otelê bibînin. Paşê min got ev kar naçe serî. Min Muhsin Kızılkaya jî da dû xwe, min ji yên din re got nabe û li erebeya xwe siwar bûm çûm gundên Elewiyên Textecî. Gotin hûn mehê 40 hezar lîre distînin. Mêrikan hindik ma li me bixin. Têkiliya rasteqîn ev e. Berêvarê re ez û Muhsin reviyan, parêzkarên me jî hene. Wê demê Tayyip Beg ji Malên Semayê re gotiye Malên Cumbuşê. Di ser vê de jî dema em çûn helbet...

Şêwaza siyasetmeşandinê ya birêz Erdoğan çawa ye? Tavilê li we xwedî derdikeve, piştevaniya we dike. Ango dema got Mirovên Aqilmend merivên min in, MHP û CHPyê rasterast pozîsyon girtin. Ew xebat li wê derê qediya, heke hûn ji min bipirsin. Yeka din jî, di meseleya Mirovên Aqilmend de pêşnûmayek tune bû ku bigota ka dê dawiya vê rêyê di kû re derkeve. Ango ev bêprojetiya Çepgiriya Tirkan e, pêşnûma tune ye. Û bi ser de fikreka demdirêj tune ye.

Yek du mînakên ez tim qal dikim hene. Rojekê em li televîzyonê ne. Ev meseleya Mirovên Aqilmend hê nû dest pê kiriye. Şirin Payzın, li hember min jî Berhan Şimşek -CHPyekî berê ye–, yek jî Yaşar Okuyan heye. Tim bi ser min de tên. Şirin Payzınê got, “hûn ê qala çi bikin ho Mirovên Aqilmend?” li wir min manewrayek kir û wê manewrayê Mirovên Aqilmend xilas kir. Min jî

got, “Em naçin ji xelkê re qala tiştinan bikin, em diçin li xelkê guhdar bikin.” Huş bûn. Vê carê wek “Hemû Mirovên Aqilmend diçin li xelkê guhdar dikin” rapor hatin amadekirin. Ev jî tiştekî baş e. Hê jî meriv dikare ji wan raporan sûdê wergire, bi ya min. Ê guhdar bike bike heta kû derê, ji me re vebêjin. Kesek tiştekî nizane.

Herî dawî ez vê anekdotê bidim, Rıfat Hisarcıklıoğlu pir baş organîze kir û em çûn Burdurê civîna yekemîn. Yurikan bi dahol û zirneyan em pêşwazî kirin. Em li ser taştêya yurikan hazirkirî rûniştin. Hemû çapemenî li wir e. Mixtarekî pirsî: “Serokê min, ev Proseya Çareseriyê çi ye?” Rıfat Hisarcıklıoğlu ma şaş. Li nava çavên hev nêrîn, dîsa lê nêrî û got; “Proseya Çareseriyê tiştekî baş e hevalino.” Ev jî wisa qewimî û çû.

Vê xebatê, jixwe hûn jî dizanin, bi pozîsyongirtina li hemberî hev dewam kir. Dewletê pozîsyon girt. Rêxistinê pozîsyon girt. Piştî vê gêrgîniyê trajediyan rû da. Mixabin heke Tirkiye Meseleya Kurdan çareser bike –gotineke Ahmet Davutoğlu heye: “Projeyeke sedsalane ye ev”–, îro li Rojhilata Navîn dê pir xurt bibe. Dê konsolîdasyona xwe ya hundirîn çareser bike û hwd.

**Beşdar:** *Heke hûn dîsa dest bi xebatê bikin, tiştên ku hûn dibêjin “teqez divê em vê bikin û vê nakin hene gelo?”*

Li Tirkiyeyê adetek heye. Nizanim ev ji otorîteriya Almanan a piştî Şerê Cîhanê yê Yekem tê, an ji kopîkirina Îttîhat Terakkiyê ya ji Almanan tê, an jî ji kopîkirina rêxistinê ya ji Îttîhat Terakkiyê tê nizanim lê pêşî têra dilê xwe şer dikin, paşê kê hê bêhtir kuştibe digel wan rûdinin û pê re dibin dost. Paşê dîsa şer dikin. Lihevkirineke demokratîk tune ye. Tenê diaxivin. Wek dostaniya du tiştên ji hev cihê. Pêdivî bi dostaniyeke wisa tune.

Heke hûn ji min bipirsin, dewlet bêyî kesî muxatab bigire, bi taybetî ew mafên demoratîk ên takekesî; refaha civakî û aborî, mafê zimanê zikmakî, pênaseya takekes a di makezagonê de divê sererast bike... Ango bi rêxistinê re şer bike, bike ku bila dev ji çekan berdan; lê wekî ku ew tune bin tevbigere... Demokratîkbûneke tomarî, destê Tirkiyeyê, yê dewletê, yê her kesî dê xurt bike. Bila li Tirkiyeyê însanên zimanê xwe yê zikmakî diaxivin hebin, yên bi nasnameya xwe ya Kurdbûnê dibin serpirîştiya giştî ya leşkerî hebin, ji kû dizanim, di nava çarçoveyeke giştî ya demokratîkbûnê de heke çi hewce bike... Bazara bi rêxistinê re, rehabîlîtekirina yên ji çiyê hatine filan ev mijarên asta duyemîn in bi ya min.

Pirsgirêka Tirkiyeyê ya esil veqetîna ji demokrasiyê ye. Rêvebiriyên demokratîknebûyî, dibe siberoj dîsa proseyeke çareseriyê ya nû bidin destpêkirin lê dê çawa be? Nameşandina di TRT Kurdîyê de filan... A muhîm demokratîk-

bûn e, derbirîna rehet e. Bêyî metirsiyên wek em tiştekî şaş nebêjin, tiştek neye serê me... Ez rêvebirekî payebilind bûma, min ê demildest bi makezagonê dest bi sererastkirina mafên demokratîk ên takekesî bikira, bi awayê ku hemû civak li ser li hev bike. Ne parastina mafên komikan, hinekan, wê çaxê em ê veguherin Îraqê, em ne ewên ku xwe bispêrine eşîr û komikan. Jixwe li vir jî bi qasî dibînim, Diyarbekirê jî berê xwe daye çanda burjûwaziyê. Yekî çiyê nikare yên li vir bi rê ve bibe... Taxên nû, cafeyên li wan taxan, mêjiyê însanan pir diguhere. Li vir daxwaza nasnameyeke wek a Katalanên herêma herî dewlemend a Îspanyayê belkî çêbibe belkî çênebe. Meseleya li vir bi rehetî tevgerîna însanan e, mafê derbirînê ye. Heke ev bên misogerkirin, tiştên din paşê tên axaftin.

Bi ya min divê rê li ber veguherîna PYDyê bê vekirin. Heke ji dest bê divê rê li ber veguherîna Qendîlê bê vekirin, û piştî tevkariya vê veguherînê Tirkiye li Rojhilata Navîn dikare bibe xwedî bandor. Hêzên taybet ên Tirk, bila herin bi YPGyê re li derekê rûnin. Bila here nexweşxaneya xwe jî li wir ava bike, li Kobaniyê. Li şûna ku here li dû Amerîkayê dewriye biavêje, li vir avadaniya xwe bi xwe ava bike, bi lihevkirinekê. Wek çawa Suleyman Şah anîn, li wir ava bike, tevkariya veguherîna wan bike lê ji bo vê proje hewce ye, doktrîn hewce ye. Ev tune... Li ba rastgirên Tirk ev tu carî peyda nabe. Ev lênihêrtin tenê li ba Îngîlîzan heye. Îro ez lê dinêrim heta hevalên xwe lê temaşe bikin, Îngîlîz razemeniyê dikin li wir. Projeyek çêkirine, li Antartîkayê bêyî ku fok xisarê ji semasiyan bibîbin çawa dikarin koç bikin, vê dikişînin kamerayê. Ez di wê baweriyê de me ku em werin vê astê em ê bikarin van meseleyan jî çareser bikin.

Ev xebat hinekî zor xuya dikin lê ev rastiyek e, dewleta Tirk xurt e, dikare bi awayekî bidomîne. Di Meseleya Kurdan de dikare berê xwe bide pişaftinê jî. Qet nebe mirov dê bibêjin, "Ji dêvla Bexdayê jiyana Diyarbekirê an jî ya li Stenbolê xweştir e." Min Bexda dîtiye. Tew li Hewlêrê jî gelek xetereyên jiyanê hene ku bajarê herî baş Hewlêr e li wir. Dewleta Tirk qet nebe pênc şeş salan dikare vê bidomîne. Belê wê malikê li aboriyê xira bike lê di vî warî de bi lênihêrtina yekalî û bi polîtîkayên ewlehiyê yên yekalî heke bibînin ku vê didomînin, bi awayekî nerasterast tezên di meriyetê de mafdar derdixin. Ev e di şerê navabajaran de teza dewletê rast derket. Tiştên dikarin bên domandin, wekî avadaniya çandî ya derbarê pêşketina Diyarbekirê de, û di derbarê mudaxelenekirina tiştên ji berê de tên. Nabêjim tiştên baş in lê tiştên ku dikarin bên domandin. Heke ev polîtîkayên dewletê bin, heke dewleteke kûr hebe, wek min got em dikarin van nîqaş bikin. Heke Eko-Polîtîk li vir jî bihata avakirin baş dibû.

**Beşdar:** *Îro derfeteke wisa heye? Mesela ew derfet heye ku xebatên wek yên Eko-Polîtîkê bên kirin, an jî rewşeke wisa?*

Heke hûn îro van tiştan li van deran dikin... Bi şertê ku sînor derbas nekin dibe, lê helbet ji ber ku hûn bêhtir herêmî dixebitin zêde balê nakişîne. Ango dema hûn bibin sedema wendakirina raya hinekan an jî hûn rê li ber zêdebûna raya hinekan vekin... Tiştên zehmet in ango.

**Beşdar:** *A rast di çareseriya pevçûnê de tezeke wisa jî heye. Ev pirsgirêkên wiha têkiliyan xira dikin. Ev têkiliyên xirabûyî dê hin bin-pergalên dîtir ava bikin û pergal dê xwe bispêre vê. Heke armanc avakirina aştiyê be, ji hêlekê ve dema krîz tên çareserkirin ji hêlekê ve çareseriya krîzê, bi awayekî ku ew têkilî bên veguherandin, divê nêzî mijarê bibin. Ya esil ew e ku veguherandina têkiliyan e. Bi kurtahî teoriyek heye ku dibêje veguherandina têkiliyan di navenda sazkirina aştiyê de ye. Û bi ser de ji bo vê esas divê komikên dijber bi hev re têkiliyê deynin. Eko-Polîtîk di vî warî de azmûneke hêja ye. Ya ku meraq dikim ev e, dema em li heyama di navbera 2005-2001an de difikirin, tecrûbeyeke pênc-şeş salan çêbû, vê tecrûbeyê qet nebe têkiliyên aktoran veguherandin? Dema em li navan dinêrin, karekî hêja hatiye kirin. Heke di têkiliyên wan kesan de veguherînek pêk hatibe, nexwe karekî mezin hatiye kirin. Di van têkiliyan de veguherînek pêk hat?*

Ji sedî panzdehên wan rehmet kirin. Durmuş Hocaoğlu, Turan Sarıtemur ê rewşenbîrê Kurd. Di ser de deh-panzdeh sal derbas bûne helbet. Hinek jê nexweş in, Cevat Öneş nexweş e, ne şaş bim. Lê heke em ji yên li *networkê* re bibêjin, "Hadê werin em ê îro werin cem hev," hemû dê werin. Ji wî aliyî ve qet pirsgirêk tune ye. Ev jî tiştek e. Min wê demê di pêvajoya mirovên aqilmend de qal kiribû. Min ji serokwezîr re dûvdirêj qal kir. Min wêne raberê kirin bi awayekî tematîk. Karsazên me yên muhafezekar dema karekî dikin, xêrekê dikin –em hinekî bi mubalexeyî bibêjin-, bi hêviya bidestxistina koşkekê ji bihuştê wan xêr û bêran dikin. Bi tiştekî wisa ma koşkek ji bihûştê pê tê, nayê.

**Beşdar:** *Sê pirsên min hene. Gelo hûn bi taybetî têgeha "Mirovên Aqilmend" bi kar tînin? Em wê wek "Însanên Aqilmend" bi kar tînin. Hûn bi taybetî vê wisa dikin?*

Na, ne bi taybetî. Di Îngilîzî de jî wek *wiseman* tê gotin.

**Beşdar:** *Belê, nexwe di wir de jî problem heye, bi heman awayî. Pirsa min a din, Mekanîzmaya Eko-Polîtîkê xwedî xisûsiyeteke wisa ye ku bi taybetî li Tirkiyeyê di her pêvojoyê de meriv dikare bi kar bîne. Çi bû sedem ku Eko-Polîtîk têkeve nava liv û lebatê? Ango Eko-Polîtîk bi xwe pirsgirêkê ferq dike û li ser dixebite an hinek berê wê didin wê pisgirêkê ku li ser bixebite? Pirsa min a sêyem, we got xwendevanên me tam nebûne navçîn,*

*çûne kîjan hêlê bûne alîgirên wan. Baş e di vê pêvajoyê de we bêalîbûna xwe parast?*

Heke em bi çavê psîkiyatrîstekî lê binêrin, ragihandineke mîna têkiliya di navbera nexweş û psîkiyatr de, di wî warî de feraset ev e, meriv wek mirov hîs dike. Zarokê jinikê miriye ser meseleyê, êşa xwe bi we re parve dike.

Wê çaxê fikra min çi be, a niha jî li ser heman fikrê me. Tiştek neguherî di fikrên min de. Dibe di helwestên me de guhertin çêbûbe. Ser meseleyê Weqfa Avrasya Bir heye. Ji neteweperwerên hişk pêk tên ku umrê gişan di ser heftêyî re ye. Ez li wir biaxivim, ez ê di bin bandora wan de jî nemînim. Rojekê, tew carekê min hevalekî cerdevan bir wê derê, dijminekî PKKyê ye bi xwe. Kêfa kesekî jê re nehat derbarê realîteya Kurdan de. Ji ber ku di wan şert û mercan de tenê wan dikarî li wî zarokî guhdar bikin. Em nikarin yekî HDPyî bibin wê derê. Lê te dît ewlehiya paşayan, ya dewletê... Hevalekî min ê cerdevan ê pir baş heye, tew min ev mesele jî pê dan gotin. Tehamulî wî jî nekirin.

Motîvasyona Eko-Polîtîkê çi bû? Bi ya min her tiştî esabiyeteke avaker bi rê ve dibe, ev tiştekî rast e. Ibn-i Haldun jî Arnold Toynbee jî rast dibêje. Divê ruhekî esabî yê avaker hebe. Ne şert e ku îlleh CIA were ava bike tiştên wisa, wek ku em di fîlmên Mel Gibson de dibînin, venêrîna mêjî filan... Însan pir muhîm e. Însanê ku flanoreke amator datîne 'Kızıl Meydanê', bi ya min dikare van karan jî bike. Wê demê xeyaleke me ya pir jidil hebû; xilaskirina welêt û hwd. Helbet wek kesekî ji çanda rastgiriyê tê. Murat Sofuoğluyê li cem min jî her wisa mîna min bû. Ew jî ji Mohîkanê Dawîn yê Koma Têkoşîna Neteweyî bû. Îdealîzmeke hişk hebû.

Me dixwast Ak Partî wê demê piştgiriya me bike lê nizanim ji ber çi qet piştgirî nedan û vê jî em bêmotîve dikirin. Dema Eko-Polîtîk hebû, SETA jî hat demazirandin. Piştgiriyên aborî yên di navbera me de nêzî bîst qatan bûn. Ango sekna dûr a ji îqtidarê û belkî ya hêz dida me ew bû ku wan qet bersiv nedan tu randewûyên ku me ji wan dixwastin. Bi ya min heke hûn li motîvasyona wê bigerin, dahûrandina sosyolojîk a esabiyetê di vir de veşartî ye. Abdullah Begê rehmetî ditirsiya û digot, "Ez ji we re dibêjim werin Balafirgeha Yeşilkoyê, hûn derbas dibin diçin Edirneyê, hinekî hêdî, pê li frênê bikin." Karsazek e... Dema meriv diket mijarên xetere. Axir dema proseya çareseriyê dest pê kir, wî jî ji wir nan xwar. Dawiyê ku rewş xira bû û xirecirê dest pê kir, dev ji dayîna piştgiriyê berda.

**Beşdar:** *Mamoste, qadên xebatê di raporan de pir berbelav in. Mûsil, Kerkûk, Meseleya Kurdan... Bê guman xalên van ên hevpar jî hene lê tiştê ku derketiye pêş hinekî li ser mîsakî mîllî ye... Ango wek daxilkirina Kerkûk û Mûsilê xuya dike. Helbet aktoran Meseleya Kurdan xistin rojeva xwe. Îro*

*zehmet e ku ev hemû nav bên cem hev lê li ruhê wê demê dike. Em bibêjin pir jî ne dûrî perspektîfa îqtidarê ye. Ne li dij e, pê re pev naçe. Siberoj –îro jî li ser diaxivin pir ne dûr e belkî- dibe dîsa pêdivî bi xebatan çêbibe.*

Li vir du tişt hene. Yek jê pevçûnên nasnameyî ne ku xala wan a hevpar: nasname û nebanî ye. Di navbeyna Tirkên li Qibrisê de jî heman tişt heye, dîsa Mûsil jî bi vir re têkildar e.

**Beşdar:** *Hevûdu xwedî dikin esas, bi hêsanî ji yekê derbasî ya din dibin. Ser meseleyê em bibêjin li Mûsilê eşîra Şêx Berzencî... Dawiya dawîn her yek li ser rastiyekê ye. Ji binyada xwe ya dîrokî ve jî ji hêla karûbarên xwe yên îro ve jî muhîm e. Ma meriv nikare wê xebatê bi rê ve bibe bêyî ku pêdivî bi piştgiriya îqtidarê bibîne? Ez ji ber vê dibêjim: Mesela hûn dibêjin, 'hûn li vir xebatekê bi rê ve dibin, dibe hinekî herêmî be lê ji hêla motîvasyonê ve kakilê wê xebatê di xwe de dihewîne.' Li devereke wek Tirkiyeyê ku xwediyê gelek entelektûelan e, ev kar nikarin bên kirin?*

Ew profesyonelî bi me re tune bû, em amator bûn. Mesela TESEV an jî PODEM ku piştî TESEVê ava bûn, ekîbên wan hene. Keç û xort hene, hemû jî bi mastir in, bi doktora ne, zimanê wan ê biyanî pir baş e, entegreyî dinyayê bûne. Fonan distînin ji Yekîtiya Ewropayê, fonên şeş mehî an jî salek-du salî. Belkî li ba we jî hebe. Zarokên li cem me pir amator bûn. Yê me ne ewqas wexta me hebû ku em bi fon-monên Yekîtiya Ewropayê re mijûl bibin ne jî profesyoneliya me. Wê demê bi çavekî baş lê nedinêrîn ku meriv pereyan ji Yekîtiya Ewropayê bigire. Esas divê meriv van binivîse, baş e ku civak van tiştan bizane lê mixabin...

**Beşdar:** *Dema hûn bi çavê îro lê dinêrin, heke proseyeke nû hebûya derbarê dubarekirina paşerojê de... Hûn hevalên ciwan wek amator bi nav dikin, helbet ji ber bêtecrûbetiyê. Belkî rapor bi dilê we nehatin girtin an jî danehevek saziyî pêk nehat. Her kes bi derekê ve belav bû çû, ketin derdê pêşeroja xwe û karîyera xwe. Loma danehevek çênebû. Ji bilî bîra we û ji bilî wan navên ku we raberî me kirin, wekî ku hûn ê di nava komikekê de cih negirin a ku xwe bigihîne we, ne wisa? Îro pêkan e ku meriv vê bi amûrên din ji nû ve bi rê ve bibe? Bi çavkaniyên ber destê we hûn di wê baweriyê de ne ku tişt hene bên kirin, hûn li derdora xwe vê derfetê dibînin an jî we dê çi bikira ku ciwan bêhtir entegre bibin, bi avakirina komîsyonên lokal? Wan dê kurteraporên civînên we derxista. Ji vir dê nîqaşek dest pê bikira. Ew li paş wek siyekê, wek kabîneyekê dê bixebitîna. Hûn esas wek mirovên aqilmend, wek rûspiyan, lê nizanim belkî dewam bikira.*

Jixwe ya ku divê bibûya ev bû. Li Tirkiyeyê rewşeke wisa heye ku... Rewşeke wisa ku tenê ji bo çapkirina pirtûkekê jî meriv diçe li benda destûra hine-

kan, li benda navbeynkariya hinekan dimîne… Paşê dema hûn dibêjin, “Ez derbarê çareseriya pevçûnan de, li ser proyejeke baş dixebitim; hewl didim bi zimanekî çêker him metodolojiyekê him jî bingehekê ava dikim derbarê meseleyên li Tirkiyeyê û Rojhilata Navîn de,” wê demê hişmendiya siyasî ya heyî tavilê te wek xetereyekê nebîne jî çima ku dizane dê nekaribe te kontrol bike tavilê mesafeyê dixe navbera xwe û te. Mesele ne xeterebûna meriv e, mesele ew e ku nikare te kontrol bike. Tiştekî nikaribin kontrol bikin jixwe nêzîkê nabin. Dê bibêjin, “Erê tu hevalekî nas î lê em ê nikaribin te kontrol bikin.” Mesele ev e.

Heke Tirkiye demokratîk bibe, wê çaxê em ê li Yekîtiya Ewropayê rûnin, em sê çar kes. Bi hevalên profesyonel ê li ber teqawudbûnê belkî… Ango ev dikarin bên kirin. Lê bi ya min li Tirkiyeyê hê jî rewş ne guncav e ji bo vê. Heke proseyeke çareseriyê ya nû dest pê bike, bi ya min dê ne tiştekî pir dûvdirêj ê mayînde be. Ev wek taktîk û wek hemle xuya dikin. Ez wî aqilê dewletê nabînim ku hişmendiyeke wiha ava bike.

**Beşdar:** *Ji bo çareseriya pirsgirêkê tu hêviyên we tune ne wekî ku?*

Çerxa dinyayê geh li jor e geh li jêr e. Ji wê re gotineke min tune ye. Di serdema têdeyî de ev potansiyel heye lê tevgereke siyasî an jî qewimînek tune ye ku vê potansiyelê bikare bi kar bîne. Nexwe li Tirkiyeyê însanên pir hêja, xwegihandî hene. A niha li vir jî çend kes hene ku dikarin proseya çareseriyê bi rê ve bibin. Lê bi feraseta siyasî ve giredayî ye. Em dewleta Kemalîst çiqas neecibînin jî, saziyên wan hebûn. Saziyên dewletê neman. Sazî tune ne, burokrasî bi hêsanî naxebite. Di nava pergaleke çalak de meriv dikare hin tiştan bi hêsanî bi lêv bike û muxatab bibîne. Muxatab an çend xizm in an jî kes in. Wekî din tune ne. Hûn ê çawa bi van karan rabin?

Di asteke bilind de ne lê ez di wê fikrê de me ku belkî di profîleke biçûk de pêk bê. Di vî warî de li Stenbolê yek du pêkhateyên mîna Eko-Polîtîkê hebin. Ev dikare bi profîlekî biçûk be jî. Tirsa min ev e; di rejîmeke otorîter de heke proseya çareseriyê bê ferzkirin, em bibêjin hevdîtinên bi Îmraliyê re filan, ew ê bibe tiştekî din ê hetikî bi ya min. Tenê, dema atmosfer demokratîk be encamên baş, dûvdirêj û mayînde ji proseya çareseriyê derdikeve.

**Beşdar:** *Heke em werin ser pirsa du aliyên ji hev cihê çawa hatin cem hev, di atmosfera siyasî ya wê demê de bêguman hêsantir bû ku meriv wan aliyan bîne ba hev. A niha hinekî din zehmet e.*

Wê demê jî zehmetî hebûn. Zordestiya meheleyê zêdetir bû lê atmosfera siyasî baştir bû. Vê serdemê zordestiya meheleyê kêmtir lê atmosfera siyasî xirabtir e.

**Beşdar:** *Hûn mafdar in, wiha, wek kesekî sereke, ku ew proje bi rê ve birin û ev kar û xebat kirin, dipirsim. Li gor we sedem çi bû ku Proseya Çareseriyê neçû serî, an jî bi rastî jî civak ji vê re ne hazir bû? Ez fikrên we yên zelal ên derbarê vê de meraq dikim.*

Heke em li civakê binêrin, civaka me hinekî fanatîk e. Wê demê bi ya min her du aliyan tiştên cihê ji proseya çareseriyê fam dikir. Her du aliyan jî digot "çareserî" lê qesta tiştekî din dikir. Perestina qibleyên cihê dikirin. Hêviya dewletê ji çareseriyê bêçekkirin û hinekî jî zêdekirina dahata bacê ya li herêmê bû.

**Beşdar:** *Metirsiyên siyasî hebûn? Ji hêla Ak Partiyê ve?*

Pir ne zêde lê hebûn. Lê ji hêla rêxistinê ve jî di bendewariyeke wiha de bû; "Hêdî hêdî serdema serweriya me tê, em ê cilên xwe ji xwe bikin, cilên şaredariyê li xwe bikin û qanûnan ji vir bi rê ve bibin." Her du alî jî pir utopîk bûn. Divê meriv li ser pênaseya Proseya Çareseriyê li hev bike. Yek jî divê her kes hadê xwe bizane. Ango avadaniyeke wek dewletê heye li hember we. Ku hûn ne bi dînamîkên xwe lê bi *denklem*eke navneteweyî nêzî meseleyê bibin, hûn ê jî bibin wek Sûriyeyê. Ew jî tiştekî din e. Pisgirêka yekem, pênaseya çareseriyê ji hev cuda bû. Projeyeke ji mêjiyekî hevpar pekhatî an jî feraseteke lihevkirî.

**Beşdar:** *Ji bêtecrûbetiyê ye?*

Ev tecrûbe bi tetbîqkirinê tên bidestxistin. Her du aliyan jî wek proseya ewlehiyê li proseya çareseriyê nêrîn. Te dî carekê li Osloyê rûniştin, paşê li Îmraliyê tevî Altan Tan, Selahattin Beg û Hatip Beg. Ji çûyîna wan deran bêhtir divê doktrîneke vî karî hebe. Wê ev kar çawa bibe? Xweseriyeke qismî an xweserî? Welatîbûna makezagonî di dewleteke demokratîk de? Çi, çawa? Dibêjin di tesewûfê de dema meriv dest bi tiştekî dike dawiya wê nîşanî meriv didin.

**Beşdar:** *Rastgirên Tirkan –çi yên ji rêzê çi yên di rêvebiriya dewletê de em bibêjin– dê realiteya Kurdan asgarî di çi astê de qebûl bikin? Esas rewş li Diyarbekirê an jî belkî li cem hemû Kurdan ev e; Têgihiştineke giştî wek 'em Kurd in' tune ye. Dixwazin jê re bibêjin netew, dixwazin bibêjin gel, dixwazin bibêjin milet, her çi be. Ango heke Tirk netew bin em jî netew in. Ku Ereb netew bin em jî netew in. Ku Faris milet be em jî milet in. Têgeh her çi dibe bila be, xwe wek komikeke kolektif a hevtayê van her sê komikan dibînin. Di pratîkê de jî alîgirê wê ne ku pirsgirêk bêyî şer, bêyî jihevqetîn û bêyî xirecir bê çareserkirin bi qasî ez dibînim. Nizanim heval jî wek min difikirin an na lê cihê Kurdan aniha ev e. Em wek komikeke ku hevtayê*

*wan her sê komikan e. Navê wê her çi be; netew, milet, etnîsîte qet ferq nake. Û em li rêyên jiyaneke hevpar digerin. Niha tiştê ku ez meraq dikim ev e; Kurd çi dixwazin, xweseriyê an federasyonê? Heke em pirsê berevajî bipirsin, Rastgirên Tirkan -çi yên ji rêzê, çi yên di rêvebiriya dewletê de- li ber vê daxwazê li kû disekinin, dikarin kîjan derî vekin?*

Pir guherbar e, nifşê min di esasê xwe de dewletparêz e. Car tê dibe Îslamparêz, car tê dibe Tirkparêz û car tê dibe Kemalîst. Te dît dîsa Tirkparêzî û netewparêzî hat. Îslamparêzî hinekî din li paş ma. Metodolojî û doktrîneke rastgiriya Tirkan tune ye. Nexasim lênihêrtina ji hêla MHPyê ve ev e; "Hê ku dewlet xurt e, yek jî hê ku konjonktura navneteweyî ne di leha me de ye, te dît meseleyên wek Suriyeyê filan, nexasim li dijî rêxistina çekdarî an jî li dijî rêxistina ku vê wek metodolojiyeke terorî bi kar tîne, em kulma xwe ya hesinî deynin. Heta ji me hatiye em rêş bikin. Di serdemeke em pir bi avantaj de, em çareseriyeke li gor dilê xwe ava bikin û biqedînin." Tiştê bingehîn ev e bi qasî ez dibînim. Netewedewlet dixwaze însanên yekrengî, yektîpî bibîne dawiya dawîn.

Ne pêkan e meriv ji bilî avadaniyên Kurdan di tu avadaniyekê de însanên yektîpî bibîne. Dibêjin yek milet yek mezheb filan lê yektîpekî wisa tune ye. Jixwe pêdivî bi wan fikir, însan û pêşengan heye da vê di sînorê helînê de bigirin ku jê re dibêjin *melting pot*. Yekîtiya vî welatî îlam ne bi yek dewlet, yek miletî... Te dît ev tiştekî bitûn e, nayê nîqaşkirin lê di mijarên din de meriv dikare biaxive. Heke Tirkiye qanih bibe Kurd ji wan re derfeteke baş e ji bo pêşketin û xurtbûnê, çi li Rojhilata Navîn çi li Dinyayê, ew ê belkî bi kêrî tiştekî bê lê divê bên qanihkirin.

**Beşdar:** *We got têgihiştineke hevpar a çareseriyê tune. Ez jî bi we re me. Heqeten jî têgihiştineke hevpar a çareseriyê tune ye. Heke di atmosfereke demokratîk de proseyên muzakereyê an jî hin proseyên diyarkirî pêk bên, pê de pê de dê bên ser têgihiştineke hevpar a çareseriyê? Mekanîzmayên ku tên têgihiştin dê rojekê hevpar bibin? Û bi ser de ez tiştekî din jî meraq dikim. Çima projeyeke rastgirên Tirkan tune ye? Nexwe biafirîne an hewce pê nabîne? An di vî warî de derdekî wan ê wisa tune?*

Ez bi xisûsî çûm mala Ziya Gökalp. Min wêne kişandin. Li cihê ku rehmetî hat kuştin, li ber minareya çarling jî min wêne kişandin. Rastgiriya Tirkan bajaregundî ye û li Tirkiyeyê tu caran ew derfet çênebûye ku neteweperweriya burjûwaziyê pêk bê. Ew karakterê bajaregundî yê rastgiriya Tirkan, yê dewletê, yê partiyan, ew karakterê wan ê populîst ê bajaregundî pir bilind e. Jixwe burjûwa estetîkê, hûnerê, felsefeyê diafirînin. Heke rastgiriya Tirkan neteweperweriyeke burjûwaziyê biafiranda, dikaribû çanda lihevkirinê ya bi çînên din re çêtir bi pêş bixe. Dikaribû wan pirsgirêkên we qalkirî çareser bike. Belkî têgihiştina Turanîzmê ya ku Tirkên Kazanê afirandine... İlber

Ortaylı jî ji wan Tirkên Kazan e ser meseleyê an jî Yusuf Akçura. Çima ku karakterekî rastgiriya Tirkan a ji dewletê xweser diafirîne tune ye, çima ku rastgiriyeke Tirkan a bajarvaniyê çênebûye, rastgiriya Tirkan bajaregundî ye. ji meaşê memûrtiyê hez dike, xwe nade ber ticaretê, esnaf e. Loma ji meseleya Kurdan fam nake.

Ser meseleyê İyi Parti. Ez bi Yavuz Ağıralioğlu re tim diaxivim. Wer nekin, wer nebêjin dibêjim. Bila we nexapînin dibêjim. Dibêje, "Dema ez HDPyiyan dibînim şehîd tên bîra min." Ez vê fam dikim lê dema tu ew ên din, ku bi Ocalan re radibin rûdinin, dibînî şehîd nayên bîra te lê dema bi yên HDPyê re rûdinin şehîd tên bîra te? Heke di nava hezar zanîngehên dinyayê de navê du heb zanîngehên rastgiriya Tirkan hebûya, yek du *think-tank*a (dezgehên ramanyariyê) wan hebûna, ew meseleyên hûn qal dikin dê çareser bibûna. Lê haho her roj zanîngeh vedibin, nava wan vala. Belkî bi vî awayî birêvebirin rehettir tê. Ango îqtidareke ku dikare her bê domandin.

Heke em werin ser pirsa din, li vir ji têgihiştina aştiyê bêhtir ya ku xurt e dewlet e. Ango ya ku aboriya xwe, burokrasiya xwe, hiyerarşiya xwe, hêzên xwe yên ewlehiyê, îstixbarata xwe xurt dewlet e. A ku konjonkturên dinyayê, a ku Amerîka, Rûsya û hêzên li herêmê bivê nevê bixwazin pê re tifaqê bikin, dewlet e. Dewlet bi awayekî dikare vê konsolîde bike, bi dayîna berdêlên mezin. Çima xelk van berdêlan bide? Çima însan bimirin, sûcdar an jî bê sûc? Heke hêzeke biçûk hebe û lênihêrtina rêvebirên dewletê ya derbarê meseleya Ermeniyan de ku ji Îttîhat Terakkiye û vir ve neguheriye, heke ew hêza biçûk vê lênihêrtinê biguherîne, ew paradîgmaya ku hûn dibêjin dê biguhere û dê çareser bibe. Lê niha ne di wê astê de ye heke hûn fikra min bipirsin.

Mesela min du sê general nas kirin, diçûn serdana malbatên PKKyiyan, korgeneral bû. Bi ciwanê çûyî çiyê re diaxive û hewl dide ku wî qanih bike. Însan pir jê hez dikin. Mêrik ji FETOyê girtin, paşê fam kirin ku ne ji wan e, berdan. Pêdivî bi aqilê dewleteke wisa heye ku li ser paradîgmayên cihê bifikire, aqilekî rasyoneltir û maqûltir. Ev dê bi rêya siyasetê bibe an bi rêyeke din nizanim. An nexwe bi awayekî dîtir ev ne mimkun e. Tiştên xembar jî hene. Li Kolombiyayê dîsa diçin ser ya xwe ya berê. Ev kar ne hêsan in û em jî ji wan ne xweser in. Lê dewlet dikare bi awayekî xurt konsolîde bike. Serweriya hişmendiya demokratîk di dewletê de çiqas cih bigire, çareseriya van tiştan jî dê ewqas hêsan bibe.

**Beşdar:** *Di çareseriya meseleyê de an jî di sazkirina aştiya civakî de erka hêzê girîng e? We got li Kolombiyayê dîsa vedigerin ser ya berê. Bi ya min sedema vê ya bigehîn ew e ku dewleta Kolombiyayê xwe hêzdar dibîne û pê bawer e ku d*ê bi awayekî *konsolîde bike. Heke heman tişt li vir jî biqewime d*ê aştiya civakî *saz bibe?*

Çûna çiyayan pir kêm bûye. Em jî şêwaza vî wezîrê karûbarên hundir naecibînin. Lê, lê binêrin, mêrik aşkere dikin, binêrin yên ku diçin çiyê kêm bûne, aramî heye. Mirin tune ye.

**Beşdar:** *Dibe ev jî çêbibe, dibe îro rêxistina heyî bi temamî jî biqedînin lê sibê dibe rêxistineke din derkeve.*

Helbet, lê ev heye, mijara esas, afirandina rizayê ye. Divê dewlet wê rizayê di civakê de ji bo her kesî biafirîne. Dema riza bê afirandin rêvebirin dê hêsantir bibe. Lê mêjiyê wan ranagire ku ewqas sofîstîke bi rê ve bibin. Ji ber ku siyasetmedarên me yên ewqas jêhatî tune ne mixabin. Ew mêjiyê ku bikarin wê rizayê biafirînin tenê di nav giregirên avaker ên Amerîkayê de hene. Li jiyana mêrikan binêrin ji serî heta binî... Avadaniyek, aqilek û siyasetmedariyeke dewletî hebe ew çareseriya ku hûn dibêjin dê pêk were bê guman. Çima na.

**Beşdar:** *Heke atmosfera siyasî hinekî din nerm bibe... Em bibêjin rojek hat û her du alî jî ji çareseriyê heman tişt fam kirin, li ser pênaseya aştiyê li hev kirin û em bibêjin Eko-Polîtîk hê jî li ser kar e. Li hêlekê hin tiştên qewimî hene. Dîroka siyasî heye. Ya herî hêsan Sûr heye. Avakirina van dê çawa bibe?*

Heke hûn ji min bipirsin, li Tirkiyeyê çareseriya Meseleya Kurdan divê rastgirên Tirk bikin. Tenê ew dikarin dewletê qanih bikin. Ji wan dê çiqas derkevin ez nizanim lê ew ê rê li ber hêsanîbûna vî karî vekin. Carinan hevalan rexne jî dikim. Hin civîn tên lidarxistin, tim lîberalên giregir, hevalên ku di guhê gê de dijîn. Jixwe araq mîna avê ye. Hemû hevalên hêja û entelektuel in lê van tiştan girse diyar dike. A ku di navika Tirkiyeyê de rûdine rastgirî ye. Yeka din jî, çepgiriya Tirkan romantîk e. Romantîzm jî dan destê Kurdan. Her du alî jî jixwe romantik tevdigerin. Hewce ye rastgiriya Tirkan bê qanihkirin ku bi awayekî çalak tev li proseyê bibe.

Helbet di paşerojê de trajedî hene mixabin. Te dît Ahmet Türk digot, "Em hazir in ku hevdeh hezar failê meçhûlan ji bîr bikin." Pêdivî bi mêrxasan jî heye. Ev neyên jibîrkirin nabe. Helbet ji bo şîngerandinê, divê hin mekanîzma bên avakirin lê pêşî divê niyet hebe. Ma ez, ma îqtidara min, ma dewlet, ma milet, ma xelk? Li gor vê pergalê, li gor van kategoriyan avadanî dikare bê danîn.

**Beşdar:** *Niyet bê guman pir girîng e lê ji aliyekî ve jî ew şîn divê bê gerandan. Niha em li Sûrê dinêrin. Sûrê çiqas şîna xwe gerand?*

Ez û Muhsin diaxivin. Qet tiştek nebe jî ser meseleyê divê gora Şêx Seîd bê çêkirin. Ne wek tirbê be jî divê gorek jê re bê çêkirin. Û ev ê jî bi kêrî şîngerandinê bên lê ev mijareke pir cihê ye. Ji bo wê pêdivî bi şêwirmendiyê heye.

Wek emeliyata mêjî, bêyî xisarê bidî derekê divê bê kirin. Pevçûnên nava kolanan tiştekî din e helbet.

**Beşdar:** *Ma em hêdî hêdî ber bi dawiyê ve naçin gelo? Ji ber ku hûn bi Rojavayê jî dizanin, niha her tişt bi wir ve hatiye girêdan. Proseyeke bendemayînê heye. Rastgirên Tirkan ne amade ne. Belkî bi guherîna dewletê re tiştin bibin. Rojava helbet ew cih e ku hesabê polîtîkayên navneteweyî herî zêde li wir li bin guhê hev dikevin. Esas salname jî wisa ne. Ji meha berfanbarê û vir ve her qala mudaxeleyeke taloqkirî dikin. Heta dawiya vê mehê wext dane. Dibêjin, "Heta wê wextê heke Amerîka dixwaze wek Tirkiyeyê tevnegere, em ê têkevin." Wer xuya ye dê li wir şikestinek çê bibe.*

Li Efrînê şikestinek çêbû lê pir bandoreke wê çênebû. Ez di wê baweriyê de me ku şertên Efrînê taybet in, hebûna Rûsyayê, têkiliyên Tirkiyeyê yên bi Rûsyayê re û hwd.

**Beşdar:** *Em bi hev re li Amerîkayê di civînekê de bûn. Wiha digotin: Li wir tiştê ku difikirin, avadaniyeke mîna ya Bakurê Îraqê ye lê ev ê dûvdirêjtir biajo. Ji loma, muhtemelen hebûna Trump a li Amerîkayê gelek tişt guhertin bê guman lê dîsa jî wekî ku dibêjin, saziyên bi kok û binyad ên li Amerîkayê karîn Trump qanih bikin, bi ser ketin. Nexwe bi ya Trump bûya niha ji wir dê vekişiyana.*

Heke Trump mîna Fethullah Gülen bûya niha malik li dinyayê xira kiribû. Siûda me ya herî mezin ew e ku Fethullah Gülenekî DYAyê tune.

**Beşdar:** *Devlet Bahçeli serkêşekî bibandor û têra xwe jî xwedî karîzma ye. Her çiqas me ew rexne kiribe jî li gor hinekan serkêşekî mezin e lê dema mesele tê ser berjewendiyên polîtîk tavilê çivan dide xwe. "Rastgiriya Tirkan" ev demek e di navenda nîqaşên me de ye. Gelo çiqas rasteqîn e ku em bibêjin rastgiriya Tirkan li ber çareseriyê dibe asteng, ew rastgiriya Tirkan, ew aqilê rastgiran ku –gava din we jî rexne kir wek rastgiriya bajaregundî– dikeve nava hesabên erzan ên hilbijartinê, her roj pevçûnên qoltuxan ango ew rewşa wan a di asteke rajor de îdealîze nebûyî li ber çavan e? AKPya ku Erdoğan avakirî jî ev pênc sal in ji partiya navendî derketiye, ber bi partîgeriya rastgir ve diçe. Sedema xilasbûna Proseya Çareseriyê ya mistûmezin û jinûve-destpêkirina şer û pevçûnan, wek em hemû pê dizanin, bi Rojavayê bêhtir bi wendakirina hilbijartinên Tirkiyê re têkildar e. Em qala partî û aqilekî wiha yê rastgiran dikin. Û em qala girseyeke mezin a li Tirkiyeyê dikin ku her amade ye bi gotina partiyeke wiha bike. Em proseya çareseriyê bînin bîra xwe, gotinên meriv ji ber şerm dike, gotinên ku niha dikevin şûna heqaretan li rojavayê Tirkiyeyê li qadan hatin gotin û xelkê jî pir xweş ev gotin erê kirin. Esas li cem civakên mîna yên me afi-*

*randina erêdanê ango afirandina rizayê pir hêsan e. Esas ev ne mijarek e ku em jê bitirsin. Mesele ew e ku şerxwazî an jî ew zimanê şerxwaz divê li cem civatê bi kêr neyê. Niha yekane sedema vî zimanê şerxwaz ê heyî ew e ku dema hilbijartinan ev ziman bi kêr hat, ji hêla civakê ve, ji hêla girseyan ve hat erêkirin. Yê min ez nikarim tiştekî din bi xwe bidim bawerkirin.*

Belê lê heke ev zimanê şerxwaz bi ekonomiyê bê destekkirin dê xirabtir bibe. Lê niha, di nava ekonomiyeke xirabûyî de xelk dizane ku bi şer zik têr nabe. Ew dema ku zimanê şerxwaz xisar nedida ekonomiyê ji ber metirisya 'bila pergal û sazûmana me xira nebe, bila şorbe ji zikê me kêm nebe' piştgirî dan wê siyaseta şerxwaz. Ez li ser wê fikrê me ku di ekonomiyeke xirabûyî de dê zimanê şerxwaz bi kêr neyê. Pirs ev e, erê du partî bi zimanê şerxwaz diaxivin lê di muxalefetê de jî tiştek tune ye, antîtezekê, çareseriyekê, rêyekê danaynin. Disa jî li gor min ev dê bi liserferzkirina avadaniyeke navneteweyî çêbibe û dê proseyeke çareseriyê ya çêkirî dest pê bike. Encamên çiqas xwezayî dê ji wê proseya çêkirî derkevin ez wê nizanim.

Çepgiriya Tirkiyeyê jî cuda ye. Her çiqas çepgirî wek protest, lîberal, pirsîner, enternasyonal bê zanîn jî, çepgiriya li Tirkiyeyê wek hûn jî dizanin neteweperwer, pixudokî, Kemalîst, komediyeke Awrasyayî ye ji serî heta binî. Ew jî pir enfekte bûne mîna rastgiran. Heke zarokên rastgiran êdî bibin deîst, agnostîk filan û dîn nîqaş bikin; heke ji bilî ewên min jimartine jî kesî nebînin ku bibin rêvebir di şîrket an jî di şaredariyên wan de, wê demê dibe xwe biguherin. Ji bo vê jî yek du nifş divê.

Ez dibînim. Îro dînê dezgehî tê nîqaşkirin. Malpereke min a bi navê faraszade.com heye, min li wir nivîsî, hin nivîsên min ên din jî hene. rastgiran êdî li ser navê îslamê tiştek nehiştin. Hûn dibêjin "tesewûf" û "terîqat", ango divê derî ji her kesî re vekirî be. Mêrik di destê wan de alayên partiyê, cube, rih, li ser motosîkletan digerin. Mizgeft bûn mizgeftên milî, dergeh bûne dergehên milî. Ma çêdibe, ev der bîst û çar seatan vekirîbûn ji her kesî re. Ya ku me ji Mewlana hîn kir, ev bû. Ez wer difikirim ku heke vê pêvajoyê bibînin dê dest bi nîqaşkirina xwe bikin. Wê bibêjin, "Ev kar qediya êdî, ekonomiya vî karî berevajî bû." Wê hingê lê bigerin ku li kû derê bibînin. Helbet pirsgirêkeke din jî xurtbûna avadaniyên navendî ye. Ya herî cidî ji Endulûsê derketibû. Li wir avadaniyên navendî tune bûn hûn pê dizanin, mîrekiyên curbicur hebûn. Yek jî, hunermend pir dihatin destekkirin, li Bexdayê jî her wisa. Dema derbasî wan avadaniyên navendî bûn bivê nevê ev kevneşopiya ilmî qediya. Terîqetan jî kevneşopiya îrfanê qedand.

**Beşdar:** *Di sektora taybet de têgeheke wek learning organization heye. Tê wateya rêxistin û şîrketên ku hîn dibin. Em dikarin jêhatîbûna hînbûnê ya rêxistinekê di nava partiyeke siyasî, SCSyê an jî di nava dewletê de bifi-*

*kirin. Ez ê qala tiştekî din ê bi vê re têkildar bikim û pirsa xwe bikim. Di veguherîna civakî de yek ji dînamîkan jî meseleya "nifş"î ye. Pevçûna çînî ye, pevçûna etnîk û neteweyî ye ya ku veguherîna civakê diyar dike? Di vê mijarê de hinek jê jî "pevçûna nava nifşan" wek dînamîkeke veguherînê dibînin. Di civata rastgiran de "jêhatîbûna hînbûnê" ya nifşê ciwan di çi astê de ye? Şikandina neteweperweriya bajaregundî ku we qalkirî pêkan e gelo? Şikandin û derketina derveyî wê an jî potansiyela xwenûkirina wan pêkan e gelo? Mesela em vê dizanin, cihên ku AK Parti di krîzê de ye û rayan lê wenda dike diyar in. Bêhtir kesên xwende, bajarî û ciwan wenda dike. Ji ber ku li wir lênihêrtineke din, teheyyuleke din heye loma an ji ber tiştekî din e?*

Problem ev e jixwe. Ev nifşê ku hûn qal dikin, heke ji derekê bûrsê negirin an jî neketibin nebûbin memûrê dewletê û pereyekî baş nestînin an jî nikaribin şîrketa bavê xwe bidomînin; tu berjewendiyên wî yên aborî nemabin, van deverên we qalkirî hemûyan înkar dike. An jî qet nebe dibêje, "Te dît belkî bibe lê ev teqez e ku dê ne wek gotina bavê min be," û xwe diavêje hin deran. Problem ev e jixwe. Zarokên misilmanan misilmantiyê qebûl nakin êdî. Misimantiya ku dê û bav li ser ferz dikin qebûl nake, jixwe nakeve wê lêgerînê û nabêje "Ka ev dînê heqîqî kîjan e?" Wan rêyan li wan zarokan digirin. Zarokên malbatên din belkî nîqaşa wan tiştên hûn dibêjin bikin lê rê li wan ên din tê girtin. Min gelek kes dîtine ku serê xwe vedikin. Dibêjin Ayşe Çavdar wextekê wisa bûye. Ev problemeke cidî ye lê kêm kes hene ku serê xwe binixumînin, bi wê nûra rûyê xwe di her civatê de biaxivin, xwebaweriya xwe nîşan bidin, feraseteke hevgirtî derxe holê û bi baweriya xwe bandorê li baweriya kesên din bike.

BEŞA PÊNCEM

# PARASTINA WELATIYAN Û AZMÛNA DUY-DERÊ; PIRSGIRÊKA MAYIN Û BERMAYIYÊN PEVÇÛNAN LI TIRKIYEYÊ

*Özlem Öztürk*

Me wek Komeleya Hestiyariya Civakî û Dijberên Pevçûnan (Duy-Der), di 2008an de dest bi xebatan kir. Beriya vê jî bi qasî deh salan li ser zayenda civakî û tundiya li ser jinê xebitîm. Esas mamosteya matematîkê me. Mijara mayinan her bala min dikêşa, ji ber ku dema ez li Mêrdîn û Şirnexê dixebitîm, hin xwendavanên min ên mexdûrê mayinan hebûn, hinekan destê xwe, hinekan lingê wenda kiribû. Dema min li çîroka wan zarokan guhdar kir, ez li ser fikirîm bê ka ez dikarim çi bikim. Ji ber ku wexta min ji wan zarokan pirsî û got: "Heke we ew made nas bikirina, ji we re qala wan bikirina, haya we ji wan deran hebûya, hûn ê dîsa jî biçûna wê derê û bilîstina?" Zarokan got, "Na, em nediçûn nedilîstin." Piştî van pirs û bersivan ez û çend hevalên xwe em li ser fikirîn. Piştî nîqaşeke dûvdirêj ku ka em dikarin çi bikin, di sala 2006an de me dest bi xebatê kir. Di 2008an de jî me ev komele damezirand û em bêhtir bi vî karî daketin.

Ez ê qasek din qala tecrûbeyên xwe yên derbarê vê de bikim. Ji ber ku bi ya min pirsgirêka mayinê li Tirkiyeyê hê jî rast nehatiye pênasekirin. Meseleya mayinê di raya giştî de, nexasim di çapemeniya welêt de wek meseleya ewlehiyê tê nirxandin. An jî di pêwendiya wan zeviyan de tê nîqaşkirin ku nayên hilberandin. Çima ku ew nîqaş qala binpêkirina mafê jiyanê nakin, mafê jiyanê ku mafê bingehîn ê mirovan e, bi kêrî famkirina meseleya esas nayên. Meselaya esas ku ka ev ji bo însanên li wir tê çi wateyê, çi xisarê jê dibînin û bandoreke çawa li jiyana wan dike. Loma wekî ku ez ê pir biaxivim xuya dike lê bi qasî ji min hatiye ez ê nêrîn û tecrûbeyên xwe bi we re parve bikim.

Min li ba xwe plansaziyeke wiha çêkiriye; pêşî em ê qala meseleya mayinan li dinyayê bikin. Di vê mijarê de li dinyayê çi heye çi tune ye? Di vî warî de kîjan peymanên navneteweyî hene? Ev peyman çi şertan û çi berpirsiyariyan dide ser dewletan? Kîjan dewlet mayinan hildiberîne û kîjan dewletan dev ji hilberandinê berdaye? Piştî ku me bi kurtahî qala van kir, em ê werin ser Tirkiyeyê ya ku birîna me ya nekewiyayî ye. Ez ê hewl bidim bersiva van pirsan bidim; "Pirsgirêka mayinê li Tirkiyeyê di kîjan astê de heye? Ev pirsgirêk çiqas me eleqedar dike û wek SCS em dikarin çi bikin? "

Ewil dixwazim bi pênasaya mayinê dest pê bikim ku tim wek “mayinên bejahiyê yên antî-personel” derdikeve pêşiya me. Mayinên bejahiyê yên antî-personel, ew mayin in û bi sazûmeniyeke wisa hatine hazir kirin ku dema însanek, giyanwerek an jî hebûnek nêzîkê dibe diteqe û dibe sedema mirin an jî birîndarkirina kesekî an jî gelek kesan. Teqemeniyên li ber şer û pevçûnan mane jî ew cebilxane ne ku nehatine teqandin an jî neteqîne. Narincok, topên hewanê, roket, çek, gule ku em jê re dibêjin koma cebilxaneyan, dikevin teqemeniyên li ber şer û pevçûnan mane.

Ji mayinên panîjêker[10] bigirin heta yên antî-tank, bi awayên curbicur hatine çêkirin û him ji hêla dewletan ve him ji hêla rêxistinên çekdarî ve pir zêde tên bikaranîn. Dixwazim bibêjim xetereya van teqemeniyên li ber şer û pevçûnan mane pir zêde ne, nexasim mayin. Ji ber ku ev amûrên pir bêkontrol in. Ji mayinên bejahiyê zêdetir dibin sedema malxirabî û malwêraniyê. Ser meseleyê topeke hewanê ya pir besît heta sê sed metroyî bandorê li dora xwe dike lê bombeyek xisarê dide giyandarên hezar metroyî dûrî xwe. Mayinên bejahiyê wek yek ji çekên kone tên binavkirin. Gelek taybetiyên mayinên bejahiyê hene ku wan ji çekên din vediqetîne. Ji ber ku mayin pir erzan in û umrê wan nêzî 75-100 salan e. Taybetiyeke mayinan a wisa heye. Îro mayina ku we li derekê vaşartiye, siberoj dibe hûn wê mayinê li wir nebînin. Ji ber ku di bin axê de ye û ax organîzmayeke jîndar e, li gor rewşa hewa û demsalê tim diguhere. Dema lehî radibe an jî ax diheze, mayin jî cihê xwe diguherîne. Ev jî xetereyê mezintir dike.

Yê ku mayinên bejahiyê dilebitîne qurbanî bi xwe ye. Mayin di binê erdê de, li benda kes an jî giyanweran e. Piştî lebitandina wî kesî an jî wî giyanwerî mayin diteqe û dibe sedema mirin an jî birîndariyê. Îhtîmaleke sêyem tune ye. Li gor me meseleya mayinê ne meseleyeke ewlehiyê ye lê meseleya mafên mirovan e, çima ku mafê jiyanê binpê dike ku yek ji mafên bingehîn ên mirovahiyê ye. Ne tenê mafê jiyanê, mafê ger û geştê, mafên aborî û civakî, mafê xweza û ajalan ku ev jî mafên bingehîn in. Ji loma me kir ku li Tirkiyeyê jî di vî warî de hişmendiyekê ava bikin. Ez di wê fikrê de me ku wekî hemû meseleyan di vê meseleyê de jî heke em lênihêrtineke tomarî saz nekin dê dahûrandin û çareseriyên rast neyên dîtin ji bo çareserkirina meseleyê. Meseleya mayinê jî meseleyeke wisa ye. Çima ku bi gelek meseleyên din ên wekî meseleya jinê, meseleya zarokan, meseleya xweza û heywanan, meseleya aborî, meseleya îdeolojîk ve girêdayî ye, divê bi lênihêrtineke tomarî û bi perspektîfeke mafparêzî bê nirxandin, pêşniyazên çareseriyê jî li gor vê perspektîfê bin.

Li dinyayê meseleya mayinê çi ye? Dixwazim hinekî qala wê bikim. Ez ne şaş bim 193 dewlet hene ku Yekîtiya Ewropayê nas dikin. Ji van 193 dewletan, di

10 Mayinên ku paniya meriv jê dikin. (Nîşeya Wergêr)

64 dewletan de ji sed milyonî zêdetir mayinên bejahiyê hene. Di destpêka salên 1990î de, Kampanyaya Qedexekirina Mayinan, ku bi serkêşiya saziyeke sîvîl dest pê kiribû, hêjayî Xelata Nobelê hat dîtin. Gelek saziyên sîvîl ên li dinyayê ku derbarê mayinan û mafên mirovan de dixebitin, piştgiriya vê kampanyayê kirin. Piştî Xelata Nobelê ya Aştiyê wergirt, ev kampanya bû peymaneke navneteweyî ya bi navê Peymana Ottowayê ku dewletan dike binbarê vê peymanê.

Peymana Ottowayê peymaneke navneteweyî ye ku ji hêla Yekîtiya Ewropayê ve hatiye amadekirin. Wek Danezana Mefên Mirovan, Danezana Mafên Zarokan. Peymana Ottawayê di vî warî de peymaneke girîng e, peymaneke wisa ye ku dewletên bûne alîgirên wê peymanê dike wê binbariyê ku mayinên di stokên xwe de di nava çar salan de, yên di nava sînorên xwe de jî di deh salan de îmha bikin. Û dîsa çima ku hilberandin, kirîn, firotin û stokkirina mayinan qedexe dike peymaneke girîng e. Dewletên alîgirê vê peymanê wê teahudê didin ku wê sînorên xwe ji mayinan paqij bikin.

164 dewletên alîgirê vê peymanê, dixwazin bila mayin werin qedexekirin. Tirkiyeyê di 2003an de Peyman îmze kiriye û berpirsiyariya Tirkiyeyê di 2004an de dest pê kir. Li gora ku di 2004an de berpirsiyariya Tirkiyeyê dest pê kiriye divê heta 2014an sînorên xwe ji mayinan paqij bikira lê ev nekir. Ji ber ku Tirkiye jî alîgirê Peymana Ottowayê ye divê raporekê bide Yekîtiya Neteweyan ku di vê demê ewqas mayin paqij kirine, ewqas nekirine, yên ku nekirine ji ber kîjan sedeman nekirine filan. Sedem jî tim çi ne? Meseleya ewlehiyê. Gotin, “Li Tirkiyeyê problema terorê heye, ji loma metirsiyên me yên ewlehiyê hene” û deh salên din xwastin ji Yekitiya Neteweyan. Yekîtiya Neteweyan heşt sal dem dan û li gor vê Tirkiye neçar e ku heta 2022an mayinên di stokên xwe de îmha bike û sînorên xwe ji mayinan paqij bike. Sê sal mane ji 2022an re. Tu xebatek an jî hewldanek çênebû. Di 2014an de li hin herêman hin paqijiyên biçûk çêbûn. Wê jî, dema em hatin ser mijara ‘meseleya mayinan li Tirkiyeyê’, em ê bi hûrgilî qal bikin.

Dixwazim vê bibêjim, Amerîka û Îraq ne alîgirên Peymana Ottowayê ne. Pentagon çima ku dixwaze mafê bikaranîna mayinên bejahiyê di destê xwe de bigire nebû alîgirê peymanê. Wekî din Hindistan, Pakistan, Rûsya, Burma û Çîn ji wan dewletan in ku ne alîgirê peymanê ne. Jixwe piraniya dewletên ku nebûne alîgirên peymanê, mayinan hildiberînin. Sêzdeh dewlet mayinên bejahiyê ên antî-personel hildiberînin; Koreya Başûr, Koreya Bakur, Nepal, Pakistan, Rûsya, Sîngapur, Amerîka, Wîetnam, Kuba, Hindistan, Îran, Burma û Çîn. Di vê de bandora Peymana Ottowayê pir e, helbet bandora rêxistinên dinyayê jî ku li ser meseleya mayinê dixebitin. Çil û neh dewletan ragihandin ku wan hilberandina mayinan daye sekinandin û ev hejmar her diçe zêdetir dibe. Ev tiştekî girîng e. Amerîka yek ji wan dewletan e ku dibêje em ê jî hil-

berîna mayinan bidin sekinandin. Îsraîl û Nepal jî di nava wan dewletan de ye. Lê di raporên belavkirî de em dibînin ku rexne li Îsraîlê têne kirin çima ku hê jî hilberîna mayinan nesekinandiye.

Li dinyayê rewş ev e lê rêxistinên muhîm jî hene ku li ser meseleya mayinê dixebitin. Dilê min heye ez qala van rêxistinan jî bikim. Lewre bi ya min ew ê asoya me hinekî din fireh bibe derbarê wan kar û xebatan de ku di vî warî de bên kirin. Xebatên ku ev rêxistin bi rê ve dibin û raporên ku salane bi rêk û pêk tên weşandin ji hêla YNyê ve tên nasîn. YN her sal raporan ji dewletên alîgirê Peymana Ottowayê dixwaze. Yeka din jî, li gor daneyên van raporan dikare di vê mijarê de wan dewletan binirxîne. Çima ku kar û xebatên van rêxistinan û raporên ew diweşînin muhîm in, dixwazim hinekî qala van rexistinan jî bikim.

Bi navê Bangewaziya Cenewreyê rêxistinek heye. Navenda wan li Swîsreyê ye û armanca wan ew e ku komên çekdarî yên bi dewletekê ve negirêdayî, dema dest bi şer û pevçûnan kirin, li gor rêgezên mirovahiyê tevbigerin û di şer û pevçûnan de xisarê nedin sîvîlan. Rêxistina Bangewaziya Cenewreyê hewl dide di dema şer de rê li ber rûdana îstîsmarên zayendî bigire, zarokan nekin şervan û hewl dide ku mafê sîvîlan bên parastin. Taybetiyeke pir girîng a Bangewaziya Cenewreyê heye; di van mijaran de peymanê bi komên çekdarî yên bi dewletekê ve negirêdayî dide îmzekirin. Pê dide îmzekirin û dibêje, "Tu têkoşîna çekdarî didî. Di demên şer de tu yê zarokan nekî şervan, tu yê ji hêla zayendî ve kesî îstîsmar nekî, tu yê mayinan bi kar neyînî." Ev rêxistin jî ji hêla YNyê ve tê nasîn. Tew di sala 2006an de derbarê bikarneanîna mayinên bejahiyê de bi me re ketin têkiliyê. Di 2013an de jî bi PKKyê re peyman îmze kirin ku zarokan nekin şervan. Bangewaziya Cenewreyê her sal bi rêk û pêk dewletên alîgirên vê peymanê kontrol dike û raporekê dişîne bê ka ew dewlet çiqas li gor peymanê tevdigerin.

Komîteya Şopandina Mayinên Bejahiyê jî rêxistineke pir muhîm e. Ew jî her sal bi rêk û pêk raporan diweşînin derbarê dewletên ku alîgirê peymanê ne û wan raporan pêşkêşî raya giştî a navneteweyî dikin. Yek ji wan rêxistinan e ku ji hêla YNyê ve tê nasîn. Rewşa wan bi rêk û pêk dinirxînin bê ka berpirsiyariya xwe ya ku ji Peyamana Ottowayê tê, tînin cih an na. Daneya mirin û birîndaran çêdikin ku mayin û bermayiyên şer bûne sedem. Ev rapor û ev dane bergehê wê dewletê yê derbarê meseleya mayinan de derdixe holê. Xebateke vê rêxistinê ya bi navê 'Kampanyaya Navneteweyî ya Mayinan' heye. Di sala 1998an de dest pê kirine û hê jî berdewam e.

*Mines Advisory Group* (MAG), armanca vê rêxistinê ew e ku pêşerojeke ewle saz bike ji bo kesên tahde ji pevçûnên çekdarî û tundiyê dîtine. Xebata wan a bingehîn mayin in û li çil dewletî dixebitin. Perwerdehiyên li ser rîska

mayinan, di vî warî de avakirina hişmendiyekê di raya giştî de, paqijkirina mayinan... bi gelek xebatan radibin. Bi taybetî xwe digihînin komikên xizan ên biçûk ku heta niha kesî xwe negihandiye û hewl didin ji wan komikan re qadên ewle yên jiyanê saz bikin. Demeke dirêj e li Kurdistana Îraqê ev xebatên min behskirî hemûyan pek tînin.

*Halo Trust* navenda xwe li Londonê ye. Di çapemeniyê de gelek caran derdikeve. Ji wan weqfan e ku bi piştgiriya Leydi Diana hatiye damezirandin. Xebata wan a bingehîn paqijkirina mayinan e. Li wan gund û deverên ku ji mayinan hatine paqijkirin, ji nû ve qadeke jiyanê saz dikin. Ango pêşî mayinan paqij dikin paşê li wê derê ji bo çandinî bê kirin û ji bo ji nû ve qadeke jiyanê bê sazkirin an jî li gor taybetiya devera ku hatiye paqijkirin, bi xelkê herêmê ve biryar didin ka dikarin çi bikin.

*Survivor Corps* hewldan û torek e ku li ser *network*a wan kesên bi saxî ji ber şer û pevçûnan xilasbûyî dixebite. Pêşengiya wê kampanyaya ku bûye sedema derketina Peymana Ottowayê kiriye. Navenda vê rêxistinê jî li Amerîkayê ye.

Bi kurtahî wiha ye rewşa dewletan, asta meseleya mayinê ya li dinyayê û xebatên ku derbarê vê de tên kirin. Berî ku em dest bi meseleya Tirkiyeyê bikin, pirs an jî tiştên ku hûn dixwazin lê zêde bikin hene gelo?

**Beşdar:** *Mueyîdeyeke Peymana Otowayê heye gelo, çi bi wan dewletan dikin dema li gor peymanê tevnegerin?*

Peymanên navneweteyî xwediyê wê taybetiyê ne ku alîgirên wê peymanê dike binbariyekê lê tu mueyîdeyeke wan peymanan tune ye. Hevalên hiqûqnas çêtir dizanin lê axir YN civaka dewletan e û di avadaniyên din ên mezin de jî heman pisgirêk hene. Hebûna Peymana Ottowayê ji bo me referanseke baş e. Dema em vê meseleyê dinirxînin, rexne dikin, divê em tiştekî referans bigirin. Dema em dewleta Tirkiyeyê rexne dikin, pêşniyazên çareseriyê lê dikin, em xwe dispêrin Peyman Ottowayê. Ev Peyman wî heqî dide me ku em bibêjin, “We ev tişt teahud kirin, we qewl da ku hûn heta filan dîrokê van tiştan pêk bînin lê we pêk neanî.” Mueyîdeyên wê yên mezin tune ne lê alîgiran binbar dike, alîgir dikevin binê barekî. YN bi giştî pêşniyaran li dewletan dike, dibêje, “Te filan tişt teahud kir divê tu teahuda xwe pêk bînî ” û pêşniyazên xwe dike.

Dîsa li gor min pir muhîm û karîger e. Ji ber ku di vê pergala dinyayê de tiştekî din ku em xwe pê bigirin tune ye mixabin. Em li gor çi rexne bikin? Heta ew peyman hebin divê em wan bi kar bînin, belkî bi xêra van em hinekî zorê bidin kesên ku xwe nadin ber vê. Û li gor wê jî em ê teşeyekê bidin raya giştî, bi ya min.

Mueyîde jî dikarin tiştên wisa bikin. Têkiliyên dewletan cur bi cur in. Dibe di wan têkiliyan de bê rojevê. Di peymanên ticarî de dibe bên rojevê. Li Tirkiyeyê tiştên derbarê mayinan de hatine teahudkirin heke pêk neyên, ev tê wê wateyê ku ev ne dewleteke ewle ye. Ev ê jî bandorê li peymanên wek aborî, ticarî û gelek tiştên din bike. Ji vî aliyî ve muhîm in. Ji ber bandorê li têkiliyên curbicur dike. Û bi ser de di qada navneteweyî de xirabûna prestîj û pêbaweriya dewletekê jî ne tiştekî biçûk e.

**Beşdar:** *Li welatên ku alîgirê vê peymanê ne, gelo welatiy*ên *xisar ji mayinan dîtine dikarin heqê xwe ji dewletê bixwazin?*

Wiha ye; li her welatî, di çarçoveya hiqûqê de welatî dikarin doza heqê xwe bikin. Wek tê zanîn, li Tirkiyeyê piştî ku we hiqûqa Tirkiyeyê ya navxweyî qedand û heqê xwe bi dest nexist, hûn dikarin serî li Dadgeha Ewropî ya Mafên Mirovan (DEMM) bidin. Lê meseleya mayinê li Tirkiyeyê wiha ye… Ser meseleyê me sala 2006an li Colemêrgê xebatek kiribû. Li wir me xwe gihand kesekî ku xisar ji mayinê dîtiye. Lingekî xwe wenda kiribû. Digot, piştî min doza tazmînatê kir di ser de wan ez ceza kirim. Ez mam şaş, min got, “Çawa tu hatî cezakirin?” Got, “Ji ber ku min xisar daye malê dewletê.” Tiştên wiha absurd jî diqewimin li Tirkiyeyê.

**Beşdar:** *Peymana Ottowayê, ji ber ku peymana YNyê ye, nabe ku bibe mijara serîlêdana şexsî li Dadgeha Makezagonî eger ne şaş bim, lê di pêşerojê de helbet ev rê dê vebe. Heke Tirkiye heta 2022yan van mayinan paqij neke, dê bibêjin, “êdî ev ne mijareke munferit e lê qewîmîneke wisa ye ku bandora wê domdarî ye.” Wê çaxê heke meseleyeke derbarê mayinan de rû bide û mesele here ber destê DEMMyê zehmettir e ku dewlet sedemeke objektîf û maqûl nîşan bide. Lewre DEMM dê bibêje, “Tu alîgirê vê peymanê yî û te berpirsiyarî û binbariyên xwe pêk neanîne. Ji loma ev teoriyên ku tu nîşan didî ez qebûl nakim.” Dê vê derfetê bi dest bixe. Dibe bandoreke wiha li Serîlêdana Şexsî jî bibe. Û bi ser de bi navê Peymanên Medenî peymaneke YNyê a bi giştî heye. Li wir serî li Komîteya Mafên Mirovan didin û ji vir encamek baş tê bi dest xistin. Ne bi rasterast jî be bi awayekî nerasterast dibe bandorê li Tirkiyeyê bike. A rast ez mam şaş ku Tirkiyeyê ev peyman îmze kiriye. Dibe ji bandora konjonktura siyasî ya wê demê be.*

Yek ji wan welatan e ku Danezana Mafên Mirovan îmze kiriye.

**Beşdar:** *Peymana Mafên Siyasî û Medenî jî çer ku hikûmeta AKPyê hat û nehat îmze kir. Tê de ‘Mafê Tayinkirina Çarenûsa Xwe’ jî heye.*

Di Danezana Mafên Mirovan de jî xal hene ku şerh daniye ser. Di Danezana Mafên Zarokan de jî her wisa şerh hene.

Li Tirkiyeyê meseleya mayinan û bermayiyên pevçûnan di çi rewşê de ye? Em hinekî berê xwe bidin wê derê. Nexşeya li jêr asta meseleyê bi me nîşan dide.

**Tablo 1:** Zeviyên mayinkirî yên tên zanîn-li ser sînoran

| Sînor | Hejmara Mayinan | Dîroka Mayinkirinê | Hejmara Zeviyan | Mezinahiya Zeviyan |
|---|---|---|---|---|
| ***Sînorê Ermenîstanê*** | | | | |
| Erdexan | 9724 | 1994 | 15 | 597.225 |
| Îdir | 132 | 1994 | 6 | 32.000 |
| Qers | 10.578 | 1993 | 22 | 662.285 |
| ***Sînorê Azerbaycanê*** | | | | |
| Îdir | 2.994 | 1997 | 1 | 85.800 |
| Agirî | 113.294 | 1993-1998 | 122 | 6.797.790 |
| ***Sînorê Îranê*** | | | | |
| Colemêrg | 11.625 | 1990-1993 | 239 | 1.180.000 |
| Îdir | 41.151 | 1993-1996 | 13 | 3.359.380 |
| Wan | 32.504 | 1990-1993 | 133 | 2.984.640 |
| ***Sînorê Îraqê*** | | | | |
| Colemêrg | 15.223 | 1990-1998 | 316 | 1.526.130 |
| Şirnex | 53.823 | 1990-1993 | 399 | 4.391.399 |
| ***Sînorê Suriyeyê*** | | | | |
| Entab | 218.891 | 1955-1960 | 681 | 55.200.000 |
| Hetay | 41.676 | 1955-1960/1993-1997 | 191 | 23.700.000 |
| Mêrdîn | 164.387 | 1955-1960/1993-1997 | 231 | 54.000.000 |
| Riha | 190.495 | 1955-1960 | 168 | 57.600.000 |
| **YEKÛN** | **906.497** | | **2.537** | **212.116.659** |

Tablo; Ev dane ji rapora civîna 12. a dewletên aligirê Peymana Qedexekirina Mayinan a Tirkiyê (29ê Adara 2013an) hatine girtin.

Li Tirkiyeyê deverên ku zeviyên mayinan hene... Ev dane me bi xwe nedane hev. Ev dane ji raporên dewletê û ji raporên Komîteya Şopandina Mayinan amadekirî û pêşkêşî YNyê kirî hatine girtin. Li Tirkiyeyê karê mayinkirinê kengî dest pê kir? Salên 1950yî, di serdema Adnan Menderes de bi boneya ku rê li ber çûnûhatinên derqanûnî yên li ser Sûriyeyê û Tirkiyeyê bigire, herwiha bi boneya rê li ber bazirganiya sînorî ya derqanûnî -wek "qaçaxî" tê binavkirin- bigire. Bi vê boneyê ji Hetay û Entabê dest pê kirin hemû sînorê Sûriye-Tirkiyeyê mayin kirin.

Jixwe bajar bi bajar, di mezinahiya zeviyê de, di nava çend zeviyan de çiqas mayin hene û dîroka veşartina wan di nexşeyê de heye.

Li Entab, Riha, Mêrdîn, Hetayê di sala 1955an de mayinkirin dest pê dike û heta sala 1997an dewam dike. Jixwe li Tirkiyeyê, li hemû sînorên bejahiyê mayin hene. Gurcistan, seranserê sînorê Ermenistan, Îran, Îraq û Sûriye bi mayinên bejahî tên parastin. Jixwe xweparastina 'em mayinan ji bo parastina sînorên xwe bi kar tînin' ji vir tînin. Lê dema em li nexşeyê dinêrin, em zeviyên mayinkirî li bajarên ne li ser sînor jî dibînin; Sêrt, Bedlîs, Batman, Diyarbekir, Bîngol, Dêrsim... tevî ku ne li ser sînor in zeviyên mayinkirî li wan deran jî hene.

**Tablo 2:** Zeviyên Mayinan

| Herêm (Bajar) | Hejmara Mayinan | Dîroka Mayinkirinê | Hejmara Zeviyan | Mezinahiya Zeviyê |
|---|---|---|---|---|
| Batman | 284 | 1993-1994 | 15 | 11.000 |
| Bedlîs | 853 | 1993-1997 | 75 | 455.000 |
| Sêrt | 1416 | 1991-1993 | 36 | 125.000 |
| Bîngol | 2387 | 1994-1997 | 59 | 275.000 |
| Diyarbekir | 3636 | 1993-1997 | 38 | 75.700 |
| Qers | 10.578 | 1993 | 22 | 662.285 |
| Erdexan | 12.004 | 1993 | 19 | 1.035.225 |
| Dêrsîm | 12.189 | 1993-1995 | 156 | 700.000 |
| Wan | 32.614 | 1991-1993 | 143 | 3.038.140 |
| Hetay | 41.676 | 1955-1997 | 191 | 23.200.000 |
| Îdir | 44.277 | 1994-1996 | 20 | 3.472.190 |
| Colemêrg | 74.502 | 1991-1998 | 809 | 2.730.125 |
| Agirî | 113.294 | 1993-1998 | 122 | 6.797.730 |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Mêrdîn | 166.960 | 195-1997 | 247 | 54.090.000 |
| Riha | 190.495 | 1955-1960 | 168 | 57.800.000 |
| Entab | 218.891 | 1955-1960 | 681 | 55.200.000 |
| Şirnex | 77.887 | 1991-1998 | 719 | 4.754.882 |
| **YEKÛN** | **1.003.943** | | **3.520** | **214.737.307** |

Tablo; Ev dane ji rapora civîna 12. a dewletên aligirê Peymana Qedexekirina Mayinan a Tirkiyê (29ê Adara 2013an) hatine girtin.

**Beşdar:** *Mesela dever*ên ku hûn jê re dibêjin zevî li *k*û *dera bajêr in? An jî li Diyarbekir cihê mayinkirî k*û *der in?*

Ez ê qala wan bikim. Jixwe problema herî mezin ev e. Em sînor dizanin. Sînor cihê herî ewle ne ji ber ku li sînoran têlên rêsinî hene, her kes pê dizane ew cihê mayinkirî ye. Lê li bajaran li kû derê hene, ku der hatine mayinkirin? Em tenê dikarin vê...

**Beşdar:** *Armanc çi ye? Metirsiya li vir çi ye?*

Ez ê qala wê jî bikim. Mayinên di nava sînoran de xetereyeke mezin e ji bo sîvîlan û welatiyan. Ji ber ku em nizanin kû der mayinkirî ye. Baş e em ê ji kû bizanin û texmîn bikin? Mixabin li gor deverên ku teqîn lê çebûye. Divê jîndarek xisarê bibîne, divê însanek bimire an jî birînar bibe ji bo ku em bizanin ka kû der mayinkirî ne. Helbet rêxistinên saziyên sîvîl û însanên ku bi vê meseleyê re eleqedar in ketine dû vê meseleyê û hin lêkolînan dikin. Mesela li Diyarbekirê ku der mayinkirî ne? Derdora gundên ku hatine valakirin. Dema em li dîrokan dinêrin...

Gava din me qal kir ku meseleya mayinê gelek meseleyan di nava xwe de dihewîne. Mayin ku teqiya, reseniya axa li ser teqiyayî xira dke. Bi reşandina madeyên kîmyewî reseniya axê xira dibe. Dûman û madeyên kîmyewî ku tev li hewayê dibin, dikin ku hewa qirêj bibe. Qirêjiya hewa jî qirêjiya xwezayê bi xwe re tine. Tenê ne însan heywan jî nêzîkiyê li mayinan dikin. Lewre qurbaniyan ji hev dernaxe û dibe sedema telefbûna heywanan. Ser meseleyê di salên 1990î de li Kurdistanê, ku wek Rojhilatê Anatolyayê û Başûrrojhilatê Anatolyayê tê gotin, gelek heywan ji ber mayinan telef bûn.

Piştî 1980yî vê carê Meseleya Kurdan li Meseleya Mayinan zêde dibe. Piştî salên 1980yî, bi taybetî salên 1990î dest bi mayinkirina vî aliyê sînoran kirin. Vî aliyê sînoran ku Kurd lê zêde ne û pevçûn lê li dar in. Te dît we got metirsî çi ye, metirsiya li vir ev e; Meseleya Kurdan. Ji bo têgihiştina asta meseleya mayinan ev dîrok muhîm in bi ya min. Komîteya Şopandina Mayinên

Bejahiyê ku min gava din qal kiribû, di sala 1999an de raporeke pir balkêş weşand derbarê Tirkiyeyê de. Di vê raporê de tê gotin ku li Tirkiyeyê mayin ne têne ji hêla dewletê ve lê ji hêla hêzên çekdarî yên derveyî dewletê ve jî têne bikaranîn. Û bi ser de di qeydên Tirkiyeyê yên fermî de, di raporên wan de dê hebin, bi xwe aşkere kirine ku di navbera salên 1957-1998an de 936.663 ango nêzî milyonek mayin li ser sînoran binerd kirine. Di depoyan de niha nêzî sê milyon mayin hene ku divê bihatina îmhakirin. Ser meseleyê li Dêrsima ku jê re dibêjin Tuncelî, ne bajarekî li ser sînor e. Digel ku bajarekî dûrî sînor e, li gor ku dewletê aşkere kiriye, 10.557 heb mayin hene ku niha gihiştiye nêzî 12.000an. Mesela di 2010an de 97 sîvîlan ji ber mayin û bermayiyên pevçûnan jiyana xwe ji dest dane. Ji van 26 zarok, 41 yên mezin in. 19 heb zarokan dema bi van lîstine, jiyana dest dane. Zarokên Kurd ku ji wan were pêlîstok in, ji ber wê meraqa xwe ya mesûmane çima bi wan mayin û bermamayiyên pevçûnan listîne yan jiyana xwe ji dest dane yan uzuwekî xwe wenda kirine. Ne şaş bim sala 2006an –ew Doğan Güneş bû?– serfermandarê giştî, di daxuyaniyekê de got, “Me nexşeya xwe ya mayinan wenda kiriye!” Daxuyaniyeke wiha wahîm dabû.

Dema em li salên 2000î dinêrin, proseya aştiyê sala 2013an dest pê kiribû... Ez li ser wê fikrê me ku proseyeke pir girîng bû û divê demildest vegerin ser wê proseyê, helbet bi awayekî jidiltir, plansazîtir û birêkûpêktir. Bi qedandina proseya aştiyê, li herêma me ji nû ve pevçûnan dest pê kir. Bi destpêkirina van pevçûnên navbajarî re Sûr, Cizîr, Şirnex, Nisêbîn, Silopî îro em dibînin di çi rewşê de ne. Gelek tax xira bûn û tune bûn, pevçûnên dijwar qewimîn. Bi sedan, bi hezaran kes neçar man ku koç bikin. Ez çima van dubare dikim? Ev der ji bermayiyên şer nehatin paqijkirin. Piştî pevçûn qediyan, li Cizîrê, li Nisêbînê, gelek cîsmên ku zarokan li erdê dîtine û bi sedema pêlîstînê an jî firotinê an jî ji meraqan ji erdê rakirine di destê wan de teqiyane û gelek zarok ji ber vê jiyana xwe ji dest dane. Li gor rapora 2017an, li Tirkiyeyê 42 kesan tehde ji mayin û bermayiyên pevçûnan dîtiye, 23 ji van zarok in. Ango yên ku xisarê dibînin nîvî jê mixabin tim zarok in û umrê wan di navbera 7-14an de ye.

Dixwazim mayinên li ser sînoran jî raberî we bikim. Dibêjin ji 1995an dest pê kiriye. Sînorên bejahiyê yên bi Sûriye, Îraq, Îran, Azerbaycan û Ermenistanê re, seranser mayinkirî ne û li ser sînor 906.497 heb mayin hene. Me gotibû bi giştî nêzî mîlyonek mayin hene. 100.000 hebê mayî jî di nava sînoran de ne. Min qala Peymana Ottowayê kir. Di vî warî de meriv dikare çi bike? Rêya jêxilasbûnê ya ji binî ve helbet paqijkirina mayinan e. Lê em qala hejmareke pir zêde û qala qadeke pir mezin dikin. Qala meseleyekê dikin ku gelek meseleyan di nava xwe de dihewîne. Nemaze Meseleya Kurdan. Jixwe faktoreke girîng e ji bo taloqkirina çareseriya meseleya mayinan.

Baş e, heta ku ev mayin hatine paqijkirin, em ê çavên xwe li ewqas mirinan bigirin û xwe li nedîtinê deynin? Helbet na, heta mayin bên paqijkirn gelek tişt hene em bikin. Binbariyên ku Peymana Ottowayê daye ser milê Tirkiyeyê hene. Em dikarin hewl bidin û bikin ku Tirkiye wan binbariyan bîne cih... Ji bilî vê, wek saziyên civaka sîvîl û wek kesên hesas jî gelek tişt hene ku em bikin.

Piştî me qala rewşa li Tirkiyeyê kir, berî ku em dest bi pirsa "Em dikarin çi bikin?" bikin, dixwazim qala tiştekî din bikim. Piştî me Peymana Ottowayê îmze kir, di bin banê Wezareta Parastinê de sala 2015an navendek bi navê Navenda Xebatên Mayinê hat damezirandin. Li vê navendê rêziknameyek jî hat amadekirin ku armancên curbicur dabûn ber xwe; plansazîkirina xebatên derbarê mayinan de û tetbîqkirina van xebatan, weşandina standartên paqijkirina mayinan, hewldana bergiriyên xweşker ji mexdûran, avakirin û xebitandina pergala agahîstandinê ya derbarê mayinan de û hişyarkirina raya giştî... Ev navend hat damezirandin lê hê tu xebat li ser nehatiye kirin.

Li Tirkiyeyê wekî din çi bû? Yek jî qanûnek derket bi navê Qanûna Mayinê. Esas tu eleqeya vê qanûnê bi mayinê re tune ye. Di vê qanûnê de tenê qala paqijkirina mayinên li sînorê Sûriyeyê, ku nêzî 600 km ye, dike. Te dît di çapemeniyê de jî derket. Digotin zeviyên me yên bi adan ên li ser sînorê Tirkiyeyê dewrî şîrketên Îsraîlî dikin û bi vî awayî ket rojeva çapemeniyê. Ev qanûneke wiha ye. Derbarê mexdûrên mayinan de tiştek tune ye, bi tu awayî qala wan nake. Bi tu awayî qala mayinên li ser sînorê Îran, Îraq, Ermenistan û sînorên din nake. Tenê derbarê paqijkirina mayinên li ser sînorê Sûriyeyê de ye ev qanûn. Di sala 2000î de devereke pir hindik a li ser sînorê Sûriyeyê ji mayinan hat paqijkirin û piştre ji ber şerê li Sûriyeyê paqijkirina mayinan hat sekinandin.

**Tablo 3:** Zeviyên mayinkirî yên tên zanîn-li derdora tesîsên leşkerî

| Herêm (Bajar) | Hejmara Mayinan | Dîroka Mayinkirinê | Hejmara Zeviyan |
|---|---|---|---|
| Batman | 284 | 1993-1994 | 15 |
| Sêrt | 1476 | 1991-1993 | 36 |
| Bîngol | 853 | 1993-1997 | 59 |
| Diyarbekir | 3636 | 1993-1997 | 38 |
| Erdexan | 2280 | 1993 | 4 |
| Dêrsîm | 12.189 | 1993-1995 | 156 |
| Wan | 110 | Nayê Zanîn | 5 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Colemêrg | 47.654 | Nayê Zanîn | 71 |
| Mêrdîn | 2.573 | 1993-1994 | 16 |
| Şirnex | 24.064 | Nayê Zanîn | 162 |
| **YEKÛN** | **97.446** | | **637** |

Tablo; Ev dane ji rapora civîna 12. a dewletên aligirê Peymana Qedexekirina Mayinan a Tirkiyê (29ê Adara 2013an) hatine girtin.

Ev nexşe raberî me dike ku mayin bi Meseleya Kurdan re têkildar e. Li herêma me, derdora tesîsên leşkerî jî mayinkirî ne. Li Tirkiyeyê tu herêmeke din tune ye ku derdora qereqol û tesîsên leşkerî mayinkirî bin. Lê ev qereqol, tesîsên ewlehî û leşkerî, ku hûn li ser nexşeyê dibînin, derdora hemûyan mayinkirî ne. Diyarbekir, Batman, Sêrt, Mêrdîn, Dêrsim, Bîngol, Bedlîs, Erdexan, Colemêrg, Şirnex û Wan; bajarên ku pevçûn lê zêde ne.

**Beşdar:** *Derdora saziyên di nava bajêr de jî mayinkirî ne?*

Erê, ser meseleyê li Colemêrg û Şirnexê.

**Beşdar:** *Derdora Qereqola li Rezan a li navenda Diyarbekirê jî mayinkirî ye?*

Na, Qereqola li Rezan na lê li tesîsên leşkerî yên li çolterê mayin hene. Ev nexşe ji me re wê dibêje. Mesela li Şirnex û Colemêrgê qereqol bi piranî li ser giran tên avakirin. Derdora qereqol û tesîsên leşkerî yên wê derê mayinkirî ne. Jixwe mayinên ku dikin derdora wî girî –li Şirnex û Colemêrgê hezîna axê pir çêdibe, ji ber ku berf zêde dibare- bi hezîna axê mayin jî bi ber axê dikevin û dadikevin jêr.

**Beşdar:** *Proseya Çareseriyê ya 2013an di heman demê de ev prose bû ku dewletê giranî dabû ser avakirina kale-kolan. Li derdora van kale-kolan jî mayin hene? Haya we ji vê heye gelo?*

Kale-kol jixwe ev avahî ne ku ber bi binê erdê ve dadikevin. Min li Şirnex û Colemêrgê dît. Piraniya avahiyê di binê erdê de ye, hindikek li ser erdê ye. Hemû qereqol nekirin Kale-kol. Li derdora wan mayin hene an tune ne baş nizanim lê ne bawer im. Ji ber ku piraniya wan avahiyan di binê erdê de ne, dibe mekînazmayeke wan a parastinê ya cihê hebe. Lê li derdora piraniya qereqolan heye. 97.000 mayin li derdora van qereqol û têsîsên leşkerî ne.

**Beşdar:** *We got ku paqijkirina van bûdçeyeke mezin dixwaze. Wekî ku çek erzan in lê paqijkirina wan buha ye. Dema paqijkirinê -çi li Tirkiyeyê çi li deverên din- kî xwe dide ber van mesrefan? Ji YNyê pereyek jê re tê veqetandin an her dewlet xwe bi xwe, bi derfetên xwe? An ew rêxistinên gava*

*din we qalkirî vî mesrefî didin? Kî ye berpirsiyarê vê? Yek jî, ez vê meraq dikim. Heta niha nekiribin jî qet nebe ji vir û şûn ve wek nîşaneyeke jidiliyê derbarê çareseriya Meseleya Kurdan de, paqijkirina mayinan de dê bi kêrî avakirina aştiyê bê gelo, an jî mînakên vê hene li dinyayê? Qet nebe wek paqijkirina hin deverên Diyarbekirê an jî Wanê.*

Rêxistinên min gava din qal kirin, rêxistinên civaka sîvîl in û bi fonan, bi fonên YNyê li ser xwe ne. Paqijkirna mayinan heqeten jî buha ye û pisporiyê dixwaze, di ser de divê rê û rêbazên paqijkirinê jî bên destnîşankirin. Bêyî reseniya axê bê xirakirin û bêyî xisarê bidin xwezayê gelek model hene ku li dinyayê hatine ceribandin.

Pêşî divê dewlet plansaziyekê çêbikin derbarê paqijkirina mayinan de. Her dewlet ji mayinên di nava sînorên xwe de berpirsiyar e. Jixwe bi qanûna mayinê xwastin vê pêk bînin. “Em ê mayinan bi pergal û rêbazeke çawa paqij bikin? Em bidin şîrketekê an di bin banê Wezareta Parastinê de û bi derfetên xwe paqij bikin?” Ev êdî di înîsiyatîfa dewletan de ye. Helbet peymanên navneteweyî jî piştgiriya vê dikin lê berpirsiyarî ya dewletan e. Peydakirina mesrefê paqijkirinê jî di berpirsiyariya wê dewletê de ye.

**Beşdar:** *Gelek dewlet hene ku zeviyên xwe ji binî ve paqij kirine, ne wisa?*

Belê belê... Ewropayê piştî Şerê Cîhanê yê Duyem ev kar pêk anî û qedand. Dev ji şerê bi hevûdu re berdan. Avadaniyeke bi navê Civata Ekonomîk a Ewropayê ava kirin ku pişt re navê wê bû Yekîtiya Ewropayê. Bi avakirina vê rêxistinê, mekanîzmayek di nava xwe de saz kirin ku alîkariya hevûdu bikin û piştgiriyê bidin hevûdu. Lê li dewletên me gava din qalkirî pir zêde ye. Mesela Efxanistanê paqijiyeke jidil kir. Herî dawî Mozambîkê ragihand ku hemû mayinên li welatê xwe paqij kirine.

Ku em werin ser pirsa te ya duyem, ev dê gaveke pir baş be. Nemaze dema Proseya Çareseriyê me jî di raporên xwe de hewl da vê bînin ziman. Di demajoya du salan de kesek ji ber pevçûnan nemir lê zarokên Kurd hê jî dimirin. Lewre mayin ew cure çek in ku -ji ber taybetmendiyên me qal kirmixabin guh nadin demên aştiyê an jî proseyên çareseriyê. Ji hêla avakirina pêbaweriyê ve paqijkirina mayinan helbet gaveke pir girîng e û li welatên din jî gelek caran ev model hatiye bikaranîn. Him ji hêla avakirina pêbaweriyê ve him jî ji hêla însan xwe di ewlehiyê de hîs bikin.

Nemaze dixwazim vê bibêjim ku van tiştên ez qal dikim ne gotinên min in. Bi awayekî fermî di raporên dewletê de derbas dibin. Dewletê di raporên xwe de ragihandiye ku di navbera salên 1989-1992yan de, ku demeke pir kurt e, li derdora tesîsên ewlehiyê yên li Rojhilat û Başûrrojhilatê Tirkiyeyê,

ji ber sedema ewlehiyê 39 hezar mayin veşartine. Dîsa di salên 1990î de piştî gund hatine valakirin û niştecihên wê derê neçar hiştine ku ji gundê xwe derkevin, li derdora hinek ji wan gundan jî mayin hatine veşartin. Di salên 2000î de Qanûna Vegera Gundan derxistibûn. Rê li ber vekirin ku gundî ji nû ve li gundên xwe vegerin lê gelek însanan ji ber van mayinan nekarî vegerin gundê xwe. Ez ê dîsa qala daneyeke fermî bikim. Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsa Tirkiyeyê, di 1994an de raporek weşandiye û dibêje li bîst bajaran; 905 gund, 2523 mezre ji însanan hatine valakirin. Li van deran li derdora milyonek û nîv - sê milyon însan neçar man koç bikin. 3428 hejmareke pir zêde ye, qala qadeke pir mezin dike û bi me dide zanîn piraniya van deran mayinkirî ne.

Meha çûyî li Dêrsimê bûyerek qewimî. Du zarok mirin. Ew zarok digel malbata xwe çûne zozanan û dikarin çiqas dûrî konê xwe bikevin? Zêde bi dûr neketine lê rastî bermayiyeke pevçûnê hatine. Piştî ku pê lîstîne her du zarok jî mirine. Em dizanin ku li piraniya mêrg û çêregehan mayinkirî ne. Telefbûna heywanan nîşaneya wê yekê ye ku li wê derê mayin hene. Û bi ser de hin dever hene ku wek herêma ewlehiyê tên ragihandin. Di nûçeyan de em dibînin, dibêjin, “15 rojan dê kesek nekeve van herêman, qedexe ye.” Ev herêm jî di vî warî de, him ji hêla mayinan ve him ji hêla bermayiyên pevçûnan ve cihên xeternak in. Dema em li hejmarên mayinan ên demên berê dinêrin, wekî ku piştî salên 1990î xebatên mayinkirinê kêm bûne xuya dike. Lê ez ne di wê baweriyê de me, ne li ser wê fikrê me. Bi ya min mayinkirina zeviyan her berdewam kir.

Me got pirsgirêka herî mezin a demildest divê bê çareserkirin, paqijkirina mayinan e. Di nava sînoran de hin dever hatin paqijkirin lê wexta em li 100 hezar mayinên di nava sînoran de bifikirin, cihê ku hatiye paqijkirin pir kêm e. Li ser sînorê Ermenistanê 128, li ser sînorê Îranê 3800 û li cihekî wek Colemêrgê tenê 19 mayin paqij kirine. Li ser sînorê Îraqê 16, li ser sînorê Sûriyeyê 430, li ser sînorê Mêrdin û Rihayê 330 mayin paqij kirine. Mayinên ku hatine paqijkirin bi giştî wek 25 hezar xuya dibe.

**Tablo 4:** Mayinên Hatine Paqijkirin

| Herêm (Bajar) | Hejmara Mayinan | Hejmara Zeviyan | Mezinahiya Zeviyan |
|---|---|---|---|
| ***Herêmên Hûndirîn*** | | | |
| Batman | 182 | - | 11.000 |
| Sêrt | 172 | - | 125.000 |

| | | | |
|---|---|---|---|
| Bîngol | 2111 | - | 275.000 |
| Diyarbekir | 2879 | - | 75.700 |
| Erdexan | 1893 | - | 438.000 |
| Dêrsîm | 5170 | - | 710.000 |
| Colemêrg | 1977 | - | 48.500 |
| Mêrdîn | 1661 | - | 23.985 |
| Şirnex | 3936 | - | 90.000 |
| ***Sînorê Ermenistanê*** | | **-** | |
| Qers | 128 | - | 363.463 |
| ***Sînorê Îranê*** | ***3819*** | **-** | |
| Agirî<br>Colemêrg | 3800<br>19 | - | 2.615.648 |
| ***Sînorê Îraqê*** | | | |
| **Şirnex** | 16 | - | - |
| ***Sînorê Suriyeyê*** | | | |
| Entab | 430 | 3 | 872.622 |
| Mêrdîn | 330 | 2 | 270.500 |
| Riha | - | 1 | 7.175 |
| **YEKÛN** | **25.047** | **6** | **1.150.279** |

## BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *We qala mirina zarok û sîvîlan kir û jixwe em jî dibînin, dibihîzin. Baş e, ji bo xwe biparêzin, tiştên ku sîvîl dikarin çi bikin? Fîlmê 'Hükümet Kadın' tê bîra min, ew sehneya ku pêşî kerekî dişînin nava zeviya mayinkirî. Tiştên wisa bi rastî jî diqewimin? Lewre kesên qaçaxiyê dikin hene. Dibe hûn lê rast hatibin an jî we dîtibe. Ji bo xwe biparêzin, ew kîjan rêbazan bi kar tînin?*

Mixabin heywan tên bikaranîn. Keran û hêştiran didin pêşiya xwe, didin ser rêya ku heywan tê re diçin û bi vî awayî ji xwe re rêyeke xweparastinê diafirînin. Lê ew tiştê em jê re dibêjin "qaçaxî" çawa bibêjim, deriyê debarê ye dawiya dawîn. Dizanin ku der mayinkirî ne. Jixwe li ser sînoran vî karî dikin.

Hin rêbazên bi vî rengî hene ku xwe bi xwe dîtine. Lê meseleya me, kesên sîvîl ên di nava sînoran de ne. Li wê derê wek min gotî, li gor cihê teqînê tê texmînkirin kû der mayinkirî ye. Piştî encamên dilsoj meriv dibe xwedî tecrûbe. Nexwe çiqasê wê herêmê mayinkirî ye, kû der mayinkirî ne an jî çiqas mayin hene kes pê nizane. Çima ku lêhaybûn maye bi tesadûfan loma wek binpêkirina mafên mirovan derdikeve pêşberî me. Ne tenê mafên mirovan, min berê jî gotibû, gelek meseleyên din jî di xwe de dihewîne wek meseleya xwezayê, ya heywanan û hwd.

Rêbazên wiha jî hene. Em vê di xebatên xwe de jî pêk tînin. Kesên li van herêman dijîn bi vê dizanin. Ku tûmikek hebe, ax hatibe kolan, heywanek li wan deran mirî be, ev nîşaneya wê yekê ye ku li wan deran mayin hene. Dîsa têlek an jî parçeyê metalekê ji bin erdê ve xuya bike, tavilê pê derdixin ku ew parçeyê metalê yê mayinê ye. Kevirên li ser hev ên boyaxkirî dîsa dibe nîşaneya vê yekê be. Parçeyên metalan ên bi daran ve hatî girêdan an jî têl û benên di nava gil û giya de, dibe yê dafikên bûyî bin. Cîsimên wek gûstil û pereyan ên li ser erdê û bi benekî ve girêdayî dibe bombe bin. Helbet ji bo vê divê çi bê kirin? Divê dema dimeşin sereqat derûdora xwe di çav xwe re bikin. Baldariyeke wiha jî ma pêkan e di nava jiyana rojane de, a rast ez jî pê nizanim.

**Beşdar:** *Gelo tê tespîtkirin ka bermayiyên pevçûnan aîdê kê ne? Ji ber ku dewlet, da ku berpirsiyariyê ji ser xwe biavêje, dibêje: "Min ev mayin nekirine binê erdê, rêxistina ku ez pê re tê dikoşim ev kirine." Û gelo xwe dispêrin vê hincetê; "Ez bi rêxistinên terorî re pev diçim û hin zehmetiyên vê hene"? Di vî warî de ferqek heye di navbera mayinên rêxistinê û yên dewletê de.*

Dewlet her vê dibêje û wê bibêje jî. Herî dawî di bûyera Dêrsimê de jî du zarokan jiyana xwe ji dest dabû. Gotin "ji ber mayinên rêxistina terorî" ku bûyera li wir ne bûyera mayinê bû. Ew, muhîmateke neteqiyayî bû. Wekî din, dema mayin an jî teqemenî yên rêxistinê bin, ev bûyerê mesûmane û mafdar nake. A rast, bi ya min ev nîqaş ji meseleya esas berê me dide devereke din. Min eleqedar nake kê ew der mayin kiriye. Ev, rastiya ku mayin zirarê dide min naguherîne. Mewzû û behs mafên mirovan in. Muxatabê min dewlet e û dewlet mecbûr e ewlehiya welatiyên xwe bistîne. Kê mayin li ku veşartiye a rast ez bi vê pirsê re ne eleqedar dibim ne jî meraq dikim. Heke li vî welatî pevçûn her li dar bin, zevî werin mayinkirin, ev nîşaneya wê yeke ye ku dewlet bi rê û rêbazên antîdemokratîk tê birêvebirin û dewlet nikare rê û rêbazan biafirîne da bi kêrî çareserkirina meseleyê bên. Ev meseleya dewletê ye û divê ew çareser bike.

Heke em têkevin nava nîqaşa "Ev mayina dewletê ye ev mayina rêxistinê ye," em ê aliyê heq ê meseleyê ji bîr bikin. Dewlet jî rêxistin jî divê mayinan

bi kar neyînin, bikaranîna mayinan sûc e. An nexwe em ê wê firsendê bidin destê yên berpirsiyarê van tiştan da ji berpirisiyariya xwe birevin. Derbarê mayinan de nikarin tespîteke wiha bikin lê derbarê bermayiyên pevçûnan de car caran tespîtên wisa kirine.

**Beşdar:** *Axir bandoreke wisa çêdibe, dibêje "min nekir, ez tê dikoşim," filan, da ku zexta li ser xwe kêm bike…*

Bi ya min nikare vê bike… Lewre dawiya dawîn Peymana Ottowayê îmze kiriye. Ka tu pêşî binbariyên xwe pêk bîne. Rêxistinê jî kiribe dîsa dewlet divê paqij bike. Em nizanin kê mayin veşartine û jixwe meseleya me jî ne ev e. Meseleya me çi ye? Meseleya me ew e ku zeviyên mayinkirî li kû ne? Çi zirarê dide sîvîlan û divê çawa rê li vê bê girtin? Ango bi kurtahî ev mesele dê çawa çareser bibe, li gor min.

**Beşdar:** *Ma ji vî aliyî ve jî ne girîng e, bi Peymana Ottowayê re dewlet ketine binbariyekê, bi vê peymanê dewlet tên venêrîn an jî qet nebe hewl didin li wan venêrin. Lê rêxistineke wek Bangewaziya Cenewreyê jî heye û ev rêxistin hewl dide ku rêxistinên çekdarî dûrî mayinan bisekinin. Ev jî nîşanî me dide ku aliyekî vî karî jî heye. Divê tiştin bên kirin da rêxistin jî dev ji van tiştan berdin. Bi deng difikirim: Di destê dewletê de muhtemel e ku nexşe hebin, te dît li kîjan bajarî, li kîjan gundî hene. Em giş dizanin qet nebe ji Serdema Osmaniyan û vir ve kevneşopiyeke baş a arşîvkirinê heye. Li vir jî muhtemel e ku hebe. Gelo di destê rêxistinê de, heke rêxistinê bi kar anîbin –bi qasî em dizanin bi kar anîne li Tirkiyeyê-, li ber destê rêxistinê jî gelo nexşeyeke wiha dê hebe? Ma dizanin li kû derê, li kîjan gundî li kû çi veşartine, gelo qeydên van digirin li cem xwe? Aliyekî meseleyê yê parêzvaniyê heye. Dawiya dawîn yê ku divê van paqij bike dewlet e. Lê ji aliyê din ve, pevçûn dewam dikin, rêxistinê peymanek îmze kiriye û heke li aliyekî din ve hê jî mayinan binerd bike… Hevîdar im wiha nake lê ez hinekî jî li senaryoya xirab difirikim. Em bibêjin rêxistinê peyman îmze kiriye lê ji aliyekî ve jî bi awayekî fiîlî hê jî mayinan vedişêre û qeyda van nagire. Erê derfetên dewletê filan hene. Dawiya dawîn rêxistineke îllegal e, em bibêjin li çiyê bi awayekî veşartî şer dike. Îhtîmal e ku nikare qeydên van bigire, arşîv bike filan. Dibe nikare koordînatan diyar bike û bibêje li gor filan nexşeyê, li filan nixteyê hene. Ser meseleyê li Dêrsimê tîmeke rêxistinê mayin binerd kir û li cem xwe qeyd nekir. Di fiîliyatê de ev tê vê wateyê; dewlet bixwaze jî nikare van paqij bike lewre jê ne haydar e. Em qala milyonek mayin dikin. Muhtemel e ku sedî nod-nod û pêncê wê, dewletê veşartine lê yên mayî? Wekî ku valahiyek dimîne, bi ya min. Yek, divê em derbarê vê de agahdar bin. Ku hebin, li kû ne? Haya rêxistinê jê heye an na em pê nizanin. Muhtemel e ku nizane.*

Di 2006an de gotibû heye. Piştî rexistinê li Cenewreyê peyman îmze kir, gotibû, "Nexşeyên me hene û heke dewleta Tirk nexşeya xwe ya mayinan aşkere bike em ê jî aşkere bikin." Got lê em nizanin hê jî mayin tên veşartin an na. Ji vî aliyî ve mixabin rewşek tune ye ku em muxatab bibînin lê helbet girîng e. Dema em dibêjin mayin ji hêla dewletê û ji hêla hêzên derveyî dewletê tên bikaranîn, esas em qesta vê dikin. Em dubare û sedbare dibêjin çekek e ku divê neyê bikaranîn lewre zirarê dide sîvîlan. Lê mixabin tê bikaranîn. Wê demê em pê hesiyan ku nexşeyeke wiha heye. Gotin em ê aşkere bikin. Lê Tirkiyeyê vê carê got, "We ev peyman bêyî haya me çêkiriye bi rêxistineke terorî re, hûn çawa peymanê çêdikin!" û got ez vê peymanê nas nakim.

**Beşdar:** *Nexasim di hiqûqa welatên wek Fransa, Almanyayê de tiştekî wisa heye, derbarê temînkirina zirarên terorê de. Bi awayekî balkêş dibêjin, "em wan wek berpirsiyar nabînin." Yekane dewleta ku vê wek berpirsiyariya rêxistinê dibîne Tirkiye ye. Lê di hiqûqa navdewletî ya Tirkiyeyê de, bandoreke vê ya pir biçûk heye û dewlet tezmînatên cuzî dide. Dema bê îspatkirin ku ev mayin yê dewletê ne, wê demê berpirsiyarî qat bi qat zêde dibe. Nexwe binbariya parastina mafê jiyanê yên welatiyan, parastina heq û mafên bingehîn ên welatiyan helbet li ser dewletê ye. Lê dema em rasterast dibêjin mayina aîdê dewletê, wê demê bandora wê qat bi qat zêdetir e. Çima ku nexasim ji hêla hiqûqî û parêzvaniya mafan ve bandora wê zêdetir dibe, loma min pirsî bê ka tê tespîtkirin mayin aîdê kê ye an na û dixwazim vê jî bipirsim, gelo rêyên tespîtkirina vê hene?*

Dema em hemû aliyên wê didin ber çavan, mayin meseleyeke wisa ye ku qadeke mezin digire. Lê çareseriya wê bi ya min ewqas ne zehmet e. Ji wan pirsgirêkan e ku dikare bê kontrolkirin. Mesela ez ê qala bergiriyeke pir hêsan bikim. Lewhayên hişyariyê...

Lewha pir erzan in. Lewhayên ku li ser "Herêma Mayinkirî", "Herêma Xeternak" dinivîse an jî lewhayên ku resimê qaqot li ser. Ew lewha ne ku ji hêla Kurdan ve pir zêde tên zanîn û tên nasîn. Li ser sînoran pêkan e ku em van bibînin. Ev nîşane ne ku ji me re dibêje sînor cihên xeternak û mayinkirî ne. Zeviyên nava sînoran ên mayinkirî û xeternak jî dikarin bên destnîşankirin û ji van lewheyan dikarin li wan deran jî deynin, bi vê rêyê qet nebe di asta yekem de dê bibe bergiriyeke hişyarker ku însan nekevin wan deran.

Wekî din çi dikare bê kirin û li Tirkiyeyê di vî warî de çi tê kirin? Nexasim di warê çêkirina nexşeyên cihên mayinkirî, nîşankirin û hişyarkirinê de qet tiştek nayê kirin. Tenê saziyên sîvîl bi derfetên xwe hewl didin bikin. Heke derbarê mayinên di nava sînoran de wek gava pêşî ev xebat bên kirin, dê rê li ber bê girtin ku ew cîsim zirarê bidin kesên sîvîl: Destnîşankirina zeviyên mayinkirî û derbarê vê de agahdarkirin û hişyarkirina kesên li wê herêmê

dijîn, danîna lewhayên hişyarker û dîsa perwerdekirin û agahdarkirna kesên li herêmê. Zarok bi piranî wan cîsimên ku dibînin dibin malê û pê dilîzin. Heke ew di malê de biteqe, bûyerên dilsojtir dê rû bidin. Ew madeya teqemenî ya di nava wan cîsiman de derdixin. Ji bo masîgiriyê –nexasim li aliyê Colemêrgê- ji girtina masiyan wek barûd bi kar tînin. Ji ber vê teqîn pêk tên. Ev bûyerên wiha pir qewimîn.

Li Tirkiyeyê bi xweşikî tu xebatek nehatiye kirin, derbarê wan xisaran de ku mayin û bermayiyên şer bûne sedem. Xebateke ku tê de encamên van bûyeran tên nirxandin û daneyek nehatiye amadekirin. Ev xebata amadekirina daneyan jî divê demildest bê kirin.

Me qala qanûnan kir. Peymana Ottowayê, Qanûna Mayinê hene. Navenda Xebatên li Ser Mayinan heye ku bi rêya Peymana Ottowayê hatiye damezirandin. Lê tu qanûnek ji bo mexdûrên mayinan tune ye û ev qanûn divê demildest bê çêkirin.

Û bi ser de derbarê mexdûrên mayinê de tu xebatên rehabîlîteyê tune ne ku mexdûr ji nû ve li civakê vegerin. Derbarê maf û pêdiviyên van kesan de jî pergalek tune ye ku xisûsî ji bo wan hatiye sazkirin. Digel bikaranîna mayinan li gor Peymana Ottowayê qedexe ye, li Tirkiyeyê qanûnek tune ye ku vê qedexe bike an jî ceza bide wan. Em di wê baweriyê de ne ku di qanûnê de, di qanûna ku bê derxistin, divê cezayê vê hebe. Qanûnên ku dê bên derxistin, tew yên ku a niha di meriyetê de ne jî, li gor Qanûna Mayinê û li gor Peymana Ottowayê divê ji nû ve werin sazkirin.

Tirkiye beriya her tiştî divê ji raya giştî re aşkere bike ka dê mayinên di depoyên xwe de kengî îmha bike. Divê nexşeya xwe ya mayinê û plansaziya xwe ya paqijkirina mayinan bi me re parve bike. Nexasim xelkê herêmê û zarok di vî warî de divê bên hişyarkirin û perwerdekirin.

Baş e, me di vî warî de çi kir? Ji 2008an û vir ve wek Duy-Derê, me derbarê mayin û bermayiyên pevçûnan de qada xwe ya xebatê diyar kir. Me hewl da ku di vî warî de polîtîkayên herêmî û neteweyî bên sazkirin ku meseleya mayin û bermayiyên pevçûnan ne meseleya ewlehiyê lê meseleya mafên mirovan e. Bi taybetî me giranî da ser xebatên li qadê. Lewre pêdivî bi xebata perwerdehiyeke hişyariyê hebû ku jê re dibêjin Perwerdehiya Rîska Mayinan û me di vî warî de projeyek amade kir.

Beriya wê me çawa dest bi vî karî kir? Beriya avakirina komeleyê me wek komeke înîsiyatîf, di nava sînorên Colemêrgê de û digel lêkolîneke li ser mayinan, em li bersiva van pirsan geriyan; “Li Tirkiyeyê ev pirsgirêk di çi astê de heye? Pêdiviya mexdûrên mayinan bi çi heye û çi zirar digihîje wan?” Em

bi 1058 kesî re rûniştin. Ev, ew kesên ku zirar ji mayinan dîtibûn û me li gor awayê qewimîna bûyerê, pirsgirêkên van însanan nirxandin û biryar da ku bi taybetî li deverên zeviyên mayinkirî hene em perwerdehiyeke li ser rîskên mayinê bidin. Ji 2008an û vir ve em perwerdehiya hişyarker didin zarokên di navbera salên heft-çardeh salî de.

Em vê xebatê çawa bi rê ve dibin? Bi taybetî em di ser dibistanên dewletê re diçin. Du sedemên me hene ku em dibistanên dewletê tercîh dikin. Yek jê em pê dizanin ku muxatabê me dewlet e. Ya duduyan, zarok herî zêde li dibistanên dewletê hene. Sedema dîtir, ji bo em bikarin li dibistanên dewletê vê xebatê bikin, divê em destûrê ji saziyên fermî bixwazin. Lewre mixabin kes ne xwediyê wê azadiyê ye ku hema çawalêhato biçe dibistanekê û bibêje, “Ez hatim li vir filan xebatê bikim.” Em bi waliyan re, bi qeymeqaman re, bi gerînendeyên perwerdehiyê re, bi rêvebirên dibistanan re hev dibînin û ev hevdîtin ji bo me pir bi qîmet in. Lewre dema em wan hevdîtinan pêk tînin, mîna ku em li vir bi we re li ser nîqaş dikin, em bi wan re jî vê meseleyê nîqaş dikin. Ji aliyekî ev dibe xebateke hişyarkirin û agahdarkirinê jî. Piştî em destûrê distînin, em gund bi gund li hemû dibistanan digerin. Li gundên biçûk an jî li mezreyan, dibistanin hene ku deh zarok lê perwerde dibin, em diçin wan dibistanan jî û zarokan agahdar dikin. Materyalên me yên dîtbarî hene, em fîlman nîşan didin û bi posteran dikevin polan, hemû dibistanan, qehwexaneyên gundan, posteran li wan deran bi dar de dikin da ku wan peyamên hişyarker hîn bikin.

Bi navê *Hızır Dede [Bavkalikê Xizir]* kovareke me heye. Di kovarê de karîkatur hene. Lê teqemenî û mayin wekî xwe yê rastîn in di wan karîkatûran de da ku wan baş nas bikin. Jixwe pirsgirêka herî mezin ew e ku zarok van cîsiman nas nakin, pêlîstok dihesibînin. Heke em wan teqemaniyan jî wisa bi awayekî xweşik, şîrîn çêbikin dibe zarok dîsa wan pêlîstok bihesibînin, bi metirsiya ku pêlîstok bihesibînin û rakin pê bilîzin em resimê rastîn ên mayinan bi kar tînin. Bi slogan û agahiyên hişyarker em dikin ku zarok bi ber bayê meraqa xwe ya mesûmane nekevin.

Em çi dikin, mesela li kîjan herêmê mayin hene? Kengî divê hûn nêzîkî wan deran nebin? Em bi materyalên dîtbarî yên hişyarker hewl didin ku van tiştan bi zarokan bidin famkirin; divê hûn dûrî cihên bitûmik, cihên hatî kolan an jî cihên ku baratayên heywanan lê hene bisekinin. Heke hûn wenda bûbin, rêçên lingên xwe bişopînin û di wê rêyê re ku hûn tê re hatine, bi şûn ve vegerin. Dema we cîsimekî xerîb li erdê dît, teqez divê hûn nêzîkê nebin, destê xwe pê nekin, keviran neavêjinê û bi êgir nêzîkî wê nebin.

Dema em vê perwerdehiyê didin, em hewl didin ku mamoste jî tev li vê perwerdehiyê bibin. Lewre mamoste tim digel zarokan in û demeke dirêj

wî karê mamostetiyê dikin. Mamoste jî derbarê mijarê de agahdar dibin û dema diçin li herêmên xeternak mamostetiyê dikin, êdî pê dizanin meseleya mayinê meseleyeke çawa ye û pê dizanin di van rewşan de dê çawa tevbigerin, çi bibêjin û çi bikin û çi nekin. Ji ber vê, ji bo me pir bi qîmet e tevlêbûna mamosteyan.

Piştî her xebatê rapor hene em diweşînin. Daneyên me û tesbîtên me hene. Car caran hin lêkolîn hene em dikin. Ser meseleyê di sala 2012an de me li Cizîrê lêkolînek kir. Ji 2008an û vir ve em dixebitin. Ji bo ku em li xwe hay bibin û ji bo ku fam bikin bê ka xebatên me bi kêrî tiştekî tên an na û ji bo em pêşiya xwe bibînin em lê dinêrin ka pêşketinek, guherînek, hişmendiyek heye an na, em car caran, serê çar-pênc salan carekê li ser xebatên me kirî an jî li ser xebatên xwe yên pêşerojê em lêkolînan dikin.

Di sala 2012an de derbarê Cizîrê de lêkolîneke me ya wisa hebû.

**Tablo 5:** Dîrokên ku bûyerên mayinteqînê rû dane.

| Sal | Hejmara Bûyeran | (%) | Sal | Hejmara Bûyeran | (%) |
|---|---|---|---|---|---|
| - | 4 | 0,8 | 1998 | 7 | 1,4 |
| 1976 | 1 | 0,2 | 1999 | 12 | 2,5 |
| 1982 | 2 | 0,4 | 2000 | 16 | 3,3 |
| 1985 | 2 | 0,4 | 2001 | 3 | 0,6 |
| 1987 | 2 | 0,4 | 2002 | 7 | 1,4 |
| 1988 | 8 | 1,7 | 2003 | 3 | 0,6 |
| 1989 | 68 | 14,1 | 2004 | 8 | 1,7 |
| 1990 | 31 | 6,4 | 2005 | 2 | 0,4 |
| 1991 | 19 | 3,9 | 2006 | 5 | 1 |
| 1992 | 35 | 7,2 | 2007 | 6 | 1,2 |
| 1993 | 67 | 13,9 | 2008 | 6 | 1,2 |
| 1994 | 45 | 9,3 | 2009 | 20 | 4,1 |
| 1995 | 13 | 2,7 | 2010 | 21 | 4,3 |
| 1996 | 14 | 2,9 | 2011 | 18 | 3,7 |
| 1997 | 15 | 3,1 | 2012 | 23 | 4,8 |
| **Yekûn** | | | | **483** | **100** |

Li vir dema em li dîrokên mayinteqînê dinêrin, em dibînin ku piştî salên

1990î teqîn zêde bûne; di salên 2000î de kêm bûne û piştî 2009an dîsa zêde bûne. Nexwe dema şer û pevçûn zêde dibin, teqîna mayinan jî zêde dibe.

Mesela dema em li cihên mayinteqînê dinêrin... "Çolterên Gund" ango derdora gundan... ne pir dûrî gundan e, der û dora gundan. Li nava gund, li kêleka qereqola gund rû dane, herî zêde li kêleka qereqola gund rû dane 122 heb. Ev jî vê dipeyitîne; Meseleya der û dora qereqolan a ku gava din me qal kir.

**Tablo 6:** Cihên mayin lê teqîne.

| Mekân | Hejmara Bûyeran | Ji Sedî (%) |
|---|---|---|
| Çolterên Gund | 224 | 46,4 |
| Navenda Gund | 76 | 15,7 |
| Navenda Cizîrê | 27 | 5,6 |
| Çoltera Cizîrê | 14 | 2,9 |
| Li Kêleka Qereqola Gund | 122 | 25,3 |
| Yên Din | 1 | 0,2 |
| Yekûna Van | 464 | 96,1 |
| Yên Nayên Zanîn | 19 | 3,9 |
| **Yekûna Hemûyan** | **483** | **100** |

**Tablo 7:** Di teqîna mayinan de awayê rûdana bûyerê.

| Awayê Rûdana Bûyerê | Hejmara Bûyeran | Ji Sedî (%) |
|---|---|---|
| Dema Erdajotinê | 19 | 3,9 |
| Li Çûna Dibistanê | 5 | 1,0 |
| Li Çûna Operasyonê | 45 | 9,3 |
| Dema Komkirina Êzingan | 51 | 10,6 |
| Dema Çêrandina Heywanan | 106 | 21,9 |
| Dema Kolanê | 9 | 1,9 |
| Dema Gerûgeştê | 142 | 29,4 |
| Dema Lîstikê | 44 | 9,1 |
| Dema Seyranê | 3 | ,6 |
| Dema Danheva Pincêr | 12 | 2,5 |

| | | |
|---|---|---|
| Li Malê | 40 | 8,3 |
| Yekûna Van | 476 | 98,6 |
| Yên Nayên Zanîn | 7 | 1,4 |
| **Yekûna Hemûyan** | **483** | **100** |

Dema em li awayê rûdana bûyerê dinêrin –jixwe aliyê herî dilsoj ev e- em dibînin ku dema însan li ser kar û xebatên xwe yên rojane ne, rastî mayinekê hatine û jiyana wan serobinî bûye. Dema erdê xwe ajotiye lê rast hatiye ser meseleyê. Di vir de, gelo çûne zeviya mêrik mayin kirine? Ne bawer im, hebe nebe yek ji wan mayinan e ku piştî liv û lebata axê, hatiye ketiye nav zeviya mêrik. Zarok li ser rêya dibistanê lê rast hatine. "Li Çûna Oprasyonê" jî bi cerdevanan re eleqedar e, dema berhevkirina êzingan, dema çêrandina heywanan mesela hejmareke pir zêde ye. Li mêrgên derveyî gundan pêk tê, dema kolanê û dema seyranê jî ev bûyer rû dide. Yên rêjeya wan herî zêde ev in. Ev jî pirsgirêkeke pir muhîm e, dema çil û çar kes ji xwe re dilîzin, rastî mayin û bermayiyên pevçûnan hatine. Dema em van tesbîtan dikin, em qîmetê didin pêşniyazên wan jî, çima ku rasterast ew kes in ku bûyer li wan qewimiye. Dema em jê dipirsin ka "Çi dikare bê kirin?" hemû jî di serî de dixwazin herêm ji mayin û bermayiyên pevçûnan bên paqijkirin û însan bên agahdarkirin û hişyarkirin.

**Beşdar:** *Gelo xebatek li ser nexşeçêkeriya van deran hatiye kirin, çi ji hêla we ve çi ji hêla SCSyeke din ve? Li ber destê we gelek bûyer hene. Em hejmara wan dizanin lê meriv nexşeya wan çêbikira, yeko yeko, gund bi gund...*

Komeleya Mafên Mirovan di serê sala 2000î de dest bi xebateke bi vî rengî kir. Dema em li Colemêrgê dixebitîn me jî nexşeyeke wiha çêkir ji bo Colemêrgê lê ji xeynî van divê xebateke berfireh ji bo her derê bê kirin. Yeko yeko bûyer bên tesbîtkirin, li kû derê çi qewimiye di ser vê re divê bê kirin.

**Beşdar:** *Ji aliyê bûyeran ve gelo bankeyeke bûyeran heye li ber destê me?*

Bankeyeke giştî ya daneyan li ber destê me tune ye. Ser meseleyê derbarê Cizîrê de tabloyeke wiha a daneyan heye li ber destê me. Yek jî derbarê Colemêrgê de, dema 2006an em çûn, me bankeyeke wiha çêkir. Di van mijaran de me peywira xwe hinekî bi cih neanî. Lewre me giranî pir da ser qadê. Xebatên qadê bi rastî xebatên pir kûr in, jê re pir wext divê. Em li Çelê, li Silopiyê, Nisêbînê, Mêrdînê û li Dêrsimê xebitîn û dema em diketin qadekê, em bi kêmanî salekê li wir diman. Ev jî pir dem dixwaze û hinek jî budçe divê. Di warê xebata qadê de heqeten jî em pir bi tecrûbe ne lê di vî warî de dikarim bibêjim kêmanî ya me ye.

**Beşdar:** *Navenda Bîrê derbarê wendahiyan de nexşeyek amade kir. Pir kedê dixwaze. Yeko yeko daneyên bûyeran girtin û bi wan nexşeyek çêkirin. Dibe em vê wek projeyekê bidin pêşiya xwe lê ya rast divê hemû arşîv werin xwendin. Baş e, dema hûn diçin dibistanan, hûn destûrê ji Gerînendeya Saziya Perwerdehiyê distînin? Helwestên wan çawa ne? Rê li ber we vedikirin an dibin asteng?*

Belê em destûrê distînin. Heke rayedar kesên ji herêmê bin, Kurd bin, hema fam dikin. Lê ku ji rojavayê Tirkiyeyê hatibin, şaş û faf dimînin. Ser meseleyê carekê li Şirnexê ez çûm cem gerînendeyê perwerdehiyê. Ji Adapazariyê bû ez ne şaş bim. Bi şaş û metel li min guhdar kiribû û gotibû, "Li Şirnexê pirsgirêkeke wisa heye qey? Ma tiştekî wisa çêdibe, cana min!" Min jê re got em bi hev re dakevin kolanan, ka em çend gule û teqemaniyan dibînin. Çawa, nabe! Tew beriya çend hefteyan bûyerek qewimî, min got, "Zarokek birîndar bûbû, we ev jî nebihîst?" Bi mînakên mîna van em hewl didin wan qanih bikin ku xebata me xebateke mirovane ye. Di rewşên wiha de qahihkirin hinekî dûvdirêj dibe. Lê heke ji wê herêmê be, teqez di nava bîranînên wî de çîrokên wisa hene û ev mesele ji wan re nas tê. Li hin deveran carinan astengî derdikevin, wê demê em mecbûr dimînin ku çend caran herin wê derê ji bo qanihkirinê. Li hin cihan em tavilê destûrê distînin lê li hin deran na. Ev li gor nêzîkatiya însanan û li gor fikra rêvebiran a polîtîk diguhere. Heta îro, bi qasî ji destê me hatiye, me ew destûr standiye û xebatên xwe kirine.

**Beşdar:** *Esas van xebatên ku hûn pê radibin divê dewletê bikirina. Xebata li qadê, perwerdehiyên li dibistanan filan... divê ev wek ders di mufredatê de cih bigirin, xebata agahdarkirin û hişyarkirinê; ev tev dikeve ser milê dewletê, milê saziya perwerdehiyê an jî saziyên din. Ji vî aliyî ve rewşeke sosret e. Di ser de xebatên ku hûn dikin ji nedîtinî ve tên, destûrê nadin filan. Ev jî aliyekî din ê vî karî ye. Çima ku dewlet vê nake, helbet divê hinekên din bikin. Hesbelqeder, em dikarin xwe bigîhinin hemûyan an jî nikarin. Dawiya dawîn we li gelek deveran ev xebat meşandiye. Baş e, ji bo ku dewlet jî di vî warî de bixebite, divê çi bê kirin? Lêkolîna ku we li Colemêrgê kiriye û rapora we ya Cizîrê heye. Digel van, perwerdehî hene ku we dane. Li gor ku we qal kir, raporên van perwerdehiyan jî hene, çi bi zarokan re çi bi mamosteyan re û çi bi mezinan re... Belkî divê meriv parêzvaniya van bike, rayedarên dewletê bibîne û ji wan re qala van tiştan bê kirin ka dewlet dikare çi bike di vê mijarê de, kêmasî dê bi wan re bên parvekirin, nîqaş dê bên kirin. Hewldaneke we ya wisa çêbû qet?*

Pêkanîna vê helbet mimkun e. Lê gelo li Tirkiyeyê mimkun e, divê meriv hinekî zorê bidê. Me di 2006an de rapora Colemêrgê amade kir û di 2007an de me projeya rehabîlîtasyonekê pêk anî. Ev qanûna ewlehiya civakî hê derneketibû. Wê demê Qerta Kesk hebû û kesên qerta wan a kesk heyî nedikarîn ji

xizmetên nexweşxaneyê sûd wergirin. Ji %98ê mexdûrên mayinê qerta wan a kesk hebû. Protezên xwe sê salan carekê diguherîn. Em qala tiştekî plastîk dikin. Ev însan li gundan dijîn, li nav erdan dixebitin. Lingê xwe wenda kiriye lê mecbûr e ku jiyana xwe ya rojane bidomîne. Di demeke kurt de protezên wan zirar didît û wan bi derfetên xwe, paç, naylon an jî bant pê ve dikirin û heta sê salên wan biqediyana, wiha îdare dikirin. Piştî rapora Colemêrgê pêdiviyeke wiha derketibû û em li ser fikirîn bê ka em dikarin çi bikin di mijara van protezan de. Li Zanîngeha Dîcleyê, Navenda Protez û Orotezê heye. Em bi wan re axivîn û me bi devkî li hev kir ku em tedawiya nêzî sed heb mexdûrên mayinan li wê derê bikin. Û me kir ku protezên nêzî sed heb mexdûrên mayinan bên guherandin.

Me pirtûkek amade kir ku ji çîrokên wan kesan pêk tê. Mesela me deh panzdeh heb pirtûk ji Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsa Tirkiyeyê re şandin. Me da parlamenterên ku em dizanin an jî yên me xwe gihandî. Me tiştên wisa kirin lê ew tiştê ku hûn jê re dibêjin parêzvanî ji bilî rayederên herêmî, em bi kesekî re neketin têkiliyê. Ji ber tenê dildarî û daxwaza me têrê nake. Divê yên li hember jidil û daxwazkar bin lê helbet pêkanîna van jî mimkun û girîng e.

**Beşdar:** *Dema hûn li Colemêrgê li qadê dixebitîn, berteka zarokan çawa bû? Yek jî, ez vê meraq dikim. Derbarê sazkirina hişmendiyeke wisa de ku ne bi çavê meseleya ewlehiyê lê bi çavê mafê mirovan lê binêre... Belkî we kiribe lê li bajarên rojavayê Tirkiyeyê jî bi ya min rêvebirina van xebatan bi qîmet e. Em dikarin bibêjin çima haya yekî Îzmîrî jê tune. Nebûye, çênebûye, lê rast nehatiye, pêşdarazî... em dikarin hezar hincetî bihejmêrin. Ez ji Qibrisê hatim ser meseleyê. Li vir qet şaş namînin ji bo hin tiştan. Ev jî muhîm e bi ya min. Nizanim hûn çi difikirin?*

Helbet tiştekî hêja ye ku meriv xwe bigihîne her kesî, her derê, ji bo rêvebirina xebatên agahdarkirin û hişyarkirinê. Loma ez pir guh didim vê xebatê. Em bi hevalên ji qadên cihê û ji rewşên cihê tên cem hev û meseleya mayinê nîqaş dikin, em pê dihesin meseleya mayinan bi gelek meseleyên din re di nava hev de ye û em bi hev re didin û distînin.

Heke em bên ser mijara bertekên zarokan; dema me dest bi vê xebatê kir, me serê xwe pir bi aliyê wê yê pedagojîk, psîkolojîk re êşand. Me yê ji zarokan re qala mirinê qala mayinan bikira... Em pir li ser fikirîn bê ka em ê çawa ji wan re vebêjin û pir li ser vê xebatê sekînin. Lê hebûna mayinan jî wek realîteyekê li pêşberî me bû. Em bi metirsî bûn dema me dest pê kir ji ber sedema "Dê berteka zarokan çawa be?" Ji ber vê yekê dema me dest bi xebatê kir, ji rêbazên hûrgilî bêhtir, ji wan rêbazên ku dê trawmayên din ên zarok bîne bîrê bêhtir, me hewl da ku perwerdehiyên hişyarker û danasînî bin.

Zarok qet şaş namînin, nabêjin, "Waa, ma tiştekî wisa jî hebû?" Lewre zarok bi van dizanin. Tew ew jî bi me re dest bi axaftinê dikin. "Wisa hat serê birayê min jî, wiha hat serê cîranê me jî," filan. Dema me digot baş e, nexwe hûn çima pê dilîzin, wê demê meraqa wan a zarokane û mesûm dest pê dikir. Tiştekî wisa ye ku divê meriv tim zarokan hişyar bike û bi wan bide nasîn. Ev çekên ewqas binefiskî û bi xetere ne! Mesela mayinek heye. Rengê wê kesk û birqoyî ye, di dirûvê teyareyê de ye, jixwe wê dikin bin erdê û difirînin. Te dît em jî wê bibînin em ê bibêjin qey pêlîstok e. Mayinên di dirûvê konserweyan de hene. Dibêje qey tê de xwarin heye û vedike. Sêwirandina wan a wiha cur bi cur jî nîşan dide bê ka mayin çawa ji wan çekan e ku bi awayekî bêrehm û dermirovî hatine çêkirin.

BEŞA ŞEŞEM

# ŞOPANDIN Û HESABDAYÎN: AZMÛNA KOMELEYA MAFÊN MIROVAN

*Öztürk Türkdoğan*

Komeleya Mafên Mirovan (IHD) çi dike? Ez ê behsa IHDyê bikim bê ka di pêvajoya çareseriya pevçûnan de çi kiriye. Lê pêşî ez dixwazim bi giştî qala komeleya me bikim ka çi dike. Di van demên dawî de, ji ber reşkirina taybet a çapemeniyê, çalakiyên me zêde xuya nabin. Bi piranî em di demên reform û çareseriya pevçûnan de xuya dikin. Ji ber ku di demên din de, em rasterast hesabê wan mafan digirin ku ji hêla dewletê ve hatine binpêkirin û rapor dikin, çima ku ev jî ne bi dilê wan e, em di çapemeniyê de pir xuya nakin. Ji loma ji “Rêxistineke mafên mirovan a klasîk çi dike?” wêdetir, wek IHD em çi dikin, ez ê ji we re qala vê bikim.

Em her sal raporên binpêkirina mafan amade dikin û diweşînin, tevî bîlançoyên wan. Em vê ji sala 1994an û vir ve bi rêk û pêk dikin. IHD, di 1986an de hate damezirandin lê ji 1994an vir ve raporên salane yên binpêkirinên mafan ên li Tirkiyeyê bi rêk û pêk diweşîne. Yekîneya dokumantasyonê ya Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TIHV) ku ji hêla IHDyê ve hatiye damezirandin, ji sala 1991an vir ve, bi taybetî derbarê îşkence, kiryarên xerab û mafê jiyanê de raporan amade dike û bi raya giştî re parve kir. Rapor û bîlançoyên salane jî pir girîng in. Lewre dema em van amade dikin, li gel van em raporên taybet jî amade dikin.

Raporên binpêkirinê yên salane, herî dawî di sala 2018an de nêzî 850 rûpelan bû. Her jimareke di wê raporê de, xwedî bîlançoyek û paragrafekê ye. Dema ev tên weşandin, ji Wezareta Karûbarên Hundir û Wezareta Dadê re tê şandin û daxwaza ‘derbarê binpêkirinan de çi hewce ye bila bê kirin’ tê kirin. Lê di vê mijarê de heta îro kesek li me venegeriye û negotiye, “Me ev, ji ber filan tiştî kir.” Ez dikarim vê bi dilekî safî bibêjim. Her sal dema bîlanço aşkere dibin, em civîneke nirxandinê li dar dixin û bi raporeke nivîskî rewşa demokrasî û mafên mirovan a li Tirkiyeyê dinirxînin. Ser meseleyê îsal me di 19ê Gulanê de, bi kurtenivîsekê sala 2018an nirxand. Ev jî nêzî bîst, bîst û yek rûpelan e. Jixwe nirxandin jî pir dirêj diajon. Ji ber ku rapor pir dirêj in, li Îngilîzî nayên wergerandin lê nivîsên me yên nirxandinê û bîlançoyên me li Îngilîzî tên wergerandin û ji sazî û dezgehên wek YN, KE, saziyên YEyê, mîsyona dîplomatîk, çapemeniya navneteweyî, saziyên sîvîl ên mafên mirovan

ên navneteweyî yên em pê re têkildar re bi awayekî tê şandin. Ji çapemeniyê re jî tê şandin. Malpera me ya înternetê di heman demê de weke arşîvê ye. Hûn dikarin di malpera IHDyê de bigihîjin gelek agahî û belgeyan. Malpera me ya Îngilîzî jî her wisa ye. Lê pir zêde êrîş tên ser malperên me. Da ku em malperê li ser pêyan bihêlin em sereqat tevdiran digirin. (Lê *hacker* pir jêhatî ne û bi awayekî van tevdîran têk dibin.)

Em raporên taybet amade dikin. Ev raporên taybet dema bûyerên civakî rû didin tên amadekirin. Ez dikarim hin mînakan bidim: Mîna raporên taybet ku me piştî xwepêşandanên Newroz, Gezî û Kobaniyê amade kirin. Ewqas pir in ku... Mesela piştî pevçûnên çekdarî ku dibin sedema binpêkirinên giran, wek binpêkirinên dema qedexeyên derketina derve. Mijarên pir spesîfîk hene. Ser meseleyê, meseleya goristanan heye. Bi taybetî meseleya goristanên ku mîlîtan lê tên binaxkirin. Mijarên li ser der û dorê hene. Herî dawî hevalên me çûn Çiyayên Kazê. Carinan pirsgirêka qirêjiyê ya bajarekî dibe mijara raporê. Ev dibe karkerên demsalî jî bin. Teşebusên lînckirinê yên li dijî penaber û koçberan, dîsa teşebusên lînckirinê yên li dijî Kurdan, Elewiyan û Mitirban, meseleyên ku herî pir em serê xwe pê re dêşînin ev in û teqez bi awayekî em li ser van bûyeran raporên taybet digirin. Wek hûn dizanin, duh li Edeneyê bûyerekê rû da. Hin komikan qesta lînckirina penaberên Sûriyeyê kirin. Şaxa me ya Edeneyê îro li ser vê mijarê raporeke taybet aşkere dike.

Taybetmendiya raporên taybet ev e: Li gorî mijara xwe, teqez em wan dişînin wezareta eleqedar, di vê mijarê de tedbîrên ku em dixwazin bên girtin, em di beşa encamê de dinivîsin. Heke lêpirsîneke jidil hewce be, em dozgeriyên eleqedar agahdar dikin. Heke bûyer hin saziyên din ên giştî eleqedar bike, em wan jî agahdar dikin. Bi awayekî ji awayan em raya giştî jî derbarê mijarê de agahdar dikin ku ev girîng e. Ser meseleyê di ser raporên me re ku me derbarê qedexeyên derketina derve de amade kiribûn, me giliya memûrên dewletê kiribû. Di beşa duyem de ez ê qalê bikim. Me giliya peywirdarên giştî kiribû ku li wir dibin sedema binpêkirinan. Lê wan -Serokatiya Serperiştiya Giştî ya Leşkerî– lêpirsîn li me da vekirin.

Di serdema 2013-2015an de, dema Proseya Aştî û Çareseriyê, me raporên Komîsyona Şopandina Proseyê û Şopandina Vekişînê amade kirin. Ji bo amadekariya proseya aştiyê me Komxebata Mafên Gelan a IHDyê li dar xist û rapor amade kirin. Me ev rapor jî bi raya giştî û bi kesên eleqedar re parve kir. Wek serokê giştî yê IHDyê, min di nav Heyeta Mirovên Aqilmend de cih girt. Hîn jî bi vî navî hin xebatan wek fiîlî bi rê ve dibim.

Em raporên alternatîf amade dikin. Hûn dizanin Tirkiye hem endamê YNyê hem jî endamê Konseya Ewropayê ye. Hin peymanên bingehîn ên YNyê hene û di pêvekên wan peymanan de hin komîte hene. Raporên sîbankî yên alte-

natîf hene ku me ji Komîteyan re amade kirine. Carinan em bi tena serê xwe van amade dikin, carinan bi saziyên din ên mafên mirovan re amade dikin. YN, hemû welatan di qada mafên mirovan de bi periyodên diyar dişopîne. Rapor hene ku me ji vê şopandina periyodîk re pêşkêş kirine. Ew jî mijareke pisporiyê ya cuda ye. Bi kurtasî wiha bibêjim: Mesela me bi tena xwe îsal raporên Meseleya Kurdan û meseleya aştiyê, binpêkirinên mafan ên li girtîgehan û binpêkirinên li dijî parêzvanên mafên mirovan amade kirin. Em di mijara mafên zarokan de bi rêxistinên zarokan re, di mijara mafên jinan de bi rêxistinên jinan re, di qada mafên mirovan ên giştî de bi wan rêxistinan re xebitîn ku platforma hevpar pêk tînin.

Yek jî Federasyona Mafên Mirovan a Navneteweyî heye ku em endamê wê ne. Em bi YNyê re akredîte ne, her wiha bi Konseya Ewropayê re jî. Tora Mafên Mirovan a Behra Spî ya Ewropayê heye. Em carinan jî bi wan re amade dikin. Em raporan pêşkêşî van deran dikin.

Ev rapor çawa tên pêşkêşkirin? Em rewşa mafên mirovan a li Tirkiyeyê vedikolin û rapor dikin. Piştî re em rapora dewleta Tirkiyeyê vedikolin. Li hember wê rapora dewletê, nêrînên xwe yên dijber diyar dikin. Pirsên em dixwazin ji Tirkiyeyê bên pirsîn em dipirsin û bi vî awayî bi dezgehên YN û KEyê re xebatên me yên bigehîn ên pêşkêşkirina raporan berdewam dikin.

Rapor hene ku em pêşkêşî Konseya Ewropayê û Komîseriya Mafên Mirovan a YNyê dikin. Ev, pêvajoyeke pêşkêşkirina raporan a pir birêkûpêk e. Em her tim bi Komîseriya Mafên Mirovan a Konseya Ewropayê re di nava têkiliyê de ne. Em her tim bi Komîseriya Mafên Mirovan a YNyê a Cenewreyê re di nava têkiliyê de ne. Ango raporên giştî, raporên rojane, raporên taybet, bîlançoyên ku em amade dikin, her tim em werdigerînin Îngilîzî û dişînin van deran. Li van deran jî carinan mirovên ji Tirkiyeyê çûne dikarin bixebitin. Li gorî mijarê, kesên ku Tirkî dizanin dişixulînin. Wê demê hûn dikarin Tirkî jî bişînin.

Dibe li mehkemeyên Tirkiyeyê tu qîmeta van raporan tune be. Lê di qada navneteweyî de, dema derbarê Tirkiyeyê de nirxandin bên kirin, dema raporên Tirkiyeyê bên nirxandin, raporên me referans tên girtin û ev rapor pir bi kêr tên. Teqez piştî wan civînên komîteyan, divê çi bên kirin, kêmasî û qisûriyên Tirkiyeyê bi bîra wan dixin. Ji vî aliyî ve ez dixwazim bibêjim ev rapor pir girîng in.

Raportorên taybet ên YNyê hene. Ne şaş bim, pêncî û yek raportorên Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan hene. Bawer im ev hejmar bû pêncî û du û her diçe zêde dibe. Li wir jî, li gorî mijarê bi raportorên taybet re em her tim di nava têkiliyê de ne. Mekanîzmayên cuda jî hene lê hema hema giş dişibin hev.

Têkiliyên ku me bi van sazî û mekanîzmayan re daniye, agahî û belgeyên ku em pêşkêşî wan dikin, xwedî girîngiyeke taybet in di warê nirxandina Tirkiyeyê ya ji hêla van aktor û mekanîzmayan ve.

Derbarê têkiliyên me yên bi YEyê re ez dikarim vê bibêjim: Hem bi Delegasyona Enqereyê ya YEyê re, hem jî bi komîsyona li Brukselê re hevdîtinên me yên birêkûpêk hene. Hemû raporên me diçin ber destên wan jî. Loma, dema ew derbarê Tirkiyeyê de raporên xwe yên salane û raporên xwe yên pêşketinê aşkere dikin, li ser mijarên me diyar kirî disekinin.

Raporên me yên ku em fikir û nêrînên xwe radigihînin hene. Di serî de welatên ku di polîtîkaya xwe ya derveyîn de cih dane mafên mirovan û bi taybetî jî welatên ku pir penaber û koçberan qebûl dikin. Daîreyên têkildar ên van welatan hene. Em nêrînên xwe radigihînin wan. Li Tirkiyeyê rewşa mafên mirovan çawa ye? Lewre bi taybetî piştî teşebusa derbeyê, bi tetbîqkirina rewşa awarte gelek mirov bi daxwaza îlticayê neçar man biçin welatên Ewropayê û welatên din. Loma rewşa Tirkiyeyê ji me dipirsin, em jî bi raporan fikir û nêrînên xwe radigihînin wan û teqez ew van raporan referans digirin.

Em nêrînên xwe ji welatan re jî dişînin ku raporên mafên mirovan amade dikin. Ev DYA, Almanya, Fransa, Brîtanya û hin welatên Îskandînav in. Li dinyayê herî zêde Amerîka deng dida, lê bi Trump re hêza bandora wan ket. Êdî mîna berê ji bo ku bi xwe jî qîmet nadin wan raporan, bê bandor e lê wê didomînin, ez dikarim bi rihetî vê bibêjim.

Em nêrînên xwe ji dezgehên fermî yên mîna wezaret û TBMMyê re jî dişînin. Em carinan van ji ber xwe ve pêşkêş dikin. Di hin mijarên diyar de em dibêjin, “Me ev rapor çêkir, em dixwazin mewzûat wiha biguhere, raya giştî vê meseleyê nîqaş dike, nêrîna me ev e, rapora me ev e.” Her tim bi hevdîtinên rûbirû em raporên xwe pêşkêş dikin. Hin caran jî ew me vedixwînin. Mesela planeke çalakiyê ya mafên mirovan a nû bê amadekirin, em tev li civînan dibin û raporên xwe pêşkêş dikin. Hûn dizanin komîsyona pisporiyê ya TBMMyê heye. Bi taybetî Komîsyona Edaletê û Komîsyona Karên Hundirîn, di mijarên mafên mirovan de, bêhtir jî di pêvajoya YNyê de, ku YN jî tev li mijaran dibe, me vedixwînin. Ser meseleyê di pêvajoya çareseriya şer de, di 2014an de, qanûna ku me jê re digot “qanûna pêvajoyê” lê bi navê “Qanûna Yekparebûna Civakê û Bidawîkirina Terorê” hatibû binavkirin, wê demê di Komîsyona Karên Hundirîn de dihat nîqaşkirin, em wek nûnerên IHD, TIHV û MAZLUMDERê çûbûn. Avabûna Saziya Wekhevî û Mafên Mirovan a Tirkiyeyê, muzakereya Qanûna Çavdêriya Polîsî û weke van gelek qanûn hebûn. Weke di amadekirina Qanûna Parastina Daneyan de, di gelek mijaran de em dikarin biçin û nêrînên xwe bidin. Di vê merheleyê de tenê

bi Wezareta Dadê re diyaloga me berdewam dike. Ji ber ku Wezareta Karên Hundirîn polîtîkayên ewlehiyê yên hişk bi rê ve dibe. Rêziknameya TBMMyê ya navxweyî hat guhertin û mîna berê me venaxwînin.

Carinan jî em, ji Dadgeha Mafên Mirovan û Dadgeha Qanûna Bilind re wek nêrîna aliyê sêyem raporan pêşkêş dikin. Ev girîng e. Hûn dizanin li Tirkiyeyê qanûnên usûlê hatin guhertin. Heke di nav we de hiqûqnas hebin dizanin, ji bo ku usûla cezayê guherî, di CMKya nû de êdî mirov dikare raporên pisporan pêşkêş bike. Heke li dadgehên bilind mijarek hebe ku mafên mirovan eleqedar bike û we jî di vê mijarê de xebat kiribin, heke ev mijar bikeve nav qada xebata we, hûn dikarin wek aliyê sêyem nêrîna xwe pêşkêş bikin. Carinan vê li xwe digirin û qebûl dikin. Carinan nagirin. Lê li xwe negirin jî, hûn bawer bikin, ew raporên ku hûn dişînin teqez dixwînin. Ev pir girîng e.

Herî dawî di pêvajoya qedexeya derketine derve de, li ser binpêkirinên giran ên mafên jiyanê, bi tevahî sî û çar serîlêdan li DEMM hatine kirin. Ji van sî û sê serîlêdanan, bîst û şeş serîlêdan derbarê binpêkirinên mafên jiyanê de ne. Me wek IHD, TIHV û Navenda Hafizeyê, nêrîna ya pisporî pêşkêşî wan dosyeyan kir. Ew dosye ji usûlê hatin redkirin. Niha em pêvajoya Dadgeha Qanûna Bingehîn (DQB) didomînin.

Em dixwazin DEMM û Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan a Ewropayê jî mudaxilî nêrînên me amadekirî bibin. Di hin dozan de Komîseriya Bilind serîlêdana me qebûl dike û mudaxil dibe. Mudaxilî dozên derbarê qedexeya derketina derve de bû. Herî dawî Komîseriya Bilind a Mafên Mirovan mudaxilî dosyeya Selahattin Demirtaş bû. Wekî din, hin dosye jî hene ku hîn li ser hevdîtin nehatine kirin, em dikin wan mudaxilî van dosyeyan jî bikin. Ev pir girîng e, lewre komîseriya ku dezgeheke konseyê ye, bi we re diçe dadgeha xwe, li gel we mudaxilî dosyeyê dibe û nêrîna xwe pêşkêş dike. Li ser dosyeyeke ku derbarê serî wendakirinan de bû, me nêrîna xwe wek aliyê sêyem pêşkêşî DQByê kir. Mixabin DQB rêziknameya demboriyê pêk tîne. Loma ev dosye ji ber sedema demboriyê hatibû redkirin. Lê axir serîlêdana me bi awayekî xist nav dosyeyê.

Hin belgeyên me yên qeneatê û daxuyaniyên me hene. Ev belgeyên qeneatê, bi prensîbên rêziknameyan re rasterast têkildar in. Loma ew prensîb ji bo me pir girîng in. Di rêziknameya IHDyê de nivîsîna wan prensîban demeke dirêj girt. Di serî de, piştî nîqaşên bi salan, deh prensîbên ewil hatin nivîsîn. Piştî heşt salan bû. Dîsa, piştî nîqaşên bi salan, me ev prensîbên xwe kirin çardeh û niha em li gorî wê rêziknameya xwe, dem bi dem belgeyên qeneatê aşkere dikin û daxuyaniyan didin. Ev ji bo me pir girîng e. Em derbarê mijarên mafên mirovan û demokrasiyê de daxuyaniyan didin û li wir nêrînên xwe yên li ser vê mijarê dibêjin.

Em wek komele rasterast li ser serîlêdanan dixebitin. Ango kesek bifikire ku mafê wî hatiye binpêkirin, dê were forma me ya serîlêdanê dagire û serî li me bide. Dema ku me jî serîlêdana wî girt, em jî serî li saziyên fermî didin. Li gor mijara xwe diguhere. Di demên dawî de, di sala 2012an de Venêrîna Giştî hat avakirin. Di DQByê de rêya serîlêdana şexsî vebû. Pişt re Saziya Mafên Mirovan a Tirkiyeyê hat damezirandin û di gelemperiyê de hin lijneyên mafên mirovan hatin sazkirin. Niha Venêrîna Giştî, erka xwe didomîne. Rexneyên me, li Saziya Wekhevî û Mafên Mirovan a Tirkiyeyê hene. Ev demên dawî, têkiliyên me û lijneyê pir ne baş in. Mixabin em hewce nabînin serî lê bidin. Em bêhtir serî li Venêrîna Giştî didin. Em ji hin serîlêdanan encam digirin, ji hin serîlêdanan encam nagirin. Ev pêvajo dê dûvdirêj bibe.

Ji rewşa awarte û vir ve, hema bibêjim em wek nîv dezgeheke dewletê dişixulin. Ango serîlêdan tên û em wan serîlêdanan ji Gerînendeya Giştî ya Girtîgehan a Wezareta Dadê re, ji Gerînendeya Giştî ya Karên Cezayê re, ji Wezareta Karên Hundirîn re, ji wezaret û dozgeriya eleqedar re, ji saziya eleqedar re, ji Saziya Venêrîna Giştî re û ji Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsê re dinivîsin. Em daxwazên xwe dibêjin. Ew jî bersivên standard didin me: “Serîlêdana we gihiştiye ber destê me, lêkolîn tê kirin, wiha dibe, wisa diçe.” Pişt re wiha pir kar çêbûn, bê hemdê xwe em bûn saziyeke dewletê. Lê di vê mijarê de, di vê astê de tiştekî ku em bikin tune ye.

Carinan mijarên pir spesîfîk çêdibin. Herî dawî Komeleya Înîsiyatîfa Heq raporeke taybet weşandibû. Beriya wan me li ser vê mijarê rapor weşand û hin xebat kirin. Dîsa li Tirkiyeyê, bûyerên revandina bi darê zorê û serî-wendakirinê rû didin. Li Tirkiyeyê mijara wendakirina di binçavan de, di sala 2004an de qediyabû. Bûyera wendakirina di binçavan de herî dawî di sala 2004an de bû, heta teşebusa derbeyê. Di dawiya 2016an, di serê 2017an û pê ve, li Tirkiyeyê mixabin 30 kes li rasta kolanê hatin revandin, bi mehan ji wan xeber nehat girtin, îşkenceyên giran dibînin û pişt re wan serbest berdidin. Îcar polîs tê wan dibe û li ser sûcên adlî wan digirin. Yan wan dişînin girtîgehan an jî wan serbest berdidin. IHD, bi serîlêdana wan, serî li dozgeriyê da, bi komxebata YNyê û bi awayekî domdar di têkiliyê de ye û van bûyeran dişopîne. Bi heman awayî hem li cem Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsê, hem jî li cem Wezareta Karên Hundirîn her tim teşebusên me berdewam dikin. Van demên dawî, ango Komîsyona Mafên Mirovan a Meclîsê ku piştî hilbijartina 2018an ava bû, li gor Komîsyona ewil pir xirab e û bi vê komîsyonê re bi tu awayî têkiliya me tune ye. Em ji wan re dinivîsin, ew bersivên nivîskî didin me. Ango em her tim di ragihandineke nivîskî de ne. Rewşeke pir ecêb e, komîsyoneke ku navê wê Komîsyona Mafên Mirovan e û me hîn hevûdu nedîtiye. Hêla desthilatdar a komîsyonê bi mafên mirovan re evqas eleqedar e. Carinan dibêjin, “IHD, evqas hejmar dibêje lê ne ewqas e, evqas e.” Em dibêjin, “Em bi ewqasî jî razî ne, bes hûn vê pirsgirêkê çareser bikin.” Ji vê û wê de jî naçe.

Gilî hene ku li dozgeriya komarê hatine kirin. Carinan bûyerên îşkenceyê yên pir krîtîk çêdibin, lazim e em van bişopînin. Di wan mijaran de serîlêdanên me çêdibin. Lewre, heke hûn banga sûcekî bikin, divê hûn heta dawî vê bişopînin. Ev pêvajoyeke adlî ye, ne wek gilîkirinekê ye. Weke giliya ku li saziyeke fermî tê kirin nefikirin. Bûyerên ku em li vir jî dişopînin hene lê li Tirkiyeyê lêgerîna edaletê mixabin pir dereng pêk tê. Loma ev, xebatên demeke dirêj in. Bêhtir şaxa me ya Diyarbekirê, şaxa me ya Stenbolê û navenda me ya giştî van xebatan birêkûpêk dikarin bi rê ve bibin. Kapasîteya şaxên me yên din tune ye ku van xebatan bi rêk û pêk bike. Lê qet nebe di ser çend şaxan û navenda me ya giştî re ev xebat didomin.

Wekî din rêbazên pir cuda hene. Di YNyê de prosedurên cuda yên raportorên taybet hene. Rêbaza xebata komîseriya Konseya Ewropayê heye. Bûyerên ku em radigihînin komxebatên cuda bi cuda hene û heke hûn van bûyeran yek bi yek bişopînin, dikarin ji van bi hêsanî encam bigirin. Ser meseleyê ez vê mînakê bidim, di pêvajoya qedexeya derketina derve de, dosyey hene ku ku me bi daxwaza tedbîrê biribûn DEMMyê. Piştre ji bo ji aliyê esasê ve bên nirxandin, pêvajoyên parastinê hatin bipêşxistin. Li wir hem rewşa Akademîsyenên ji bo Aştiyê hem jî rewşa xebatkarên tenduristiyê, ku ji bo alîkariya mirovan çûbûn Cizîrê, me her tim anîbû rojevê.

Ser meseleyê li Tirkiyeyê herî dawî Akademîsyenên ji bo Aştiyê bi biryara DQByê bi rihetî bêhna xwe vedan û xebatkarên tenduristiyê jî yekser beraet kirin. Niha ez dikarim bibêjim ev bi bandor in. Lewre dadgehên bilind her dem bi hev re di nava têkiliyê de ne. Heke hûn mijara xwe ya mafdar, bi israr bişopînin, axir nerasterast be jî hûn ê feydeya wê bibînin. Pêvajoyeke pir tevlihev e lê bi taybetî dixwazim diyar bikim ku me ev bandor ji vir girt.

Hûn dizanin li meclîsê du komîsyon ava bûn. Yek jê di 2012an de ava bû. Binekomîsyona Komîsyona Mafên Mirovan ava bûbû. Me tablo pêşkêşî Komîsyona Lêkolîna Binpêkirinên Mafê Jiyanê kirin. Yek jî, di 2013an de bi navê Komîsyona Lêkolîna Rêyên Aştiya Civakî, Komîsyoneke Lêkolînê ya Meclîsê bû ku di pêvajoya çareseriyê de hatibû avakirin, em çûn vê komîsyonê. Bi saetan me nêrînên xwe, raporên xwe, bîlançoyên xwe ragihandin. Di nav wan raporan de ev hemû nêrînên me hene.

Ser meseleyê raya giştî her tim nîqaş dike, “Çiqas gund hatin valakirin?” Li gor rapora fermî ya komîsyona Meclîsê di bîst salan de 905 gund û 2523 gundik ango 3428 cihnişîn bi zorê hatin valakirin. Ev têgeha valakirina bizorê, bi zor qebûl kirin. Ev gundên ku dewletê vala kirine. Di vir de kêm zêde milyonek û nîv - sê milyon mirov bi zorê dan koçberkirin. Dema hûn biçin wan komîsyonan, hûn dikarin bi awayekî dûvdirêj van nîqaş bikin. Li ser qedexeya derketina derve jixwe me pir rapor girtin. Hema hema derbarê

hemûyan de raporên me yên taybet hene. Derbarê vê de agahiyên dawî yên rojanekirî hûn dikarin di malpera TIHVyê de bibînin.

Mesela, gorên komî… Rastiyeke gorên komî ya Tirkiyeyê heye. Em di vê mijarê de xebatan bi rê ve dibin. Aniha xebatên me pir kêm bûne lê ev ji wan karên herî girîng e ku di pêşerojê de li benda me ye. Çawa li Bosnayê gorên komî tên vekirin, li Tirkiyeyê jî di siberojeke nêz de, hemû gorên komî dê bên vekirin û xebateke dûvdirêj dê bimeşe. Me ji bo damezirandina weqfekê hemû amadekariyên xwe kiribûn lê ji ber ku şer û pevçûn dîsa dest pê kirin, me ev projeya xwe taloq kir. Lewre niha qada me ya xebatê ya pratîk hatiye girtin. Ji ber vê, ez dikarim bibêjim rastiyeke me ya wiha heye. Me di xebatên xwe yên qadê de, gorên ji komkujiya Ermeniyan mayî dîtin, me gelek gorên ji komkujiya Dêrsimê mayî dîtin. Dîsa me gelek gorên ji serhildanên Kurdan mayî dîtin. Cihnişînên wisa hene… Ser meseleyê, cihên ji sala 1915an vir ve wek qada gorên komî bikarhatî me dîtin. Tesbîtên me yên ecêb hene.

**Beşdar:** *Bêhtir li kû bûn ew qad*?

Li rojhilat û başûrrojhilatê Tirkiyeyê, li bajarên Kurdan.

**Beşdar:** *A rast di hemû bajaran de heye.*

Li hemû bajaran tune ye, li van deran heye: Diyarbekir, Sêrt, Bedlîs, Colemêrg, Çewlîg, Wan, Şirnex, Mêrdîn, Dêrsim, Elezîz, Agirî, Îdir, Erdexan, Qers, Semsûr, Meletî, Hetay û Riha. Yeka din jî, malên mirinê yên Hizbullahê hene ku li cihên cuda bi cuda hatine tesbîtkirin. Her hal ew gişt hatin vekirin. Yek jî li Antalyayê goreke komî heye. Di salên 1990î de qadeke mîlîtanên PKKyê lê hatî veşartin heye. Cihên wiha jî hene. Belkî niha li Behra Reş jî hene. Lewre van demên dawî, qayîdeyên hurmetdayîna miriyan pêk nayên. Meytên hin mîlîtanên ku di şer de tên kuştin, li çolê dihêlin, qet meytên wan hilnadin jî. Bi gelemperî kepçeyekê tînin. Cihekî dikolin. Hemûyan bi hev re binax dikin, ser wan digirin û diçin. Wisa pir zêde cihên gorên komî hene.

Niha ez çima vê ji we re vedibêjim? Madem em ê behsa Meseleya Kurdan bikin, em ê behsa çareseriya pevçûnan jî bikin, li Tirkiyeyê dewlet ji bo rûbirûbûna raboriyê çi kiriye? Bibêjin raperîna Kurdan an jî serhildana Kurdan, bibêjin komkujî, bibêjin qirkirin, çi dibêjin bibêjin. Piştî van hemû bûyerên ku qewimîne, kêm caran be jî dewleta Tirkiyeyê meraq kiriye.

Li navçeya Wanê, li Qerqeliyê sî û sê kesên ku hatine kuştin, wek fermî sî û du kes derbasî qeydan bûne lê ya rast hejmara wan sî û sê ye. Mesela li meclîsê komîsyoneke lêkolînê hatiye avakirin lê ev komîsyon rapor nedaye û nexebitiye. Rapora herî navdar di 1993yan de Rapora Komîsyona Lêkolîna Kuştinên Failî Meçhûl e. Rapora komîsyonê heye lê belê di lijneya giştî de

nehatiye dîtin. Te dît qala hevdeh hezar failî meçhûlan dikin, aha derbarê van kuştinên failî meçhûlan de li ser rapora komîsyona lêkolînê nîqaşên hatine kirin ev in. Lêbelê di wir de ewqas hejmar tune ye, ez wê bibêjim. Li ser komkujiya Sêwasê rapor heye. Dîsa di sala 1993an de li Başûrrojhilatê Tirkiyeyê, li ser rapora meseleyên qewimî hevdîtin hatin kirin, bi heman awayî di 1994an de komîsyonek ava bû lê rapor tune ye. Derbarê ewlehiya sînor de raporek heye. Ango Meseleya Kurdan eleqedar dike. Li ser Metin Göktepe... Rapora Susurlukê ya navdar heye. Ya rast metna esas a vê raporê Serokê Lijneya Venêrînê, Kutlu Savaş, amade kiribû. Piştre li meclîsê jî ev komîsyona lêkolînê hat avakirin û muzakerekirin. Raporek di 1997an de heye derbarê cih û warên hatine valakirin. Raporên li ser Uğur Mumcu, zarokan, qetla ji ber namûs û adetan hene. Colemêrg, Gever û Şemzînan, derbarê "zarokên baş" de rapor heye ku serokê kevin ê serperiştiya giştî ya leşkerî behsê dikir. Ew zarokên baş hûn dizanin ku herî dawî beraet kirin? Hatin beraetkirin.

Hûn dizanin li Tirkiyeyê ewil kê komeleya mafên mirovan damezirandiye? Mereşal Fevzî Çakmak damezirandiye, di nav damezirînerên wê de ye. Pir ecêb e ne? Di serdema Menderes de bi navê Komeleya Mafên Mirovan, di nav damezirînerên vê komeleya ewil a damezirandî de serokê serperiştiya giştî ya leşkerî, ango mereşal heye. Ez henekan dikim, dibêjim ku: "Navê me pir giran e, Fevzi Çakmak jî bûye damezirînerê komeleyeke bi vî navî." Jixwe sê meh destûr dane, piştî sê mehan girtine. Piştî wê careke din ceribandine lê destûr nedane, qet nehatiye avakirin jî. Paşê di sala 1986an de bi navê Komeleya Mafên Mirovan ev komele hatiye damezirandin.

Komîsyona Lêkolîna Derbeyan hat damezirandin. Komîsyona Venêrîna Mafên Mirovan ku di sala 2011an de hat damezirandin û di sala 2012an de xebitî, em çûn ji bo rapora binekomîsyonê tev li xebatên komîsyonê bûn û me tevkariya wan kir. Em çûn Komîsyona li ser Nirxandina Pêvajoya Çareseriyê û Lêkolîna Rêyên Aştiya Civakî jî, me li wir jî bi awayekî dûvdirêj behsa xebatên xwe kir. Nêrînên me di wan hemû raporan de, hin caran wek nêrînên cuda, hin caran jî wek nêrîneke dijber cih digirin. Hin caran bi awayê "hema wisa" bibe jî qet nebe argûmanên me yên bingehîn ên ku me dixwast bibêjin di nav van raporan de cih girtin.

Niha em tên ser mijara herî zehmet. Lewre divê bi hesabdayînê re, em teqez li ser rûbirûbûna raborî û bêcezabûnê jî bisekinin. Ango taybetmendiya herî girîng a xebatên mafên mirovan tesbîtkirina binpêkirinê, belgekirin, raporkirin e. Lêbelê ev kar li wir ranaweste. Ango divê hûn li edaletê bigerin, edalet divê cihê xwe bibîne. Têrê nake, divê hûn piştgirî bidin mexdûran. Lewre piştgiriya mexdûran xebateke pir girîng e. Têrê neke, divê hûn raya giştî çêbikin. Hûn ê raya giştî çêbikin, zexta raya giştî çêbikin, hûn ê piştgiriya raya giştî

bigirin ku hem bi qasî bihîstina mexdûriyeta mexdûran, dilê mexdûran têr dibe û hem jî bi qasî ku edalet cihê xwe bibîne, dilê wan jî ewqas têr dibe. Divê ev pêvajo bên bipêşxistin û li vir jî xebatên ku haydarkirinê bên kirin.

Paşê, jidil jî em ê binpêkirinê çawa tune bikin? Rêya herî girîng a tunekirina binpêkirinê edalet e. Lewre binpêkirin çêbûye û jixwe ew tişt qewimiye. Yê mirî jixwe miriye, yê birîndar bûyî jixwe birîndar bûye, yê îşkence lêbûyî jixwe lêbûye, yê xira bûyî jixwe xira bûye. Lê belê divê edalet cihê xwe bibîne ku jiyana hevpar û civakî bidome. Em dibêjin aştiya civakî, em ê çawa bi hev re bijîn? Her tim dê yek were we bikuje, bişewitîne, xira bike, îşkenceyê bi we bike. Hûn nikarin her tim bêdeng bimînin. Ango heke hûn mirov bin hûn ê serî hildin, li hember derkevin an jî hûn ê bibêjin em êdî naxwazim bijîn.

Meseleya Kampa Mexmûrê wiha çêbû. Te dît her tim di televizyonan de tê axaftin: Kampeke bi navê Kampa Mexmûrê heye, pêncî kîlometre li başûrê Hewlêrê ye. Min sê çar caran serî li wir da. Hûn dizanin ka ew kamp çima çêbû? Li Şirnexê ji gundên bizorê hatin valakirin, gundiyên ku canê xwe xilas kirin, ji mala xwe heta wir koç kirin. Gotin, “Êdî em naxwazin di welatekî wiha de bijîn.”

Komkujiya Gundê Geverê –bûyera ku bi bombebarana F-16an sî û çar gundî miribûn–, rehmetiyê Tahir Elçî biribû DEMMyê û DEMM li dijî Tirkiyeyê biryara binpêkirinê dabû. Mesela derbarê bûyeran de IHD heyetek çêkiribû, pişt re raporek derbarê wan deran de weşandibû û di pêvajoya dozan de ji raporên me jî sûd wergirtin.

Ji raporên me yên derbarê gundên hatî valakirin de, bi awayekî pir baş sûd hat wergirtin. Bi taybetî di salên 1990î de IHDyê, di mijara perwerdeya parêzeran a li ser serîlêdana DEMMyê de, bi rîskên mezin projeyên perwerdeyê pêk anîn. Bi zor û zehmetiyan ev proje pêk hatin. Dewletê destûr neda. Wan, hemû pêvajo û zehmetiyan her tim jiyan û tim di qada hiqûqa navneteweyî de, lêgerîna edaleteke rastî pêk anîn. Li vir cehdeke mezin heye, em her tim, hevalên keddayî bi hezkirin bi bîr tînin.

Aha ew Mexmûr wiha çêbû. Kesên serî hildidan çûn. Niha li wir gundekî dozdeh hezar nifûsî heye, ne gund e bajarok e. Çend kampên din jî hene ku pir nayên xeberdan. Ser meseleyê li Karataşa Edeneyê, devçema ku Çemê Ceyhanê dirijê heye. Hîn jî Kurd hene ku gundên wan hatine valakirin û li wir di bereqeyan de dijîn. Niha, em bibêjin 1993-1994, em niha di 2019an de ne, di navberê de 25 sal derbas bûye. Edaleta ku di 25 salan de cihê xwe nedîtiye, mexdûriyeta ku berdewam dike! Encamên van pir giran in helbet! Ji aliyê nifşan ve pir zêde giran e. Ji ber vê ev rapor û ev belgekirin pir girîng in.

Herî dawî rapora me ya derbarê Cizîrê de pir deng vedabû. Kêliya ku me ew rapor çêdikir, rapora sîbankî ku me di 2016an de pêşkêşî Komîteya Dijî Îşkenceyê ya YNyê kiribû, ez di hevdîtina wê raporê de bûm. Çend hevalên me yên li Swîsreyê bi lez organîze bûn û ew rapor ji bo Îngilîzî hat wergerandin. Ev rapor çûbû cem hemû dezgehên YNyê û derbarê tiştên qewimî de haydarbûnek çêkiribû. Yekser Serpiriştiya Giştî ya Leşkerî nivîsek nivîsîbû: "Rapora ku IHD, Baroya Diyarbekirê, IHD, Komeleya Gundem Çocuk, Sendîkaya Kedkarên Tenduristiyê amade kiriye, dibe ku di dahatûyê de bibe sedema darizandina endamên hêzên çekdarî yên Tirkiyeyê." Loma, gotiye, "Rê li van bigirin!" Ev bîrnameyek e, belgeyeke bîrnameyê nivîsîne. Wezîrê karên hundirîn Efkan Ala ev wek fermanekê hesibandiye û di Hezîrana 2016an de yekser destûr daye. Tew me dît du mufettîş hatin. Me got, "Xêr e, çi karê we li vir heye?" Gotin, "Em bi telîmatê hatine."

**Beşdar:** *We çima ji raya giştî re parve nekir ev belge?*

Me parve kir, karê me ewqas zêde ye ku ev ji bo me tenê yek ji rojevan e. Me parve kir, lêpirsînên wê hîn berdewam dikin. Pişt re di wê navberê de derbe çêbû. Mufettîşek ji kar hat avêtin, ji ber ku bi FETOyê re têkiliya wî heye. Mufettîşê din got, "Dê çawa be?" Min got, "Pêşî dê rewşa awarte bê îlankirin, pişt re dê me hemûyan perîşan bikin." Em Tirkiyeyê pir baş nas dikin. Peyana derbeyê çêbûye û derbe hatiye tepisandin. Serokkomar dibêje, "Xweşxwaziyeke Xwedê ye." Herhal dê derbeya dijber bike. Rêya wê jî, yekane amûra hiqûqê, rewşa awarte ye. Jixwe hûn rewşa awarte îlan nekin, nikarin van bikin. Axir, ev venêrîn sê mehan dewam kir. Pişt re nivîsîna raporê neh mehan ajot. Piştî salekê rapor derket. Dozger gazî min kir, ez çûm. Min got: "Dozger beg, kesek bi van mijaran re eleqedar nabe. Me ev xebat, di pêvajoya çareseriya şer de, di bin agahiya Rawêjkariya Ewlehiya Giştî de kiriye. Ji ber vê em nekevin wir." Di beşa din de jî tiştek tune ye jixwe. Ew jî ji nav vî karî derneket, dosye du salan ma. Niha, herî dawî ji muxalefeta mewzûata komeleyan, 614 TL cezayê pereyan li min birîn. Ji nav vî karî derneketine. Ji bo destûra lêpirsînê ji xala 301ê, şandine Wezareta Dadê. Yek jî, wekî din derbarê min de lêpirsîneke cuda, ji propagandaya rêxistina derqanûnî vekirine. Ango piştî sê salan cihê ku em hatinê ev e! Mufettîş ji nav vî karî derneketiye û her tişt nivîsiye: Xerakirina yekîtiya dewletê, parastina redda wijdanî, naskirina komkujiya Ermeniyan, tesbîtên li çolterê li ser çareseriya Meseleya Kurdan...

Ez ê qala pêvajoyên dozên derbarê wan de jî bikim. Mesela ez mudaxilî doza 28ê Sibatê bûm. Min ji dozgerên cemaetê yên wê demê re got, "Em wek IHD dixwazin mudaxilî vê lêpirsînê bibin." Bi eks û înadê, ez wek şexsekî serbixwe dam nivîsandin, li cem navê min jî "Serokê IHDyê" nivîsîbû. Ango li wir jî mudaxiltiya me tam nehat qebûlkirin.

Ser meseleyê, bîrnameya 1998an, bîrnameyek e ku di pêvajoya 28ê Sibatê de hatibû amadekirin: "Bila Partiya Refahê bê girtin, IHD bê girtin, HADEP bê girtin." Navên rojnamevanan rêz kirine: "Bila ev bên beralîkirin, bên girtin." Niha ew belgeyeke tawanê ye. Derbarê wê belgeyê de doza me li DEMMyê berdewam dike. Dema ew belge hat aşkerekirin, piştî 2000an, me gilînameyeke tawanê pêşkêşî dozgeriya Dadgeha Ewlekariya Dewletê kir û nehat şopandin. Pişt re di heyama AKPyê de; bawer im 2009 bû, wan li ser darizandina leşkeran di dadgeha sîvîl de, qanûn guhertin. Hema ku ew qanûn guherî, em dîsa çûn, me serîlêdana giliyê kir. Van dozgerên cemaetê tiştek wisa kirin. Wan amadekariyên 28ê Sibatê dikirin. Zêde dirêj ajot, dû re doza 28ê Sibatê hat vekirin. Doz hat vekirin, di angaştnameyê de her tişt hebû, tenê beşa ku me, IHD, dixwast di angaşnameyê de cih bigire ew beş tenê nexistibûn. Ango cihê ku esil jê ceza bixwin ew der bû. Ji ber ku wan Partiya Refahê dan girtin. Wan qesta kuştina Akın Birdal kirin, wan kiryarên tirsandinê ji bo rojnamevanan pêk anîn. Ev hemû wan kirin, tiştek nemaye ku wan nekiriye. Wan her tiştê ku di wê belgeyê de hatibû nivîsandin kirin û ev hemû di 28ê Sibatê de kirin. Li Tirkiyeyê jî tiştên wiha hene, bila wêrekiya we neşikîne, ev pêvajoyek e.

Derbarê kuştinên failî meçhûlan de bi sedan raporên me hene. Piştî hemû cehda me, dozên ku me dane vekirin şanzdeh in. Çardeh ji wan bi beraetê bi encam bûn, ma du dosye. Dosyeya rehmetî Musa Anter berdewam dike. Yek jî dosyeya JITEMa Enqereyê, ku Mehmet Ağar wek tawanbar tê darizandin, berdewam dike. Ma du dosye. Di doza 12ê Îlonê de jî li benda mirina Kenan Evren û Ahmet Tahsin Şahinkaya man. Ango di pêvajoya Dadgeha Bilind de bi aşkere li benda mirina wan man. Lewre her du jî nexweşên giran bûn û her du jî paşê mirin, piştî mirina wan dosye girtin. Em niha pênc parêzer man. Em bi înad in, me ew doz dîsa temyîz kir. Dosye li Dadgeha Bilind e, îhtimaleke mezin Dadgeha Bilind dê erê bike, pişt re dê biçe DQByê, paşê DEMMyê.

Çima wêrekiya we neşikîne? Mixabin ev li Tirkiyeyê wiha ye. Em komeleyek in ku li hemberî 12ê Îlonê hatiye avakirin. Rojek piştî referandûma 12 Îlona 2010an, ewil me serîlêdana giliyê kir. Axir îcar mafê gotinê ya ewil dan min. Lê mudaxiliya me qebûl nekirin. Gotin, "hûn piştî derbeyê hatine avakirin." Ne muhîm e ku em di derbeyê de hatibin avakirin. Lê dadgeh bi kiryarî tiştek wiha kir: Bi rastî gotina ewil dan IHDyê û li cem navê min, "Serokê IHDyê" nivîsîn. Ji bo fedakariya xwe hilînin, rêbazeke wiha dîtin. Ango wek fermî em ne mudaxil in lê wek parêzerê kesên din tev li dozê dibin. Lê ya rast bi kiryarî IHD mudaxilê dozê ye. Hûn ê van bijîn.

Li Tirkiyeyê li cem peywirdarên dewletê hesab pirsîn tiştekî zor zehmet e. Lewre mekanîzmaya dewletê ji serî heta binî abîdeya bêcezabûnê ye. Di vê

rewşa awarte de qanûnên ku bi KHKyan hatine derxistin êdî darizandina wan pir zehmet e. Ango heta qanûneke bingehîn a nû, qanûneke nû neyê çêkirin, pir zehmet e.

Li Tirkiyeyê pergaleke pir taybet a ceza/darizandinê heye. Ev pergal bi TMKyê û hin hikmên usûlî yên ceza û usûla cezayê tên birêvebirin. Ango pergal wiha dixebite: Bi navê Lijneya Ewlehiya Millî (MGK) lijneyek heye. MGK, Belgeya Siyasî ya Ewlehiya Millî çêdike. Di Belgeya Siyasî ya Ewlehiya Millî de, ji her pênc salan carekê pênaseya dijminên der û hundir tê kirin. Her pênc salan carekê dinivîse ku kî dijminê hundirîn e. Rêxistin, beşên civakî yên bi rêxistinan re têkildar tên rêzkirin. Komele, weqf, partiyên siyasî, saziyên civaka sîvîl ên bi wan re têkildar in... Tev yek bi yek tên rêzkirin, tên kategorîzekirin. Nimareyan didin van gişkan û beşa têkildar a Belgeya Siyasî ya Ewlehiya Millî, ji Wezareta Dadê re tê şandin.

Te dît Demirtaş duh êvarê hat girtin (di sala 2016an de lêpirsîneke jê hatî veqetandin û bi angaştnameyê ve hatiye girêdan û hatiye girtin; lêpirsîneke kevin e, divê bihata girtin lê nehatiye girtin), bi vî awayî hat girtin. Ango dadgerekî normal bi ti awayî biryareke wiha îmze nake. Yek jî, rêbazeke wiha heye li vir. Her dem derbarê her kesî de, derbarê kesên bûyî malê raya giştî de, her dem nimareya lêpirsîna veşartî heye. Dema lazim bibe ji bo ku bi kar bînin, wê li kêlekê digirin. Ewqas jî ne bê tecrûbe ne peywirdarên dewletê. Loma niha, serîlêdana giliyê û pêvajoya lêpirsînê pir girîng in ji bo şopandinê.

**Beşdar:** *Hûn hiqûqnas in, parêzer in. Ez vê meraq dikim. Di encamê de, failî meçhûl bin, valakirina gundan be, mijarên din ên weke van bin, pêvajoyên pir dirêj in. Tenê ne salên 1990î, derbeya 12ê Îlonê, 1915an, em dikarin pir bi paş de biçin. Ev bandoreke çawa li ser civakê dihêle? Ango heke edalet pêk nehat, bêcezabûn berdewam kir, helbet bedbînî derdikeve holê. Lê bi rastî ez pir meraq dikim, bandora wê ya sosyolojîk çi ye? Hûn dikarin bibêjin, "Ez ne derûnnas im," lê ez bersiva we meraq dikim.*

Ez dikarim çavdêriyên xwe bibêjim, çavdêriya min a herî zindî wiha ye: Me bi Dayîkên Aştiyê û xizmên serwendayiyan re çalakiya rûniştinê li dar xist. Li Stenbolê her şemî, Dayîkên Şemiyê bi parêzvanên mafên mirovan re çalakiya rûniştinê li dar dixin. Ev trawmayeke mezin e.

Li Tirkiyeyê trawmayeke civakî ya pir mezin heye. Loma di serdema pêşiya me de mijara herî girîng a sereke ku Tirkiye divê pê re eleqedar bibe trawmaya civakî ye. Me di vê mijarê de, di bin banê TIHV de dest bi xebata avakirina enstîtuya trawmayê kir. Di demeke nêz de enstîtuya trawmayê dê bê avakirin. Lewre li Tirkiyeyê trawmayên beşên civakî hene; yên Kurdan, yên Elewiyan, beşên civakî yên dîkekirî, yên jinan, yên astengdaran, yên mitri-

ban, komên etnîkî yên cuda, mexdûrên îşkenceyê, kesên ku xizmên wan hatine îşkencekirin... Piştî derbeyê, ser meseleyê; ji civata muhafezekaran, ku em li daneyên Wezareta Dadê binêrin, bi sed hezaran mirov hatin binçavkirin û girtin. Heke hûn li binyata malbatan bifikirin, herî kêm milyonek mirov trawma derbas kirin. Loma civaka Tirkiyeyê xwedî trawmayeke pir mezin e û di mijara serederiya trawmayê de divê xebatên dûvdirêj bike.

Ev, ji aliyekî ve xîreta têkoşînê ji aliyekî ve jî hîsa acizbûn û bêzariyê bi pêş dixe. Dikin ku tirsê bikin serwerê civakê lê bi xêra serê mirovên ku têdikoşin, ew hewaya tirsê dike bişikê. Ji aliyekî ve bi rastî civak bi awayekî hişk tê tirsandin, ji aliyekî ve bi xêra serê mirovên ku bedel didin, ew tirs dişikê.

Me gelek caran bangewazî kir. Min ji parêzerên wan re xeber dişand. Lewre xeberên îşkenceyê ku min dibihîstin felaket bûn. Me got, "Gelî malbatan, ji kerema xwe re werin serî li me bidin, em ê bi we re eleqedar bibin."

Mesela em bi van meseleyên revandinê re ji nêz ve eleqedar dibin. Em çi dizanin, belkî jî hejmar pir felaket bibûya. Belê, em dixwazin hesab bipirsin, li pêşberî edaletê em dixwazin serederiyê bi bêcezabûnê re derxin lê ji aliyekî ve jî piştgirî zêde dibe. Ango esas li Tirkiyeyê "komeke mexdûran" a pir mezin heye û trawmaya ku ew jiyane pir mezin e.

Aha, herî dawî dayîka Elmas jiyana xwe ji dest da. Anik Can jiyana xwe ji dest da. Axir dayîka Anik qet nebe meytê kurê xwe dît. Lê dayîka Elmas nedît, gora kurê xwe nedît û çû. Rehmetî dayîka Berfo di danişîna 12ê Îlonê de – Dayîka Berfo 104 salî bû, me ew bi kursiya biteker anî salona danişînê– wiha li Kenan Evran nihêrî. Çi hat devê wê got, gotinên nemayî gotin. Belkî jî ew, kêliyeke herî girîng a jiyana wê ye. Lê belê ew jî negihîşt kurê xwe û çû.

Ango trawmaya civakî ya li Tirkiyeyê wisa kûr e ku... Îstatîstîkên nifûsê, arşîvên Osmaniyan vebûn. Her kes dikare êdî bigihîje qeydên nifûsê. Gelek malbat eslê xwe yê etnîkî nû hîn bûn. Dest pê kirin bi bişaftinê re rûbirû bibin. Divê em vê piçek jî di meseleya rûbirûbûna raborî, heqîqet û edaletê de biaxivin. Li vir meseleyeke tevlihev heye.

Lê em dibêjin, "Edalet, rihet dike." Em berdewam bikin li edaletê bigerin. Em bawer nekin jî berdewam dikin. Em mecbûr in bikin lewre dema em dev ji lêgerîna edaletê berdin, dibe ku em jî bikevin nava koma ku binpêkirinan dikin. Ji ber vê fikra edaletê pir zêde girîng e. Em ji aliyekî ve jî dibêjin: "Têkoşîn, rihet dike." Bi têkoşînê re jiyan tê. Em mecbûr in têbikoşin, alternatîfeke me ya din tune ye. Ev têkoşîneke domdar e, rêyeke din a vê tune ye. Hûn herin, xwe bixin nava çar dîwaran bibêjin, "Ez piçek serê xwe rihet bikim." Tiştekî wisa tune ye.

Şopandina van pêvajoyên lêpirsînê pir girîng in. Ser meseleyê em çi dikin? Li Cizîrê di bodrûman de li ser mirovên ku hatine şewitandin û li ser meytên ku me tesbît kirine, em vê pêvajoyê dimeşînin: Banga sûcê, biryara neşopandinê, îtiraz, esehîbûn, DQB; bişopîne, piştre biçe DEMMyê li wir li edaletê bigere. Çend salan ajot êdî... Ji aliyekî din ve pêvajoya tezmînatê. Em wê bêhtir ji wan parêzeran re dihêlin ku bi karên hiqûqê yên taybet ve mijûl dibin. Lewre ji wir dahatûyeke aborî dibe ku bi dest bikeve. Rasttir û hêsantir didome pêvajoyên tezmînatê. Rastiyeke wiha heye.

Yek jî, bi van meseleyan re her kes nikare eleqedar bibe. Heyama dawî, pirsgirêkeke pratîk a wiha derket pêşberî me. Ji aliyekî ve divê hûn van tiştan bikin û ji aliyekî ve jî mirovên ku vê bikin pir kêm in. Ser meseleyê divê zanebûna wî ya hiqûqê tekûz be. Hûn ê prensîbên DEMMyê bizanin, prensîbên Jordanê bizanin. Usûlên lêpirsînê bizanin. Di rewşên wiha de divê hûn bizanin ku hûn serî li kû bixin. Em bi wateyeke din, her tim bang li baroyan dikin ku perwerdeyê bidin hevalên parêzer. Rêxistinên hiqûqê her tim dixebitin. Ji aliyekî ve jî dema em firsendê dibînin, di mijarên wiha de dikin ku hevalên parêzer perwerde bikin. Ev tiştekî bi armanca we re jî eleqedar nîne. Divê hûn hin tiştan bizanin. Divê hûn usûl û rêbazên pir taybet ên lêpirsînê bizanin ku hûn bikarin delîlan berhev bikin û pêvajoyê bi rê ve bibin.

Dozên ku em dişopînin hene, dozên ku me bi darê zorê dayî vekirin. Divê hûn van bişopînin. Dozên îşkenceyê hene, dozên failî meçhûlan hene, ez dikarim van mînakan bidim. Hin dozên îşkenceyê hene an jî dozên derbarê bûyerên civakî de, em diçin û mudaxil dibin. Bi gelemperî di qetla jinan de mudaxiliya rêxistinên civaka sîvîl qebûl dikin. Hin dadger di van mijaran de dikarin înîsiyatîf bigirin lê di hin bûyeran de nagirin. Ser meseleyê di komkujiya Soma û Sirûcê de qebûl nekirin, lê em wek komele mûdaxilî komkujiya Gara Enqereyê ne. Ji vê pê ve, em vê xebatê di wan dozan de bi rê ve dibin ku em wek mudaxil tev lê dibin.

Yek jî, dozên dijber hene, ji ber vê hemû pêvajoyê em tên sûcdarkirin, di her firsendê de me sûcdar dikin û dibêjin, “Bi rêxistina terorê re têkildar, eleqedar in û alîkariya terorê dikin.” Me bi piştgiriyê sûcdar dikin, doz û lêpirsîn hene li hevalên me hatine vekirin. Herî dawî lîsteya doz û lêpirsînan ji sê sedî derbas bûbû. Li wir jî em ji eks û înada xwe danakevin. Em tim diçin beşdarî danişînan dibin, dixebitin ku bigihîjin her derê. Bi gelemperî bi beraetê bi encam dibin lê yên ceza didin jî hene.

Ku bi cezayê encam bibe em çi dikin? Em hevalên xwe dişînin derveyî welêt. Li cihanê diyasporayeke felaket a IHDyê heye. Ez pir mubalexeyê nekim lê hejmara me heye ku em li sî welatî şaxan vekin. Li Awistralya, Swîsreyê nûnertiya me heye lê ji ber ku em nikarin kontrol bikin, welatên din destûr

nadin. Lewre vê carê jî ku rêxistin bikevin nav vî karî, em nikarin ji navê derkevin. Herî dawî sekreterê me yê giştî Hasan Anlar mecbûr ma çû Swîsreyê. Serokê şaxa me ya Edeneyê jî li Swîsreyê ye.

Vê heyama dawî wek sazûman hin komikan xwestin bi ser me de werin lê belê bi awayekî ji ber xweseriya me ya di xebatên me de, sekna me ya di prensîban de, nekarîn vê pêk bînin. Di ragihandina rewşa awarte de bi hezaran komele hatin girtin. Hin derdoran ji min pirsîn, "Çima saziya we negirtin?" Me got, "Ji ber ku em bi salan e bi van re têdikoşin." Lewre em saziyeke xweser in, bi rastî di vê mijarê de yekîneyên eleqedar ên dewletê jî dizanin ku em çiqas xweser in. Ji bilî vê, xebatên ku em dimeşînin pir girîng in. Em mirovên wisa ne ku bi hemû xirabiyên dewletê re eleqedar dibin. Dema em berevajî bifikirin, ji bo ku binyada civakî xira nebe, ji bo ku hin têkiliyên civakê bimeşin, pêdivî bi wan mirovan heye ku bi hemû xirabiyên dewletê re eleqedar bibin û van ji navê hilînin. Pêdivî bi wan mirovan heye ku lêgerîna edaletê pêk bînin û pakiya civakê pêk bînin. Ev rastiyeke civaknasiyê ye. Divê hûn berevajî bifikirin. Dema ku hûn berevajî lê binêrin, kes tune ne ku vê xebatê bikin. Ku dewlet vê qadê jî tune bike, a rast xwe tune dike. Serîhildan derdikeve holê; terorîzebûna hemû qadê, wek amûrê têkoşînê dehfdana mirovan bi aliyê bikaranîna tundiyê de... Loma di hin mijaran de dewlet bixwaze jî nikare pir bi pêş de biçin. Kengî diçin? Di şerê giştî de diçin. Jixwe şerê giştî, yek ji wan rewşan e ku mafên mirovan ji binî ve tune dibe. Yek jî di heman demê de têkiliyên navneteweyî; YN, Konseya Ewropayê, YE û hin dewletên bihêz ku di polîtîkayên xwe yên derve de guh didin mafên mirovan. Di nav vê hemû demê de tecrûbe, têkilî, danûstandinên fikrî û hwd. alîkariya me dike ku em van hemû pêvajoyan derbas bikin.

**Beşdar:** *Di bin çavan de weke berê îşkence hê dewam dikin?*

Li Tirkiyeyê îşkenceyê dirûv guherand. Piştî teşebusa derbeyê, di lêpirsînên Fetullah Gulen de em pir dibihîzin. Vê, di navendên standart ên binçavkirinê de nakin. Ji navendên binçavkirinê derdixin, dibin cihekî din li wir dikin. Li wir kamera tune ye, qeyd tune ye. Loma bi tevahî wexta ku tu bibêjî, "Di binçavkirinê de îşkence dikin," tu dibî derewker. Lewre di navendên fermî yên binçavkirinê de ev nayên kirin.

Yek jî, dema te binçav dikin. Deriyê malê dişikînin, dikevin hundir. Li ber çavên zarokên te, li te heqaretan dikin. Kelepçeyê ji pişt ve girêdidin. Bi tundî te li erebeyê siwar dikin, di erebeyê de te aciz dikin, li te dixin. Gazê li çav û rûyê te dikin. Ev ne îşkence ne? Jixwe dema te li wir binçav dikin, heta te dibin nezaretxaneyê hin tiştên ku dixwazin li te bikin, dikin. Derbarê te de rewşeke taybet hebe, komên din te hildidin dibin û îşkence dikin. Piştre bi tirs û gefan dengê te dibirin.

Rêbazên wisa yên îşkenceyê hene, dema tu diçî cem dadger li ser û guhê te tiştek nexuya ye lê dema poşet dixin serê te, îşkenceya fetisandinê li te dikin, tu reş û şîn dibî. Ev îşkence ye. Lê dema tu ji bo kontrolê diçî cem bijîşk, ev xuya nabe. Hin caran îşkenceya tecawizê ya bi copan dikin... Bi tu bijîşkî re napeyive. Wek asayî divê li gorî Protokola Stenbolê muayene bê kirin. Ev nayê kirin. Di tiba adlî de hemû bijîşkên peywirdar divê li gorî Protokola Stenbolê muayene bikin, ne li gorî daxwaza xwe. Qanûn, di Protokola Stenbolê de diyar in û divê te muayene bike lê heke ku tu gilî bikî, muayene dikin. Ku wisa jî dibe, îşkence diyar nabe.

Li gel vê, gelek kes di salonên dadgehan de an jî li dadgera jêpirsînê, îşkenceyên ku li wan hatiye kirin, li zabitnameyan didin qeydkirin. Dest pê kirine di dadgehan de diaxivin. Sî kesên ku hatine revandin, jixwe bênavber îşkence li wan bûye. Di girtîgehan de jî rêbazên cuda tên bi kar anîn.

Li Tirkiyeyê îşkence cih û şikil guhert lê dewam dike. Hem jî wek sîstematîk dewam dike. Lewre em vê, hema hema li her cihî dibînin. Diyar e, ji ber ku heyama derbeyê û heyama rewşa awarte bû, ev mesele dîsa der bû. Em di vê mijarê de pir xemgîn in. Em fikirîn ku me pêşketinek bi dest xistiye lê mixabin Tirkiye dîsa vegeriya ser halê xwe yê berê. Helbet bila tu kes weke girtîgeha qawişa 5an a Diyarbekirê xeyal neke. Lê hevalino, îşkence îşkence ye. Em dibêjin, "muemeleya rûmetşikên" ne wisa, em dibêjin "muemeleya xirab". Dewlet dixebite ku peyva îşkenceyê bi kar neyne. Lewre peyva îşkenceyê tiştên nebaş tîne bîra mirov lê ev hemû îşkence ne. Qedexeya muameleya xirab û muameleya rûmetşikênê heye. Hin caran heta êvarê li kesekî dixî, qet bandor lê nake. Lê tu şeqamekê diavêjê, heta dawiya umrê xwe ji bîr nake. Ev îşkence ye. Ew, bandor e ku li te dike.

Li gel meseleya bêcezabûnê divê mijara hesabdayînê jî bê axaftin. Li Tirkiyeyê polîtîkayeke dewletê heye. Tirkiye peywirdarên dewletê her tim diparêze. Ev di eslê xwe de meseleya destnedayînê ye. Hûn dizanin, ji serî heta binî dewlet peywirdarên xwe her tim bi mertalên destnedayînê diparêze. Bi gelemperî ev wiha tê ravekirin: "Ev di nav sûcên ji bo peywirê de ne." Lê di navbera polîsekî de yê ku îşkence dike û yê ku gumanbar binçav dike, ji aliyê sûcên peywiran ve cudahî çi ye? Li gorî çi dê were tesbîtkirin? Ji ber wê tetbîqkirin pir zêde girîng e. Her tim ev polîtîkaya parastinê tê bipêşxistin û divê bi vê re serederî bê kirin.

Piştî teşebusa derbeyê hat kontrolkirin, serokkomar, wezîrê karên hundirîn, wezîrê dadê û serokwezîr, yekî jî heta niha negotiye, "Hemû yekîneyên ewlehiyê; leşker, polîs, îstixbaratvan, dadger, dozger... îşkence qedexe ye. Hûn ê şeqamekê jî neavêjin kesî, kî îşkence bike ez ê wî mehf bikim!"... Heywax heywax ku jixwe negotin. Demeke dirêj serokkomar Erdogan gotina "îşkence

qedexe ye" bi kar neanî. Hê nû dibêje, "toleransa îşkenceyê qethen tune ye." Erê baş e, te çima di sala derbeyê de ev negotin. Ev pir zêde girîng e. Hin yekîneyên ewlehiyê vê îtiraf dikin û dibêjin, "Me rayeke berfireh da, em nikarin kontrol bikin." We çima da? Dayîna rayeya berfireh, tê wateya "Dikarî îşkence bikî."

Çanda darazê çêbû, ev xetertir e. Parêzvanî, parêzvana dozger, parêzvana dadger... Di bûyerên civakî de polîs lê dixe... Ethem Sarısülük, li Muglayê kuştina xortê xwendekar, kuştina Berkin Elvan, kuştina Ali İsmail Korkmaz... Çanda darazê her tim sûcdaran diparêze. "Cezaya herî kêm çawa bidim, çawa xilas bikim." Ev feraset, ev çand bi pêş dikeve. Çima? Lewre "ew" peywirdarê dewletê ye, "ev" jî dijminê dewletê ye û pir xeter e.

Derbarê parastina fermî ya peywirdarên dewletê de, rojek beriya derbeyê, qanûneke bi hejmara 6722yan derket. Ev qanûn, hemû peywirdarên dewletê ku di operasyonên ewlehikariyê de cih digirin, peywirdarên giştî û kesên ku alîkariya wan dikin, ji bo darizandina van destûra hikûmetê tîne û ev, di dîroka Komara Tirkiyeyê de qanûna herî xirab e. Di qedexeyên derketina derve de Serperiştiya Giştî ya Leşkerî her tim parastineke fermî dixwast. Serokê Serperiştiya Giştî ya Leşkerî, pêşî ji Ahmet Davutoğlu belgeyeke pêbaweriyê ya îmzekirî wergirt. Pêşî bi wê îdare kirin. Piştre di 14ê Tîrmeha 2016an de qanûneke taybet derxistin. Wê qanûna taybet, bi awayê ku tiştên beriya wê qewimîne bihewîne hat çêkirin. Ango darizandina kesên di salên 1990î de tev li operasyonan bûne jî niha girêdayî destûrê ye. Ev bobeletek e. Li ser van hemûyan DEMMyê got, "Pêşî biçin Dadgeha Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê."

Heta ev hebe, Dadgeha Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê nikare tu tiştekî bike. Tiştekî bike tune ye. Lewre kesî nelêtiya qanûna bingehîn a vê qanûnê derpêş nekir. DQB jixwe ji ber xwe ve betalkirina wê qanûnê nikare bixwaze. Yek ji şaşiyên mezin ên Haşim Kılıç jî ev bû. "Di serîlêdana ferdî de heke nelêtiya qanûna bingehîn a rêzikekê bê tesbîtkirin an jî angaşteke wiha bê kirin, lijneya giştî di heman demê de nelêtiya qanûna bingehîn a wê rêzikê digihîne biryarekê an nagihîne?" ev nîqaş hebû. Me got, "Bigihînin, bikin." Nekirin. Niha Tirkiye êşa wê pir dikişîne.

Qanûnên wisa hene ku tu dadger newêrin nelêtiya wan a qanûna bingehîn derpêş bikin. Ji ber ku ew dadgeh jî derpêş nake, tu kes nikare nelêtiya qanûna bingehîn a wê qanûnê bîne rojevê. Temam, dê çawa çêbe? Bi têkoşîna siyasî dê bi salan biajo. Loma ev meseleya parêzvaniya fermî pir zêde girîng e.

Yek jî bi KHKyên di rewşa awarte de hikmên taybet anîn. Di dema rewşa awarte de her cure parêzvanî ji wan re hat sazkirin. Tenê ne parêzvaniya hiqûqî, cezayî, adlî, darayî, her cure parêzvanî... Ji rêzika 15an a qanûna bin-

gehîn a 1982yan, ku di serdema Kenan Evren de derket, berfirehtir ji bo xwe çêkirin. Mixabin ev jî kirin. Ji ber wê rewş ne baş e.

Yek ji neyîniyên herî girîng ên vê bêcazatiyê ew e ku di asta navneteweyî de bû sedema dejenarasyona mafên mirovan, dadgehên wekî DEMMyê ketine rewşeke wisa ku êdî nikarin nirxên xwe jî biparêzin. Xebatên lobîtiyê yên Tirkiyeyê bandoreke mezin li Konseya Ewropayê û DEMMyê kir. Saziyên mafên mirovan ên YNyê êdî ne çalak in... Lewre nayê hesabê Amerîkayê. Jirêderketina van her pênc endamên dayîmî, di nirxên mafên mirovan de bû sedema dejenarosyoneke mezin. Çima ku YE li şertên mafên xwe yên bingehîn xwedî dernakeve û berjewendiyên xwe yên siyasî û aborî di ser wan re dibîne, ev jî hêzê dide desthilatdariya welatên mîna Tirkiyeyê. Di demên dawî de pirsgirêka me ya herî mezin, pirsgirêka ku em ji heqê wê nayên, helwesta DEMMyê ye.

Pirsgirêka li Tirkiyeyê pir komplîke û pir berfireh e. Ji loma teqez divê bi paşeroja xwe ve rûbirû bibe. Me wek Komeleya Mafên Mirovan bi rêya parlamenterekî qanûnek pêşniyaz kir. Serokwezîr Erdoğan derbarê Komkujiya Dêrsimê de gotibû, “Heke lêborîn be, lêborîn dixwazim.” Me jî got: “Lêborîn wiha nayê xwestin. Qanûnek tê derxistin û bi qanûnekê lêborîn tê xwastin.”

Ji Meşrûtiyeta Duyem a 1908an, ji Raperîna 31ê Adarê heta îro; Ji salên ku Îttihat Terakkî hatiye ser kar û fikrên xwe xistine meriyetê û pê ve, divê Tirkiye bi raboriya xwe re rûbirû bibe û proseyekê pêk bîne. Komkujiya Ermeniyan, komkujiya Dêrsimê, qetlîamên li Kurdan hatine kirin, binpêkirinên dema derbeyê, binpêkirinên di girtîgehan de, binpêkirinên li muxalefeta rejîmê, her cure binpêkirinên li kesên komunîst, dîndar û hwd. Binpêkirina mafên derbarê kesên ku li gor Peymana Lozanê kêmar tên hesibandin, divê senifandineke binbeşî bê çêkirin, pêşî heqîqet bê derxistin û piştre bi heqîqetê re divê edalet bê nîqaşkirin.

Ango yan hûn ê bibêjin edaleta vehêner yan jî hûn ê biçin edaleta cezayê. Li Tirkiyeyê, heke em rast bibêjin, bi fikra min rêya edaleta cezayê tune ye. Di qetlîama Roboskiyê de jî edaleteke cezayê pêk nehat ku qetlîameke pir nêz e. Di bodrûmên Cizîrê de, derbarê wan mirovan de jî ku bi saxî hatin şewitandin, wek gumanbar hê îfadeya kesekî nehatiye girtin. Ev di dawiya 2015an, di serê 2016an de qewimî. Hê ev bûyer nû ne û îro wek gumanbar îfadeya tu kesî nehat girtin. Ji ber vê bi ya min, divê mijara edaleta vehênêr zêdetir bê axaftin.

Lê ya herî girîng heqîqet e. Lewre divê ev civak bi heqîqetê re rûbirû bibe. Kesên ku xwe wek Tirk bi nav dikin divê bi heqîqetê re rûbirû bibin. Li Tirkiyeyê pirsgirêka herî mezin rûbirûbûna dewletê ye. Lê divê tenê ne dewlet, civak jî rûbirû bibe. Lewre dawiya dawîn -yên ku xwedî bîra dîrokî ne,

dizanin- piştî her komkujiyê hin kes tên şirîkkirin ji vê re. Erd û milkên qurbaniyên komkujiyê hatine desteserkirin, dest danîne ser mîrateya wan.

Ez ê tesbîteke xwe ya ecêb bibêjim û biqedînim. Herî dawî ku aştiya îmarê derket, min meraq kir, li Tirkiyeyê ev aştiya îmarê çawa çêbûye? Jixwe di wexta Ataturk de çêbûye, hûn dizanin: Piştî mubadeleyê yên çûne û hatine, jinûve-sazkirina milkan... Menderes di 1956an, Özal di 1984an, Tayyip Erdoğan di 2017an de. Milkên ku Dewleta Komara Tirkiyeyê desteser dike, di her sî - sî û pênc salan de welatî jî desteser dike û li hev parve dikin. Ev jî mijareke zêde girîng e. Ji ber vê divê civak bi raboriyê re rûbirû bibe.

Ez li Qersê, li gundekî Ermeniyan ji dayîk bûm. Kalikên me ji Dêrsimê hatine, koç kirine, piştî Komkujiya Ermeniyan qewimiye, wan li gundên ji Ermeniyan hatine valakirin belav kirine. Hê di wexta Osmaniyan de dane wan. Ez ji malbata xwe re dibêjim: "Ev ax ne yên me ne." Ez qet xwe aîdî vir hîs nakim. Lewre ev aşkere ye, dema ku mirov diçe dibîne, maleke Ermeniyan, maleke ji keviran hatiye çêkirin. Malên sed, sed û pêncî salî ne, lê ev yên we ne.

Loma divê civak jî rûbirû bibe û vê qebûl bike. Divê qebûl bike ku şirîk e li neheqiya hatiye kirin, da ku em bikarin bi trawmaya civakî re serederî bikin. An nexwe ne mimkun e em serederî bikin. Ku em vê bikin, ez tu car nikarim bibêjim, "Di dahatûyê de binpêkirinên mezin dê çênebin." Nêrîna ku min ji tecrûbeya xwe derxistiye ev e: Heqîqet dê derkeve meydanê, em ê bi heqîqetê re rûbirû bibin. Belkî jî wê wextê em dikarin hesab bidin û bipirsin. Gel bi dildarî çiqas dikare tev li vê pêvajoyê bibe. Kes naxwaze tev lê bibe.

Ez duh li Rîzeyê bûm. Li kolanê meşiyam, çend sed metro meşiyam, min wiha lê nihêrî. Wek orijîn, şexsiyet Laz, wek tîpolojiya nijadî Tirk pir kêm in. Komên nijadî yên cuda cuda. Lê hemû ketine ser xalên cuda cuda yên ecêb. Bişaftinê mehf kiriye. Em nebêjin bişaftin û derbas nebin, bişaftin berdewam dike. Jixwe ev bişaftina çandî her berdewam e. Ji ber vê em hemû wek perçeyekî civakê divê em tev li rûbirûbûnê bibin. Belkî ji bo vê hewce ye, em piçek serê xwe biêşînin. Ji ber ku pir sûcên giran hatine kirin, em her tim bala xwe didin wir. Lê ji aliyekî din ve jî mijarên ku em pê re eleqedar nabin hene.

Piştî komkujiya Ermeniyan, girtin keçikên biçûk dan malbatên leşkeran û ev mijara 'wek zarokê malê girtine' pir hat bikaranîn û li ser wê roman hatin nivîsin. Ser meseleyê hûn dizanin, Alparslan Türkeş hîn dibe diya wî Ermenî ye. Diçe Ermenistanê. Serî li muzexaneya komkujiyê dide. Kulîlkan datîne ber abîdeya komkujiyê. Dîmenên vê hene. Ez vê li gorî hin agahiyan dibêjim û gelek tiştên di mêjiyê wî de diguherin. Lêbelê umrê wî têrê nekir, bi fikra min ew jî weke Özal bi guman mir.

Mesela rehmetiyê Hrant Dînk çima hat kuştin? Lewre got Sabiha Gokçen, keçeke Ermenî ye. Ji ber wê gef lê xwarin. Sedema esas ew e. Baş e, rejîmek xwe çawa wiha dikare bidomîne? Êdî di dewra me de etnîsîteyên cuda bi rastî hêz didin civakê, ne dewlemendî, ew tiştekî cuda ye, tiştekî were pîvan. Divê ev êdî bê qebûlkirin. Lewre rastiyên sedsala 21an e, nêrînên însanan guherîn û ne weke berê ye. Ji ber vê, bi fikra min ev pir girîng e.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Bi ya min, ev meseleya rûbirûbûnê, bi taybetî ne rewşeke tenê ji bo Tirkiyeyê ye. Li welatên din jî tiştên cuda hene. Ji ber ku înkareke cidî heye... Heke dest bi rûbirûbûnê bê kirin, ji bo hemû beşan dê tiştek derkeve holê. Ser meseleyê ez li Mêrdînê dijîm. Dêrikî bi rihetbûna xwe, tew bi laîkbûna xwe pesnê xwe didin. Min rojekê îdare nekir û li nexweşxaneyê ji hevalekî xwe re got: “Hûn Dêrikî ne, hûn ne Ermenî bin.” Lewre êdî min îdare nekir ji ber vê pesindayînê. Ev mînakek bû. Mesela hevaleke min a din a Kurd jî got, “Hûn amade ne rûbirû bibin bi Suryaniyan re?” Di mijara erdan de. Bi heman awayî ev ji bo Qibrisiyan jî derbasdar e. Wek hemûyan dapîra min jî niha di maleke Rûman de rûdine. Ji ber vê, a rast divê hemû komik bi hin tiştan re rûbirû bibin û ji min tirê ev mirovan ditirsîne. Ez bi vê ve girêbidim, hevalekî min ê derûnnasê klînîkê, bi ciwanên Ermenistanê re dixebite, lê bi xwe jî Tirk e û rojek pir zêde diçe bi ser ciwanên Ermenî... Paşê min di vîdeoyê de dîmen temaşe kirin. Ji wan re wek derûnnas vê dibêje: “Hewce ye em nasnameyeke nû ya Tirk ava bikin, ji loma em nikarin vê wek derûnî qebûl bikin.” Min got, “Te heqeten te wisa go?.” Got, “Lewre wek derûnî rastiya vê ev e.”*

**Beşdar:** *Dema min li we guhdar kir, li gel hemû hişyariyên we, hêvîsariyekê ez dîl girtim. Lê ji aliyekî ve jî min di dilê xwe de digot, ‘mirov dikare çi bike’, ‘hewce ye çi bê kirin?’ Ango ji bo vê em tev li van xebatan dibin. Em di lêgerîna bersivan de ne. Bi taybetî, heke hûn bikarin behsa zehmetiyên xebatan bikin belkî piçek feyz û wêrekî bide me. Ji ber ku em mirovên di serê rê de ne. Yek jî, dixwazim pirseke teknîkî bikim. Dema hûn bi saziyên din re koordînasyonê saz dikin, çiqas zehmetî dikişînin? Lewre IHD saziyeke pir zêde taybet e. Saziyeke wisa taybet e ku heta dewlet jî teredud dike dest bidê. A rast divê IHD bibe otorîteyek. Divê gotina wê her dem bi taybetî ji aliyê muxalif û bindestan ve bê guhdarkirin. Ango partiyên siyasî –çend partiyên me yên giran ên siyasî hene– di çi astê de dikarin bi we re koordînasyonan deynin? Mesela bobeleta Roboskiyê hat serê me. Hê jî li cem me hemûyan ne zelal e. Herî dawî li ser vê, partiyeke siyasî xwe-rexneya xwe da, li ser teşebusa birina DEMMyê ya pêvajoyê. Gelo IHD di nav vê pêvajoyê de bû an jî xaleke hêviya we şikandî çêbû an jî hûn pişt re tev lê bûn? Belkî ev xaleke destpêkê ya baş be ji bo xebata hevpar bi saziyên din re.*

**Beşdar:** *Gava din, dema min behsa guherîna binyada dadgehan kir, min qesta vê dikir: Dema li pêvajoya çareseriyê bê nihêrtin jî cudahiyek dibînim. Mesela DQB, di biryara xwe ya YouTubeê de, di biryara xwe ya Twitterê de, di biryarên xwe yên li ser astengkirina ragihînê de qebûl kiribû ku bêyî bikaranîna rêyên hiqûqî rasterast serîlêdan bên kirin. Heta biryara îhlalê jî da. Wê demê TIB [Serokatiya Ragihandinê ya Telekomunîkasyonê] hebû. TIB ketibû şûna dadgehê -saziyeke îdarî-, wek dadgehê biryar dabû. We gava din behs kir -ev pir li rewşa failî meçhûlan dike- qanûnek hatiye derxistin, ev ne qanûnek e were texmînkirin û hêvîkirin. Ya rast divê rasterast serî li DQByê bidin. Li vir dîsa bi fikra min ev pirsgirêk bi Meseleya Kurdan ve têkildar e û ez vê meraq dikim. Endamên DQByê tên guhertin. Herî dawî yekî bi navê Yıldız Seferioğlu tayînî DQByê kirin. Ew jî parlementerê kevin ê AKPyê bû. Êdî endamên ku Gül tayîn kiribûn diguherin, ber bi endamên Erdoğan tayinkirî ve diçe. Bi pêvajoya çareseriyê, derbasbûna pêvajoya pevçûnê re, em dibînin ku endamên dadgehan guherîn. Gelo ev rewş dê encamên çawa derxe? Lewre DQB derbarê Öcalan de biryara îhlalê da. Vê di pêvajoya Osloyê de deng dabû. Parastinên ku Abdullah Öcalan li DEMMyê kiribûn, ji ber ku di dema çapkirinê de hat desteserkirin biryara îhlalê hat dayîn. Lê heman dadgeh li ser Roboskiyê îcar biryara redkirinê da. Bawer im li Ewropayê di nav DEMMyê de tiştek tê sazkirin di lehê Tirkiyeyê de. Bi taybetî ji ber polîtîkayên penaberan, ji aliyê hin saziyan ve, weke ku toreke Tirkiyeyê diparêze heye. Ez meraq dikim ka hûn li ser vê mijarê çi difikirin.*

**Beşdar:** *Li ser vê mijara rûbirûbûnê we edaleta sizayê na lê edaleta vehêner pêşniyaz kir. Wek gundê we, gundê min jî gundekî Ermeniyan e. Erd jixwe bê tapo bûn. Piştre re karên tapokirinê hatin kirin. Her kes li cihekî hêwirîbû. Kesên pispor gotin: "Ev a wî ye, ew a wê ye." Gelo ev komîsyonên edaleta vehêner, dema em rûbirû bibin, van milkan dê li xwediyê wan ê heq vegerînin? Ango di encamê de, dê mafên maddî û manewî yên deyndêr bên dayîn, dê xisara wan bê telafîkirin?*

**Beşdar:** *Piştî 15ê Tîrmehê derbarê serîlêdanên siyasî yên penaberiyê de ku ji welatên din re hatine kirin, we got me raporek ji Îdareya Penaberiyê re pêşkêş kiriye. Çiqas bala xwe didin vê û mesela di vê pêvajoyê de serîlêdanên ferdî yên ji we re tên hene? Heke hebin hûn dikarin alîkarî bikin? Lewre niha gelek kes tên darizandin. Dûçarî heman pêvajoyan dibin.*

Tiştên ku ez dibêjim meseleyên pir micid in û dibe wêrekiya we bişikê. Dema ez dibêjim, "Bila wêrekiya we neşikê" qesta min ev e: Em, weke mirov, dixwazin di civakeke çawa de bijîn? Em dixwazin bibin mirovekî çawa? Tiştên me hemûyan hene ku em hemû pêşî ji malbatê, dû re ji derdorê, ji dibistanê, ji hawirdora xwe hîn bûne. Ango em dikarin çiqas li hemberî neheqiyan bisekinin? Gelo em edaletê dixwazin? Têgehên pir hêsan in. Em hemû, mirovên

birûmet in. Ya ku hûn naxwazin di civatê de li we bê kirin bi rastî rûmeta we ye. Loma hûn dixwazin bi her kesî re wekhev bin. Ji aliyekî ve hûn dixwazin azad bibin, lê hûn edalet û aştiyê jî dixwazin. Heke hûn van biparêzin, ev bes e. Ya girîng ji bo we, hebûna aramiya we ya hundirîn e. Pir girîng e ku hûn bi xwe re xweşhal bin. Zexta ji derve tê, dê her dem hebe. Lê heke aramiya we ya hundirîn hebe, heke hûn wê bi xweşabûnê bikin, jixwe hûn ê vê xebatê bimeşînin. Mirov hêza xwe ji vir, ji hundirê xwe digire.

Yek jî, bê guman her kes xwedî şexsiyet û kesayetiyeke taybet e. Her kes nikare têbikoşe. Hin kes hindik, hin jî pir lê di dawiyê de her kes nikare bi heman radeyê beşdarî xebatên parêzvaniyê bibe. Hin kes dikarin piştgirî bidin vê. Ser meseleyê, li Tirkiyeyê di têkoşîna mafên mirovan de mirovên bi salan alîkar hebûn, her çend ew ne li ber çavan bûn jî. Gava hûn bikevin nava civakê, bawer bikin, hûn ê hêza têgeha mafên mirovan a efsûnî û bisêhr bibînin. Lewre her kes vê dixwaze. Li vî welatî, dirûşmeyên “Bila qehr bibe mafên mirovan!” dan gotin, lê yên ku wê dirûşmeyê dibêjin jî hewceyî mafên mirovan in. Li Tirkiyeyê mînakên vê heta hûn bibêjin zêde ne. Tiştekî ecêb e, Tayyip Erdoğanê ku girtiyekî siyasî bû, niha bi hezaran girtiyên siyasî yên mîna xwe afirandin. Li aliyekî jî mînakên wiha jî hene. Ji ber vê, bi ya min a girîng li vir ev e; heke aştiya we ya hundirîn hebe, heke cehda we ya têkoşînê hebe, ev bes e. Ji derveyî vê, ya rast ez nikarim pir tiştekî zêde bibêjim. Ev li gor kesan diguhere.

Bê guman, têkiliya IHDyê bi partiyên din ên siyasî re heye. Li gel HDPyê heye. Car caran, CHP di mijarên girîng de me vedixwîne û bangî hin civînên xwe dike û em bi hev dişêwirin. Partiyên din ên siyasî yên cuda... Em di heman demê de, ji bo demokrasiyê têdikoşin û em dikarin di demên pir dijwar de gelek partiyên siyasî û komên civakî bînin cem hev. Hûn dikarin asta vê meraq bikin. Qet nebe em dikarin ji sedî pêncî-çilê Tirkiyeyê bînin cem hev, lê hin beş hene jixwe naxwazin bên cem hev. Potansiyela me heye ku em ji sedî sed bînin cem hev, lê carinan ew ne di destê we de ye.

Parêzvanên mafên mirovan, li cihê agir pêketî ne. Dema hûn bi pirsgirêka herî giran re mijûl dibin û helwesta xwe diyar dikin, partiyên siyasî ku bi polîtîkayên xwe, çareseriya meseleyê asteng dikin û dibin sedema domandina binpêkirinê û jixwe ji we dûr dikevin. Bizanin ev mijara yekem e ku ew ê bi we re biaxivin. Mijara yekem a ku ez ê bi MHPyê re biaxivim Meseleya Kurdan e, mijara yekem a ku ez ê bi AKP, CHP û İyi Partiyê re biaxivim dîsa Meseleya Kurdan e. Lewre pergal xwe li gorî vê saz dike. Ev netew-dewleta bîrdoziya klasîk, bişafker e. Tu li aliyê netew dewleta bişafkerî an li aliyê komara demokratîk î? Evqas hêsan e! Tu li aliyê veguherînên Ewropayê yî an hîn jî di feraseta 1930î de yî?

Împaratoriya ku roj lê naçe ava ya Îngilîstanê jî çareseriyên şer derbas kirin. Heta Îngilîstana li dinyayê hikûm dike jî. Pêdiviya wê jî tune bû. Ku bixwaze kapasîteya wê heye ku sed salî şer bike, lê ew guherî û vediguhere. Çima tu hîn jî serhişkiyê dikî, dibêjî her kes dê bibe Tirk? Niha tiştekî ez bi vê re biaxivim jixwe tune ye. Ez tenê hewl didim wê qanih bikim, wê ji vê ramana derewîn dûr bixim. Em hê jî bi kesên xwedî ramana pir prîmîtîf re têdikoşin. Hin caran em asê dibin. Bi rastî ez nikarim bawer bikim. Dînê ku ew bawer dike vê nabêje. Wî, dîn û bîrdoziya xwe guherandiye. Bûye tişteke ecêb. Hûn ê çawa qanih bikin?

Ji ber vê em ê pişt daneynin, em ekserî ne. Em ê teqez veguherîna pergaleke demokratîk a piralî pêk bînin. Civaka Tirkiyeyê xwedî vê tecrûbeya şer e. Em pir tiştan dibêjin, lê bawer bikin ez her dem vê dibêjim: Têkoşînê ev hemû xirabî fêrî me kirin, me çanda demokrasiyê afirand û ev pir girîng e. Ji bo vê, jixwe em vê têkoşînê didomînin. Em bê hêvî filan nînin, wisa nefikirin. Lê li beramberî pirsgirêkên kangren jî... Ji ber vê ez ê werim ser edaleta vehêner. Rêyeke din tune ye.

Niha ew nikarin vî karî çareser bikin. Pakêta darazê li ber wan e, hejmar ecêb in. Her tişt berevajî bûye. Tirkiye wek bihuşta sûcdaran e; dizî, zordarî... Talan bike, cezayê wê tune ye. Hûn dikarin xala ku AKPyê aniye binêrin? Li dosyeyên sûcê, yên ku xortê endezyar ê ji Zanîngeha Teknîkî ya Stenbolê kuştin, binêrin. Hûn dikarin bifikirin gelo, tu dirûşmeyek bibêje...ji bo Demirtaş hikma dawî çar sal û heşt meh ceza hate birîn. Niha ji bo vê dewletê kîjan bi talûke ye? Demirtaş talûke ye, ew ne talanker e. Jixwe karê wê dewletê, hikûmetê qediyaye. Ew pergala ku bi qasî sûcên adî û rûreşiyê mezûr bibînin bi paş ketibin jixwe şansê wê yê jiyînê tune ye. Dema em dibêjin dejenerasyon, em qesta vê dikin. Ji ber vê, em rast in û em ê vê pirsgirêkê bi awayekî çareser bikin.

Di mijara Roboskiyê de daxilbûna me tune ye. Ger em li ser pirsgirêkekê rawestin, em micid radiwestin. Berê me êşa vê gelek kişand. Komîsyonên me yên hiqûqê heta dawiyê dişopînin. Berdewamî heye. Usûla Dadgeha Qanûna Bingehîn pir zêde hişk e. Ew nameya temamkirina kêmasiyê tenê ji parêzerekî re dişînin. Di dosyeyê de parêzerên bi destûrname pir in. Temamkirina kêmasiyeke hêsan, hemû mesele ev e. Gava hûn wê kêmasiyê di nav panzdeh rojan de temam nekin, hûn bersiva redkirinê digirin. Ji ber ku kêmasiyeke hêsan nehat rastkirin û ew belge di wexta xwe de nehat şandin, dosyeyê ji usûlê red kirin.

DEMMyê jî jixwe di demên dawî de, di meseleya siyaseta ewlehiya neteweyî ya Tirkiyeyê de topê diavêje ber Dadgeha Qanûna Bingehîn. Konseya Ewropayê naxwaze pir zêde dest bide van mijaran. DEMM ne wek salên 1990î ye. Wan

salan, wan tevkariya çareseriya van pirsgirêkan dikir. Di heyama paşîn de jî cudahî ev e: Dadgerên ji welatên nû yên ku piştî hilweşîna Yekîtiya Sovyetê ava bûne û dadgerên ji bloka rojhilata kevn hatin, kalîte kêm kirin. Wekî din, dagirkirina Ûkraynayê ji aliyê Ûris ve û binpêkirinên wê yên li wir... Li Ewropayê jî paşketinek heye. Di heman demê de di nirxên mafên mirovan ên cîhanê de kêmbûn û yek jî ji ber pereyan bandoreke lobiyê ya pir xurt a Tirkiyeyê heye. Dema ev tev bên cem hev, DEMM dibêje, "Jixwe mafê we yê serîlêdana şexsî heye. Rêya Dadgeha Qanûna Bingehîn bi kar bînin, wisa werin." Di meseleya Roboskiyê de jî got, "Dadgeha Qanûna Bingehîn mafdar e."

Em niha çi dikin? Em bi hevalên xwe re, ku parêzerên IHDyê jî tê de ne, li rê û rêbazên nû digerin. Ango, em li ser pêvajoyên wekî destpêkirina lêpirsînê û berhevkirina delîlan ji nû ve disekinin. Dê di Roboskiyê de dem pir dirêj bibe, lê çareyeke me ya din tune ye. Ji ber ku gelek mexdûr hene. Ser meseleyê, mîratgirên qanûnî yên miriyan hene ku qet serî lê nedane. Ji ser wan lêgerînek ji bo serîlêdanê heye. Hevalên me li ser vê mijarê dixebitin.

Dema qedexeya derketina derve, me bi daxwaza pêşgiriyê serî lê dabû. Dadgeha Qanûna Bingehîn di 2016an de serîlêdana me ya pêşgiriyê red kir. Serokê dadgehê diçe qesrê û ji bo salvegera damezirandina Dadgeha Qanûna Bingehîn, Serokkomar Erdoğan wî vedixwîne. Di derketinê de rojnameger pirsan jê dikin. Li ser biryara Can Dundar ku di navbera wan û serokkomar de nîqaş çêbûbû. Dadgeha Qanûna Bingehîn, derbarê Can Dundar de biryara azadiya derbirînê dabû. Ji bo parastina xwe, serok dibêje: "Em li ser polîtîkayên ewlehiya neteweyî ya dewletê li dijî hikûmetê biryarê nadin, ma em êdî çi bikin?» Gava hûn dibêjin polîtîkayên ewlehiya neteweyî ya dewletê, ev Meseleya Kurdan e. Ev gotinên serokê dadgehê piştre nehatin tekzîb kirin. Kanala Sputnikê û rojnameya *Cumhuriyet*ê, ev ragihand û ev gotin nehatin înkarkirin. Me ev jî ragihandin DEMMyê. Dadgeha Qanûna Bingehîn a Tirkiyeyê derbarê azadiya derbirînê de biryarên baş dide, derbarê mafên civîn û xwepêşandanê de biryarên baş dide lê di vê mijarê de nikare. DEMM jî di heman rewşê de ye. Konseya Ewropayê ji ber ku aliyê wê yê siyasî serdest e, naxwaze di vê mijarê de berpirsiyariyê bigire.

Ez werim ser meseleya ku em jê re dibêjin edaleta vehêner. Ew dibêjin: Naskirin, tezmînat, ax. Niha di vê mijarê de pirsgirêka axê tune ye. Tu yê pêşî meseleyê nas bikî. Rêya pêkanîna mexdûriyetê tezmînat e. Me derbarê Qirkirina Ermeniyan de ev jî got: "Hemwelatîbûn û tezmînatê bidin kesên ku dixwazin werin." Em bibêjin kesek hat û erdê xwe tespît kir. Buhayê wê çi be bila bê hesabkirin û heke dilê wî yê firotinê hebe bila bê kirîn. Lê hûn dikarin vê, pêşî bi dayîna hemwelatiyê bikin. Niha, piştî demek di ser re derbas bû, hûn bi her awayî nikarin gel qanih bikin. Loma divê ji derekê dest pê bikin û rêya vê naskirin û tezmînat e. Ev li dinyayê her wiha çareser bûye. Ew dibêjin

“ax” û hemwelatiyan ditirsînin, bi gotina “Ew ê werin erdê we bistînin.” Gava hûn wiha bibêjin, jixwe hûn nikarin rûbirû bibin û her kes dê xwe jê dûr bigire. Bi qasî tê bîra min, li dinyayê mînakeke vê tune ye. Ev bi gelemperî bi lêborîn û tezmînatê ye, heke mîratgirek zindî hebe.

Hin dozên ku li Amerîkayê hatin vekirin hatin qezenckirin. Niha parêzerên Tirkiyeyê, li vir erdê Ermeniyan, ku li ser navên weqfan û li ser navê xezîneyê hatine qeydkirin, tesbît dikin. Ger mîratgirên wan ên zindî hebin, ew diçin û wan li Amerîka, Kanada û Ewropayê dibînin û destûrname ji wan distînin. Dû re tên û li vir dozê vedikin. Lê heke ew li ser navê xezîneyê an jî li ser navên hin weqfan tomarkirî be, ew vê yekê dikin. Lê ew dîsa jî çareseriya hiqûqê diceribînin. Ew ê ji Tirkiyeyê dadgehek biryara vê bide.

Di mijara têkiliya bi Daîreya Penaberiyê re, jixwe mijara sereke, nirxandina derdora mafên mirovan a Tirkiyeyê ye. Ya yekem, gelo îşkence û kiryara xirab berdewam dike? Gelo mafên siyasî û bingehîn hatine misogerkirin? Ji ber ku heke mirovek serî lê dabe û li welatê ku jê hatiye, binpêkirinên mafên mirovan tune bin jixwe ew têne redkirin, lê eger binpêkirin berdewam bikin jixwe ev qonaxa yekem e. Hin caran ji derveyî welat, pêkhateyên pir taybet ji me dipirsin. Kesek wiha ku serî li me da. Pîvana me pir zelal e: “Heke tawanek li dijî mirovahiyê nekiribe, qebûl bikin.” Hin leşker, polîs, karmendên îstîxbaratê hene ku tev li sûcên li dijî mirovahiyê bûne. Em dibêjin: “Em nikarin wan tesbît bikin.” Em ê çawa tesbît bikin? Hûn ê çawa leşkerên tev li komkujiyê bûne tesbît bikin? Li ber destê me ew amûr tune ye. Em dibêjin, “Hûn welatekî mezin in, îstixbarata we heye, lê bigerin.” Ev prensîb e û divê hûn bi vê prensîbê jî bizanin. Tirkiye tev li komkujiyê bûye, di derbeyê de rêxistina wî têk çûye, reviyaye û çûye, heke îlticayî welatê te kiribe, tu yê lê bikolî. Hûn ê qebûl nekin heke vî zilamî li vir sûcekî giran kiribe, evqas hêsan e.

Mesela, muameleya ku Almanya kiriye li kesên tev li Komkujiya Sêwasê bûne. Almanya bi salan ev hincet nîşan da: “Li Tirkiyeyê cezaya muebeta giran heye. Ji ber vê sedemê ez nikarim îade bikim.” Lê dibe di navbera her du dewletan de peymaneke dualî bihata îmzekirin, dikarî bi vî awayî piştrast bibûya, jixwe êdî DEMMyê biryarên nû dan. Dixwaze kesên cezaya muebeta giran xwarine, roja berdana wan a bimerc bê dayîn. Ev jî sedema Almanyayê betal dike.

Ev cure mesele jî meseleyên hesas in, lê esas girîng in. Nêrîn û raporên me yên di vê mijarê de, teqez referans tên girtin. Jixwe çavkaniyên din tune ku referans bigirin. Ku hebe jî carinan ji me dipirsin. Di dema dawî de, hin saziyên aborî jî dest pê kirine nêrîna me dipirsin. Ev ne tiştekî xêrê ye. Di asta cîhanê de, hin saziyên aboriyê yên giregir jî hene ku carinan ji me dipirsin, “Em werin vir an neyên?” Em jî dibêjin: “Meseleya Kurdan çareser bikin, we-

rin. Heke hûn çareser nekin, neyên.” Bersiva me jî pir zelal e. Ku hûn çareser nekin, ev tê wateya şerê domdar.

**Beşdar:** *Xuya ye Buroya Hiqûqnasên Nûjen, pêvajoyeke zehmet derbas dike. Derbarê vê mijarê de belkî min nekarî bişopînim lê dengek ku were guhê me tune ye. Xebateke we heye gelo? Lewre wan hevalan derbarê muxalefeta Tirkiyeyê de karên baş dikirin. Fikra hebûna bêdengiyê li cem min serdest e. Wek IHD, xebateke we ya taybet çêbû gelo?*

Ew hevalên me ne. Ji bo ku li ser medyaya serdest û berbelav, reşkirineke giştî heye xuya nabin lê em dozên wan dişopînin, rewşa wan jî hem rapor dikin hem jî dişopînin. Di vê mijarê de jixwe pir kes tune ye. Yek Komeleya Hiqûqnasên Hevçerx heye, Komeleya Hiqûqnasên Azad heye û yek jî parêzerên IHDyê hene. Jixwe ev tenê man. Me derbarê wan de raporeke taybet çêkir: “Rapora Parêzerên di Bin Zexta Darazê de Li Tirkiyeyê.” Me ev rapor jî wergerand Îngilîzî û ji rêxistinên eleqedar re şand. Em ji nêz ve dişopînin lê di eslê xwe de, em kêm dimînin ku zexta raya giştî çêbikin. Lewre her kes di bin zexta darazê de ye. Belkî em bikarin vê biaxifin. Ser meseleyê em dikarin li ser pirsa, “Li ser vê çawa kampanyayeke çêtir tê kirin, kêmasî çi ne?” biaxifin. Derbarê Osman Kavala de hem li cîhanê û hem jî li Tirkiyeyê kampanya pêk tên lê bandorê lê nake. Lewre li hemberî me hikûmeteke ku bandorê jê nagire heye.

Hiqûqnasên Hevçerx, parêzeriya gel dikin û rola wan a di Komkujiya Somayê de pir girîng e. Hûn dizanin, di qezaya trênê ya Çorlûyê de, derbarê kesên jiyana xwe jidestdayî de, bi heman awayî karên baş kirin. Di gelek bûyerên civakî de, bi heman xebatan, xebatên desthilatdar aciz bike kirin. Ez qet ji bîr nakim, Selçuk Kozağaçlı û hevalên xwe jî li wir bûn. Qet tiştek nekirin. Kêliya em ji bajêr derdiketin, em ê biçûna hin cihan, di cih de avêtine ser wan û ew binçav kirin. Em dîsa vegeriyan. Em hatin, şer û pevçûn... Dewlet, tiştekî pir ecêb e. Dewlet di bûyera Somayê de pir aciz bû. Sedema esas parêzeriya doza civakî ye. Ez nafikirim ku sedemeke wê ya din hebe.

Di bûyera îşkenceyê de, di usûlên lêpirsîna taybet de, di usûlên lêpirsînê de tu yê çi bikî? Tu yê dozger çawa aciz bikî, çawa bêacizî û bêsekin tu yê daxwazname bidî? Ji bo parêzerên wiha biqutifînin, ev kirin. Niha wek rêya ewil, ji bo dengê gel bibirin berê xwe didin parêzeran. Li vir suîqesta ku li rehmetî Tahir Elçi hat kirin, dîsa suîqesteke li ser vê esasê bû. Me ev mesele di nava xwe de çareser kir. Çima, ji bo çi hat kirin, kê kir kêm zêde em dizanin. Di mêjiyê me de ev bûyer zelal e, tiştekî ku em li ser pir nîqaş bikin tune ye. Ji vî aliyî ve parêzerên ku parêzeriya doza civakî dikin, bi rêya darazê tên qutifandin û dikin xet bikişînin li ber lêgerîna ku gel ji bo mafên xwe dike. Ev hemû tişt bi vê armancê tên kirin. Mêjiyek heye ku vê dike.

Li hember wê jî em têkoşînê bi awayekî bêsekin didomînin. Ji aliyê din ve jî pirsgirêkên parêzeran ên muhîm hene. Di lêpirsîna rêxistina Fetullah Gülen de, hejmara parêzerên ku hatin binçavkirin û hatingirtin, zêdetirî sedî bû. Kesên ku hê jî girtî ne wek hejmar hindik in. Di civata me de, derbarê parêzerên bi van doz û lêpirsînan re eleqedar dibin, dozên hatine vekirin ji heştêyî zêdetir bûn. Di wê dozê de parêzerên ku tên darizandin, derdora sê sedî ne. Hejmara parêzerên girtî diguhere lê tu carî daneket binê bîstî. Her berdewam dikin.

## BEŞA HEFTEM

# NAVÇÎNÎ Û HÊSANKARÎ

*Şah İsmail Bedirhanoğlu*

Hema bibêjin li hemû deverên pevçûn lê heyî xebatên navçînî û navbeynkariyê jî hene. Çi li Afrîkaya Başûr çi li Îrlandayê û çi li Kolombiyayê, em hemû pê dizanin û me hemû bihîstine ku pevçûnên bi saya navçîniyê qediyayî û veguherî aştiyê hene. Di van xebatan de bandora navçîniyê pir zêde ye.

Li herêmên ku em lê dijîn jî, xwîniyên hev tu carî xwebixwe nehatine cem hev, nexwestine werin cem hev û li hev werin. Her hin kes an jî hin malbatên ku her du alî jî pê bawer in ketine navbeynê û bi karê navçîniyê rabûne ku aliyên xwînî yên pev diçin li hev bînin. Pevçûnên bi vî rengî ku li derûdora me qewimîne bi piranî bi aştiyê qediyane.

Nexasim pevçûnên di navbera rêxistin û dewletan de bi awayekî ji awayan bi navçînan re ketine têkiliyê. Piştî wê têkiliyê an rasterast dest bi diyalogan kirine an jî carinan destpêkirina diyalogê dûvdirêj bûye, carinan bi lezûbez, carinan jî dîsa li hev pev çûne. Carinan jî ew hewldanên navçîniyê bêencam mane. Lê qet nebe li wan deverên min qalkirî pevçûn bi saya xebatên navçîniyê gihiştine aştiyê.

Li Îrlandayê dema Bill Clinton hat ser kar –Çima ku malbata Clinton jî bi eslê xwe ji Îrlandayê ne, ev ji bo Îrlandiyan bûbû derfetek– û bi taybetî bi saya navbeynkariya CIAyê, hevdîtinan dest pê kir. CIA him bi gerîlayên IRAyê re him bi Serokwezirê Îngilistanê Tony Blair re rûniştiye û dest bi proseya aştiyê kiriye. Proseya ku nexasim bi saya serkêşên wêrek ên xwe xistî bin rîskê dest pê kir, axir bi aştiyê qediya. Bê guman di pêkhatina vê aştiyê de, rola Jonathan Powell mezin bû. Jonathan Powell, serşêwirmendê Tony Blair e û DÎSAyê jî berê ew vexwendibû Diyarbekirê.

Li Afrîkaya Başûr prose di ser Mandela re bi rê ve çû. Aliyekî wan ê dişibe me jî heye; wek hepsîbûna Mandela... Li Afrîkaya Başûr prose bi navçîniya hin karmend û saziyên sîvîl dest pê kir, paşê jî bi hevdîtîna yekser a Mandela û rêvebiriya De Klerk dewam kir. Tevî ew xetere hebû ku mîlîtanên Mandela wî wek xayin îlan bikin, Mandela bi awayekî biryardar hevdîtînên aştiyê domandin.

Li Kolombiyayê bi qasî nîv sedsalê pevçûnan dewam kir. Bi hezaran, bi sed hezaran kesî jiyana xwe ji dest dan. Lê bi saya Santosê Serokê Dewleta

Kolombiyayê, bi saya serkêşekî mîna Santos ê biryardar, ev prose gihişt asteke baş û serkeftî. Li Kolombiyayê proseya aştiyê di ser karsazekî re dest pê kir ku ew karsaz hevalê serkêşê FARCyê yê zaroktiyê bû. Ji proseyê jî axir aştî pêk hat. (Xweş, van rojan hin fermandarên FARCyê ragihandin ku dê dîsa dest bi têkoşîna çekdarî kibin. Lê zehmet e ku piştî vê wextê xelk piştgiriyê bide vê biryarê. Lewre FARC ket hilbijartinan. Di hilbijartinên azad de FARC negihişt armanca ku hêvî dikir. Ev aliyê meseleyê jî heye. Cudahiyên mezin hene di navbera têkoşîna gerîlatiyê û siyasetmedariyê de. Dibe hûn têkoşîneke çekdarî ya pir serkeftî bidin lê dema hûn daketin qadê û we dest bi siyasetê kir, dibe hûn ne serkeftî bin.)

Hê jî pevçûnên ku di sala 1983yan destpêkirî berdewam in, te dît di sala 1983an de PKK ragihand ku dest bi têkoşîna çekdarî kiriye. Her çiqas bi awayekî zelal nehatibe tesbîtkirin jî li Tirkiyeyê û li herêmê nêzî pencî hezar kesî di van pevçûnan de jiyana xwe ji dest dane. Car caran hevdîtinên mîna van qewimîne. Nexasim di dema Özal de –ez ê qasek din qalê bikim- wek hewldanên navsazî jî dostê min Cengiz Çandar navçîtî kiriye. Özal jî ji wan serkêşan bû ku xwediyê profîleke biryardar bû. Lê ne rewşa welêt a navxweyî amade bû ji bo vê, ne jî konjonktura navneteweyî. Axir bi mirina Özal ev pêvajo sekinî. Hemû qeneat di wî warî de ne ku Özal bi tesedûfî nemiriye.

Meseleya Kurdan meseleyeke wisa ye ku siyaseta Tirkiyeyê ya navxweyî, ya derveyî, jiyana ekonomîk û sosyal a Tirkiyeyê dîl girtiye, îpotek daniye ser pêşeroja kesên li Tirkiyeyê dijîn.

Piştî Özal hin hewldanên Erbakan jî çêbûne. Ew jî pir qels man. Her serkêşê siyasî ku li Tirkiyeyê bûye îqtidar, îlam serê xwe bi vê meseleyê re êşandiye. Hinekan bi feraseta ‘heta ku yek endamekî rêxistinê nemaye têkoşîna domdarî’ serî li rêbazên leşkerî daye, hinekan serî li diyalogê... Her serkêş îlam li ser vê meseleyê fikiriye ku bersivekê ji vê pirsê re bibîne; “Gelo ez dikarim bi projeyeke çawa dawiyê li vê meseleyê û van pevçûnan bînim.” Lê li aliyekî atmosfera siyasî a li welêt, li aliyekî pêşketinên navneteweyî berê siyasetê û siyasetmedaran dane deverên din.

Piştî AK Partî hat ser –nemaze piştî 2004an- hin pêşniyaz derbarê vê de ji Erdoğan re hatin û wî jî guh da wan pêşniyazan. Ji van pêşniyazan yek jî di sala 2005an de bû. Di destpêka 2005an de komek rewşenbîr diçin cem Erdoğan û jê dixwazin ku dema hat Diyarbekirê bila derbarê çareseriya Meseleya Kurdan de peyameke muhîm bide. Erdoğan, dema di 2005an de hat Diyarbekirê bi “Meseleya Kurdan meseleya min e” dest bi axaftina xwe kir û proseyek da destpêkirin. Proseyeke ku paşxaneya xwe hebû. Ne gotineke hema wisa bû.

Di paşxaneya vê de hin hevdîtin, hin nîqaş çêbûbûn. Lê wê demê cemaata ku a niha jê re dibêjin FETO şirîkê Ak Partiyê yê îqtidarê bû. Wê demê cemaat pêşniyazeke wiha li Erdoğan dike: “Em di Meseleya Kurdan de rêyeke wiha bidin ber xwe; em him operasyonên leşkerî bidomînin him jî pişta siyasetmedarên wan –jixwe piraniya wan bi kiryarên derqanûnî radibin, bi daxuyaniyên xwe, bi hin nirxandinên xwe û çalakiyên xwe- bişikînin lê em hin daxwazên Kurdan ên demokratîk jî bidinê.” Li ser vê Erdoğan bi hevalbendên xwe re –Efkan Alayê ku wê demê serşêwirmendê serokwezîr bû û walîtiya Diyarbekirê kiribû, bi kesên wek Yalçın Akdoğan û Hakan Fidan re– vê mijarê dinirxînin. Ew jî wiha dibêjin: “Ev jî rêbazek e lê tecrûbeyên dinyayê nîşan didin ku meriv bi kê re şer bike divê bi wî re rûne. Pêşniyazeke Îngîlîzan jî dê hebe ji me re.” Pêşniyaza hevalbendên Erdoğan jê re maqûltir tê û Proseya Osloyê bi vî awayî dest pê dike.

Mîna ku em a niha li kêleka hev rûniştine, rûdinin; rayedarên dewletê û rêvebirên PKKyê. Ev hevdîtin dest pê dikin. Cihê ku van hevdîtînan lê dest pê kiriye Oslo ye. Ji ber ku li Osloyê dest pê kiriye, navê proseyê jî wiha dimîne. Paşê hevdîtin li Berlînê, li Londrayê didomin. Bi piranî hevdîtin li Silêmaniyê pêk tên û nêzî hevdeh hejdeh caran li hev rûdinin. Dema ev hevdîtin didomin, cemaeta ku îro wek FETO tê binavkirin, di nava dewletê de, di nava îstixbaratê de, di nava teşkîlata polîsan de bi bandor e. Hemû agahî û mijarên sereke li ber destê cemaetê hene. Heke bala we kişandibe, te dît piştî ku ev hewldan bê encam man, ne PKKyê ne jî dewletê, di vê mijarê de aliyê din sûcdar nekirin. Axir hinekan ev hevdîtin aşkere kirin. Esas her du aliyan pê dizanî kê deşîfre kiriye lê aliyê dewletê bêhtir dizanî.

Paşê li Diyarbekirê operasoneke mezin pêk hat û gelek kes hatin girtin. Bînin bîra xwe, bi navê Operasyona KCKyê wêneyek di çapemeniyê de derket ku gelek kesên destê wan kelepçekirî hebûn. Piştî wê operasyonê û piştî wî wêneyî prose ket rewşeke aloz. Hevdîtin bê encam dimînin. Lê Sabri Ok, Mustafa Karasu û Zübeyir Aydarê ku di ber PKKyê de diçûn hevdîtînan, dîsa diçin û dibêjin: “Hûn ji aliyekî ve bi me re rûdinin, ji aliyekî ve hevalên me digirin.” Paşê Sabri Ok jî qala vê kir. Hakan Fidan dibêje: “Jixwe yên ku vê dikin, dixwazin hûn maseyê biterikînin.” Helbet aliyê PKKyê bi vê bawer nake. Di hevdîtînan de Proseya Xabûrê jî bê encam dimîne.

Dema meriv li dû xwe vedigere û lê dinêre, meriv fam dike ku esas her du aliyan jî hevdîtin sabote kirine. Heke ev mesele çareser bikira, Erdoğan dê bûbûya siyasetmaderekî xwedî karîzma li Tirkiyeyê û ev ne bi dilê cemaetê bû. Dîsa wê demê li Farqînê komek esker şandin operasyonekê ku esas neşandin operasyonê, “şandin mirinê.” Ku ne şaş bim bîst û du esker mirin. Paşê pevçûn ji nişka ve zêde bûn, pevçûn jî ne pevçûnên hema wisa bûn. Di wê pêvajoya pevçûnan de ku sala 2011an dest pê kir û heta Newroza 2013an

dewam kir, 980 kesî jiyana xwe ji dest da. Dema em li Îrlandayê dinêrin, di pevçûnên ewqas qerase de 900 kes mirine.

Di Berfanbara 2011an de bûyera Roboskiyê qewimî. Di bûyera Roboskiyê de derdora Ak Partiyê û Erdoğan di wê baweriyê de bûn ku hinekan jê re dafik danîne. Ev hinekî rast e jî. Îstixbarata dewletê û hinek derdorên îstixbarata navneteweyî wê demê agahiyan didin dewletê. Jê re dibêjin ku Bahoz Erdal û komek mîlîtanên çekdar hewl didin têkevin nava sînorên Tirkiyeyê û çalakiyeke mezin pêk bînin. Ev agahî çend caran li ser hev tê. Bahoz Erdal jî wê demê wek berpirsiyarê gelek çalakiyan di çapemeniya Tirkiyeyê de derdikeve. Di wê fikrê de bûn ku heke yekî wisa di pevçûnê de bê kuştin, dê ji wan re bibe sedema motîwasyonê û rajoriya psîkolojîk. Ev agahiya îstixbaratî ewqas mezin kirin ku… Şevekê, li gor agahiya Heronên Amerîkayê û Tirkiyeyê dê hin kesên bi çek nêzî sînor bibin û fermana “çi hewce be, bila bê kirin” tê dayîn.

Ez bûyera Roboskiyê wek 11ê Îlona Kurdan dibînim. Kurd daneketin qadan û protestoyeke mezin pêk neanîn û çalakî li dar nexistin. Tevî vê yekê di hemû civakê de bû sedema şikestineke mezin. Bi vê şikestinê hêviyên jiyaneke hevpar têk çûn û baweriya civakan bi hev nema. Aliyê hikûmetê ev şikestin hîs kir. Wê demê hevalekî karsaz li min geriya. Got ji Enqereyê hinek dixwazin te bibînin. Ne şaş bim Îlona 2012an bû. Ez çûm û min û Yalçın Akdoğan bi hev re firavîn xwar. Ji min pirsî bê ka rewş çi ye? Yê min aliyekî min ê xweşbîn tim heye lê vê carê min metirsiya xwe anî ziman û got dê welat parçe bibe. Wî jî wek min got, “Ez jî, aliyê hikûmetê jî wisa difikire.”

Dotira rojê ez û Beşir Atalay li ser telefonê bi qasî saet û nîvekê em axivîn. Ya ku min ji vê axaftinê derxistî; dewletê dest bi Proseya Îmraliyê kiriye û xeylî jî pê de çûne, dema me ew axaftin kir. Di nava siyaseta demokratîk de jî wê demê têkilî qut bûbûn. Agir ji devê her du aliyan -BDP û hikûmet- dibarî. Min jê pirsî û got “Ma diyaloga we heye?”, ne ji aliyê BDPyê ve ne ji aliyê rêxistinê ve tu diyalogeke wan çênebûbû. Bi min dabû zanîn ku di vî warî de pêdiviya wan bi rêxistinên sîvîl ên herêmê heye. Min got, “Haya me ne ji plan û projeyên rêxistinê heye ne jî yên dewletê. Em saziyên civaka sîvîl in. Di warê qedandina pevçûnan de heke tişek ji destê me bê em ê texsîr nekin.”

Du aliyên pevçûnan hene û tiştên ku me yê bikira divê bi dilê her du aliyan bûya. Xuya bû dewlet hinekî li ser xebitîbû, amade xuya dikir. Em li Diyabekirê bi hevserokên wê demê, Selahattin Demirtaş û Gültan Kışanak re rûniştin.

Min û Emin Aktarê serokê baroyê me dest bi sazkirina heyetekê kir. Di wê heyetê de IHD, ji muhafezekaran serokê MAZLUMDERê yê berê Yılmaz Ensaroğlu, balyozê berê Akın Ölçer, Cengiz Çandar, Osman Kavala, Avni Özgürel, Bekir Ağırdır hebûn. Selahattin Demirtaş jî Beşir Atalay jî ev ji me

re gotin: “Belê em vê hewldana erê dikin.” Digel vê, her du aliyan got ku hin kesên diviyabû ne di vê heyetê de bûna hene û divê ew ne di vê heyete de bin. Proseyeke wiha dest pê kir.

Navçînî him karekî zehmet him jî bi rîsk e. Ew rîsk heye ku her du alî jî we şaş fam bikin. Helbet derbarê hin bûyerên rojane de hin fikrên meriv hene. Paşxaneya hişmendiyeke meriv a siyasal dê hebe derbarê Meseleya Kurdan de. Ya kirîtîk ew e ku meriv karibe xwe ji van rizgar bike –ji aliyê her kesî ve dibêjim–, meriv her du aliyan fam bike û bi wan re empatiyê pêk bîne. Ku meriv karibe vê bike, îhtimaleke mezin meriv dê bi ser bikeve. Na ku meriv nikare vê bike, meriv dê ji hêla aliyan ve bê berterefkirin. Ez ê qasek din bi hûrgilî qala vê bikim, ji bo hûn meseleyê baştir fam bikin, min qala bûyera ku hatiye serê heyeta me kir.

Bi kurtahî ji hêla BDPyê û hikûmetê ve rewş ev bû. Yek jî, divê me diyalogek di navbera CHPyê û hikûmetê de çebikira. Beşir Atalay jî bi taybetî ev dixwast û digot; “Divê teqez em bi Kemal Kılıçdaroğlu re rûnin.” Lewre di têkçûna peroseya Xabûrê de bandora helwesta Deniz Baykal pir bû. Heqeten jî Deniz Baykal erd û ezman li hev rakirin. Yek ji wan aktoran bû ku prose têk bir. Li gor Beşir Atalay heke CHP muxalefeta vê bike, rêvebirina vê proseyê dê têkeve tengasiyê. Ew û Kemal Kılıçdaroğlu bêyî bidin çapemeniyê, pêşî li Stenbolê li hev rûniştin. Paşê li ber çapemeniyê carekê li hev rûniştin. Kemal Kılıçdaroğlu wiha got: “Erdoğan dixwaze çi bike bila bike, dixwaze dest bi çi bike bila be, em ê krediyeke bêdawî bidinê.” Erdoğan jî got, “Tu kî yî krediyê bidî min?” Piştî vê bersiva Erdoğan ewqas ked berhewa bû û em ji nû ve hatin serî. Paşê bi darê zorê hat ser hev. Wê demê Avni Özgürel û Yılmaz Ensaroğlu bûn ku nehiştin Kılıçdaroğlu ji piştgiriya proseyê vekişe.

Di 2012an de Proseya Îmraliyê bi lez û bez diqewimî. Êdî hatibû wê astê ku her kesî naveroka nameya Öcalan, ku di newroza 2013an de ji raya giştî re hatî aşkerekirin, meraq dikir. Qewimîn û pêşketin ewqas bi lez û bez bûn ku... bi rêya siyasetmedarên BDPyî di navbera dewlet, BDP Û PKKyê de hevdîtin pêk dihatin. Hikûmetê, bi ya min, xwast di ser me re hevdîtînên xwe yên digel BDPyê bipeyîtîne. Ew metirsiya dewletê hebû ku dema wan nameyek an jî peyamek şand, di nava BDPyê de hinek wê peyamê negîhinin cih an jî naveroka peyamê li ba xwe biguherin. Ji ber vê ev pêdivî bi wan re çêbûbû ku heman peyamê carekê jî di ser me re bigihînin rêxistinê.

Aliyê dewletê xebateke bi rêk û pêk û şidiyayî bi rê ve dibir. Qet nebe havdîtin hema bibêje bêyî rîsk dihatin kirin. Lê aliyê tevgera Kurdan têra xwe ne amade bû. Belkî ne li benda proseyeke wiha jî bûn. Ez vê him ji bo BDPyê him ji bo PKKyê dibêjim. Dawiya dawîn em qala kesên muhîm dikin ku sî salî şer kirine.

Sî salî şer hatiye kirin, bi hezaran kes hatine kuştin... Normal e ku di rewşeke wiha de alî ji hev bawer nekin. Nebaweriyeke nayê gotin hebû; him ji aliyê rêxistinê ve him ji aliyê dewletê ve. Ji hêla rêxistinê ve her qewimîn, her pêkhatin, her peyam wek kopmloyekê li rêxistinê didîtin; wer bawer bûn ku hewl didin rêxistinê tesfiye bikin. Vê jî paranoyayek çêdikir û rê li ber afirandina siyasetê digirt.

Nameya Öcalan a ku di newroza 2013an de hat xwendin, mêjiyê her kesî serobino kir. Di nava rêxistinê de bû sedema şaşwaziyê. Bi kurtahî di nameyê de digot dema şerê çekdarî xilas bûye û dem dema siyaseta demokratîk e. Piştî nameyê em li ser daxwaza dewletê digel heyetekê çûn wî aliyê Xabûrê. Piştî nameyê, heyeta BDPyê çûbû. Ku ne şaş bim, Sırrı Süreyya Önder, Selahattin Demirtaş û çend kesên din bûn. A ku me dît ev bû: Metirsiya “Dê çi bibe, em ê ji vir û bi şûn de çi bikin?”

Ya herî muhîm, herî krîtîk ku bibêjim ev e; heke armanca we lihevanîn be, pêkanîna aştiyê be û hewldanên we di vî warî de bin, divê hûn metirsiyên her du aliyan ên di derbarê hev de kêm bikin, ne ku zêde. Ser meseleyê di nava rêxistinê de û li ba Öcalan metirisyek hebe –ku hebû-, ya muhîm ew e ku meriv van zêde neke lê kêm bike. Çima ku em di navê de ne, em dişopînin. Piştî nameya Öcalan pevçûn rawestiyan, agirbest hat ragihandin. Dû re jî vekişîna bi şûn ve hat rojevê.

Wek Kurdekî dibe hûn asta muzakereyên li Îmraliyê destpêkirî pir kêm bibînin. Ez, em bibêjin ez wisa dibînim ser meseleyê. Çima ku ez wisa dibînim, ne rast e ez bi tiştên bandorê li hevdîtinan bike rabim. Hevdîtin dê berdewam bikin û berpirsiyarê hevdîtinan dewlet û rêxistin e. Ya navçînan ew e ku karê xwe yê navçîniyê bi awayê herî baş pêk bînin.

Heyeta me naveroka nameya Öcalan dizanî. Piştî Öcalan û Hakan Fidan li ser pêşnûmaya peymaneke ji yanzdeh xalan pêkhatî li hev dikin, Öcalan dibêje, “Bila Erdoğan van pêk bîne, em ê ji bo serokdewletiyê piştgiriyê bidinê.” Di civîneke heyeta me de qala vê kirin. Min jî qala gotina Öcalan a “Bila Erdoğan van pêk bîne, em ê ji bo serokdewletiyê piştgiriyê bidinê” kir. Nexasim ji rewşenbîrên Tirk bertekên pir mezin rabûn. Paşê hin hevalên ji nava heyetê li ser navê xwe nameyek nivîsîn. Name dane Sırrı Süreyya Önder da ku bigihîne Selahattin Demirtaş. Naveroka nameyê bi kurtahî wiha ye; “Kar û xebatên ku hûn dimeşînin bi qîmet in, hêja ne. Lê em piştgiriyê nadin serokdewletiya Erdoğan, di vê mijarê de hûn jî tu sozan nedin.” Nameyê didin Sırrı Süreyya Önder. Wê hefteyê Önder na lê Selahattin Demirtaş diçe Îmraliyê. Li ser vê Önder vê rewşê bi Demirtaş re parve dike û dibêje; “Name li ba min e, naveroka nameyê ev e û tu yê ji Öcalan re bibêjî.” Demirtaş jî naveroka nameyê radigîhîne Öcalan. Hevdîtinên bi Öcalan re dihatin qeydkirin; him bi nivîskî

him wek vîdyo. Hevdîtina Demirtaş a dawî bû bi Öcalan re. Öcalan diyar dike dê kî were hevdîtînan lê biryara dawîn dewlet dide.

Demirtaş dibêje: "Min ê nameyek bianiya lê li ba Sırrı Süreyya ma. Dibêjin hesasiyeteke rewşenbîrên Tirk a wisa heye." Öcalan nirxandineke ez jî pê re me dike. Dibêje, "Ez xebat û hewldana wan hevalan pê dizanim, bi qîmet dibînim û wan xebatan pîroz dikim. Ji hemûyan re jî hurmetdar im lê ne rast e ku heta hevdîtin dewam bikin, ev heval di ser fikrên xwe re bikevin pozîsyoneke wisa ku bandorê li vê proseyê bike," û bi rexneyî dibersivîne.

Ev rewş, aliyê hikûmetê hema bibêjin dihejîne. Hinek ji nava wê heyetê –heyeta ku ji xwe re dibêje em bêalî ne û ji her du aliyan xweser in- radibin û rê li ber aktorekî sereke yê vê proseyê dixin. Li ba hikûmetê karîgeriya heyeta me, esas wê rojê qediyabû. Paşê em wek heyet li hev civiyan. Nîqaşên dijwar çêbûn. Her çiqas piştî vê, xebatên heyeta me dewam kiribin jî hikûmet ji aliyê xwe ve bi pêbaweriya me bi guman bû.

Wek berê jî min qal kirî, tu amadekariyên aliyê tevgera Kurdan tune bû. Ji hêla amadekariyan ve hinekî qels bûn. Di van proseyan de du tiştên pir muhîm hene. Yek, "ziman û şêwaz" ya din, "gavên pêbaweriyê." Ji hêla ziman û şêwazê ve divê em qebûl bikin ku hikûmet pir baş bû. Qunciknivîs, aktorên siyasî her roj tiştek digotin. Tew yê ku di televizyonê de derketî û gotî "Öcalan mezintirîn fîlozofê serdema xwe ye," Yalçın Akdoğan e. Wê demê çi zimanê BDPyê çi zimanê PKKyê hişk bû. Şêwaz hişk bû; "Em qet jê ne bawer in, pê ne ewle ne," filan.

Ji hêla gavên pêbaweriyê jî hikûmetê qet hewl nedida. Di mijara 'girtiyên nexweş' de ku me gelek caran biribû pêşiya wan, hikûmetê nedixwast gavekê biavêje. Hikûmetê hewl dida hemû pozîsyonên bidestxistî bike mijara bazarê. Helbet AK Partî û Erdoğan bêyî amadekarî û bi qesta mijûlkirinê dest bi vê proseyê nekirin. Lê bêyî ku dijwarî û kûrahiya meseleyê li ber çavan bigirin, gotin "em ê di nava çend mehan de" çareser bikin. Dê çi bibe? "Dê Öcalan bangî rêxistinê bike, gerîla dê tevî çekên xwe werin teslîm bibin, em ê qanûnekê derxin û wan serbest berdin û wek xwîşk û bira bi hev re bijîn. Paşê em ê derbarê Çand û Zimanê Kurdî de hin guhertinên makezagonî bikin û proseyê biqedînin." Nêzîkatiyeke wan a wek "em ê bi erzanî jê derkevin" hebû. Aliyê tevgera Kurd jî ne amade bû ku ka dê ji ku dest pê bike.

Navçînî û navbeynkariyeke xurt di navbera her du aliyan de çênebû. Pêkhatin û xebatên heyeta me pir baş bûn. Piştî hinekên ji heyetê pozîsyona xwe guherîn, karîgeriya heyeta me nema. Tu saziyeke din tune bû ku her du aliyan jî fam bike.

Piştgiriya navneteweyî jî ji bo proseya çareseriyê tune bû. Erdoğan û derdora xwe ew wek projeyeke xwemalî didîtin. Rojavayê Tirkiyeyê jî pir piştgirî neda. Aktorên herêmê jî nedixwastin aştî pek bê. Lewre ji bo Îranê, Tirkiyeyeke bi PKKyê re lihevkirî na lê Tirkiyeyeke bi PKKyê re şer dike maqûl bû, hê jî wisa ye. Ji vê hêlê ve rayedarên AK Partiyê mezinahî û dijwariyên proseyê nedîtin. Ez nabêjim, "Me baş didît, em xwediyê feraseteke pêşdîtin û dahûrandineke bêhempa bûn lê ew ne wisa bûn." Wê demê yên Ak Partiyê pir ji xwe bawer bûn.

Lê hikûmetê di vê proseyê de xebateke muezzem a endezyariyê pêk anî. Bülent Arınç carekê wisa got: "Esas Öcalan merivekî baş e. Rojekê serokê me yê Bankeya Navendî ji min re got, 'Em li heman dibistanê bûn. Wê rojê esas dê biçûya mizgeftê lê neçû. Ku biçûya mizgeftê dê bibûya misilmanekî baş.'" Bülent Arınç, qunciknivîsan, siyasetmedaran, hemû qelemên xurt ên ku xebatên Ak Partiyê û kampanyayên wan ên derbarê têkiliya bi gel re bi rê ve dibirin, hewl didan ku Öcalan akredîte bikin. Lewre dewletê demeke dirêj Öcalan wek "Kujerê sebiyan," wek "serkêşê terorê," bi raya giştî dabû nasandin. Pêşî wek şeytanekî li civaka xwe dabû nasandin û niha jî dikir ku wek mirovekî baş pê bide nasandin. Hin zehmetiyên wê hebûn ku li ser Öcalan xebateke endezyarî ya bi vî rengî bi rê ve bibe. Aliyê dewletê hinekî ji heqê vê derket. Erdoğan jî di vî warî de xurtbûna xwe ya serkêşiyê bi kar anî. Ev peyam da girseya xwe; "Meraq nekin, ez ê tiştên baş bikim, bi min ewle bin!"

Hevdîtin geh baş geh xirab bi awayekî dimeşiyan. Şexsen ez ne li bendê bûm ku ji nû ve pevçûn dest pê bikin. Wê demê wexta li televizyonan ev ji min dipirsîn, ne ji ber tetmînkirina raya giştî, ji ber ku min bi xwe jê bawer dikir, min digot, "Nikarin dîsa vegerin ser pevçûnan." Heta Ricciardone yê Balyozê Amerîkayê hat Diyarbekirê, vê rewşê wisa dewam kir. Ricciardone piştî nameya Öcalan a duyemîn hatibû. Wê şevê bi karsaz û rêxistinên civaka sîvîl re rûnişt. Dema min jê pirsî "Derbarê proseya çareseriyê de hûn çi difikirin?" dahûrandinek –bi Tirkî jî dizanî- kir. Got, "Tirkiye mutefiqekî muhîm e ji bo me. Heçî kesên ku dixwazin aştî û aramiya xwe ya navxweyî pêk bînin, em digel wan hemûyan in û piştgirên wan in." Di dawiya axaftina xwe de got, "Min jî dixwast mîna we xweşbîn bim." Dema min ev bihîst niqutî dilê min ku dê Proseya Çareseriyê bikeve tengasiyê.

Navçînên li deverên din, kesên ku bi vê xebatê rabûne, çiqas xwe ji hestên xwe rizgar kirine? Em dizanin ku azmûnên baş hene di vî warî de. Yek ji wan Jonathan Powell e ku di proseya Îrlandaya Başûr de cih girtibû. Bavê Powell di çalakiyeke bombeyî de dimire ku gerîlayên IRAyê wê çalakiyê li dar dixin. Powell bi xwe şêwirmend bû. Dema digel Tony Blair bi gerîlayên IRAyê ve hevûdu dibînin, serokwezîr destê xwe dide gerîlayan lê ew naxwaze destê xwe bidê. Naxwaze lewre yên hemberî wî kujerê bavê wî bûn. Lê paşê xwe ji hestên xwe rizgar kiribû û bûbû yek ji aktorên herî girîng di rêvebirina pro-

seyê de. Negotiye, “Van kesan bavê min kuştiye û ez naçim cem wan.” Çend caran hat Diyarbekirê jî, tecrûbeyên xwe bi me re parve kirin. Kesekî muhîm e ku çûye deverên curbicur ên dinyayê û konferans dane.

Navçînî, wek min got meseleyeke zehmet e. Min wek Kurdekî siyaset jî kiriye, di saziyên sîvîl de jî cih girtiye. Dema em li naveroka hevdîtînên li Îmraliyê pêkhatî dinêrin, daxwazên ku Abdullah Öcalan xwastine, wek Kurdekî ez qet tetmîn nekirim. Lê di navçîniyê de referansa min ev bû: Bila ev pevçûn biqedin û şer raweste. Heke Kurd dê di siyaseta demokratîk de serkeftî bin, bila îro dakevin qadê, dûrî çekan bila siyaseta xwe bikin. Bila têkoşîna mafên xwe yên neteweyî di asta herî jor de bidin. Mesele ev e. “Öcalan ev xwast, ev nexwast, ev hindik xwast, dewlet wî dixapîne...” tu qîmeta van nîqaşan tune ye. Ya girîng ku tenê xalek be jî bila bihata îmzekirin, bila Öcalan jî me jî îmze bikira, bila pevçûn biqediyana û kesek nemira.

Ji 2013an û vir ve şeş hezar însan hatin kuştin. Belkî zêdetir e jî lê hejmara rast ne Ak Partî, ne PKK ne HDP; kesek nizane. Tu saziyeke sîvîl jî vê hejmarê nizane.

Dema xendekan pir însan mirin. Ez vê dibêjim, xwezî qet nebe proseyê pevçûn bidana sekinandin. Belkî ev tiştên ne xweş nehatina serê me. Pêşdîtin û feraseta siyasî tiştekî din e. Dîtina van tiştên nexweş û rîskan... Mixabin ne aliyê dewletê û AK Partiyê ne jî aliyê PKK û HDPyê, ev nedîtin.

Wek gotina dawî ez vê bibêjim; raya giştî min dizane, nas dike. Ez tu caran nebûme alîgirê AK Partiyê jî û yê HDPyê jî. Digel vê, wek Kurdekî di her platformê de min hewl daye Kurd bigihîjin mafên xwe. Dema proseyê car hebû min rexne li Öcalan dikirin lê bi giştî li gor min Öcalan yek ji wan kesên xwedî pêşbîn û feraseta siyasî ye.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Hevdîtinên ewil di 1993an de dest pê kirin. Paşê piştî 2008an dewam kirin. Di vê navberê de qut bû. Di navbera salên 1999 û 2004an de Proseya Îmraliyê heye. Di destpêka 1999an de, bi bangewaziya Öcalan yek ji Ewropa û yek ji çiyê du komên aştiyê hatin Tirkiyeyê. Öcalan wê demê wiha digot: “Ew ê werin, piştî darizandineke kin dê bên berdan û paşê hûn ê herin hezar kesên din bînin.” Bi taybetî ji bo balê bikişînim ser bandora neyînî ya Cemeata Gülen li proseyê kiriye, min xwast van bibêjim. Paşê komên aştiyê hatin. Mehkemeya Ewlehiyê ya Dewletê bi hişkeber nêzî meseleyê bû. Gotin; “Yan divê hûn bibin îtîrafkar û ji Qanûna Poşmaniyê sûd wergirin an jî di sînorê herî jor de em ê ceza bidin we.” Axir di sînorê herî jor de ceza dan wan. Ew pêvajo wisa berhewa çû. Piştî wê proseyê, cara*

*ewil Öcalan qala bandora neyînî ya cemeata Gülen kir. Ku ne şaş bim 2004 bû, ji bo Erdoğan got: "Ji wî re bibêjin, ev cemaet wî dorpêç dike." Ez vê jî lê zêde bikim.*

**Beşdar:** *Pêvajoya bi dû re neyînî bû. Ku avadaniya heyetê çawa bûya we yê ev astengî çareser bikirina? Di destpêkê de divê we di nava xwe de rêgezên xwe diyar kiribin derbarê şixulê heyetê de. Paşê hinek nameyekê dinivisîn –belkî ne bi qesta astengkirina proseya navçîniyê- lê daxilî mijarekê dibin ku diviyabû daxilê nebûna. Mesela îro ji bo sazkirina heyetekê pêşniyazên we çi ne? Bi ya we divê heyeteke çawa be? Yek jî, heyet bêhtir li ser mêran ava bûye wekî ku. Çend jin bûn nizanim lê ma pêkan e ku wê demê ji koma 'Hewldana Jinan a Ji Bo Aştiyê' çend jin jî di wê heyetê de hebûna? Pirsa min a sêyem: We got aliyê tevgera Kurdan ne amade bû. Li aliyekî dewlet, bi saziyên xwe, memûrên xwe, pere û çavkaniyên xwe; heta hûn bibêjin bes dikare li ser vê mijarê lêkolînan bike, tiştekî aşkere neke û li kêlekekê bide sekinandin heta roja xwe hatiye. Paşê ku roja xwe hat, dê refikan deyne ser maseyê, dîplomatên xwe bişixulîne, agahiyan bide hev û hwd. Li aliyê din tevgera Kurdan ku bi xebatên endamên xwe û kesên dildar li ser xwe ye, belkî hinek jî saziyên sîvîl hene, qet nebe di siyaseta sîvîl de. Esas şert ne wek hev in û di mijara amadebûnê de belkî jî derfet ne guncaw bûn wê demê. Hewce bû ku ji nişka ve têkeve nava lêkolîneke bilezûbez. Lê kar tê nagihîjin. Lewre şert û rewş bileztir diguherîn. Ji loma yê xwediyê dezavantaj aliyê Kurdan bû lê ku bixwastina, beriya wê amadekariyên xwe bikirina, prose dê baştir bi rê ve biçûya. Ez şiroveyên we yên derbarê vê de meraq dikim.*

Sazî û dezgehên dewletê hene. Ji dezgehên fikr û ramanî, ji akademiyê, ji dîplomatan ji dinyayê sûd werdigirin. Qet tiştek tune be, rêxistineke muezzem a îstixbaratê heye. Bi îstixbarata dewletên din re di pêwendiyê de ne, hemû çalakiyan dişopînin û dibînin. Belê newekheviyeke mezin heye di vî warî de. Digel vê, rêxistineke ev sî sal e şer dike li hember me ye. Li ser rûyê dinyayê rêxistina herî xurt e, di qada navneteweyî de Kurd li kû hebin li wir bi rêxistin bûye, hema bibêje li hemû welatên dinyayê nûnertî vekirine... bivê nevê meriv dikeve hêviya performansekê, dema me ew performans nedît, em man şaş. Qet ne amade bûn.

Derbarê pirsa heyetê de dikarim vê bibêjim: Li ser daxwaza Beşir Atalay a "Tiştekî hevpar bikin û hêzê bidin proseyê, bendewariya me ji we ev e," heyet ava bû. Lê me daxwazên her du aliyan ên wekî "Bila ev tune bin, ew tune bin" li ber çavan girtin. Belkî em jî bê tecrûbe bûn, em bi destlepkê dimeşiyan.

Li ser meseleya jinan... çend jin hebûn. Ji civata muhafezekaran jî jin hebûn. Erê wek hejmar hindik bûn lê hebûn. Her du aliyan jî angajmanên siyasî û

kesên nasnameya wan a siyasî derketî pêş nedixwastin. Dema me heyet saz dikir, me du krîter dan ber xwe: Çeşîtdarî û nûnertî. Ji Kurdan, ji rewşenbirên Tirkan, ji çepgiran, ji rastgiran, ji jinan, ji muhafezekaran, ji her aliyî... Me hewl da ku bi çeşîtdariyê kompozîsyonekê çêbikin. Helbet dema me ew çeşîtdarî çêkir, me hewl dida ku kesên berê ji bo aştiyê ked dane tê de cih bigirin. Me ew kesên ku di vî warî de xwedî fikir û hewldan in tercîh kirin.

Wek min gava din jî gotî, hin ji endamên heyetê ku li dijî rejîma serokdewletiyê û serokdewletiya Erdoğan bûn çima ku bi lez û bez pozîsyona xwe aşkere kirin, me li cem dewletê pêbaweriya xwe wenda kir. Paşê xebatên me dewam kirin, di çarçoveyeke tengtir de em bi hin xebatên dîtir rabûn. Lê heyetê dikaribû bibandortir bûya. Yê ku fikra Mirovên Aqilmend da dewletê ev heyet bû. Me dozdeh nav pêşniyaz kirin lê ji şêst û sê kesan pêk hat. Dîsa yê ku Lijneya Şopandinê pêşniyaz kir ev heyet bû. Heke di wê mijara min qalkirî de pozîsyona xwe aşkere nekira, dibe sûda heyetê bêhtir bigihîşta çareseriya meseleyê. Carinan di rê de qezayên wisa diqewimin.

**Beşdar:** *Min diplomasî xwendiye, têkiliyên navneteweyî. Ji loma di mijarên wek muzakereyên navdewletî, rêbazên pevçûnê de him bingeheke min a termînolojîk heye him jî min serê xwe hinekî bi dîrokê re êşandiye. Dîplomasî û çareseriya pevçûnan bi hin pêşqebûlan ve girêdayî ye. Lê beriya her tiştî di dîplomasiyê de ya ku pozîsyona aliyan a li ser maseyê diyar dike hêz e, xurtî ye. Ango peymanên navneteweyî bi hêza aliyê di şer de biserketî tên danîn. Bi vî awayî pevçûn tên berterefkrin, proseyeke nû, asteke nû dest pê dike.*

*Îro roja dawî ya Dibistana Aştiyê ye. Ya ku em qalê dikin jî aştî ye. Em bêhtir li ser navçîniya civakî û pevçûnên civakî diaxivin. Lê ji mêj ve, di hemû çalakiyan de ez rastî handîkapeke wiha hatim. Her kes mîna ku du erkên dewletê pev biçin diaxive. Pozîsyona we jî hinekî muzakereyên navdewletî tîne bîra meriv, bê karbidestî, mîna ku we jî gotî tenê birin û anîna nameyan. Lê hûn rewşenbîr in, pêşengekî civakê ne, sermayedar in û Kurdistanî ne. Hemû rewşenbîrên ku bi karê navçîniyê rabûne ev in.*

*Bi kurtahî, divê ruh hebe di pevçûnên civakî de. Em dikarin li Quranê binêrin bê ka li ser mijarê çi gotiye. Derbarê pevçûnan de gotineke wiha tê bîra min: Dibêje, "Heke du alî pev çûn, aliyê yê mafdar bigirin." Nabêjê "Navçîniyê" bikin. Ev di civaka me de jî di hemû civakan de jî wiha ye; dema du bira pev diçin, civat, cemeat bi vî awayî li hev dicive. Li ser wê esasê ku mafê yê mafdar bê dayîn bêhtir hakemek, otorîteyek tê sazkirin. Wek civak, tiştê ku em ji navçîniyê fam dikin ev e. Hemû çavdêriyên min, xwendinên min ên objektîf ên derbarê proseyê de ji min re dibêjin ku handîkapa herî mezin ya vê proseyê ev bû.*

*Hikûmetê prose di şexsê Erdoğan de, li ser esasê serokdewletiyê saz kir û bi gelek helwestan rabû ku ne li gor ruh û ehlaqê aştiyê bûn. Her wiha sedema herî mezin ku nehişt prose bigihîje tu encamê, têkçûna Erdoğan a di hilbijartinên Hezîranê de bû. Erdoğan bi metirsiya wendakirina îqtidara xwe ev prose bi destên xwe qedand. Li vir, hema bibêjin hemû civak li ser fikrê ye. Dibe gelek şaşî û xeletiyên PKKyê yên mîna vê jî hebin.*

*Ma nediviyabû rewşenbîrên Kurd û Tirk hinekî din wêrek bûna? Heta otorîteyeke ehlaqî ya mîna vê tune be, gelo aqilê we dibire ku meseleya pevçûnê çareser bibe? Lewre Erdoğan here jî, yekî din dê were û vê carê ew ê li gor berjewendiyên xwe tevbigere. Ez wek welatiyekî ciwan li ser vê fikrê me. Ji loma navçînî pir nakeve serê min û a rast hinekî jê dûr im. Dixwazim nîqaşekê bidim destpêkirin. Belkî çavdêriyên we bikin ku em bêhtir li ser vê meseleyê bifikirin û fam bikin.*

Xwezî wek hûn dibêjin pozîsyoneke me ya wisa hebûya û bandora me li ser her du aliyan hebûya û me xwe bida aliyê yê mafdar... Ev pozîsyon dibe aîdê kê be? Ev pozîsyon dibe aîdê dewleteke xurt be. An nexwe, ne pêkan e ku wê heyetê, bi wî halê xwe, xwe bida aliyê yê mafdar û ji îqtidarê re bigota, “Tu neheq î, Kurd biheq in!” Bi vê helwestê dê tu xêra me jî negihîşta proseyê. Wê çaxê em ê bibûna yek ji wan saziyên sîvîl ku xwe dane aliyê tevgera Kurdan a siyasî.

Jixwe hûn hemû kêm zêde pê dizanin meseleyê ji kû dest pê kir û li kû qediya. Helbet rola me tenê ne birin û anîna nameyan bû, wiha nehatibû plansazkirin. Ya ku min qal kir mîzansenek bû. Heyet bi gelek karan rabû ku ez niha nikarim bibêjim.

Ez yek ji wan karên herî muhîm bînim bîra we. Di 2012an de grevên birçîbûnê hebûn. Grevên birçîbûnê di girtîgehan de bi armanca mafê perwerdehiya zimanê zikmakî dest pê kir. Bi armanceke pir bilind dest pê kirin ku jê re sererastkirina makezagonê û guherandina pergala perwerdehiya Tirkiyeyê divê. Qedandina grevan bi hewldan û keda wê heyete pêk hat. Aliyê hikûmetê jî di vê mijarê de di nava bêçaretiyê de bû. Yên ku grev dabûn destpêkirin jî ji ber ku armanc pir bilind bû, nedizanîn dê kêngî biqede. Serokê Baroya Diyarbekirê yê wê demê Emin Aktar jî me jî pir hewl da. Dîsa bi hewldan û çareseriyên pratîk ên wezîrê dadê yê wê demê Sadullah Ergin, em ji wê pêvajoyê derketin.

Ne li gor mîsyona wê heyetê bû ku xwe bide aliyê yê mafdar. Wê demê biketina pozîsyoneke dîtir û me yê siyaset bikira.

Ku min şaş fam nekiribe, we got ku navçîniyeke mîna ya me tu xêra wê tune

ye. Ez ne bi te re me. Ne ku em bi wan xebatan rabûne loma dibêjim. Di destpêka axaftina xwe de min mînakên ji dinyayê dan. Her pêdivî bi xebatên wiha yên navçîniyê çêbûye. Binêrin, li Kolombiyayê berî ku prose dest pê bike, serokdewletê Kolombiyayê Santos, karsazekî ku hevalê serkêşê FARCyê yê zaroktiyê ye vedixwîne cem xwe, bi rojan pê re dimîne û li ser diaxivin bê ka dê vê meseleyê çawa çareser bikin. Hevalê xwe karsaz e lê hê jî têkiliya wî bi serkêşê FARCyê re heye, haya wan ji hev heye. Serokdewlet jî bi vê dizane. Xebat li ser vê dest pê dike û paşê saziyên sîvîl daxil dibin. Axir, di ser wî hevalê zaroktiyê re çîka ewil tê jenîn. Hevdîtin bi awayekî di ser navçînan re bi rê ve diçin.

Aliyan tu carî, li tu derê negotine, “Me şer kir, em westiyan, were em li hev werin.” Li vî welatî jî negotine. Eşîrên li herêmên me jî negotine. Du hevalan, du birayan jî negotiye. Divê hin hebin ku di vî warî de bandorê li wan bikin.

Lê em ne ew heyet bûn ku bi potansiyela xwe bandorê li aliyan bikin. Heyeteke ku bi aqlê selîmiya her du aliyan bawer, meseleyê kêm zêde dizane û ji gelek kesên paşerojeke wan heyî pêk hatîbû. Yên heyetê xwediyê bîr û baweriyên cihê bûn. Xala hemûyan a hevpar ew bû ku pevçûn demildest rawestin. Mîsyona me ya bingehîn jî ew bû ku di rêvebirina proseyê û di berterefkirina astengiyan de em hêsankar bin û cesaretê bidin aliyan. Peywira me ev bû. Ango ya me ew bû ku em derbarê lihevhatinê de cesaretê bidin aliyan û daxwazên wan ên bilind li hevûdu bînin û wan bînin ser xaleke hevpar. Xwezî em bandorker bûna.

Tiştekî asayî ye ku Erdoğan, beriya her tiştî li pêşeroja xwe ya siyasî bifikire. Serokê giştî yê partiyekê ye. Asayî ye ku partiya wî jî li îqtidarê bifikire. Dema rêveberiya Tony Blair bi IRAyê re rûdine, ji çapemeniya Îngîlîz kesek bi van hevdîtinan dihese û ji Jonathan Powell re dibêje, “Haya min ji we heye hûn çi dikin û ez ê vê aşkere bikim.” Aşkerebûna wê dihat wê wateyê ku pêşeroja siyasî ya Tony Blair diqede. Lê Tony Blair, beriya rojnameger, bi xwe aşkere dike. Dibêje, “Hin hevdîtinên me hene.” Li ser vê di anketan de rêjeya raya Partiya Karkeran dadikeve hejdehan. Dawiya dawîn ev partiyeke siyasî ye û ji loma Tony Blair ditirse. Axir asayî ye ku partiyên siyasî li van tiştan bifikirin. Lê Erdoğan di vê mijarê de pir bi metirsî tevdigerî.

**Beşdar:** *Pêbaweriyek dan we gelo? Belkî jî gotibin, “Di pêvajoya proseyê de her tişt dê bê axaftin, her tişt dê bê kirin û ev ê nebin delîl di aleyha we de.” Ewil pêbaweriyek nedan we li dijî neheqiya ku aniha li we dikin?*

Tiştekî wiha negotin, me jî nexwast û jixwe nehat bîra me jî. Ji darizandinê bêhtir rîskekî din hebû. Pirsgirêkeke muhîm a Tirkiyeyê; Meseleya Kurdan. Aktorên navneteweyî, cîhana rojava, DYA, Rûsya, aktorên li herêmê… kesekî

çareseriya vê meseleyê nedixwast. Lewre Tirkiye yek ji welatên xurt û muhîm e li herêma xwe. Dewleteke ev pirsgirêka xwe çareser kirî, dê bêhtir bandor li derûdora xwe bikira, dê bibûya xwedî kapasîteyeke eskerî, siyasî û aborî. Dema em ji Îraqê, Îranê û ji Sûriyeyê lê binêrin, ev wiha ye. Tirkiyeyê ku îstîqrar û aştiya xwe ya navxweyî pêk anî, ne bi dilê wan e. Ji loma ew kesên ku di heyetên mîna vê de hewldanên çareseriyê didin, tim li ber xetereyên kuştinê ne. Heke yek we bikuje hûn ê ji kê bizanin?

A rast qet nehat bîra me ku rojekê ev dê wekî sûc derkevin pêşiya me û em ê bi van bên darizandin lê bû û em pir li ber xwe ketin helbet. Bêsiûdiyeke mezin e ku hin tiştên li ser daxwaz û agahdariya dewletê me kirî piştî demekê wek sûc anîn danîn pêşiya me. Lê heke dîrok xwe dubare bike helbet em ê dîsa heman tiştî bikin. Ji bo kesên tev li xebatên proseyê dibin, divê qanûn bên sazkirin. Di vê mijarê de qanûnek derxistin lê tenê ji bo rayedarên îstixbarat û dewletê. Dosyeya me ji xebatên KCDyê ên navbera salên 2010 û 2014an pêk tê. Dosyeyeka wiha kumpas e.

**Beşdar:** *Heman tişt anîn serê Osman Kavala û Selahattin Demirtaş jî. Ne ji ber xebatên navçîniyê lê ji ber dosyeyên din, ji ber xebatên din. Rasterast qala proseyê nakin.*

Dozeke din li min vebû. Vê carê bi doza Geziyê re, bi Osman Kavala re têkîldar e. Niha derketina derveyî welêt li min qedexe ye.

**Beşdar:** *Nimet Beriker berhevkariya pirtûkeke bi navê Ji Pevçûnê ber bi Lihevkirinê; Teorî, Prose û Pratîk kiriye. Di wir de meqaleyeke Beriker heye li ser navçîniyê. Di vê meqaleyê de qala bîst û çar modelên navçîniyê dike. Ji navçînên ku tenê agahiyan dibin û tînin, heta navçînên ku Yekîtiya Neteweyan wan wek hêza aştiyê dişîne, gelek cûreyên navçîniyê tên nîqaşkirin. Min got belkî bala we bikişîne loma min qal kir.*

*Tenê cureyeke navçîniyê tune ye. Li ba me jî heta niha du model hatine pratîzekirin. Di Proseya Osloyê de em pê dizanin ku heyeteke navneteweyî hebû. Lê di Proseya Çareseriyê de, di ser Koma Têkilîdanîn û Diyalogê re navçîniyeke herêmî pêk anîn. Heyeteke ku ji kesên herêmê pêk tê hatiye avakirin û dewlet ji aliyekî ve di ser navçînan re ji aliyekî ve jî di ser vê heyetê re, bi rêxistinê re têkilî daniye. Bi mekanîzmayeke wiha dualî xwastiye têkiliyên bi rêxistinê re kontrol bike.*

*Bi qasî tê bîra min, dema Proseya Çareseriyê, KCKyê dixwast bila DYA bibe navçîn. Di Proseya Osloyê de dezgeheke navneteweyî –muhtemelen ne saziyeke civaka sîvîl bû, ne dewletek bû-, paşê di Proseya Çareseriyê de heyeteke ji rewşenbîrên herêmê pêk tê navçînî kir. Paşê jî KCKyê rasterast*

*navçîniya DYAyê xwast. Çi kir ku KCK vê biryarê bistîne? KCK çima navçîniya heyeteke ji rewşenbîrên herêmê pêkhatî û li ser aliyan tu bandoreke wê tuneyî, navçîniya heyeteke hêsankar û çêker na lê navçîniya hêzeke emperyal wek a DYAyê xwast?*

*Dixwazim di çend mijaran de fikrên xwe bibêjim. Di serî de, bi ya min, divê meriv ji "nêzîktêdayîna normatîf" berê xwe bide "nêzîktêdayîna rasyonel." Divê mesele ji mijara norman û nirxan... ango ji "aştî xweş e" bêhtir divê mesele were ser "aştî pêdivî ye" ye.*

*Dixwazim mînaka Porteqalê bînim bîra we. Du zarok hene û her du jî porteqalê dixwazin. Lê tenê porteqalek heye. Dayik divê daxwaza wan her duyan jî bîne cih. Ji zarokan dipirse û dibêje, "Hûn ê porteqalê çi bikin?" Yek jê dibêje, "Ez ava wê dixwazim." Yê din bi dêya xwe dide zanîn ku dê pê kekê çêbike. Li ser vê dayîk porteqalê diguvêşe, avê dide zarokekî û bermayiyên porteqalê dide yê din ku pê kekê çêbike.*

*Teoriya li vir ev e: Divê mesele bi awayê ku her du alî jî pê tetmîn bibin ji nû ve bê sêwirandin. Heke meriv pirsgirêkê li derveyî têgihiştina klasîk bisêwîrîne, pirsgirêkê ji nû ve çarçove bike û heke ew çarçove qezencekê bixe destê her du aliyan, bi vî şiklî meriv dikare bi ser bikeve. Di meseleya navçîniyê de meseleya esas ev e. Pêdivî bi wan navçînan heye ku meseleyê ji nû ve bisêwirînin û çarçove bikin. Belkî hûn vê mijarê binirxînin. Ev tişt çiqas pêk anî ev heyeta ku hûn jî di navê de?*

*Ya duduyan di lîteratûra çareseriya pevçûnê de têgeheke bi navê security dilemma ango dudiliya ewlehiyê heye. Bi ya min di Proseya Çareseriyê de yek ji mijarên hatî paşguhkirin ew bû. Dudiliya ewlehiyê ev tişt e ku aliyên pevçûnê dikevin mitaleya ewlehiya xwe ya piştî çareseriyê. Ev tişt bêhtir ji bo rêxistinê tê gotin. Bi kurtahî, toeriyek dibêje, "Divê mekanîzmayek bê sazkirin ku rêxistin piştî çareseriyê jî hebûna xwe bidomîne, heke ev sazkirin tune be, rêxistin xwe nadin ber lihevhatinê." Meriv nikare ji van însanan re bibêje, "Em li hev hatin û em ê we bikujin." Divê mekanîzmayek bê sazkirin ku ev însan bikarin xwe biparêzin, tew mekanîzmeyeke wisa ku aktorên siyasî bikarin xebatên xwe bidomînin.*

*Ser meseleyê di piraniya proseyên çareseriyê de bêçekkirina rêxistinan bi reformên eskerî re, bi hev re tên kirin. Carinan serhildêr tev li artêşa bi reforman hatî guhertin dibin. Dîsa li Kolombiyayê, meclîsê kotayekê ji partiya serhildêran re vediqetîne. Axir, divê mekanîzmeyek hebe ku rêxistin piştî çareseriyê jî hebûna xwe bidomîne. Ev dibe bi guherandina makezagonê be, dibe bi avakirina partiyeke siyasî be, dibe bi tevlêbûna artêşê an jî bi awayekî dîtir be.*

*Bi ya min meseleya dudiliya ewlehiyê bi qasî hêzên serhildêr, serê hikûmetan jî diêşîne. Me di Proseya Çareseriyê de ev paşguh kir. Heke Erdoğan pê bihese ku piştî çareseriyê dê hêza xwe wenda bike, dê çima xwe bide ber çareseriyê? Ango heke tu mêrik nekî serokdewlet nexwe çima bi te re rûne, çima proseyê bidomîne? Wek çawa rêxistin li pey berdewamiya hebûna xwe ye û ev ji aliyekî ve tê famkirin, heman tişt ji bo hikûmetê jî derbasdar e. Heke muxatabê we ji hêla siyasetê ve wenda bike nexwe çima bi we re proseyê bidomîne? Divê çorçoveyek bê bidestxistin ku her du alî jî jê qezenc bikin û bi ya min ev nehat kirin.*

*William Zartman -yek ji wan kesan e ku li ser çareseriya pevçûnan pir xebitiye- vê pirsê dipirse; "Alî kengî li maseyê rûdinin?" Têgeheke wî heye derbarê vê de, "korerêya zirarê dide her du aliyan." Pevçûn dê werin asteke wisa ku dê têkevin korerêyê û dê zirarê bide her du aliyan jî. Vê wek şertekî asgarî datîne. Zartman dibêje, "Heta her du alî neyên vê radeyê, ne mîmkun e ku li ser maseyê rûnin. Lê carinan tevî ku mesele hatiye wê radeyê, alî li ser maseyê rûnanin. Lewre pê nahesin." Di vî warî de navçîn divê bîne bîra her du aliyan ku rewşa heyî zirarê dide her du aliyan, ketine korerêyê û dikare wek mînaka porteqalê çarçoveyeke nû pêşkêş bikin. Carinan rola navçînan ew e ku vê korerêyê bîne bîra aliyan û jê re çarçoveyeke nû bibîne.*

*Di Meseleya Kurdan de aktorekî xurt ê mîna DYAyê ku li ser aliyan xwedî bandor e, xwedî çavkanî ye, dê bibe navçîn? Ev modeleke baş a navçîniyê ye gelo? Dikarim mînaka Fîlîpîniyan bidim. Li wir bilekis, dewletên ji bûyer û ji mijarê dûr, dewletên ku tu berjewendiyên wan li wir tuneyî bûne navçîn ji bo navçîniyê. Sedema ku navê dewletên wek Norwec û Swêdê derketiye pêş ew e ku ne li dû berjewendiyan in. Ango di pevçûna wan aliyan de tu berjewendiyeke wan a siyasî û aborî tune ye. Dibe xurtbûn û objektîfiya navçînan jî rêveker be. Aktorê têkildar dikare bikeve vê metirsiyê; "Hin armancên van hene û dibe tehdeyê bide berjewendiyên min." Aktorên xurt dibe ku ne navçînên xurt bin. Bi ya min pozîsyona DYAyê niha ev e. Li Îraqê mudaxil bû. Rasterast mudaxilî krîza li Sûriyeyê bûye; him bi fizîkî him bi artêşa xwe li wir e. Wek Fîlîpîniyan, heke navçîn ne xurt be, li ser aliyan ne xwedî bandor be, dibe baştir be.*

*Ez vegerim ser pirsa xwe, KCK çawa hat wê astê ku navçîniya DYAyê xwast? Agahiyeke we heye gelo? Li gor we DYA di Meseleya Kurdan de dikare bibe navçîn?*

Haya min ji vê meseleye tune ya rast. Cemil Bayık di du hevpeyvînên xwe de navê DYAyê bi lêv kir û ev got. Dema navê DYAyê hat bilêvkirin, di navbera DYA û Tirkiyeyê de hin krîz hebûn.

Meseleya Kurdan êdî meseleyeke piralî, piraktorî û pirrehendî ye. Li herêmê dibe pêdivî tim bi komên mîna me yên hêsankar hebe. Em Tirkiyeyê jî û rêxistinê jî baş nas dikin.

Ji hêla eskerî, aborî û siyasî ve bandora DYAyê him li ser Tirkiyeyê heye him li ser rêxistinê. Jixwe Tirkiye ji mêj ve li dijî wê bû ku mesele di qada navneteweyî de bê nîqaşkirin û aktorên navneteweyî tev li vê meseleyê bibin. Û bi ser de wê demê çima ku têkiliyên DYA-Tirkiyeyê ne baş bûn, Tirkiyeyê xwe neda ber vê pêşniyazê.

Di Proseya Osloyê de tevî ku her du alî jî li gor xwe ecemî bûn, dîsa jî bi ya min li ser bingeheke baş dest pê kir. Aktorên sêyemîn Îngilîz bûn. Norweciyan mazûvanî kirin. Îngîlîzan wek navçînî û hêsankarî di proseyê de cih girtin. Îngîlîz jixwe dihatin Tirkiyeyê û qala proseyên Îrlandaya Başûr û yên li dinyayê dikirin. Hevalbendên Erdoğan jê re qala vê mijarê dikin û dibêjin: “Pêşniyazeke Îngîlîzan jî heye,” pêşniyara îngîlîzan tê qebûlkirin û Proseya Osloyê bi vî awayî dest pê dike.

Hevdîtinên Îmraliyê hinekî din girtî bûn. Öcalan dawiya dawî girtî bû û newekheviyek hebû. Hevdîtin bi piranî di navbera Öcalan û îstixbaratê de pêk dihatin.

Tirkiye hay ji wê xetereyê heye ku heke aktorên navneteweyî tev li vê meseleyê bibin, pê dizane dê gelek tawîzan bide. Loma dibêje, “A baş ez vê meseleyê bi Kurdan re çareser bikim, kesekî sêyemîn bila tev lê nebe, em ê di nava xwe de çareser bikin.” A rast bi feraseta “Ez ê wan qanih bikim û bêyî xirecir xwe jê pak bikim” tevdigere. Dibêje, “Ez ê di ser Öcalan re çareser bikim, heke PKK astengiyekê derxe ez ê bi operasyonan an jî dîsa bi rêya Öcalan wan jî qanih bikim.” Loma ne bi dilê Tirkiyeyê ye ku DYA tev li meseleyê bibe. Heke em têkiliyên DYA û Tirkiyeyê yên a niha bidin ber çavan, navçîniya DYAyê ihtîmaleke zehmettir e.

Paşê rayedarên hikûmetê tim wiha digotin: “Jixwe di Proseya Osloyê de me dît ku dînamîkên navneteweyî, hin aktor ne qayil in ku em vê meseleyê çareser bikin, loma em ê xwe bi xwe çareser bikin.” Nêzîkatiyeke wiha hebû li cem dewletê, li cem Ak Partiyê. Hê jî bi ya min ev nêzîkatî berdewam e.

**Beşdar:** *We got ku aliyê tevgera Kurdan ne amade bû û derbarê vê de bê plan û bê proje bûn. Em qala rêxistineke deh-panzdeh salî nakin. Rêxistina ku em qal dikin ew rêxistin e ku xwediyê hêza eskerî û aborî ye, tew bi qasî ez di çav xwe re dikim, bi navê diyasporaya Kurdan xwediyê avadaniyekê ye, rêxistineke wer xurt e. Ev ji vî aliyê ve ji min re pir bi mantiqî nayê. Tunebûna plan û projeyên rêxistinê gelo tê wê wateyê ku armanca rêxistinê ne çareserî ye?*

Nexêr, ez bi xwe nikarim bigihîjim wê encamê. Rêxistin bêhtir ne amade bû. Te dît qasek berê heval jî got, dewlet xwediyê sazî û dezgehan e, bi parlamentoya xwe, bi îstixbarata xwe, bi artêşa xwe. Xwediyê wê derfetê ye ku bi gelek saziyên sîvîl re pêwendiyê deyne; akademîsynên xwe, zanîngehên xwe hene. Dewlet ji sala 2002yan û vir ve tiştekî wisa difikire û bi hin tiştan radibe. Te dît Oslo, Xabûr, yekîtî û bihevrebûna xwemalî û li ser projeyên xwişk û biratiyê dixebite. Berî ku van projeyan aşkere bike, di paşxaneya wan de li ser dixebite, daneyên muhîm hene li ber destan. Lê di van xebatan de rêxistin di paşxaneya xwe de nexebitiye. Qet nebe me ev dît. Tenê di ser metirsiyan re prose bi rê ve dibir. Li ser metirsiyên wek "Dê me înkar û îmha bikin, dikin me tesfiye bikin." Helbet asayî ne ev metirsî, sî sal e şer dikin. Rêxistin bi qasî dewletê ne amade bû. Vê jî em şaş hiştin.

**Beşdar:** *Rêxistinê prose pir teng bi rê ve bir, bi kadroyên xwe re jî parve nekir, gelek agahî. Her ku ket hewldana veşartinê, Kurd veder kirin. Têgeha navçîniyê li vir pir bi qîmet bû. Heke wê demê tevgera Kurdan karibûya hin şexsiyetên Kurd, saziyên civaka sîvîl, serkêşên civakê û hin malbatan tev li vê proseyê bikin, dê destxurttir derketa hemberî dewletê. Ji hêla dewletê ve jî proseya çareseriyê sergirtî bû. Tevgera Kurdan dûrî Kurdan bû. Wê demê hin pêşniyazên ku dixwastin platformeke xurt bê avakirin, dixwastin xebatkarên partiyê yên berê, serkêşên civakê û rêxistinên civaka sîvîl jî tev li proseyê bibin. Lê pir jî guh nedan van pêşniyazan. Wek Ak Partiyê, di nav tevgera Kurdan a siyasî de jî metirsiyên hilbijartinê çêbûn. Û yek jî, her kesî dixwast bibe qehreman. Bi ya min tevgera Kurdan a siyasî pir ne amade bû. Lê ez ne di wê baweriyê de me ku di serê dewletê de modeleke çareseriyê hebe. Jixwe bivê nevê pirsgirêka pêbaweriyê heye.*

**Beşdar:** *We got ku "Di wê pêvajoyê de me xwast lijneya şopandinê bê sazkirin." Ku min şaş fam nekiribe we got komîteyeke wiha jî hat avakirin. Baş e piştî prose têk çû, wê komîteya şopandinê derbarê pozîsyonên her du aliyan de tu rapor amade kirin? Li kîjan aliyî kîjan helwestên erênî-neyînî hebûn an jî kîjan alî xwediyê helwestên wek pêşdarazî û di hewldana sabotekirinê de bû filan? Ya duduyan, a niha têkiliyek an jî diyalogek heye gelo? Ango belkî jî herî zêde pêdiviya vê demê bi navçînan heye, vê dema ku her kes vekişiye qunciкê xwe. Ji 2015an û vir ve di navbera şeş hezar û yanzdeh hezaran de însan mirine. Yên ku di 2019an de mirî ne tê de. A niha gelo tu hewldan hene?*

**Beşdar:** *Wek we jî got, dema em li mînakên dinyayê dinêrin, li Kolombiyayê, li Afrîkayê –Helbet ev li Tirkiyeyê zêdetir e– di hemû proseyên pevçûnan de avantaja dewletê zêdetir e. Aliyên sêyemîn jî wisa dibînin û wisa nêzî meseleyê dibin. Loma tim meyla wan li ser vê ferasetê ye: "Ka em binêrin bê dewlet çi dixwaze, dê rêbazeke çawa bişopîne, li gor wê em ê ji bo we*

*tiştekî bikin." Bi giştî, rêya ku aliyên sêyemîn dişopînin, ev e. Piştî ku prose bi pêş dikeve –Li Kolombiyayê jî wiha bû–, ji bo stûna wê ya qamûyî pêk bînin, hewl didin hevsengiya wê ava bikin û guh didin ser xwastekên yên hember. Bi vî awayî hewl didin hevsengiya wê ava bikin.*

*Li gor min sedema herî mezin ku ev li Tirkiyeyê pêk nayê, neçalakbûna mekanîzmayên navneteweyî ye. Mesela li Kolombiyayê, Norwecê ev prose bi temamî hildabû ser xwe. Bi heyetên pispor tên piştgirîkirin. Li ba me, bêhtir navçîn û aliyên sêyemîn hene ku ji hêla dewletê ve hatine avakirin. Em vê heta Însanên Aqilmend bibin. Rol û mîsyona hevalên di nava wê heyete de çi bû?*

*Pirsa min a din: Li wir rola jinan çi bû? Ma ne divê jinan di xebatên navçîniyê de bêhtir cih bigirta, lê jinên ku rasterast tê de cih bigirin hema bibêje qet tune ne.*

**Beşdar:** *Çima ku Tirkiye ji derve re girtî ye, xwast meseleya xwe ya navxweyî bi mekanîzmayên xwe yên navxweyî çareser bike û xwast ev mekanîzmayên navxweyî jî bi dewletê re têkildar bin, loma astengî derket. Angaşta 'tevgera Kurdan a siyasî ne amade bû' ji hêlekê ve tê famkirin. Lewre heta proseyê, gaveke wiha mezin neavêtiye û ji nişka ve bi proseyê re rûbirû dimîne. Di hilbijartinan de jî heman tişt diqewime. Hikûmet li gor pêdiviyên xwe demeke dirêj amadehiyên xwe dike û ji nişka ve dibêje, "Hilbijartin!" Tew haya yê hember jê tune. We got, "Daxuyaniyên Öcalan ne di asta bendewariyan de bûn." Divê tiştekî çawa bûya ku proseyê dewam bikira?*

Min wisa gotibû: Di hevdîtînên destpêkirî de, her çiqas asta muzakereyan ne bilind be û daxwaz ne li gor min bin jî, ez ê piştgiriyê bidim proseyê. Min got wek navçînan divê fikrên me yên şexsî bandorê li muzakereyan nekin. Di wê proseyê de him ji hêla pêşbîniya wê ve him jî ji hêla ferasetê ve min heqê Öcalan dabûyê.

Dema em li nîşeyên ji hevdîtînên Îmraliyê pêkhatî dinêrin, em dibînin ku Öcalan jî dewletê jî ji derve navçîn nexwastine. Dibêjin, "Em ê di nava xwe de çareser bikin." Ji loma heta nêzîkatiyeke bi vî rengî hebe, heta ji aktoran daxwazeke wiha tune be, welatek ranabe û ji ber xwe ve daxil nabe. Ev ne pêkan e jî.

Dewleta Tirkiyeyê, di Proseya Osloyê de li gor xwe tiştek tecrûbe kiriye. Esas ne ku tecrûbe kiriye lê gihiştiye encameke wisa û gotiye, "Dema yên ji derve mudaxil dibin ji me fam nakin, proseyê xira dikin. Loma em vê meseleyê bi projeyeke xwemalî çareser bikin." Û bi vî awayî nêzîkî wê dibe. Ev metirsî bi dewletê re heye ku heke kesekî sêyemîn daxil bibe, prose dê berfirehtir bibe

û ji loma jî meseleya ku dixwaze bi erzanî xwe jê pak bike dê lê giran bibe. Di paşxaneya meseleyê de ev heye.

Pirsa din derbarê lijneya şopandinê de bû. Lijneya şopandinê tenê fikrek bû. Nav hatin destnîşankirin. Piştî qewimînên Lihevkirina Dolmabahçeyê ev prose qediya jixwe. Ango tenê nav hatin destnîşankirin û hew. Di lijneya şopandinê de navê min jî hebû. Ne tenê Erdoğan, aliyê Kurdan jî piştgirî nedan proseya Dolmabahçeyê. Her du aliyan jî neda.

Li ser pirsa "Gelo tiştekî nû heye?" dikarim van bibêjim: Tiştekî ez bi xwe bûme şahid tune ye lê bi sohbeta hin dostan re, tiştê ku di nav axaftinê de min fam kirî: A niha çareserî tune ye. Digel vê, hevdîtinên bi Îmraliyê re carinan çêdibin. Çend meh berê dîplomatê Amerîkî James Jeffrey hatûçûyeke dîplomatîk da destpêkirin. Jeffrey berê jî li Enqereyê balyozî kiribû, ez jî wî nas dikim, paşê bû balyozê Bexdayê. Li wir, esas, Tirkiyeyê pozîsyonek wergirt. Tirkiyeyê wê demê poltîkaya xwe guherand. Tirkiyeyê berê yekser bi HSDyê re nediket têkiliyê lê mîna Proseya Osloyê bi wan re yekser ket têkiliyê. Li gor xwe hin pêşniyazên wan hebûn. Heta astekê jî hatin. Hevdîtin niha qut bûne lê nizanim ka dê dîsa dest pê bikin an na?

Hevdîtin hemû li ser Sûriyeyê ne. Di ser Sûriyeyê re dê dest pê bike an jî nake. Heke li Sûriyeyê tiştên baş biqewimin bê guman dê bandorê li vir jî bike. Jixwe Proseya Çareseriyê jî ji ber meseleya Sûriyeyê qediya. Di 2014an de piştî ku Kurdan li wir pozîsyonek bi dest xist, Tirkiye ket nava tirs û metirsiyê. Mesele ev e. Kadroyên AK Partiyê, kadroyên sîvîl û eskerî axir hemû dewletê ev kir meseleya man û nemanê: "Siberoj dê me jî parçe bikin, dê bi piştgiriya hêzên navneteweyî Kurdistana mezin ava bikin." Îranî jî di vî warî de jêhatî ne. Tirkiye jixwe amade bû ji vê psîkolojiyê re. Mafdar in an na em wê pê nizanin.

Bi ya min wisa fikirîn: "Heke ez qewimînên vê pêvajoyê hinekî berteref bikim ez ê pêşeroja xwe jî misoger bikim, dirêj bikim." Di vê navê de PKKyê jî di ser Sûriyeyê re hin pozîsyon bi dest xistin. Di qada navneteweyî de ket têkilîniyê din. Tirkiye jî ket nava tirs û metirsiyê, kir meseleya man û nemanê. Wê demê bi Salih Muslim re hin hevdîtin pêk anîn him li Wezareta Karûbarên Derve û him li Saziya Îstixbaratê ya Tirkiyeyê. Di ser Öcalan re xwastin pêşketinan domîne bikin lê nebû.

Li Tirkiyeyê hê jî ew metirsî heye. Ev metirsî ne tenê bi kadroyên Ak Partiyê re lê bi kadroyên sîvîl, eskerî, burokratîk re jî heye. Li gor wan, serhevdeya sedema vê metirsiyê jî mutefiq û dostê wan ê salan DYA ye. Di paşxaneya hişmendiya dewletê de dijminahiya Amerîkayê û fikra "Amerîka van xirabiyan tîne serê me" heye. Helbet vê sedemê bandor li Proseya Çareseriyê kir û

Lihevkirina Dolmabahçeyê qedand.

Ez tim dibêjim, qewimînên li Sûriyeyê û Hilbijartinên 7ê Hezîranê jixwe ji piştgiriya navneteweyî bêpar bûn û Proseya Çareseriyê serobino kirin. Hêvîdar im di demên pêş de tiştên baştir biqewimin.

BEŞA HEŞTEM

# XIZMETDAYÎNA YEKSER: AZMÛNA WEQFA MAFÊN MIROVAN A TIRKIYEYÊ

*Metin Bakkalcı*

Derbarê çareseriya pevçûnan û aştiya civakî de, her welatiyek him şexsî him jî bi rêxistinî dikare hin tiştan bike û bandorê li rêveçûna proseyê bike. Û bi ser de qada tevgerîna rêxistinî bi qada tevgerîna civakê re têkildar e. Axir, "çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî" li ser pişta me hemûyan e. Li vir azmûna TIHVyê [Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê] di bin serenavê "xizmetdayînê" de hatiye sazkirin û ev heta cihekî tê famkirin. Lê ez ê çarçoveya axaftina xwe berfirehtir bikim û qala xebatên me jî bikim ku jixwe xebatên me jî yên xizmetdayînê ne.

Nîqaşkirina tecrûbeyan, dê bike ku em wek TIHV bi xwe re rûbirû bimînin. Di rûniştina yekem de ez ê hinekî qala çîroka TIHVyê bikim. Du beşa duyem de ez ê di nava çarçoveyeke giştî de qala kar û xebatên me bikim. Di beşa sêyem de jî em dest bi mijara xwe ya esas bikin. Dibistana Aştiyê ya DÎSAyê mijar wek "xizmetdayîna yekser" destnîşan kiriye. Divê li ser vî serenavî em hinekî li ber hev bidin. Em bi wan kesan re dixebitin, ên ku îşkence dîtine û ên ku mafê wan hatiye binpêkirin. Lê em vê wek "xizmetdayîn" bi nav nakin, bi vê dorsînor nakin. Dixwazim meseleya însanên îşkencedîtî nîqaş bikim, însanên ku işkence dîtine û nêzîktêdayîna totalîter ku em wê wek peyvên efsûnî bi kar tînin, astên derbarê wê de yên ketî nava hev, hêzê ji nava hev girtî, ez ê nîqaş bikim. Di beşa dawî de jî em ê qala bernameya "Serederiya bi trawmaya civakî re" bikin ku di nava xebatên me de xwediyê girîngiyeke taybet e. Ez li ser wê fikrê me ku têkiliyeke xurt heye di navbera vê mijarê û çareseriya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî de.

Ji bo TIHVyê em ji roja ewil ve wisa dibêjin; "Em li cihê agir pêketî ne." Ev pênase ji me re watedar tê. Em li cihê ku agir pêketî ne; wê rojê jî îro jî. Wek qada efûxwastina civakî ye, TIHV ango cihê ku em lê dixebitin. Li ser navê civakê, em bexşandinê ji kesên rastî binpêkirin û îşkenceyê hatî dixwazin. Xebata ku em dikin rasterast, belê rehabîlîtasyon –ez ê qala tedawî û rehabîlîtasyonê bikim ku em li îşkencedîtiyan dikin-, meseleya veheriyê bixwe hedîseyên bi edalet û heqîqetê re têkildar in. Û ji mêj ve em guh didin yekûniya vê û xeyala me ya esas tewifîn û tunebûna TIHVyê ye. Armanca TIHVyê jî ev e. Çima? Çima ku jiholêrabûna îşkenceyê ye armanca me. Ango teheyyula

me ew e ku em bigihîjin wan rojên ku pêdivî bi me nemîne.

Çîroka me bi 1980yî dest pê dike. 63 salî me. Hemsalên min, serpêhatiyên beriya gelek salan, wekî ku duh hatibin serê wan, hîs dikin. Serê sibeha 12ê Îlona 1980î tê bîra min. Beriya wê tê bîra min, gelek serpêhatî hene. Wekî her kes pê dizane, wekî her kesî jiyaye tê ji mirov re lê ne wisa ye. Niha çi xweş, hevalên me yên ciwan ên hê nû dest bi zanîngehê kirî hene, 18 salî ne... Di 1980yî de, meseleya beriya 39 salan belkî we xwendiye, belkî we bi awayekî ji malbata xwe yekî guhdar kiriye. Meseleya ku em jê re dibêjin Derbeya Eskerî ya 12ê Îlona 1980yî, dema em li qada me binêrin, di nava kurtedemekê de ne. Sala 1980yî, dema nifûsa welêt çil û pênc milyon bû, ji kerema xwe re bifikirin ku 650 hezar kesî îşkence dîtiye.

Ez tenduristparêzek im. Heke kêm zêde ji serê heftê kesî yekî û ji serê hevdeh malbatan malbatekê îşkence dîtibe, em tenduristparêz ji vê re dibêjin "pirsgirêka tenduristiya gel." Ev çima girîng e? Heke em pirsgirêkekê wek pirsgirêka tenduristiya gel pênase bikin, bernameyên xisûsî ji bo perspektîfên tenduristiyê hatî terxankirin jê re divên. Û bi ser de her însan muhîm e. Bernameyên ji bo her însanekî xisûsî hatî amadekirin divên. Îşkence jî, şer jî pirsgirêka tenduristiya civakê ye.

Çîroka me ji vir tê. Li Stenbolê, Dayikên Şemiyê tên cem hev. Meseleya van dayikan pir bi qîmet e. Wê demê, di 1980yî de, mirovên xweşik hinekên wan di hepsê de ne, hinek ji wan li derve ne. Lê bi taybetî ûcdana malbat û xizmên girtiyan serî li ber zilma hovane ya 12ê Îlonê rakir. Digel vê, mirov û xwendevanên hêja yên wê demê tevgerek dabûn destpêkirin. Em dikarin bibêjin ber bi nîvê salên 1980î. Li dinyayê jî qewimînên mîna vê hebûn, pir jî ne rasthatinî bû. Di nava wê zorbaziyê de ku di sala 1970 de li Amerîkaya Latîn dest pê kir û di sala 1980 de li hemû dinyayê belav bû, tecrûbeyên rehabîlîtekirina kesên îşkencedîtî dest pê kir. Pêdiviyên ji nava jiyanê... Ev hêdî hêdî berbelav bûn. Tenduristparêz bi îşkencedîtiyan re ketin têkiliyê. Digel wan kesên dest û pê lê hatine şikandin, di gel wan ên ku ruh lê hatî pincirandin meşiyan. Pêdivî jixwe li holê bûn û hin kesên ku ji bo wan hewl didan hebûn. Tecrûbe û zanyarî ketin ser hev û piştî nîqaşên di nava Komeleya Mafên Mirovan (IHD) û Yekîtiya Bijîşkên Tirk (TTB) de, di sala 1990î de TIHV damezirî.

Ez ê niha jî ji we re qala çarçoveya tecrûbe û xebatên me bikim: Armanca bingehîn a TIHVyê ew e ku ji bo pakiya fîzîkî, derûnî, civakî, piştgiriyê bide kesên ku îşkence dîtine. Derdê me, xebatên me yên ku em di bin banê rêgezên xwe yên bingehîn de pek tînin ev in û helbet kesên ku ji bo pêkanîna vê armancê hewl didin hemû dildar in. Li navendên tedawî û rehabîlîteyê jî yên ku bi dildarî dixebitin hene. Digel xebatên dildariyê, xebatkarên me jî

gelek xebatan bi dildarî dikin û bi vî awayî xizmeteke profesyonel derdikeve holê. Meseleya pêzaniyê ye ne ya profesyonelbûnê. Pêzanîna xizmeteke profesyonel heye di vir de û ji van jî muhîmtir parêzvaniya mafên mirovan heye. Ji wan kesan im ku dibêjim divê parêzvaniya mafên mirovan wek qadeke serbixwe neyê nirxandin. “Hûn çi karî dikin?” “Parêzvanê mafên mirovan im.” Tiştekî wiha tune ye. Ango parêzvaniya mafên mirovan ne pîşeyek e. Parêzvaniya mafên mirovan di nava jiyanê de ye. Heke hemû welatiyên vî welatî bi mafên mirovan hatibin nixumandin, jixwe di hundirê wan de ew parêzvaniya mafên mirovan dê hebe û hew.

Bi xebatên komî, helbet em hewl didin ku tevkariya kûrahiyeke akademîk û ruhekî aktîvîst derxin holê. Wek hemû saziyan em jî pişta xebatên xwe didin sedema hebûna xwe û qada bingehîn a xebatên xwe. Em plansaziyan didin ber xwe, planên stratejîk saz dikin. Em bêhtir guh didin xebatên rehabîlîtasyon û tedawîkirinê. Ev rehabîlîtasyon helbet di nava pêvajoya veheriyê de ne. Him ji bo xurtkirina xwe him ji bo xurtkirina derdora xwe em dixebitin. Em vê tenê li Tirkiyeyê nakin, di asta navneteweyî de em dikin. Tenê ne li Filîstîn û Îsraîlê; ji Amerîkaya Latîn heta Fîlîpîniyan heta Srî Lankayê em di qadeke berfireh de dixebitin.

Qadên ku em li ser dixebitin –di serî de xizmeta rehabîlîtekirinê-, tomarkariya tibî, tomarkirina îşkence û binpêkirina mafên mirovan ên giran in. Em ne rêxistineke hiqûqî ne lê ji ber armanca xwe ya axirîn di qada multîdîsîplîner de em carinan bi hiqûqnasan re dixebitin û hewl didin alîkariya hiqûqî jî bidin. Ji aliyê din ve em her bi van xebatan re mijûl in: Xebatên pîşeyî yên xwepêşxistinê, xebatên zanistî, serederiya bi trawmaya domdar a civakî re, dokumantasyonên binpêkirina mafên mirovan. Dema pêkanîna van xebatan heta ji me tê em qada xebata xwe ya bingehîn xurttir dikin û hewl didin ku xebatên taybet ên wek hêza mirov, agahî, peydakirina çavkaniyan jî pêk bînin. Em hewl didin ji rewşên taybet ên wek piştî pevçûnên Tîrmeha 2015an re amade bin da em bikarin ji xwe re qadekê vekin.

Heta îro me alîkariya tedawiyê daye zêdetirî hevdeh hezar kesên ku îşkence lê bûye. Li Enqere, Stenbol, Îzmîr û li Diyarbekirê navendên me hene. Her wiha piştî pevçûnên 2015an li Cizîrê û ji 2018an vir ve jî li Wanê navendên me hene. Diyarbekir û Stenbol wek navendên sereke ne ji hêla kadroyan û tora têkiliyan ve. Navendên din biçûktir in, li gor wan.

Proseya navendên tedawiyê li gor dorê wiha ne: Ev rêwîtî bi serîlêdana kesekî îşkence-lêbûyî dest pê dike. Hevdîtina ewil û dû re jî proseya nirxandina tibî dest pê dike. Digel nirxandina tibî yên hevalên me yên di qada xwe de pispor, tomarkirina tibî jî tê de, plansazî û pêkanîna pêvajoyên teşxîs, tedawî, rehabîlîtasyon, çavdêriyê tê kirin. Di vir de xala girîngtirîn rehabîlîtasyon e.

Li wir pêvajoya jinûveafirandina pêzanînekê pir bi qîmet e. Ji loma em xebateke zanistî dikin û em pir qîmetê didin vê. Ev şertê pêşîn yê vî karî ye. Di vî warî de tib pir mûhîm e. Lê wek sazî, em ji mêj ve di nava wê hewldanê ne ku di çarçoveyeke teng a tibî de li pêvajoyên rehabîlîtasyona îşkencedîtiyan û xebatên derbarê rêlibergitina îşkenceyê de nenêrin.

Wek min got, xebatên zanistî çima girîng in? Herçiqas carinan şopeke berbiçav li ser laş tune be jî em bi hin rêbazên teknîkî hewl didin ku şopên îşkenceyê bibînin. Sîntîgrafiya hestiyan ji wan rêbazan yek e û em bi vê rêbazê wan şopên trawmatîk dibînin. Di ser de bîst û penc sal derbas bûbin jî bi vê rêbazê em şopên ku li ser laşê însanan xuya nakin dibînin. Di îşkenceya ceyranê de zûbizû şopên fîzîkî çênabin. Lê van şopan em bi hin xebatên hîsto-patolojîk dibînin. Ev xebatên ku li TIHVyê hatî kirin ji hemû dinyayê re bûne referans.

Derbarê rêlibergirtina îşkenceyê de, yekane rêbera li ber destê tenduristparêz, hiqûqnas û mafparêzan kitêboka Neteweyên Yekbûyî ye. Dema rastî angaşta îşkenceyê hat çi di warê lêpirsînê de çi di warê tomarkirinê de bi rêberiya wê kitêbokê gav diavêjin. Navê wê rêberê/kitêbokê Protokola Stenbolê ye. Ne rasthatin e, lewre civîna dawîn a amadehî di sala 1999an de li Stenbolê çêbûye. Dîsa beriya civîna dawîn di hemû pêvajoyên amadekariyê de heyetên Tirkiyeyê bûne hêsankarên krîtîk. Piştî pêvajoyên êşkişandinê û xwenixumandina bi pêzanînên zanistî, bi tevkariyên me yên muhîm ev civîna dawîn hat lidarxistin. Tenê ne li Tirkiyeyê; di serî de Konseya Ewropayê û DEMM, ji Ewropayê heta Asyayê, Ji Amerîkaya Latîn heta Awistralyayê, hema bibêje li seranserê hemû dinyayê, li cihê ku angaşta îşkenceyê hebe, Protokola Stenbolê tê nirxandin bê ka hurmetê dibîne an an.

Rêwîtiya me ya ku bi îşkenceyê dest pê kir, bikî nekî veguherî xebatên rêlibergirtina binpêkirina mafên mirovan û di vî warî de jî me xwe bi pêş xist. Loma ji bo ku em van xebatan hemûyan bi hev re û bi awayekî sîstematîk bikarin pêk bînin, xeyaleke me heye ku em Enstîtuya Trawmayê û Mafên Mirovan ava bikin. Em di kêferata pêkanîna wê xeyalê de ne niha.

Dibe çavkaniyên me yên fînansmaniyê bên meraqkirin. Dildariya dildaran pir muhîm e. Ji sê behran behrek lêçûnên tedawiyê, tendûristparêzên me yên dildar, ne wek neqdî lê wek eynî didin. Axir alîkariyeke eynî ya pir hêja heye. Herwiha divê qala xebatkarên saziyê bikim ku bi kadro dixebitin, qala wan û xebatên wan ên ku bi dildarî dikin. Ji ber ku ser meseleyê li vir meaşê doktorekî ji yê doktorekî ku li derve dixebite, wekî ku hûn texmîn dikin, pir hindiktir e. Digel alîkariya dildaran, hinek jî fînansa neqdî ya ku di hin projeyên curbicur de tê bidestxistin jî heye.

Em dibêjin “Em ne rêxistineke projeçêker in,” lê em projeyan çêdikin. Ev çawa çêdibe? Proje ne armanc lê hêsankarê pêkanîna armancan e. Mesele ne domdariya projeyan e, mesele domdariya çalakiyan e ku di warê pêkanîna pêdiviyên jiyanê de bi kêr bên. Ev xetereyên mezin bi xwe re tîne. Lewre çi li Tirkiyeyê çi li dinyayê xetereyên mîna hev hene. Loma jî dixwazim qalê bikim. Di van rewşan de xetereyên dûrketina ji xweza û objektîfiya xwe heye li pêşiya tevgerên ku li ser mijarên wek parastina mafên mirovan dixebitin. Li dinyayê jî ev heye. Dibe rewşeke profesyonelbûnê bi xwe re bîne. Parêzvaniya mafên mirovan wek çawa ji jiyana rojane derdikeve, dibe ji xebatên pîşeyî jî derkeve. Ji ber xetereya ku ev bibin wek amûr, min xwast van bi we re parve bikin.

Dest bi beşa sêyem dikim. Yekûniya kesên ku îşkence lê bûye, ji pênc astên di nava hev de pêk tê. Her wiha yekûniya xebatên tedawî û rehabîlîtasyonê ku ji bo kesên îşkence-lêbûyî tên amadekirin jî ji pênc astan pêk tê. Ev nêzîktêdaniya yekûnî çawa peyda dibe û çawa pêk tê? Car caran peyvên wek “mexdûr” an jî “qurbanî” tên bikaranîn ser meseleyê. Belkî ji ‘*victim’a* Îngilîzî hatiye loma. Lê em van peyvan bi kar nayînin. Em peyva “duçar man”ê tercîh dikin. Lewre ev rewşek e, meriv duçarî tiştekî dimîne. Em dibêjin kesê îşkence-lêbûyî, kesê duçarî îşkenceyê mayî.

Belê, pêşî divê em ji bîr nekin ku kesê em qalê dikin, bi mafan hatiye nixumandin. An nexwe, dibe em rê li ber bêmirovbûnê vekin. Di bingeha feraseta îşkenceyê de, pênaseya “yê din” heye, ji wê jî wêdetir, ev ê ku wek “yê din” tê pênasekirin wek tehdît tê dîtin, li gor wan ev tehdît hebûna wan tehdît dike û divê ji holê rabe. Nêzîktêdayîneke dermirovî heye di bin vê ferasetê de, nêzîktêdayîna dermirovî ku yê li hember xwe wek dijminekî dibîne, çima ku di çavê wî de yê hember dijmin e, êdî wan mafên ku yê hember pê hatî nixumandin nabîne. Mesela di roja me de jî hewl didin li ser însanan ferz bikin ku ji hemû însanên derveyî xwe re bibêjin “Ew xetere ne, dijminên ku qesta hebûna me dikin; nexwe tu mafekî wan, zarokên wan û malbata wan tune ye.” Ango hewl didin yê li hember ku wek dijmin dibînin ji mafan şûştî û veşûştî bikin, ji însanbûnê derxistin… Dema em di çarçoveya îşkenceyê de lê binêrin, di perspektîfa qedexeya îşkenceyê de tiştekî bi navê “mafê îşkence-nedîtinê” heye. Ji loma însanê ku îşkence dîtiye ew mafê wî hatiye binpêkirin. Kesekî ku mafê wî hatibe binpêkirin jî hewce ye mafên wî kesî bên îadekirin û telafîkirin. Di vî warî de ev ne xizmetdayîn e. Alîkarî ye ku hewl dide mafên kesê îşkencedîtî bên dayîn û bên telafîkirin.

Ya duduyan panel tên lidarxistin. Em dibêjin, “Bila carekê jî kesekî ku îşkence lê bûye biaxive.” Ango îşkencedîtî carinan jî dibe rengdêr û sifatê meriv. Lê yê li hember me însan e, însanekî ku îşkence lê bûye, di parçeyek jiyana xwe de duçarî îşkenceyê maye, duçarî serboriyeke neyînî maye. Wexta dibêjim

neyînî qala pêvajoya trawmatîk dikim. Jiyana me hemûyan ji gelek serboriyan pêk tê, wek komeserboriyan e jiyan, ne wisa? Ango pîşeyekî me heye, em bi sporeke wiha re têkildar in, bi çalakiyeke çandî ya filan rengî radibin, wendahiyeke me ya bêvan rengî çêbûye, di malbatê de dê serwendayek hebe, tecrûbeyeke me ya filan û bêvan rengî heye; hin ji wan xweş in, hin jê ne xweş, hin meriv xemgîn dikin, hin bextewar. Îşkence jî helbet xwedî girîngiyeke taybet e di nava wan serboriyan de ku jiyana me pêk tînin. Ji loma em nikarin kesekî îşkencedîtî di nava ewqas dewlemendiyên jiyanê de bixin nava vê serboriya nexweş. Bi gotineke din, çima ku hemû jiyana wî ji serboriya îşkenceyê pêk nayê, em nikarin wiha pênase bikin. Bi zanîn an jî nezanîn heke em hemû jiyana îşkencedîtî bi wê serberoriya neyînî dorsînor bikin, di pêvajoya veherî û serederiyê de dê tu feydeyeke me nêgihîje îşkencedîtî, tew bi ser de em ê xisarê bidinê.

Ya sisêyan, dema em dibêjin “Însanê duçarî îşkenceyê mayî”, em qala însanekî xwediyê yekûniya fîzîkî, ruhî, civakî û polîtîk dikin, ne wisa ye?

Ya çaran, însanê îşkence dîtiye, îhtîmal e ku binpêkirinên mafên mirovan ên girantir dîtibin mixabin. Dibe bi darê zorê hatibe koçberkirin, dibe xizmekî xwe wenda kiribe, an jî xirabmalî bûbe.

Û ya pêncan, îşkence di bingeha xwe de êrîşek e li dijî xwe-hurmetiyê û xwe-hurmetiya îşkencedîtî hildiweşe, tevî vê yekê bi armanca tirsandin û tewisandinê mesajeke sergirtî ye ji civakê re; “Ez muqtedîr im, tu netişt î.”

Ji loma, çima ku yekûniya kesê îşkence lê bûye ji pênc astên di nava hev de pêk tê, wek sazî yekûniya xebatên me yên tedawî û rehabîlîtasyonê jî ji pênc astan pêk tên. Ev xebat hew ne alîkariyek an jî çalakiyeke mirovane ye û ne jî xizmetdayîn e, ji aliyekî ve. Rêwîtiyek e ku heqê kesên mafên wan hatî binpêkirin dide. Em wiha difikirin di nêzîktêdayîna yekûnî de.

Xala yekem a nêzîktêdayîna yekûnî, rehabîlîtasyon e ku divê wek yek ji hêmayên heqê veheriyê bê dîtin, heqê veheriya ku ji pênc hêmanan pêk tê. Wek di Kongreya Giştî ya 3. ya Komîteya li Dijî Îşkenceyê de hatî gotin; heqê veheriyê ji nû ve bidestxistina heqên di nava hev de, tezmînat, rehabîlîtasyon, tetmîn, heqê pêzanîna heqîqetê û têkoşîna bi bêcezatiyê re jî tê de, misogeriya dubarenekirinê, ji pênc binbeşan pek tê. Ji loma, da ku xebata rehabîlîtasyonê bigihîje armanca xwe, em hewl didin birînên fîzîkî bikewinîn û yên ruhî bitefînin. Ji ber ku ruh, dema ev şert û merc hebin dikewe û ditefe jixwe. Helbet navenda me ya sereke ev e, em hêzê ji vir digirin û heta cihê hêza me têrê kirî diçin. Bi kurtahî ev tev di nava hev de ne. Di navbera van de yekûneke arîtmetîk tune ye. Yek dê li vê binêre yek dê li vê... Ne arîtmetîk e ev. Li vir meseleya hundirandinê heye.

Ya duduyan, di nava serboriyên jiyanê de heke hêmaya muhîmtirîn û girîngtirîn îşkence be, pêvajoya rehabîlîtasyonê jî qetiyen ne ew mesele ye ku wê di nava wê serboriyê de hepis bike û li ser hemû dewlemendiyên din bigire. Bilekis, meseleya rêwîtiyekê ye ku wan dewlemendiyan serpas bike, pêvajoya trawmatîk ji nû ve bi nav bike û tev li proseya veheriyê bike. Ji loma divê meriv dûrî nêzîktêdayînên reduksiyonîk û patolojîk bisekine. Peyva "trawma" peyveke bipirsgirêk e. Belê em jî nîqaş dikin. Peyva trawmayê divê wek teşxîsa patolojîk neyê famkirin. Ango tiştê ku li me dibe îşkence ye. Ser meseleyê hûn dereke xwe bi şaşî li derekê dixin, reşûşîn dibe. Dê reşûşîn bibe, dê ruhê we bitewile. Ev serboriyeke nexweş e. Lê ez nabêjim dê îşkence teqez pirsgirêkên ruhî bi meriv re çêbike. Dibe çêbike, îhtimala ku çêbike pir e. Lê divê em hew di pencereyeke patolojîk û trawmatîk de lê nenêrin. Divê em ji bîr nekin ku tengezarî û êş carinan bersiveke asayî ye.

Ya sisêyan, çima ku însan xwedî yekûniya fîzîkî, ruhî, civakî û polîtîk e, tenduristî wek pakî û başiya laşî, ruhî û civakî tê pênasekirin. Ji loma pêvajoya tedawî û rehabîlîtasyonê, lênêrîna hiqûqî û civakî jî tê de, lênêrîna tibî û ruhî li ser me ferz dike. Ev jî xebateke komî ya bikalîte û navdîsîplînî ye ku bi xebatên zanistî û pêşxistina pîşeyî tê destekkirin li ser me ferz dike. Dema em di hewla başîkirinê de bin divê em van jî li ber çavan bigirin.

Ya çaran, kesek ku duçarî îşkenceyê mabe, îhtîmal e ku binpêkirinên din ên giran dîtibin, tecrûbe kiribin. Wê demê em ji vê re "trawmaya têkel" dibêjin; têgeheke wisa heye. Ji ber vê divê bernameyên ji bo trawmayên têkel hatine amadekirin bên çêkirin.

Ya pêncan, wek min gava din jî gotî, armanca îşkenceyê ne kes lê civak in. Nexwe ji pêvajoya veheriya vê re nêzîktêdayînên yekûnîtir divên, derbarê sazkirina hesta edaletê û rêlibergirtina binpêkirinan de.

Ji bo pêkanîna vê nêzîktêdayîna yekûnî çawa ku tiştên ez, tu, ew, hûn bikin hene; tiştên em bi hev re bikin jî hene. Heke em hêza xwe veguherînin rêxistinekê, wek rêxistin tiştên ku em bikin hene. Ne li hember kesekî, di asta welêt de, tiştên ku derbarê netewetiyê de em bikin hene. Di navbera van de jî têkiliyeke arîtmetîk tune ye; hemû di nava hev de. Ji loma pêkan e ku em bibêjin ji derekê û bi şûn ve tu girîngiya nîqaşa 'ez ê vî bêhtir derxim pêş an jî wî bêhtir derxim pêş tune ye.'

Niha dixwazim derbasî beşa çaran a mijara xwe bibim ku mijara dawîn e. Ev binpêkirina qedexeya îşkenceyê û binpêkirina mafên mirovan ne tenê têkiliyeke di navbera fail û yê duçarî vê bûyî de ye. Ne meseleya "wî îşkence li wî kiriye" ye. Aktorekî sêyemîn jî heye ku em jê re dibêjin şahid. Peyva şahid bi xwe jî bi nîqaş e. Lê ji bo ku zelal bibe em ê bibêjin fail, yê duçar maye û

şahid. Civak bi xwe şahidê van hemû rûdanan e. Dawiya dawîn li cihekî ku ez jî tê de hemû civak lê ye ev tişt diqewimin. Wek hêmanekê em kirdeyên civakê ne. Dema meriv welatî be, kirde ye jixwe. Ango dema kesek tiştekî bi kesekî din bike ew luksa me tune ye em vekişin quncikê xwe û lê temaşe bikin. Heke ez vekişim quncikê xwe, nexwe min destûr daye vê, wek endamekî civakê, di vî warî de berpirsiyariya min jî heye.

Lewre dema em qala mafên mirovan bikin, fail an dewlet e an jî yê ku li ser navê dewletê tevgeriyayî ye, ji ber pênaseya xwe. Di jiyana rojane de kesek îşkenceyê li kesekî din bike ev nakeve sînorê mafên mirovan. Îqtidarek divê hebe. Em wek civak hinekan peywirdar dikin. Ev hemû bê guman cihê nîqaşê ne lê îro ji ber peymaneke ku heyî tê qebûlkirin, civak hinekan peywirdar dike, ji bo ewlehiya civakê hinek ji azadiya xwe bêpar bên hiştin, ji bo ewlehiya me bêpar dihêle. Hemû sîstemên înfazkirina cezayan tên nîqaşkirin lê dawiya dawîn civak vê rayeyê dide dozger, vî û wî. Lê dema wê rayeyê dide, hin sînoran datîne wek civak. Jê re dibêjim, “Tu dikarî azadiya kesekî jê bistînî ji bo ewlehiya min lê ji bilî azadiya wî kesî divê tu destê xwe nedî mafên wî yên din, bi ser de mafên wî kesî divê ji hêla te ve werin misogerkirin.” Heke tu wan misoger nekî û îşkenceyê bikî ev sûc e jixwe. Wê demê, civaka ku raye daye te, divê hesabê vê ji te bipirse.

Yek jî li jiyana rojane bifikirin. Kengî şahid vediguhere fail an jî vediguhere yê duçarmayî? Ez îro şahid im lê di heman demê de dikarim bibim yê duçarmayî, tew carinan dikarim bibim fail jî. Ma ew îhtimal tune ku yê duçarmayî rojekê bibe fail? Ev jî di nava xwe de esas tiştekî pir bihurbar e.

Trawmayeke civakî ya domdar... Heqeten jî em li welatekî wisa dijîn ku tiştên asayî û awarte gelek caran tevlihev dibin. Jixwe di dîroka komarê ya nêzî nod û şeş salî de, nîvê wê, çil û sê salên wê ji hêla rejîmên derasayî ya fermî ve hatiye rêvebirin. Wek hûn jî dizanin Rêvebiriya Rewşa Awarte ya Fermî di Tîrmeha 2018an de ji holê rabû. Lê di wan salan de qanûnek derket û gotin, “Em Rewşa Awarte radikin lê heta sê salên din jî pêdiviya me dîsa bi rêvebiriyê heye.” Çima ku şertên Rewşa Awarte dewam dikir, maweya binçavkirinê donzdeh roj, kî çi bixwaze dikare bike û kî bixwaze dikare yên di ji kar biavêje. Dixwazim bibêjim Rewşa Awarte wek fiîlî hê jî heye. Ji loma nîvê din jî bi rewşên derasayî ên fiîlî hatiye rêvebirin. Em li welatekî wisa dijîn ku di sedsala dawîn de bûne şahidê trawmayên civakî û serobinoyên mezin.

Tenê di demeke nêzîk de, di pevçûnên derbarê Meseleya Kurdan de, gelek kesî jiyana xwe ji dest da. Ber bi dawiya 2012an, wek hûn jî dizanin li vî welatî şerekî dijwar hebû. Paşê rojekê tiştek qewimî û pevçûn qediyan. Bêpevçûniyê dest pê kir, di Rêbendana 2013an de. Paşê rojekê tiştek qewimî û pevçûnan dîsa dest pê kir. Ango heke dilê wan bixwaze dikarin pevçûnan

di rojekê de bidin sekinandin. Û heke ne bi dilê wan be dîsa dikarin di rojekê de pevçûnan derxin.

Şer, pevçûn, her tiştî dikuje, jê jî wêdetir nirxan dikuje. Mixabin ne mimkun e ku meriv miriyan bi şûn ve vegerîne. Ne mimkun e ku ev mîrateya çandî bi şûn ve bê vegerandin. Ev daristanên ku hatine şewitandin bi sed salan wext jê re divê, heta xwe nû bikin. Piştî ewqas rûdanên nexweş, dixwazim bala we bikişînim ser tiştekî derbarê vê pêvajoya xirab de. Qanûn an jî sazî di demeke kurt de dîsa ji nû ve tên sazkirin lê li devereke ku nirx hatine hilweşîn ne pêkan e sazî û qanûnên ku ji nû ve hatine sazkirin li ser pêyan bimînin. Ji loma divê em xisûsî li ser meseleya jidestçûna nirxan bisekinin, hemû bi hev re hewl bidin û têkevin nava kar û xebatên ku parêzvaniya mafên mirovan wek nirxekî ji xwe re dike pêşeng. Û bandora vê hilweşînê nifş bi nifş dewam dike.

Ser meseleyê trawmaya civakî ya domdar... Em civakeke wisa ne ku em dixwazin serboriyên xwe yên dilsoj ên rabirdûyê ji bîr bikin. Em jê direvin hinekî, ev tê famkirin. Lewre ev ji bo me hemûyan mekanîzmayek e. Mekanîzmayeke parêzkar: Ji bîr bike an jî tepeser bike. Di heman demê de pratîkeke rêvebirinê heye ku dixwaze jibîrkirinê bi qedexeya bibîranînê, li vê herêmê bi navên xwe, bi qedexeyên şîngerandinê pêk bîne. Ji loma em ji Tirkiyeyê re dibêjin welatê şînên nîvcomayî. Trawmayeke ku bi taybetî ji Meseleya Kurdan derketî û pê de pê de li hemû welatî belav bûyî.

Helbet heke hûn qala şîneke nîvcomayî bikin... Ji bo ku rabirdû li rabirdûyê bimîne û pêşeroj ji nû ve were, divê proseyên şînê biçin serî. Heke neçin serî, heke bîr ji nû ve neyê sazkirin û jiyan ji nû ve neyê binavkirin, li wir bîrên sexte yên îzole, komên îzole tên pê. Newala di navbera mirovan de kûrtir dibe.

Meseleya "Gelo em çawa dikarin civakê ji vê rewşê derxin û bigihînin asteke dîtir?" Vê jî -bi ya min- divê em di ser wan nirxên gerdûnî û azadker re careke din nîqaş bikin, da ku em vî ruhê parçebûyî bicebirînin. Pêkan e ku ev hemû bi xebatên yekûnî yên wekî heqê heqîqetê, xwegîhandina edaletê û veheriyê pêk bên. Rêwîtiya ji rabirdûyeke parçebûyî ber bi pêşerojeke dabeşkirî, di navenda çareseriya pevçûnan de ye.

Helbet ev ne xebatên yekpare ne. Ev hilweşiyaye, ew hilweşiyaye... Pêvajoyên van ên veheriyê hene. Pêvajoyên bêpevçûn, bê guman bi tena serê xwe jî pir hêja ne. Lê wek hûn jî dizanin pêvajoyên aştiyê hew ji bêpevçûniyê pêk nayên. Loma aştiyeke adil; li dijî jidestçûna demokrasî û nirxan serîhildan, hevpariyeke ku li ser bingeha nirxan avabûyî û daxilbûna bi vê boneyê ye. Libendêmayîna ji filankes û bêvankes wêdetir e ev. Yekser ez, tu, hûn, em, ew... Divê bê daxilbûn.

Li vir berê rexneyê didim xwe jî: Digel van hewldanan, ew pêvajoya heta em bibêjin xirab, hat serê me û hê jî tê serê me û me nekarî em rê li ber bigirin. Belê bê guman berpirsiyariya mezin a îqtidarê ye. Dawiya dawîn bi dilê me be jî ne bi dilê me be jî em wer qebûl dikin ku civakê ev raye daye îqtidara sîyasî. Lê wek civaka ku em hemû kirdeyên wê ne, me nekarî rê li ber vê pêvajoya erjeng bigirta. Gelek dostên me pê re çûn, hatin kuştin, hewldanên pir mezin dan. Ev hewldan divê neyên bêhurmetkirin, divê tim bên bibîranîn. Lewre heke sibê tiştek bê kirin dê li ser hewldanan bê kirin.

Me nekarî rê li ber vê xirabiyê bigirin lê yek ji van jî ne qeder bû, hemû bi destê însên pek hatin û pêk tên. Gotinek heye di warê tenduristiyê de: "Heke tiştek bi destê însên pêk hatibe, ew ê teqez rê li ber bê girtin." Xilas. Çima ku me nekariye em heta niha rê lê bigirin ew nayê wê wateyê ku em ê êdî nikaribin rê lê bigirin. Dîroka şer û pevçûnan ji aliyekî ve parçeyekî muhîm ê dîroka mirovahiyê ye. Lê ev tê wê wateyê ku dîroka aştiyê jî parçeyekî muhîm ê dîroka mirovahiyê pêk tîne.

Çima ku ev mesele bi destê însên pêk hatine, rê li ber tê girtin, rêlibergirtin jî bi saya me, bi saya me hemûyan pêkan e. Bawer bikin di vî warî de pêzanîn û azmûneke me ya muezzem heye. Em xwediyê wê hêvî, ûcdan û hemû tiştên din in ku ji êşên –digel ên dinyayê- vî welatî nizilîne.

### BEŞA PIRS - BERSIV Û NÎQAŞAN

**Beşdar:** *Em piştevaniya saziyên sîvîl ên li dinyayê kêm zêde dibînin. Baş e, di warê mafên mirovan de hewldaneke navneteweyî heye ku bandorê li vê derê jî bike? Berê, nexasim di salên 1990î de ev hewldan zêdetir bû bi qasî em dibînin. Te dît piştî axaftina Leyla Zana ya li meclîsê, piştgirî dan, xelat danê. Em niha lê dinêrin, qada navneteweyî pir guh nade azadiya fikrî. Piştevaniya saziyên civaka sîvîl ên nava welêt kêm zêde em dibînin. Fikra we çi ye?*

Heqeten jî em hemû her tiştî hest dikin û pê dihesin. Ez dikarim di ser azmûnên xwe û yên weqfê re tiştinan bibêjim. Min di axaftina xwe de jî got lê hinek din zelaltir bibêjim: Li Tirkiyeyê em bi krîzeke mirovahiyê re rûbirû ne. Heta ew rîska ku însan ji heqên xwe bêpar bimîne li ber mirovan hebe, li wir krîza mirovahiyê heye. Ev li dinyayê jî wiha ye. Li dinyayê jî krîza mirovahiyê heye. Em dev ji heyamên berê berdin. Lewre îsal sala heftê û yekemîn e ku Danezana Mafên Mirovan a YNyê hatiye ragihandin. Wek hûn jî dizanin, avadaniya bi navê YNyê, di sala 1948an de bi dirûşmeya "Careke din hew!" hatiye damezirandin, di şert û mercên şênber ên dinyaya wê demê de. Wê demê koma dewletên sosyalîst û koma dewletên kapîtalîst hebûn. Hevsengiya wê demê ev çeqa vektorî pêk aniye. Dema em di wir de lê binêrin, dibe ku kêm

be, di vir de lê binêrin dibe ku tiştekî din bê gotin, nîqaş dê dûvdirêj bibe û here. Lê di encama hevsengiyekê de bi dirûşmeya "Careke din hew!" damezirî ye.

Çi careke din hew? Şerê Dinyayê yê Duyemîn ku di demeke nêz de qewimî, bi deh milyonan kes mirî, welat hilweşiyayî, wêran û talanbûyî. Da ku careke din hew tiştekî wiha rû bide. Danezana Mafên Mirovan bi hevokeke xweş dest pê dike. Wê hevsengiyê ev hevok daye nivîsandin esas: "Da ku însan li hember zext û zorbaziyê wek rêya dawî mecbûrî serîhildanê nemîne, bi rejîmeke hiqûqî, parastina mafên mirovan bivênevê ye." Ango wekî ku di danezanê de jî dibêje, li hemberî zext û zorbaziyê raperîn û serîhildan derbarê mafên mirovan de ye. Ew qebûlkirina wê ya sergirtî ye. Da ku wek rêya dawî însan mecbûrî serîhildanê nemînin, ev heq derxistine û ji 1948an û vir ve li dinyayê hin tişt qewimîne.

Zaroktiya min teqabulî salên 1960yî dike. Li seranserê hemû dinyayê nirxên pir xurt ku bi wî aqilê zaroktiyê me hest dikir û derbarê pêşerojê de jî hêviyên me yên xurt hebûn ku li ser wan nirxan xwedî dibûn. Ciwaniya min di salên 1970yî de derbas bû, yek ji wan kesên pir bi siûd im. Bi şertê ku ez ê êşên wê tu carî ji bîr nekim, xweşikiyên muezzem diqewimîn li Tirkiye û dinyayê. Helbet di sala 1974an de bi derbeya eskerî ya li dijî Allendeyê re, li Amerîkaya Latîn rêzek dest pê dike. Di 1980yî de li Tirkiyeyê jî, wek qava din min qal kirî, ya ku min çîroka weqfê pê dayî destpêkirin derbeya eskerî bû.

Rûdanên salên 1990î jî tên bîra min. Ber bi dawiya 1990î û destpêka salên 2000î guherînek çêbû. Ez tenê qala êrîşa di 11ê Îlona 2011an a li dijî qûleyên Amerîkayê nakim. Hûn jî dizanin, Amerîkayê piştî wê, polîtîkayeke wek "An tu li hêla min î an jî terorîst î!" meşand. A niha li Tirkiyeyê rêvebirên siyasetê jî li ser heman helwestê ne. Piştî wê rûdanê aniha li dinyayê pêvajoyeke wiha heye.

Em gav bi gav hatin. Aniha Danezana Mafên Mirovan a YNyê ku "Careke din hew!" ji xwe re kiriye şîar li holê ye bê ka li Tirkiyeyê û li dinyayê çiqas hurmetê dibîne. Hurmetê nabîne, hêzên mezin li gor dilê xwe her tiştî dikin. Dibe berê jî dikirin lê dema berê dikirin zorbendiya hêzeke girêdar li ber radibû. Ev krîza mirovahiyê ya li dinyayê bandorê li mafên mirovan jî dike. Mesela yên ku di salên '90î de bi mafên mirovan re têkildar bûn, di nava helwesteke xudreste de bûn ku li ser daneheva rabirdûyê xwebixwe xwe gihandibûn. Qesta min bi xudresteyê çi bû? Tecrûbe û zanyariya wê tevgera ûcdanî hebû. Niha em bandorgirtina ji wî tiştê ku jê re dibêjin "amûrkirin" pir dibînin û ev di mekanîzmayên navneteweyî de jî wiha ye.

Mekanîzmayên navneteweyî jî hêmanên YNyê ne ku Tirkiye jî endam e, hê-

manên Konseya Ewropayê ne. Yek ji pêşqebûlên li wir ev bû: Bi pêşqebûla ku wê hurmetê bidin rêbazên asgarî yên demokrasiyê, karîgeriya vê mekanîzmayê hatiye rojevê. Dewlet dê hurmeteke asgarî bidin vê. Ango dema fîlan komîteya YNyê tiştek kir, dê dewlet jî bibêjin "Belê, em jî ji bo vê hewl didin." Lê dema di asteke asgarî de jî hurmetê nedin dê çi bibe kesek nizane, ew valahiyeke mezin e. Hurmetê nadinê. Mekanîzma man bêkarîgerî.

Ye yekem, di qada mafên mirovan de erozyonek heye. Ya duduyan, di warê mekanîzmayên mafên mirovan de jî bêkarîgeriyeke krîtîk heye. Nexwe divê em wê helwesta ku mafên mirovan wek hêmaya avaker derdixe pêş xurt bikin, çi li Tirkiyeyê çi li dinyayê.

TIHV bi mîsyona xwe ya mutewazî di vî warî de pir hewl dide. Protokola Stenbolê mînaka vê ye. Van rojan me Protokola Stenbolê li gor pêşketinên dawî nûjen kir ku em li hemû dinyayê karîgeriya wê zêde bikin. Bi vê saîqê em wek TIHV li Îsraîl û Filîstînê hin bernameyan dixin pratîkê. Ne ji bo ku ez heme mezin nîşan didim lê em hêza xwe ji cihê ku lê ne digirin û bi xebatên derbarê tehkîma qada navneteweyî de radibin.

Ez mînakekê bidim, nûnerê me Doktor Serdar Kuni, piştî qedexeyên derketina derve hat girtin. Meseleya Serdar Kuni, piştî ku hat girtin di qada navneteweyî de veguherî kampanyayeke muezzem. Nûnerê me yê Cizîrê bû û me hê nû li wir nûnertî vekiribû. Yekîtiya Bijîşkên Dinyayê biryarên taybet girtin derbarê Şirnexê de, piştî wê malwêraniya mezin. Nîfûsa Şirnexê ji 95 hezaran daket 47 hezaran. Heft taxên li navendê ji binî ve xira bûn. Di mehkemeya Serdar Kuni ya ewil de ku di Adara 2017an de pêk hat, ji Yekîtiya Bijîşkên Dinyayê, ji Amerîkayê, gelek saziyên tenduristiyê û parêzvanên mafên mirovan li wir bûn. Ez bawer im ew şandeya herî mezin bû ku di wan heyaman de çû Şirnexê. We got xelat, Serdar xelat girtin. Herwiha seroka TIHVyê, Şebnem Korur Fincancı, ku van demên dawî gelek doz lê vebûn, gelek xelat girtin.

Heta ji me hatiye divê em cih bidin pêzanîn û nirxan. Me wek weqif mixabin ji mêj ve ev hîs dikir. Dema pevçûn tune bûn, di çapemeniyê de derket, me got, "Heke em hewl nedin ku ew prose bigihîje encameke erênî, êşên neyên bîra me dê werin serê me." Divê em di hewldanen xwe de bi ser biketina û me ev wêranî xeyal jî nedikir. Dema qedexeyên derketina derve bênavber dewam dikirin, min bi xwe ji rayedar pirsî: "Hat bîra kê ku bi rojan, bi hefteyan qedexeya derketina derve ya 'fermî' ragihîne?" Li dîroka Tirkiyeyê mînaka vê tune ye. Di salên 1990î de jî bi awayekî fermî qedexeya derketina derve çênebûn. Bi ne-fermî digotin, "Dernekeve, na, tu nikarî." Li gor hin lêkolînan nêzî sê hezar war vala kirin. Hejmarên ji hev cihê hene lê zêde zêde hatin hilweşandin, hatin şewitandin. Lê ev ne 'fermî' bûn.

Qedexeya derketina derve ya fermî bi rojan dewam kir. Ya ewil di 12ê Îlona 2015an de bû, li Cizîrê heşt rojan derketina derve qedexe bû. Di şertên asayî de kesek dikare sê rojan tî bimîne. Çima ku dikeve qada tibê, min ev digot. 120 hezar kes li wir dijî, sîvîl ji Şirnexê derneketibûn. Li Cizîrê her roj av tune ye. Wek hûn dizanin tankerên avê hene li ser xaniyan. Ji dûr ve bi gulleyekê li tankerên avan nîşan digirtin. Bi gelek hevalên xwe yên tenduristparêz ve me hewl da ku xebateke zanistî bikin, me bi awayekî îstatîkî gelek hêman derxistibûn ku bandora neyînî li jiyana însên dike. Dê bihata bîra kê, ev nedihat xeyalkirin jî! Hat serê me, pir hat serê me, belê.

Û wê demê bersivên wek "Ev ne teserûfa min e" dan pirsa min a "Ev hat bîra kê?" Axir digel van hemû tiştan, dixwazim bibêjim dîsa jî tiştên em bikarin bikin hene. Yek ji van jî ew e ku ser meseleyê divê di demên bêpevçûn de em li ser senaryoyên xweşbîn ên muhtemel bixebitin lê ji rewşên neyînî yên muhtemel re jî amade bin. Di sala 2014an, dema bêpevçûniyê de me biryar girt ku em li Cizîrê navenda referansê vekin. Hevalên li Diyarbekirê wer diçûn wir û dihatin da ku tehkîmiya wir bikin. Tew me perwerdehiya dawî jî beriya pevçûn dest pê bikin, di Pûşpera 2015an de li wir da. Di warê senaryoya reşbîn de jî me lez da vekirina navendê û di Cotmeha 2015an de vebû. Dixwazim bibêjim meseleya esas yek, tehkîma qada em lê ne û dudu, berfirehkirina qadê. Piştî pêvajoya pevçûnê, mixabin ku dest pê kir, di pêvajoya fermî ya Rewşa Awarte de, ji ber vê, ser meseleyê, me xebatên xwe du qat û nîvan zêdetir kirin. Me qadên nû vekirin da ku em rê li ber binpêkirinên giran ên mafên mirovan bigirin. Ser meseleyê me qadên xebatê vekirin ji Akademîsyenên Aştiyê re yên ji kar hatibûn dûrxistin. An jî hin saziyên hatin girtin, me qad ji wan re vekirin ku xebatên xwe bidomînin. Di wê serdemê de, serdema ku zordestî heta hûn bibêjin zêde bû, di pêwendiya binpêkirinên mafên mirovan de –bê guman ne derbarê hemû xebatên wan de- me hewl da ku qadên xebatê biafirînin ji wan saziyan re ku hatine girtin û ji wan akademîsyenan re kuji kar hatine dûrxistin.

Vê hestê didin mirov ne wisa: "Tu netiştek î!" Wek awayê xêrnexwazî û îşkenceyê yê şênber "Tu netiştek î!" Ji loma çavên kesên tên binçavkirin girêdidin, dixwazin vê mesajê bidinê. Yê min di 1980î de hat serê min, min jî ev dît. Ne ji bo ku em wî nebînin, di navberê re meriv wan dibîne jixwe. "Serê xwe xwar bike!" ev tona deng... "Ez im muqtedîr, dikarim her tiştî bikim, hemû qedera te bi destê min e, tu yê tune bibî." Tiştekî wiha ye sedema ku wê atmosferê diafirînin.

Îro her kes dibêje serdestiya hiqûqê nemaye. Ev ne mijareke cidî ye ku meriv serê xwe pê re biêşîne. Ez ê çiyê wê cidî bigirim? Tiştin tên nîqaşkirin, mîna henekekê. Wiha; li vir serdestiya hiqûqê tune ye, ev tune ye, ew tune ye. Vê mesajê didin me: "Jixwe tiştek tune ye ku hûn bikin, neçin vê edliyeyê, serî

lê nedin, hûn nikarin. Tiştekî hûn bikin tune ye." Vê li ser me ferz dikin. Vê mesajê didin.

Jixwe ji ber van sedeman, tişekî pir bi qîmet e ku em îro li vir hatine cem hev. Kî li kû derê were cem hev, kî li kû derê çi bigire, hemû bi qîmet in. Car caran nîqaşên wiha diqewimin, "Divê em wiha bikin." Kî li kû derê bixwaze çi bike dikare bike, di pêwendiya wan nirxan de ku qadê fireh bikin û qadan biafirînin. Lewre zeafa wan xêrnexwazan ya herî mezin ji nirxan bêparmayîn e. Em ji dûr ve lê dinêrin lê ew ên ku piştgiriya wan xêrnexwazan dikin baş pê dizanin bê ka çawa nirxan çînîçînî dikin. Em nîqaş bikin, tiştên ku ez û weqif jî guh didê ev in: Xurtkirin û berfirehkirina qadên zanistî, israr û piştevaniyê.

**Beşdar:** *We 17 hezar rûdanên îşkenceyê dîtine. Ev hejmareke ezamet e. Muhtemel e ku hûn bi rûyê dewletê yê herî kirêt re muxatab dibin. Dixwazim zehmetiyên vî karî bipirsim. Heqeten jî hûn "li cihê ku agir pêketî" ne.*

*Van bîst salên dawîn, civaka sîvîl –em jî tê de- xwe li projeyan digire. Êdî bes ji bo ku fonan bigirin dixebite her kes. Armancên saziyê yên esas çi ne, ji bo peydakirina kîjan pêdiviyan dixebite, dixwaze çi çareser bike? Ji vir derkevin, em bibêjin bangewaziya foneke wiha heye, çavkaniyeke wisa heye em bibêjin. De ka em projeyeke li gor vê binivisîn. Gelo ev di nava pêşengiyên we yên sazîyî de ne? Dibêjin li filan tiştî dike û projeyan dinivîsin. Tew tê bîra min demekê jê re digotin "sektora sêyem." Bû wek sektorekê, civakparêziya sîvîl.*

*Vê bala min kişand: Parek ji sê parên xebatkarên we dildar in. Heqeten qadeke zehmet e, hûn bi rûyê dewletê yê herî xirab re muxatab dibin û îfşa dikin. Tevî vê rewşa neyînî, xebatkarên dildar ku ji sê paran parekê pêk tînin, ez pir hestiyar kirim. Li Diyarbekirê jî tu rêxistineke wiha tune ye ku evqas xebatkarên dildar tê de hebin. Rexistin di nava çar dîwaran de hepsî bûne, bûne "profesyonel," bûne sektor û tew têkiliya xwe bi girseyê re qut kirine. Em ber bi parêzvaniyeke civakî ya bi vî rengî ve diçin. Dixwazim vê ji we bipirsim: We çawa kir ku ev tora dildaran hat cem hev?*

Hûn ji cihekî erênî dipirsin. Mesela em berovajkî li pirsa we ya dawî binêrin. Beriya ku TIHV ava bibe sedî sed kesên dildar dixebitîn di vê qadê de. Em dikarin bibêjin ji sedî sed daket ji sedî sih û sisiyan. Gava din min hewl da wê vebêjim esas. Rêxistin –heke pênaseyeke xweşiktir hebe lê zêde bikin ji kerema xwe- organîzasyon in. Ango plansazkirina karekî ya li gor pêdiviyekê. Paşê hûn ê li ser bifikirin û organîze bikin bê ka hûn ê çawa wî karî pêk bînin, ev rêxistinek e jixwe. Ser meseleyê dema pêdivî bi van qûrebiyeyan çêbibe, çêkirina qûrebiyeyan a bi hewldana herî xweş û herî baş e rêxistin. Ji loma rêxistinek bixwaze jî nikare bi karên derveyî van karan rabe ku li gor pêdi-

viyekê hatine pênasekirin. Heke em ji jiyana rojane mînakekê bidin; tîmeke muezzem a basketbolê heye. Heke hûn futbolê bi tîmê bidin lîstin ew ê wek zarokan bilîzin, nikarin. Divê ewil meriv hîs bike, rêxistinek tiştekî wisa ye.

Belê, di sala 1990î de ava bû lê çîroka TIHVyê beriya vê dîrokê dest pê dike. Belkî çavê we pê ket. Li wir jixwe xebata tedawîkirina kesên îşkence-lêbûyî ji sedî sed bi dildarî dest pê kiribû. Sektora tendurisitiyê jî bi lez û bez geş bû li Tirkiyeyê, wê demê nexweşxaneyên taybet tune bûn. Sektora tenduristiyê bi giştî li ser avadaniyeke çarmendî saz bûbû; nexweşxaneyên dewletê, nexweşxaneyên zanîngehan, muayenexane, binkeyên tenduristiyê. Di jiyana rojane de me jixwe ew pêk dianîn. Yek jî, derfeta me ya nekirinê tune bû. Çi pê dida kirin mesela? Em bi vî çavî jî li pirsê binêrin. Dema dibêjim pêdan-kirin ne ku bi darê zorê bû. Însan bi li pey armanca jiyana xwe bûn ku manedartir bikin û piştre torek ava bû di nava van însanan de. Çima ev hest derdiket? 12ê Îloneke mistûmezin qewimîbû wê demê. Ez bi siûd bûm, bi tesadufî ez di girtîgehan de mam lê hevalên min li ber çavên min mirin. Ew roj ev roj e bi vê deyndariyê dijîm. Ez bi siûd im ku li ser xwe mam. Hinek neketin girtîgehan, hinek ketinê. Min jî tevî yên jê derketî got, “Gelo ez dikarim çi bikim?”

Nirx pir bi qîmet in. Carinan wiha jî tê gotin, dibe tercîhên me yên şexsî hebin ku divê rêz jê re bên girtin lê ev nirx esas in. Ma jixwe mirov ji bo ku jiyana xwe watedartir bikin nakevin nava hewldaneke esasî?

Nuanseke din a qada me heye; wek tenduristparêzan tetmînkariya pîşeyî. Yekser pîşeyê xwe seferber dike. Wek aktor, doktor, tenduristparêzên ruhî û civaknasên ku di proseyekê de cih digirin. Ew ên ku li wir wê xebata zanistî didin destpêkirin... Va ye li Îzmîrê profesorekî di salên 1980yî de dest bi xebata sîntîgrafiya hestiyan kir. Hemû dinya wek Veli Lök nas dike. Tenê ne li Tirkiyeyê, li dinyayê. Di lîteratûrê de hûn ê bibînin.

Aliyê însanî, wek însanî xwe watedarkirin... Ev ne meseleya zoriyê ye jixwe. Li tu deveran şûna zoriyê tune ye ku hûn li rastiyê bigerin. Nexwe ji vir hûn dikarin derbarê pêşerojê de bigihîjin qeneatekê.

Ne meseleya projeyê bû. Lê paşê weqif damezirî. Çima damezirî? Da ku em birêkûpêktir bin, ji bo afirandina rêyên guncavtir û ji bo ku bêhtir bi bandor bin. Belê, li wir pereyekî şênber jî hewce bû. Wek min gava din qal kir, TIHV jî projeyan amade dike lê di pêwendiya daneheva pêzanîna xwe de û ji bo ku sedema hebûna xwe baştir pêk bîne. Projeyek kengî ne wek armancekê lê wek amûrekê hat bikaranîn wê demê biqîmet e helbet. Wek amûreke ku xebatên di pêwendiya daneheva pêzanînê de û pêkanîna sedema hebûnê hêsantir dikin.

Li ser pirsa fonan... Gava din bi hewldana ez bi ser xwe ve herim, min qala wan rîskan kir; meseleyên profesyonelbûn û amûran. Ev jixwe sedemek e ji bo derketina krîza mirovahiyê û zirarder e. Di tibê de rêgeza bingehîn e; "Beriya gişkê zirarê nede." Ev zirarder e. "Ku tiştek ji destê te nayê bisekine! Mesela ku tu dixwazî projeyên dar û beran çêbike, projeyên avdaniyê, heqeten jî dê bi kêr jî were." "Baş e," me got, "Vir ne pîşeyekî cihê ye." Me got, "Cihê her kesî ye wek welatî." Lê ewqas jî ne, ne cihê henek û laqirdiyan e. Rîskeke wiha heye. Di derketina vê krîzê de, nexwe divê em xwe jî rexne bikin.

**Beşdar:** *Di vir de meseleya krîtîk nirx in ez bawer im. Têkiliya nifşê we ya bi nirxan re cihê ye. Ne wek têkiliya ciwanên niha ye, wekî ku.*

Di pencereya xwe de dibe em nifşên ciwan ji hemû aliyan ve nebînin. Berê jî Tirkiyeyê ev tecrûbe kiriye ku ji hemû aliyan ve nayê dîtin. Bawer im divê em jî di vî warî de li xwe mikur bên. Em ê çawa bibînin, çawa xwe pê bigihînin? Beriya gişkê divê em jî xwe ji wî ruhê vederker ku dibêje ev û ew bi dûr bixin.

Lê di vê mijarê de ji hêla erênî ve em dixebitin; ser meseleyê gava din min qala bernameyên em bi ciwanan re li dar dixin kir; da ku me dewlemend bike lê di heman demê de ji bo agahdarkirinê jî. Û bi tena serê xwe ev hewldanên me yên sînordar jî wê hêviyê dide me ku di nava ciwanan de nirxên xurt hene. Jixwe lêkolînên raya giştî jî raberî me dikin ku ev deh salên dawî di warê hurmetdayîna cihêtiyan de, rêzdariya ciwanên di navbera salên 18-29an de her ku diçe zêde dibe. Ji loma ez di wê baweriyê de me ku van tecrûbe û çavdêriyên me yên sînordar bi tenê jî fikrekê didin me; tecrûbe û çavdêriyên me yên sînordar ên derbarê pêwendiya di navbera nifşên nû û nirxan de.

Ji aliyê din ve, dejenarasyona li zanîngehan, zorbaziya medyayê ya hemdemî û sînordarkirina qada mafên mirovan... ji ber van sedeman ev nifşê nû nikare xwe bigihîne agahî, dokuman û qabiliyetên derbarê mafê mirovan de, ev jî veguheriye pirsgirêkeke mezin.

Jê jî xirabtir, nifşên nû li ber vê xetereyê ne; çima ku binpêkirin bûne wek tiştekî rojane yê ji rêzê, hew maye nifşên nû van binpêkirinan wek parçeyekî jiyanê yê asayî qebûl bikin. Ser meseleyê ciwan di 18 saliya xwe de dest bi fakulteya hiqûqê dikin. Lê li wir qala binpêkirinên mafên mirovan, qala –wekî ku YNyê jî gotî- xirabiya Rewşa Awarte, qedexeya derketina derve nakin, nayê nîqaşkirin. Ew ciwan wisa mezin dibin, wisa radibin. Wek encama van hemûyan jî mixabin, nifşekî bîst salî yê bi rengdêrê "memûrê dewletê" tevdigere heye û hemû xirabiyan rewa dibîne li wan kesên ku wek "dijmin" an jî "bi xetere" tên binavkirin. Tu wiha lê dinêrî, hemû rewşa awarte jê re

asayî tê. Jixwe ya normal ev e, "Ev wisa dibe" dibêje. Tecrûbeyên wan ên berê tune ne û ne di wê rewşê de ne ku muqayese bikin.

Derbarê binpêkirinên mafên mirovan ên salên 1990î de em tavilê bi wezîran re diaxivîn. Wek min gava din jî qal kir, di manzûmeya norman de –naverok xirab, şêwaz pincirî ye, ev hemû erê- dîsa jî astek hebû. Serokwezîrê xwe, wezîrê xwe, waliyê xwe, hemûyan bi hev re wek a niha binpêkirin qebûl nedikirin, qet nebe hinekan ji wan digotin, "Waa, ma wisa bû?" Belkî ji ber vê têgeha "dewleta kûr" derket. Ku van nakin nexwe di bin de, di kûrahiyê de hinek hene û em hatin û çûn bi Yeşîl (Mahmut Yıldırım) man. Hew Yeşîlek heye, geriyaye li van hemû deran. Wî her tişt kiriye tu nabêjî!

Li cem nifşên nû ev jixwe normal in, tiştên jirêzê yên rojane ne. Awayekî din tune ye. Ew derfet tune ye ku bi rabirdûyê ve jî muqayese bike, problemeke wiha heye. Ji ber van hemû sedeman, di pêwendiya nirxan û agahiyan de hevdîtina bi nifşên nû re ku hûn qal dikin, pir bi qîmet e.

Li ser pirsa, em çawa bi van bûyeran re serî dikin der... Gelek hokerên wê hene bê guman, yek ji wan em dikarin bibêjin trawmaya duyemîn e. Em jî belkî xwediyê heman çîrokê ne. Yek jî em ji rêwîtiya kesên trawmadîtî re dibêjin trawmaya duyemîn û ev pêvajoyên trawmatîk tên ragihandin. Ji bo parastina ji vê jî bername hene, bi navê "lênêrîna kesên lê dinêrin." Heta ji me tê em guh didin wê jî.

**Beşdar:** *Ez li ser wê fikrê me ku ev meseleya projeyan û çavkaniyan problemeke mezin e. Piştî ku min di 2001ê de dest bi zanîngehê kir, ez li saziyeke sîvîl bi dildarî xebitîm. Di nava sê çar salan de me komeleya xwe damezirand. Û wek encameke xwezayî ya vê rewşê me jî serê ewil çavkaniyên xwe bi projeyan bi dest xistin. Wan salan wexta me xwe hînî çerxa projeyan û filan dikir ev tiştê ku we qal kir hat serê me. Ango saziya sîvîl çima ku dikeve heyra kirêya xwe û bi vê boneyê bi rêvebirina hin xebatan radibe, pê de pê de ji xebatên di rojeva xwe de bi dûr dikeve. Bi gotineke din dikeve derdê domandina hebûna xwe.*

*Min meraq kir bê ka li dinyayê çawa ye. Min ev dît; li welatên ku qada civaka sîvîl lê xurt û karîger e, jîrekiya polîtîk serdestê vê pêvojoyê ye. Ev xebat li wir li ser hevsengiyeke sêmendî ava bûye; ekonomî, siyaset û civaka sîvîl. Û sêmendiyeke ku li ser hevsengiya raye, berpirsiyarî û çalakiyan avabûyî. Di navbera civaka sîvîl û ekonomî, siyaset, rêvebiriya gel de hevsengiyek heye. Hemû mijarên ku civaka sîvîl dike rojev, jixwe dibe rojeva siyaset û ekonomiyê jî. Menfaeta civaka sîvîl menfaeta her kesî ye. Loma karsaz jî di bin banê berpirsiyariya civakî de an jî bi xebatên din dixwaze piştgiriyê bide civaka sîvîl. Tew carinan bi xwe vê teşwîq dike. Çavkaniyên*

*giştî jî bi wî awayî hatine sazkirin ku meriv bikare xwe bigihînê.*

*Aniha li Tirkiyeyê, fikreke mezin a karsazan tune ye derbarê têkiliya di navbera xebatên civaka sîvîl û deskeftiyên xwe de. Salên dawî belkî ji hin şîrketên saziyî derket lê ji bilî wê tune ye. Jixwe otorîteya giştî pir caran civaka sîvîl ji bo xwe zirarder dibîne.*

*Ya ku min fam kiriye, naçîzane ya ku min dîtiye, hatiye serê min; kesên di nava civaka sîvîl de dixebitin, îstîsna ne tê de, lê hema bibêje hemû ew kes in ku bi şîrikên nirxan re tên cem hev. Ez bawer im divê em bi pêşdaraziyên xwe, yên ku ji ber ezberên me yên siyasî û dînî bi me re çêbûne, rûbirû bibin. Bi pêşdaraziyên xwe yên derbarê ekonomî, karsaz, ticaret û tevgerên fînansê de. Ji bo saziyên xwe yên civaka sîvîl, ji bo dezgehên xwe gelo em dikarin çawa çavkaniyekê peyda bikin ku li nirxên me jî bike? Mesela em bi zarokan re dixebitîn. Pêşniyaza min a wê çaxê ew bû ku em kreşekê vekin. Ango em tim projeyan amade bikin, bila pere werin, bi vî awayî xebat pêk tên û divê tim pereyekî me yê baş hebe. Însan û materyal hene. Hûn ji gelek tiştan re pere xerc dikin. Heqeten jî di vî warî de, saziyên sîvîl û kadroyên xwe, divê ezberên xwe deynin aliyekî, xwe ji hînbûnê re vekin. Çi di têkiliyên me yên bi karsazan re, çi di şêwaza pêzanînên me de, gelek tişt hene ku divê di ber çavan re bên derbaskirin. Xurtbûna asta me ya entelektueliyê her car têra pêkanîna çalakiyan nake.*

*Daneya gava din ez hejandim, pir bandor li min kir, ji sedî sedan daketiye ji sedî sî û sisêyan. Îro hûn ji sedî sî û sisêyan pir baş dibînin. Lewre li derdora ji sedî yek-duduyan e civaka sîvîl. Ango mînaka herî baş û herî xweş qada xebatên li ser îşkenceyê û mafên mirovan e. Ew qad jî qadeke wisa ye ku ji serî heta dawiyê xebata dildarî û "berdêla psîkolojîk" jê re divê. Kesên hûn pê re pêwendiyê datînin û xizmetê didinê tev, êşên mezin kişandine. Hûn jî jê tesîrê digirin. Heke di wê qadê de jî paşketinek hebe, divê em awayê fikirîn û pêzanînên xwe li şert û mercên îroyîn bînin, bi ya min.*

**Beşdar:** *Derbarê avadanî û xebatkarên TIHVyê de dê pirseke min hebe. Hûn di qadeke zehmet de dixebitin. Hûn keda dildarî dixwazin. Ku keda dildarî tune be wer texmîn dikim dê bibe qadeke zehmet ya xebitînê. Ez di civaka sîvîl de dixebitim lê di qadeke rehet de a rast. Koordînatorê dezgehekê me ku fonan dide. Di TIHVyê de belkî ciwan, dildar belkî xebatkarên bi kadro ên mecbûr in bi profesyonelî bixebitin hene. Divê ji bo wan qet ne hêsan be serederkirina bi vê pêvajoyê re.*

*Yek jî, wek sazî hûn vê domdariyê çawa pêk tînin? Divê xebatên we daneheveke çandî pêk bînin. Wek çawa serî bi pêvajoyên diyarkirî re tê der. Mesela li bajarekî divê hûn pêwendiyê bi kê re deynin? Ew kesên ku dixe-*

*bitin jî niha bi demê re dibin xwediyê wê danehavê lê çîrokên ku guhdar dikin, timûtim hevdîtina we ya bi kesên mafê wan binpêkirî re û çarenedîtina bilezûbez a di wê kêlîkê de, divê barekî giran be. Hin hevalên me yên ku tenê ji bo nivîsandina teza xwe bi wan re hevdîtin pêk dianîn, piştî demekê diwestiyan û xemgîn dibûn. Û nedizanîn vê xembariyê têk bibin. Ji bo xebatkarên we jî dibe zehmetiyeke wisa hebe. We got dildarî daket ji sedî sî û siseyan. Gelo hinekî ji ber vê? Wek bibêjin ev pêvajo dewam dike û em çiqas hewl bidin jî dê neqede. Piştî qederekê însan dikeve. Ji salên we, ji nifşê we çend kes man? Ciwan dê çawa bi xebatên we ve bikelijin? Derbarê vê de hûn li çareseriyeke çawa difikirin?*

Gotina min a derbarê daketina rêjeya dildaran de bila şaş neyê famkirin. Beriya ku weqif bê damezirandin me tenê bi dildaran re ev kar bi rê ve dibir. Piştî nîqaşên IHD û TTByê ên navxweyî, me got em çawa dikarin vî karî baştir bikin û biryara damezirandina weqfê derket. Paşê çima ku mekan û kadroyên organîze hewce kir, me tevî dildaran yên kadro, çer ku yek-du mekan çêbûn, vê carê pêdiviya me bi pereyên neqîd çebû. Ango ne ku her çû rêje daket. Karûbarên ku beriya weqfê me dikirin bi temamî bi dildarî bûn lê piştî weqif damezirî ji sê paran pareke wê ji yên dildar pêk dihat, di vî warî de daketin tune ye. Min qala rewşeke beriya weqfê û piştî weqfê kir.

Ya duduyan, me di sala 2012an de derbarê profîla xebatkarên weqfê de hin tespît kirin û wek rapor nivîsandin. Me gotibû “Em pir extiyar bûne” û em şaş hatibûn famkirin. Me di sala 2012an de gotibû em extiyar dibin. Lewre di pêvajoya damezirandina weqfê de nifşekî ji me mezintir hebû. Wê demê em nifşê navîn bûn. Di 2012an de me xwast em ciwan bibin. Paşê derbarê vê nîqaşê de me biryar stand. Di 2012an de me gotibû em ê bêhtir cih bidin ciwan û jinan, me biryarên taybet girtin derbarê meyla zayendî de.

Vê dewlemendiyeke mezin bi xwe re anî û bi saya serê vê, qada me ya sazîyî du qat û nîvan mezin bû. TIHV îsal derbarê hemû xebatkarên xwe de lêkolînek kir. Îroroj di saziyê de ji sêsedî zêdetir kesên dildar hene û şêst û yek jî xebatkarên saziyê hene ku xebatkar jî di eslê xwe dildarê –divê wiha bê binavkirin- vî karî ne. Ji sedî şêst û heft xebatkarên jin in. Ji sedî şêstê xebatkaran jî temenê wan di navbera 20-29an de ye. Qet nebe bi vî awayî pir ciwan bûne.

Xebatên ku em pê radibin bi rastî jî zehmet û giran in. Em hewl didin bi bernameya “Lênêrîna kesên ku lê dinêrin” perwerdehî û terapiyê bidin xebatkar û dildarên saziyê, da ku em rê li ber trawmaya duyemîn bigirin. Bernameya “Lênêrîna kesên ku lê dinêrin” wiha xeyal bikin. Di serî de cihê ku em ê bernameyê bi rê ve bibin muhîm e. Dema ez dibêjim cihê bernameyê, dibe ji we re hinekî razber were. Ev dibe mekanek be, dibe têkiliyên navmiro-

vî, kerîgeriya navxweyî, xebata komî an jî dibe di xebatê bi xwe de karbeşî hebe. Ji loma li her navendê yekîneyên rêvebiriyê hene; di rêvebiriyê de him bûyer him karîgeriya navxweyî tê nîqaşkirin, hê ku hemû kar neketine ser hev. Hemû proseyên karîgeriyê jî tê de. Ya duduyan bi rêya perwerdehiyê em dikin ku pêzanîn û daneheva agahiyan xurttir bibe. Ya sisêyan, em hewl didin di pîşeyên "taybet" de -di serî de tenduristparêzên ruhî- bernameyên supervîzyonê têxin meriyetê. Li hin navendan em vê baştir pêk tînin, li hin deran na. Em nikarin bigihîjin her tiştî lê em li ber xwe didin. Ji hêla parastinê ve ev tiştên krîtîk in. Em bi hevalên saziyên din re jî bi hev dişêwirin, didin û distînin.

Li ser meseleya domdariyê... Helbet dema em wiha ciwan bûn... Ciwan mirovên xweşik ên dinyayê ne. Xeyalên wan ên pêşerojê û jiyana wan a rojane heye, weke me hemûyan. Ya yekem, di zaroktiya me de metirsiya "em ê di pêşerojê de çi karî bikin" bi me re tune bû. Me dibistan dixwend an jî nedixwend paşê me karek bi dest dixist. Di wî karî de jî em heta dawiya umrê xwe dixebitîn û teqawud dibûn. Tiştekî wek pêbaweriya pêşerojê tune bû di jiyana me de. Min dibistana leylî xwendiye. Ji bo perwerdehiyê pere mere tune bû. Jixwe her kes hema diçû dibistanekê, bêyî pere bide. Lawê karmendê dewletê me. Belkî ji ber vê tenduristî ne mesele bû. Jixwe ku em nexweş diketin diçûn nexweşxaneyê. Cirm jî tune bû wê demê. Însanan derman jî dikirî û ameliyat jî dibûn. Bi navê taybet tiştek tunebû. Em ne ew nifş bûn ku bibêjin hadê em herin nexweşxaneya taybet. Nexweşxaneyên dewletê, yên zanîngehan, binkeya tenduristiyê, Saziya Sîgortayên Civakî (SSC) hebûn di nifşê min de.

Niha hema bibêjin çawa ku zarok diwelide malbat dikevin heyra perwerdehiya zarok, bi kreşan, bi pêşdibistanan. Hemû jiyana perwerdehiyê dibe sedema lêçûneke muezzem, îlam jî ew qaşo saziyên perwerdehiyê ku navê taybet li xwe kirine, mesrefên wan deran tew ne yê gotinê ye! Nifşê nû bi awayekî xwezayî dê bikeve heyra van û dê bibêje "Ku zarokekî min çê bibe, ez ê ji salê ewqas bidim heqê perwerdehiyê, ewqas bidim heqê tenduristiyê." Jixwe pêbaweriya tu karî tune ye. Di rewşeke wiha de, helbet dînamîkek jî heye ku xebitîna bidestmiz bi xwe re tîne, we jî gava din qal kir. Em wê dijîn. Tiştekî xwezayî ye û divê meriv fam bike û hest pê bike. Ev rastiyek e. Helbet em wan rewşan jî li ber çavan digirin. Ji aliyê din ve, jixwe piyaseyeke wisa jî nemaye. Em nikarin bibêjin destmizê li gor piyesayê. Kîjan piyase? Em li ser doktoran bibêjin, mesela çiqas e destmizê doktorekî di filan beşê de pispor? Li wir ewqas e li vir evqas, lê li kû çiqas be jî, destmizê ku em didin di binê yê wan re ye. Em hewl didin wê baştir bikin lê ew derfeta me tune ye em bi piyaseyê re qayîşê bikişînin. Çi ku piyase ne piyase ye, cengelekî hov e. Tu yê bi çi re qayîşê bikişînî! Em di vir re dimeşin. Carinan lihevanînin jî çêdibin. Em hewl didin hin tiştên taybet ji wan re li hev bînin. Em hewl didin der-

fetên baştir bidin xebatkarên xwedî zarok. Tiştên mutewazî ne ev, lê ji aliyekî ve jî belkî dibe sedema sîrkulasyonê.

Meseleya din, zordestiya em tê de û ji bo domandina vê zordestiyê bikaranîna amûrên derhiqûqî. Li Wanê gelek hevalên me bi KHKyan rastî binpêkirinên mafên mirovan hatin. Ji karê xwe bêpar man. Bê guman dê di demeke nêz de vegerin, destmizê xwe û tezmînata xwe jî bistînin, dê pasaportên xwe jî ji nû ve wergirin lê kî dê umrê wan ê çûyî bidê? Zar û zêçên wan, der û cîran... Beraet dikin em pê kêfxweş dibin helbet. Lê van hevalên me yên doktor piştî ji kar hatin dûrxistin, ji van deran çûn. Li Wanê karekî ku lê bixebitin peyda nebû. Bêhtir diçin Stenbolê. Kar li wir heye ji hêla doktoran ve. Ne hêsan e rêvebirina wê sîrkulasyonê, ji ber gelek egeran.

Tevî ku bi qasî ji me hatiye em rê li ber wê sîrkulasyonê digirin, dema sirkulasyon çêbû em hewl didin têkiliyên me jî bidomin. Em hewl didin ji wan hevalan re qadan biafirînin. Dîsa jî heke ji ber sedemên aborî derbasî karekî din bibin jî dibin dildarên me wê demê. Mîna gûşiyê tirî îhtîmala ku vebe çêdibe. Îlam jî ji hêla tenduristparêzan ve. Ji wê saziya tenduristiyê diçe ya din. Ne teqez, dibetî. Em hewl didin van baş bikin û van têkiliyan geş bikin.

**Beşdar:** *Mijareke gîrîft e rehabîlîtasyon. Jixwe we bi israr got ku ev encamek e. Ango we got heke hokerên din ên rehabîlîtasyonê tune bin dê li banî bimîne. Ev, tê vê wateyê jî. Di wateya xwe ya asayî de rehabîlîtasyon ew e ku di serdema berexêrbûnê (serdema piştî nexweşiyê) de li kesê nexweşketî tê kirin ku ji nû ve li civakê bike. Ew "re"ya li pêşiya rehabîlîtasyonê qertafeke tebatî ye, wek fikareyekê xuya dibe. Wek we jî anî ziman, em qala kesekî ku bi heqan hatî nixumandin dikin. Ji loma divê ji vê re bê amadekirin.*

*Ji bilî kesê îşkencedîtî ji bo ku trawmayên berê dîsa rû nedin, divê ev hevdîtin û rûbirûbûn temam bibin. Rehabîlîtasyona rast ev e. Ji loma bi qasî îşkencedîtî, ez haletî ruhiyeta fail jî meraq dikim. Fail, ew kesê ku îşkence kiriye. Çawa ku failên ji salên 1980yî û 1990î mayî hene û ew jî li derve ne, bi me re digerin. Gelo hûn wek TIHV qet rastî wan hatin? Ango ez ne bawer im wisa bi helwesteke xwe-rexneyî, bi daxwaza pakbûnekê serî li we dabin lê te dît belkî hebin an jî li cem dozgeran li xwe mikur hatibin. Di vî warî de we bi van re tu xebat pêk anî? Çi ku heqeten jî yên nexweş hene. Nexwe însanek çawa dikare îşkenceyê li yekî bike? Çawa dikare ewqasî bibe hov, ez li vê difikirim. Di dîrokê de tîpên navdar ên bi vî rengî hene. Ser meseleyê dozeke navdar a Eichmann heye, di serdema Hîtler de. Yên ku dibêjin min peywira xwe bi cih anî jî hene. Bêhtir tiştên sosyolojîk û polîtîk in lê ji hêla psîkolojiya klînîk ve an jî bi çavê doktorekî hûn fail çawa dinirxînin?*

Pir spas, hişyariyeke mafdar e. Em têgehên tedawî û rehabîlîtasyonê bi hev re bi kar tînin. Ez pûtepêdayî axivîm. Min hewl da behsa peyva rehabîlîtasyonê ku di nava xwe de ji pênc astan pêk tê bikim. Behsa astên rehabîlîtasyonê û nêzîktêdayîna wê ya yekûnî. Ez jî bi te re me. Ji ber ku me ev ji tibê aniye, meriv dikare li wir jî hîs bike.

Tundiya li dijî kesên azadiya wan jê hatî standin; li kolanê, li vir, hema du sikakan ji vir wê de, îlam jî piştî 19ê Gelawêjê, me daxuyanî da û got tundiya polîsan îşkence û miameleya xirab e. Dotira rojê saziyên mafên mirovan ên li Diyarbekirê jî daxuyaniyeke mîna vê dan. Dixwazim bibêjim çi? Li wir mesela em ji wê gazê re, ku di jiyana rojana de jê re dibêjin bombeya fîrmêskrêj, dibêjin "çeka ji madeyên kîmyewî pêkhatî." Çeka ji madeyên kîmyewî pêkhatî ye û heke wê gazê biavêjin ser kesên ku bi armanceke aştiyane li wir sekinîne, ew ne mudaxeleya ji hedê zêdetir e. Li wir kesek li ber xwe nade; li wir jixwe re rûniştî ne. Tu serê gavê diçî û teq gazê davêjî. Li wir çi dibe? Çavên me dişewitin, mudaxele pêwîst e. Ev mudaxeleyeke besît e. Tiştek dikeve ser sînga me ne wisa? Tiştek hewce dike li wir. Dibe di ruhê me de jî tiştin biqewimin. Dibe mudaxeleyên ji hêla tenduristiyê ve bi qîmet hewce bikin, bê guman. Lê di meseleya 'em nexin dirûvekî tibî' de, wek min di axaftina xwe de jî anî ziman, ez jî bi we re. Pir spas dikim.

Ya duduyan meseleya faîlan... Di sala 1996an de li ser vê meseleyê nîqaşên cidî qewimîn di weqfê de. Wek we got, ev fail bi me re digerin, di nava me de ne. Axir piştî van nîqaşan em gihiştin wê encamê ku fail dê zirarê bidin pêvajoya tedawî û rehabîlîtasyona kesên îşkencedîtî û me li hev kir ku em wan li derveyî vê xebatê bihêlin. Lewre sedema hebûna me tedawî û rehabilitasyona kesên îşkencedîtî ye û nedibû em tiştekî ku zirarê bide sedema hebûna xwe bikin. Belê, wek heyeteke ku bi vê meseleyê re mijûl dibe, tevî ku di vê qadê daneheveke me ya muezzem heye, me li hev kir ku em bi failan re nexebitin.

Axir me ev nîqaş kir wê demê. Ji ber van egeran, me got, "Em bi vî karî ranebin lewre wê zirarê bide karê me yê eslî." Lê ev rewşek e. Ango em nikarin bi van failan re bijîn wekî ku tiştek neqewimiye. Meseleya ku min gava din qalê kiriye û heye ku hûn jî di nava xwe de nîqaş dikin. Hêmaneke muhîm e di meseleya çareseriya pevçûnan de.

Di proseya pevçûnê ya piştî vê de, xweş xuya ye ku ji bo rabirdû were jibîrkirin û pêşeroj bê, divê bername bên plansazkirin.

**Beşdar:** *Dema 15ê Tîrmehê, li ber kamereyan îşkence kirin. Derbarê vê de ma mexdûran serî li we dan? Em bi IHDyê re axivîn mesela, li ser vê mijarê. Hin hewldanên IHDyê çê dibin; xwe digihînin însanan û ji malbatan re dibêjin "werin, netirsin!" Rewşa li ba we çawa bû?*

Bi boneya vê pirsê ez careke din bînim ziman ku heta ji me hatiye em guh didin nepenî û mahremiyeta agahiyên derbarê serîlêdanan de û em wan agahiyan bi kesekî re parve nakin. Divê em agahiyên li ber destê xwe yên derbarê agahiyên serîlêdanan de wek hurmetdayîneke mehremiyetê nedin kesî. Ser meseleyê doza me ya Edeneyê hebû. Navên serîlêdanan ji me xwastin, me neda, tevî xetereya darizandin û cezaxwarina me. Me nîqaşeke ezamet kir, em pir mafdar bûn.

Tevî vê yeke, bêyî em nav û nasnameya serîlêdanan aşkere bikin, bi awayekî anonîm em raporên xwe yên salane amade dikin û bi raya giştî re parve dikin.

Weki ku me di van raporan de jî cih dayê, îşkence û miameleya xirab piştî 15ê Tîrmehê bêhtir berbelav bû lê divê bînim bîra we ku îşkence û miameleya xirab, demên dawî, nemaze ji Tîrmeha 2015an û bi şûn ve bi destpêkirina pevçûnan re jixwe bi awayekî berbiçav zêde bûbû. Bi awayekî berbelav û sîstematîk heye. Hejmar heta hûn bibêjin zêde ne. Min berê jî gotibû ku li Tirkiyeyê zêdetirî milyonek însan rastî îşkence û miameleya xirab hatine. Hejmara li ber destê me, heta dawiya 2018an 17600 e. Dema meriv lê dinêre dibe meriv bibêje hindik e lê dema em bi çavê yekî ji wan lê binêrin dinya guheriye bûye tiştekî din. Digel vê hejmara zêde, serîlêdanên ku hatine pir kêm in. Ji derdorên cihê yên civakê bi rêjeyên curbicur serî li me dane. Ez bawer im hûn vê di çapemeniyê de dişopînin. Îsal li Enqereyê şeş heb bûyerên wendakirina bi darê zorê qewimîn. Çar jê dema bi şev diçûne emniyetê, paşê emniyetê ragihand, ku ji ber egera li derdora emniyetê bûne, hatine binçavkirin. Dudu jê hê jî wenda ne. Niha belkî we malbatên wan serwendahiyan temaşe kirin. Li IHD û TIHVyê daxuyaniyên xwe didin. Belkî bibe mînak ji bo pirsa ‘çi dikin?’ Min xwast bi we re parve bikim.

# GOTINA DAWÎ: TIŞTÊN JI BO XATIRÊ AŞTIYÊ BÊN KIRIN TIM HENE

*Vahap Coşkun*

Wek têgeheke navdîsîplînî, pênaseyeke giştî ya pevçûnê ya hemû aliyan li ser lihevkirî tune ye. Lewre pevçûn têgeheke ji hin rêzetevger û têkiliyan pêkhatî ye ku tiştên ji hev cihê tîne bîra her kesî. Pênaseyeke hemû aliyan li ser lihevkirî tune be jî meriv dikare bibêje li ser sedemên pevçûnan hema bibêje her kesî li hev kiriye.

Pevçûn bi piranî di warê lihevnekirinên nirxan de; ji ber cihêtiyên îktîsadî, siyasî, îdeolojîk, çandî û etnîk; ji ber hêmanên psîkolojik û erdnîgariyê derdikeve. Dema kes an jî komik dixwazin pêdiviyên xwe, berjewendî, nirx û daxwazên xwe pêk bînin, bi wan wer tê ku ji hêla kes an jî komikên din ve tên/dê bên astengkirin. Piştî astekê ev fikir vediguhere çalakiyê, dibe sedema aciziyê di navbera aliyan de û ev jî axir vediguhere pevçûnê.[11]

Her pevçûn di nava xwe de tundiyê nahewîne. Lewre pevçûn ji ber tebîeta xwe wek rewşeke menfî nayê pênasekirin. Heta di nava xwe de tundiyê nehewîne, pevçûn dikarin bibin sedema guherîn û veguherîna civakê. Lê dema aliyên pevçûnê ji bo parastina berjewendiyên xwe an jî ji bo gihiştina hin armancên xwe dev ji rêbazên aştiyane berdin û hikum li ser aliyê din bikin, pevçûn dê veguherin tundiyê.

Pevçûnên ku tê de tundî hebin, xisareke piralî didin civakê. Lewre her alî ji bo gotina xwe bi aliyê din bide kirin, dê hemû hêza xwe bi kar bîne da xisarê bide nirxên madî û manewî yê aliyê din, tew dê hewl bide ku wan nirxan ji holê rake. Maweya pevçûnê her ku dirêj bibe û li mekanan belav bibe dê rûxandina civakê zêdetir bike. Însan dê bimirin, dê birîndar bibin. Dê barekî giran were ser pişta aboriyê. Erdnîgarî dê tarûmar bibe. Azadî dê ji holê rabin. Qada demokratîk dê li me teng bibe. Axir, ji her aliyî ve pevçûn dê bibe sedema malxirabiyê.

Lê tu pevçûn heta bi hetayê nadomin. Hemû pevçûn dê bi awayekî ji awayan bên çareserkirin. Heke aliyekî pevçûnê an jî her du alî bibînin ku dê bi rêya çekan nikaribin bi ser bikevin an jî alî pê bihesin ku bingeha pevçûnê siyasî ye, carinan jî guherîna serkêşên aliyan dibe ku bibe sedemek ji bo qedan-

11 Akyeşilmen, Nezir, "Çatışma Yönetimi: Kavramsal ve Kuramsal Bir Analiz [Rêvebirina Pevçûnê: Dahûrandineke Têgehî û Teorîk]"; Akyeşilmen, Nezir (Ed.), *Barışı Konuşmak [Nîqaşkirina Aştiyê]* (Enqere: Weşanên ODTÜ, 2013), r. 40.

dina pevçûnê[12] û ji dêvla domandina pevçûnê dê lêgerînên çareseriyê bên nîqaşkirin. Ji loma îxtîlafa ku bûye sedema pevçûnê çiqas kûr dibe bila be, piştî qederekê sekinandina xwînrijandinê û sazkirina jiyaneke asayî dê bibe armanceke hevpar.

Tenê rêyeke çareseriyê tune ye. Dewlet carinan bêyî ku dest bi proseya muzakereyê bikin, derbarê wan mijaran de, ku dibin sedema pevçûnê, guhertinên zagonî û makezagonî dike û bi aliyên din ên pevçûnê ve têkiliyan saz dike. Carinan bi komikên çekdar ên aliyê din ê pevçûnê ve dest bi muzakereyan dikin. Carinan jî her du rê bi hev re tên ceribandin bi hewldana dawiyê li pevçûnan bîne.

Kîjan rê tê ceribandin bila be, di proseyên çareseriyê de karîgeriya civaka sîvîl pir zêde ye. Aştî ji hêla piraniya civakê ve çiqas were qebûlkirin ev prose dê ewqas serkeftî be. Maweya pevçûnê her dirêj dibe, bi civakê wer tê ku dê ev pevçûn qet neqedin û ev rewş dê qet neguhere. Loma beriya her tiştî, aliyên pevçûnê divê wê atmosferê xira bikin ku pevçûn ne tiştên xwezayî yên asayî ne û divê em xwe hînî wê nekin. Divê civak qanih bibe ku mesele ne bêçareserî ye, bi mekanîzmayên demokratîk û siyasî çareserî pêkan e, xisara çareseriyeke bi vî awayî nagihîje kesekî, bilekis dê feydeya vê bigihîje her kesî.

Bi tena serê xwe zehmet e ku dewlet an jî aliyên pevçûnê di van waran de civakê qanih bikin. Ji loma mîmarê proseyê heta jê hatiye divê berfireh be. Ji têkbirina pevçûnan re diyalogeke piralî divê; di pêwendiya serkêşên civakê û raya giştî de hewldaneke jidil divê. Toreke zindî ya civaka sîvîl dê van hewldanan xurt bike, dê hejmara aktorên ku tev li vê proseyê dibin zêde bike û bi vî awayî dê rê li ber qebûlkirina civakî vebe.

Civaka sîvîl xwediyê wê potansiyelê ye ku di hemû qonaxên çareseriyê de dikare tiştinan bike. Di demên pevçûnan de –ango ew demên ku navê diyalog û muzakereyê nayê hilanîn- civaka sîvîl dikare tundiyê bi aliyan bide berdan û hewl bide ku mexdûriyetên ji ber tundiyê derketine ji holê rake. Dikare aliyan qanih bike ku diyalog û muzakere him ji hêla ehlaqî ve him ji hêla siyasî û îqtîsadî ve rêyeke maqûltir e û ji ber sedeman dikare berê aliyan bide diyalog û muzakereyê. Her wiha di şertên herî menfî de jî dikare fikra aştiyê têxe rojeva wan.

Di demên muzakereyan de, dikarin piştgiriyê bidin muzakereyê. Derbarê civakîbûna muzakereyan de dikarin civînên bi gel re li dar bixin. Dikarin aliyên cihê yên civakê bînin cem hev. Dikarin platforman saz bikin ku her du alî

12 Herbolzheimer, Kristian, "Barış Süreçlerini Canlandırmak: Kolombiya ve Başka Yerlerden Çıkarılacak Dersler [Vejandina Proseyên Aştiyê: Şîretên Divê ji Kolombiya û Deverên din Bên Girtin]"; Çelik, A. Betül (Ed.) *Dünyada ve Türkiye'de Barış Süreçleri* [*Proseyên Aştiyê li Dinyayê û li Tirkiyeyê]* (Stenbol: Weşanên Zanîngeha Bilgiyê, 2017), r. 92-93.

daxwaz, tirs û metirsî, bendewarî û hêviyên xwe ji hevûdu re bibêjin. Dikare bibe pire di navbera aliyan de, da ku her alî nêzî hev bibin. Dikare bi lobiyan re û bi parlamenterên ku piştgiriyê didin muzakereyê re bide û bistîne. Dikare bi awayekî fiîlî çavdêriya amadekariyên fermî bike.

Demên ku astengî derdikevin pêşiya muzakereyan, bi rê û rêbazên li ser civakê bandorker dikare aştiyê bîne rojevê. Li dijî manîpulasyonên siyasetmedar û medyaya aştînexwaz, dikare civakê hişyar bike. Dikare zexteke demokratîk li ser aliyan çêbike da ku berê wan bide ser maseya lihevkirinê.

Serdemên piştî pevçûnan jî civaka sîvîl dikare parêzvaniya sazkirina pergaleke adil û wekhev bike. Ji bo pêkanîna aştiyê, dikare qadên nû saz bike da ku komikên ji hev cihê di wan qadan de bi hev re tevbigerin. Di pêvajoyên çareserkirina pevçûnan de, prose bivê nevê ewlehiyê dixe navendê. Civaka sîvîl, dikare –tevî ewlehiyê- bala civakê bibe ser tevlêbûn, tevkarî, refah, rewşa kêmînan, mafên nasnameyî û zimanî.

Axir proseyên aştiyê di heman demê de ji gelek milan ve dikarin bên birêvebirin. Di vî warî de civaka sîvîl xwedî roleke girîng e. Bi van fikir û ramanan, Enstîtuya Diyarbekirê Bo Lêkolînên Siyasî û Civakî (DÎSA), derbarê karîgeriya civaka sîvîl ya di çaresiya pevçûnan û sazkirina aştiya civakî de, bi navê ‘Dibistana Aştiyê’ hin rêzesemîner li dar xistin. Du armancên sereke yên van rêzesemîneran hebûn;

Armancek jê ew bû ku dezgehên civaka sîvîl di hemû şert û mercan de dikarin fikra aştî û çareseriyê bînin rojevê. Nabe çareserî tenê ji raya aliyan ve bê berdan. Dibe aliyên pevçûnê ji bo çareseriyê wextê guncav nebînin. Dibe ji bo xatirê hin hesabên xwe yên din, muzakere û diyalogê taloq bikin. Dibe ji bo gavavêtinê li gor wan bendemayîn ya rasttir be. Lê civaka sîvîl bi van fikrên aliyan ve ne girêdayî ne, nabe xwe têxin şûna wan. Lewre ji bo aştiyê tiştên ku civaka sîvîl bike tim hene. Nexasim li Tirkiyeyê, atmosfereke ku proseya çareseriyê hatî mehkûmkirin –proseya çareseriyê ya di navbera salên 2013-2015an de hatî birêvebirin-, di asta giştî de nîqaşkirina aştî û çareseriyê pir bi qîmet e.

Ya din, me xwast derbarê mijarên krîtîk ên wek; *civakîbûna navkomî, parêzvanî û ragihandina giştî, parastina welatiyan, pevrebûna civakî ya li dijî pevçûnan, şopandin û hesabdayîn, xizmetdayîna yekser, hêsankarî û navçînî* de saziyên civaka sîvîl azmûnên xwe parve bikin. Lewre nîqaşkirina van azmûnan, meriv ji hêla fikrî ve ji proseyên muhtemel ên pêşerojê re amade dike û dike ku meriv ji wan azmûnan şîretan bigire.

Saziyên civaka sîvîl bi tena serê xwe nikarin aştiyê saz bikin lê dikarin piştgiriyê bidin proseyên aştiyê. Pêdiviya aştiyê ne tenê bi îradeya aliyan heye,

pêdivî bi hewldaneke yekûn heye. “Di proseyên çareseriyê de alî gelek caran dikarin maseyê biterikînin. Lê heke civak xwedî li aştiye derkeve û zextê li serkêşan bikin, vegera ser maseyê tim pêkan e. Proseyên aştiyê bi muzakereyan ne dorsînorkirî ne. Ji maseyên muzakereyê mezintir in. Ji ber vê, hewce ye bawerî qet têk neçe û têkoşîna aştiyê di astên cihê de berdewam bike.”[13] Saziyên civaka sîvîl heta vê pêk bînin dê aştî û çareseriyê jî ewqas zûtir pêk bînin.

13 Çelik, Ayşe Betül, “Barış Süreçlerini Anlamak ve Canlandırmak [Têgihiştin û Vejandina Proseyên Aştiyê]”; Çelik, A. Betül (Ed.), ***Dünyada ve Türkiye’de Barış Süreçleri [Proseyên Aştiyê li Dinyayê û li Tirkiyeyê]*** (Stenbol: Weşanên Zanîngeha Bilgiyê, 2017), r. 10.

Avakirina mala aştiyê bi mekanên aştiyê pêkan e. Sazkirina mekanên aştiyê jî ne tenê bi sekinîna pevçûnan pêkan e ne jî tenê karê aliyên pevçûnê ye. Û bi ser de aktorên siyasî jî nikarin bi tena serê xwe vê saz bikin. Lewre pevçûn tenê di navbera aliyên pevçûyî de naqewimin. Pevçûn ji hêla aborî, civakî, çandî, îdarî, mekanî, derûnî û ji gelek aliyan ve têkiliyên navcivakî têk dibe û wan têkiliyan bi hesta tolhildanê û dijminahiyê jehrî dike, bi wan têkiliyên jehrî jî ji xwe re pergaleke nû ava dike.

Ji bo têkbirina tundiyê, lênihêrtineke di ser siyasetê re, jinûve-sazkirina têkiliyên jehrîbûyî û mobîlîzasyoneke civakî ya pirqatmanî, piraktorî, pirrehendî divê da ku em karibin ji pîvanga mîkroyî derbasî pîvanga makroyî bibin. Aktorên civaka sîvîl di mobîlîzasyoneke wiha de dikarin peywireke girîng bi cih bînin. Ne tenê di warê jinûve-sazkirina têkiliyên civakî de lê di warê veguherandina qada siyasetê de jî dikarin peywirê bi cih bînin.

Xebata li ber destên we ji nîqaşên xebata "Çareseriyên Pevçûnê û Erka SCSyan di Avakirina Aştiya Civakî de" hatiye pê ku (DÎSA: Dibistana aştiyê) ev xebat organîze kiriye. Çîroka hêvîdar û bandorker a heft saziyên civaka sîvîl li hêviya we ye.

DİYARBAKIR SİYASAL VE SOSYAL ARAŞTIRMALAR ENSTİTÜSÜ
ENSTÎTUYA DIYARBEKIRÊ BO LÊKOLÎNÊN SIYASÎ Û CIVAKÎ
DİYARBAKIR INSTITUTE FOR POLITICAL AND SOCIAL RESEARCH

FRIEDRICH EBERT STIFTUNG

ISBN 978-605-5458-41-6